



## Naveroka hejmara 10

### Sernivîsar

Kanîzar nahêle kurdî sêwî bimîne, r. 3

### Husein Muhammed

Bikaranîna hejmaran, r. 5

### E. B. Soane

Rêzimana zimanê kurmançî, r. 49

### Nûdem Hezex

Peyvika "ku", r. 52

### Orhan Varol

Têkilkirina kurdî û tirkî, r. 84

### David Crystal

Ziman çon demirin? r. 86

### Alfabe

Ev ziman ne bêalfabe ye, r. 94

### Umîd Demîrhan

Ferhengoka nifiran, r. 97

### Seîd Veroj

Ziwan û diyalektê kurdî, r. 116

### Navnasî

Navên kurdî çî û çawan in? r. 139

### Siyaweş Goderzî

Firezimanî le Kurdistan, r. 151

### Dengnasî

Dîftong, r. 163

### Watenasî

Hevalên derewîn, r. 175

### Marcin Rzepkin

Bible Translation into Kurdish, r. 180

### Kurdish and Catalan

A socio-linguistic comparison, r. 189

### Zarname

Ferhengoka zimannasiyê, r. 196

## Sernivîsar

### Kanîzar nahêle kurdî sêwî bimîne!

Dîsa kerem bikin hejmareke têr û tijî ya kovara zimanê kurdî *Kanîzarê*, xwandevevanên hêja. Vê carê jî em kovareke 200-rûpelî ya bi vekolîn û nivîsên li ser zimanê kurdî bi kurmancî, soranî, zazakî û inglîzî pêşkêşî we yên hêja dikin.

Di vê hejmarê de **Husein Muhammed** vekolîna xwe ya li ser hejmarnavan di zimanê kurdî de dîsa bi 50 rûpelan didomîne. Di herdu hejmarên pêştir de ew bi berfirehî li ser çêbûn û çêkirina navên hejmaran di kurdî de rawestiyaye. Vê carê ew bikaranîna hejmaran di zimanê kurdî de vedikole: çemandina/tewandina wan, ravekirina wan, cinsê wan (gelo hejmaran ti cinsê rêzimanî yê sabit heye yan na).

**Umîd Demirhan** ferhengokeke 600 nifir û nifrînên kurdî raberî me dike. **Nûdem Hezex** bi berfirehî cudahiyên bikaranîna peyvika girêder "ku" di edebiyata kevnar û ya nûjen de vedikole.

Nivîsarên me yên din yên bi kurmancî bo nimûne li ser navnasiyê, dîftongan û alfabeyên kurdî ne.

Bi soranî em nivîsareke li ser çawaniya mirina zimanan ya profesor **David Crystal** bi wergera ji inglîzî ya **Hesenê Qazî** pêşkêş dikin. Berhema din ya bi soranî hevpeyvîneke li ser pîrzimanîtiyê ye ku **Şaweys Goderzî** li gel Hesenê Qazî kiriye. Kanîzar herdu nivîsaran bi alfabeya kurdî-latînî belav dike.

Bi zazakî em nivîsareke dirêj ya **Seîd Verojî** li ser ziman û lehceyên kurdî diyarî xwandevevanên xwe dikin.

Bi inglîzî vekolîna me ya serekî ji zimannasê polonî **Marcin Rzepkin** e ku mijara wê wergerandina Incîlê (Mizgînê, Peymana Nû) ji aliyê **Nadir Osmaniyan** ve li kurmancî bi alfabeya krîlî ye. Rzepkin heta niha gelek vekolînên din jî li ser zimanê kurdî û dîroka zimannasiya kurdî nivîsîne ku em ê hinek ji wan di hejmarên *Kanîzarê* yên bînan de jî belav bikin.

Nivîsara din ya bi inglîzî ji kesekî katalanî yê bi bernavê *Xarlatà* ye û li ser berhevdana rewşa sosyolîngwîstîkî (zimannasiya civakî) ya zimanê katalanî li Spanyayê û zimanê kurdî (bi taybetî li Başûrê Kurdistanê) ye.

Di vê hejmarê de jî em dîsa du kitêbên li ser zimanê kurdî didin nasîn. Yek jê kitêba **E. B. Soane** "Rêzimana zimanê kurmancî anku kurdî" ye ku sala 1913 bi inglîzî hatiye çapkirin. Pirtûka din jî teza doktorayî ya **Orhan Varol** e ku sala 2014 bi tirkî amade bûye û li ser tesîra tirkî li ser kurdiya devkî ye. Ev van herdu kitêban ne tenê dinasînin lê wan herduyan bi tevahî ve diweşînin û dixin ber xizmeta kurdînas û kurdiyan.

Bo hêsankirina têgihîştina nivîsên zimanî û zimannasî, em li dawiya kovarê herwiha ferhengoka xwe ya zimannasî an *Zarnameyê jî belav* dikin.

## HEJMAR Û HEJMARSAZÎ DI KURDÎ DE (3):

### BIKARANÎNA HEJMARAN

Husein Muhammed



#### 11. ÇEMANDIN Û RAVEKIRINA HEJMARNAVAN

Navên hejmarên bingehîn di kurdî û gelek zimanên din de jî ji aliyê bikaranîna xwe ve ji hemû birên peyvên zêdetir dişibin navdêran û wek wan diçemin / ditewin.

Bo nimûne, di kurdî de hem navdêran û hem jî hejmarnavan bi zelalî formên xwe yê yekhejmar û pirhejmar hene. Wek mînak:

Navdêr		Hejmarnav	
Yekhejmar <sup>1</sup>	Pirhejmar <sup>2</sup>	Yekhejmar <sup>3</sup>	Pirhejmar <sup>4</sup>
çav	çavan	çar	çaran
pîvaz	pîvazan	pênc	pêncan
sêv	sêvan	şeş	şeşan
dest	destan	deh	dehan
ser	seran	sed	sedan

<sup>1</sup> Forma xwerû/neçemandî ya yekhejmar.

<sup>2</sup> Forma çemandî ya pirhejmar.

<sup>3</sup> Forma xwerû ya yekhejmar.

<sup>4</sup> Forma çemandî ya pirhejmar.

## 11.1. Pirhejmariya hejmarnavan

Di tevahiya kurmancî de sazkirina formên pirhejmar yê hejmarnavan jî wek yê navdêran e:

Hejmarnavên pirhejmar bi forma xwe ya neçemandî wek navdêrên pirhejmar jî bi forma xwe ya neçemandî bêyî ti paşgir in:

- Heval hatin. (heval = navdêr)
- Heft hatin. (heft = hejmarnav)

Hejmarên pirhejmar bi forma xwe ya çemandî anku tewandî wek navdêrên pirhejmar jî bi forma xwe ya çemandî paşgira "-an" werdigire:

- çar-an
- pênc-an
- deh-an
- bîst-an
- sed-an
- hezar-an
- milyon-an

Eger hejmar bi forma xwe ya xwerû bi vokalekê bi dawî were, hingê paşgir "-yan" e:

- du-yan
- sê-yan
- si-yan (sî + yan)
- pênciyan
- heftêyan
- heştêyan

Di zimanê devkî de N-ya dawiyê dikeve:

- çara, şeşa, deha, bîsta, seda, hezara...
- sêya, duya, heftêya...

Di hin devokan de Ê-Y dibe IY

- sêya(n) > siya(n)
- heftêya(n) > heftiya(n)
- heştêya(n) > heştiya(n)

Di hin devokan de Y-ya paşgira "-yan"ê jî nayê gotin:

- duyan > duya > dua (> duwa / diwa)
- sêyan > sêya > sêa
- heftêyan > heftêya > heftêa

Forma pirhejmar ya çemandî ya hejmarnavan hingê tê bikaranîn gava ku hejmarnav li cihê navdêrên pirhejmar yên çemandî bên xebitandin. Loma bo nimûne:

- Hevalan şîv dixwar. (heval = navdêr)
- Heftan şîv dixwar. (heftan = hejmarnav)

Lê gava ku hejmarnav berî navdêrên pirhejmar yên çemandî bên bikaranîn, hingê ne forma çemandî lê forma xwerû ya hejmaran tê emilandin:

- Heft hevalan şîv dixwar. (ne "\*heftan hevalan şîv dixwar" yan "\*heftan heval şîv dixwar.")

Di kurdî de di halê pirhejmar yê navdêran û hejmarnavan jî bêcins e anku di rewşa pirhejmariyê de nêr û mê ji hev nayên cudakirin. Paşgira herdu cinsan ya pirhejmariya çemandî di kurmancî de "-(y)an" (bi devkî "-(y)a") ye:

- Jin-an şîv dixwar > heft jin-an şîv di-xwar > heft-an şîv dixwar.
- Mêr-an şîv dixwar > heft mêr-an şîv dixwar > heft-an şîv dixwar.

Ji aliyê ravek û ravekirinê ve jî hejmarnav wek navdêran in. Di rewşa pirhejmar de ew jî wek navdêran di kurmanciya nivîskî de bi paşgira "-(y)ên"<sup>5</sup> bi ravekerên xwe ve tên girêdan:

- çav-ên şîn (çav = navdêr)
- çar-ên şîn (çar = hejmarnav)

<sup>5</sup> Di hin devokan de ev paşgir bi awayê "-(y)êt, -(y)êd, -(y)ê" ye: çarêt şîn, çavêd şîn, çarê şîn".

Ji bilî peyva "yek" û ya "sifr", hejmarên din yên temam ji tebîetê xwe ve pirhejmar in. Bo nimûne, "du, sê, deh, pêncî û çar, sed, hezar, milyon..." ji xwe ji yekê zêdetir in anku bi hêsanî pirhejmar in û wek pirhejmar tên bikaranîn. Lê heta hejmarên "yek" û "sifr" jî dikarin wek pirhejmar bên bikaranîn gava ku behsa çend "yek"an yan jî çend "sifran" tê kirin:

- Ez ê deh yekan binivîsim. (deh hejmar "yek")
- Her şeş sifrên li pey milyonê (1 000 000)

## 11.2. Cinsê hejmarnavan û yekhejmariya çemandî ya hejmarnavan<sup>6</sup>

Wek ku me li jor diyar kiriye, hemû hejmar dikarin di kurdî de bi formên xwe yên pirhejmar yên çemandî û neçemandî bên bikaranîn. Lê hemû hejmarnav dikarin di kurdî de herwiha wek yekhejmar jî bên xebitandin. Bo nimûne:

- sed-ek

<sup>6</sup> Heta niha li ser cinsê rêzimanî yê hejmaran û çemandin û ravekirina hejmarnavên kurmançî kêm hatiye nivîsîn. Yek ji kesên pêşîn yên li ser mijarê nivîsandî Celadet Bedirxan e ku idia dike cinsê hejmaran nêr e. Kesekî din ku li ser mijarê nivîsiye Arif Zêrevan e ku – berevajî – C. Bedirxanî – dibêje ku cinsê rêzimanî yê hejmarnavan mê ye. ([http://www.nefel.com/epirtuk/pdf/arif\\_zerevan\\_bingehen\\_rastnivisandine\\_02.pdf?NR:60](http://www.nefel.com/epirtuk/pdf/arif_zerevan_bingehen_rastnivisandine_02.pdf?NR:60)) Li pey Arif Zêrevanî, îcar Zana Farqînî dest avêtiye mijarê û vegeriye ser texmîna Celadet Bedirxanî. ([http://www.amidakurd.net/qunciknivis/zayend-tewanga-jimarnavan\\_6/2007](http://www.amidakurd.net/qunciknivis/zayend-tewanga-jimarnavan_6/2007)) e. Mixabin Farqînî di mijarên hejmarnavan tevlihevkin e: ravekirina/tewanga hejmaran û daçek. Bo nimûne, ew gotinên wek "Îroj yekê gulanê ye" wek isbata wê pêşkêş dike ku hejmarnav nêr in. Lê di rastiyê de di "yekê gulanê" yan jî hê rasttir "yekî gulan" de "yekê/yekî" ne forma ravekirî ya peyva "yek" e lê "yekî gulanê" yan "yekê gulan"ê kurtkirina daçekî ji forma "yek li gulanê" ye wek çawa ku "nêzîkî min" û "nêzîkê min" jî kurtkirinên forma "nêzîk li min" yan "li min nêzîk" in. Farqînî herwiha formên kurmançiya rojhilatî (behdînî) yên wek "sala 1996ê" wek isbata wê yekê pêşkêş dike ku hejmarnav di kurmançiya rojhilatî de mê ne. Lê paşgira "-ê" di kurmançiya rojhilatî de sazkerê hejmarên rêzî ye wek çawa ku di kurmançiya navendî de paşgira "-an" (bi devkî "-a") jî sazkerê hejmarên rêzî ye. "Sala 1996ê" ya kurmançiya rojhilatî û "sala 1996an" ya kurmançiya navendî di rastiyê de ji aliyê rêzimanî ve maneya "sala 1996em" dide (bi inglîzî heçku mirov bibêje "1996th year" yan jî heçku mirov bi tirkî bibêje "1996'ncı yıl"). Wek ku em ê li jêr aşkere bikin, bi qenaeta me, van her sê kesan hinek rast û hinek jî şaş kiriye. Berevajî wan alîgirên mênîyî yan nêrîtiya hejmarnavan, em ê hewl bidin isbat bikin ku hejmarnav bi xwe ne mê yan nêr in lê cinsê wan li gor amaje û referansa wan diyar dibe. Bi gotineke din, hejmarnav nêr tên bikaranîn gava ku navdêrê ew qest jê dikin nêr e û mê tên xebitandin gava ku navdêrê meqsed jê mê be.

- hezar-ek
- milyon-ek

Di rewşa neçemandî ya hejmarnavan de, wek di rewşa neçemandî yan navdêran de jî, di kurmacî de cinsê peyvan nediyar e. Bo nimûne, ji van peyvan bi xwe diyar nabe ka cinsê wan mê ye yan nêr e eger mirov cinsê wan nizane:

- navdêr: çav, gul, heval
- hejmarnav: deh, sed, hezar

Lê eger mirov van peyvan biçemîne yan jî rave bike, hingê cinsê wan diyar dibe.

Bo nimûne, peyva "çav" wiha tê bikaranîn:

- wî çavî, çavê min (ji van formên çemandî û ravekirî diyar dibe ku peyva "çav" nêr e ji ber ku ew wek peyva "wî mêrî" û "mêrê min" tê emilandin)

Peyva me ya duyem, "gul" jî wiha tê îstîmkirin:

- "wê gulê, gula min" (ji van formên çemandî û ravekirî diyar dibe ku peyva "gul" mê ye ji ber ku ew wek peyva "wê jinê" û "jina min" tê xebitandin)

Herçi peyva me ya sêyem anku "heval" e, ew dikare bi van herdu awayan be:

- "wê hevalê, hevala min" (anku mê, wek "wê jinê, jina min")
- "wî hevalî, hevalê min" (anku nêr, wek "wî mêrî, mêrê min")

Bi gotineke din, di kurmacî de ji aliyê cinsî ve sê berrên navdêran hene:

- birrek herdem mê ye, bo nimûne "gul"
- birrek herdem nêr e, bo nimûne "çav"
- birrek ducinsî ye anku dikare mê yan jî nêr be û cinsê wê li gor kesa/ê yan heywana/ê amaje (referans) tê kirin diguhere, bo nimûne "heval"

Lê madem ku ji aliyê cinsî ve sê berrên wiha yên navdêran hene, gelo cinsê rêzimanî yê hejmaran çi û çawa ye?

Ji ber ku piraniya hejmarnavan ji ekseriyeta rewşan de bi pirhejmarî tîk bikaranîn, pirsê cinsê rêzimanî yê hejmaran kêman caran derdikeve pêş mirovî. Lê wek ku me li jor jî got, hemû hejmarên



kurdî dikarin bi yekhejmarî jî biçemin û bîn ravekirin û di çemandin û ravekirina wan ya bi yekhejmarî de, di kurmançî de bi zerûrî divê cinsê wan yê rêzimanî were diyarkirin.

Bo bersivdana vê pirsê, mirov dikare bi nimûneyan nêzîkî meseleyê bibe:

Hejmara "yek" bi tebîetê xwe yekhejmar e. Tevî ku ew dikare wek pirhejmar jî were xebitandin (li jortir binêrin), ew bi piranî wek yekhejmar bê emilandin:

- Yek dibêje. (Wek "heval dibêje". "Yek" neçemandî ye û jê ne diyar e ka kesa/ê ku dibêje jin e yan jî mêt e.)
- Yekê got. (Wek "jinik-ê got". "Yek-ê" çemandî ye û jê diyar e ku mebest ji "yekê" jinek/keçek e.)
- Yekî got. (Wek "mêrik-î got". "Yek-î" çemandî ye û jê diyar e ku mebest ji "yekî" mêrek/kurek e.)

Ji nimûneyên me diyar dibe ku peyva "yek" ji aliyê cinsê xwe yê rêzimanî ve ducinsî ye û cinsê ku tê bikaranîn li gor amajê û referansa cinsê kesa/ê yan heywana/ê mebest jê ye.

Hejmara din ya bi tebîî yekhejmar "sifr" e. Bo cinsê rêzimanî yê vê peyvê, kerem bikin li vê nimûneyê binêrin:

- Hewa sar bûye û ketiye bin sifrê. (bin sifrê = kêmtir ji 0 derece celsius)

Ji nimûneya me diyar dibe ku peyva "sifr" wek mêt be hatiye xebitandin, bidin ber "bin jinê", ne wek nêr be, bidin ber "bin mêt".

Gelo çima peyva "sifr" wek mêt lê ne wek nêr hatiye bikaranîn?

Sebeb ew e ku peyva "sifr" di nimûneya me de li cihê "sifr derece" hatiye emilandin. Ji ber ku "derece" (yan hevwatera wê ya zimanê nivîskî "pile") di kurmançî de mêt ye, cihê wê neqlî peyva "sifr" bûye:

- ketiye bin sifr dereceyê > ketiye bin sifrê.

Mirov dikare bi heman awayî behsa hejmarên din jî bike:

- hejmara pênc ya li ser dîwarî nivîsandî > pênc li ser dîwarî nivîsandî

Peyva "pênc" li vê derê wek peyveke mêt hatiye ravekirin ji ber ku peyva cinsê rêzimanî yê peyva "hejmar" mêt ye.

Hejmarên "deh, bîst, pêncî, sed, hezar" wek yekhejmar çemandî yan ravekirî bi taybetî di behskirina pareyên banknotî / kaxezî de tîn kirin.

Li hin deveran ev hejmar wiha tîn bikaranîn:

- dehê min, bîstê min, pênciyê min, sedê min, hezarê min

Li hin deveran jî wiha:

- deha min, bîsta min, pênciya min, seda min, hezara min

Ji ber van awayên ji hev cuda, hin caran hatiye texmînkirin ku di kurmanciya navendî de (desteya jortir) hejmarnav nêr in lê di kurmanciya rojhilatî de (desteya jêrtir) hejmarnav mê ne.

Rast e ku di nav komdevokan de ev awayên ji hev cuda hene. Lê sebeb ne cinsê rêzimanî yê hejmarnavan bi xwe lê cinsê rêzimanî yê peyvên "banknot" yan "kaxiz / kaxid" yên di van komdevokan de ye. Di kurmanciya navendî de bi piranî peyvên "banknot, kaxez" nêr in anku mirov wiha dibêje:

- banknotê min, kaxezê min

Loma di kurmanciya navendî de mirov herwiha dibêje:

- dehê min, sedê min, hezarê min...

Di kurmanciya rojhilatî de peyvên "banknot, kaxez/kaxed" mê ne anku mirov wiha dibêje:

- banknota min, kaxeza min

Loma mirov di kurmanciya rojhilatî de herwiha dibêje:

- deha min, seda min, hezara min...

Anku cinsê li hejmarnavê barkirî ji tesîra wê peyvê ye ku amaje û mexsed jê ye, ne cinsekî sabit yê hejmarnavê bi xwe ye.

Lê bi taybetî jî belkî xwandevarên hêja yên qisekerên kurmanciya rojhilatî bipirsin: Madem ku cinsê hejmarnavê herdem li gor navdêra cinsê rêzimanî yê navdêra meqsed e, çima mirov li cihê formên wek "kesê çaran hat, barê pêncan hat" yên kurmanciya navendî, di kurmanciya rojhilatî de formên wek "kesê çarê hat, barê pêncê hat" dibîne ku "kesê" û "barê" nêr in lê peyvên "çarê" û "pêncê" wek ku mê bin hatine çemandin?

Lê li vê derê peyvên "çarê, pêncê" ne formên çemandî ji hejmarên bingehîn "çar, pênc" in lê ew hejmarên rêzî yên bi wateya "çarem, pêncem" in. Eger ew formên çemandî ji hejmarên "çar, pênc" bûna, ew dê di kurmanciya navendî de jî wisa bûna lê wek ku em dizanin, di kurmanciya navendî de ew bi awayê "kesê çaran, barê pêncan" in. Di kurmanciya navendî de jî "çaran, pêncan" li vê derê ne formên çemandî ji hejmarên bingehîn "çar, pênc" in lê hejmarên rêzî ne.

Bo ku em baş diyar bikin ku "çarê, pêncê" di "kesê çarê, barê pêncê" de bi rastî jî hejmarên rêzî ne, em dikarin wan li hin zimanên din jî wergerînin:

- kurmanciya rojhilatî: kesê çarê, barê pêncê
- kurmanciya navendî: kesê çara(n), barê pêncan(n)
- kurmanciya nivîskî: kesê ca\_rem(în), barê pêncem(în)
- soranî: kesî çwarem(în), barî pêncem(în)
- inglîzî: fourth person, fifth load
- tirkî: dördüncü kişi, beşinci yük

Anku li vê derê jî mesele ne ew e ku hejmarnav bi xwe bi awayekî sabit di kurmanciya rojhilatî de mê bin lê mesele li vê derê ew e ku di kurmanciya rojhilatî de hejmarên rêzî bi paşgira "-ê" tên çêkirin.

Li aliyekî din, hin kes dê bipirsim: Madem ku hejmarnav bi xwe ne nêr bin, çima em dibêjin "bîstê mehê, çarê gulanê, dehê sibatê" û hwd. wek ku ew nêr bin tevî ku peyva meqsed anku "roj" bi xwe mê ye?

Berî bersivdana vê pirsê divê were bibîranîn ku forma serdesttir ji "bîstê mehê, çarê gulanê, dehê sibatê" û hwd. anku awayê bi paşgira "-ê", awayê "bîstî gulanê, çarî gulanê, dehî sibatê" û hwd. anku awayê bi paşgira "-î" ye.

Li vê derê jî mesele ne ew e ku "-ê" raveka nêrîtiyê be lê "-ê" yan jî hê serdesttir "-î" li vê derê daçek e. Bo fehmkirina vê rastiyê, kerem bikin em li van nimûneyan binêrin:

- nêzîk-î min e, nêzîk-ê min e
- dûr-î min e, dûr-ê min e
- êrişî me kir, êrişê me kir
- temaşe-yî televizyonê dikan, temaşe-yê televizyonê dikan

Li vê derê paşgirên "-î" yan "-ê" ne ravek ku peyva raveber bi peyva raveker ve girê bidin lê ew daçekek in ku kêr-zêde hevwatera daçeka "li" (carinan jî daçeka "ji") ye. Kerem bikin em nimûneyên li jor bi awayekî din bibêjin:

- li nêzîk min e, li min nêzîk e
- ji min dûr e
- êriş li me kir
- li televizyonê temaşe kir

Wek çawa ku mirov "-î / -ê" di nimûneyên li jor de ne ravek lê daçek e, wisa "-î / -ê" di nimûneyên wek "bîstî / bîstê mehê, çarî / çarê gulanê, dehî / dehê sibatê" û hwd. de daçek e, heçku mirov bibêje "roja deh li wê mehê, roja çar li meha gulanê, roja deh li meha sibatê" û hwd.

Kurt û kurmançî: Gengeşe û duberiyên "hejmarnav nêr in" û "hejmarnav mê ne" bêwate ne ji ber ku hejmarnav ducinsî ne û cinsê wan di bikaranînê li gor navdêra ku meqsed jê ye lê tê barkirin.

## 12. HEJMARNAV DI DIYARKIRINA DEMAN DE

Yek ji mijarên ku hejmar gelek tê de tên bikaranîn diyarkirina deman e: sal, meh, hefte, roj, saet û hwd. Li vê derê em ê hewl bidin awayên bikaranîna hejmaran di mijara diyarkirina deman de pêşkêş bikin.

### 12.1. Hejmar di diyarkirina salan de

Di kurdî de çend peyvên taybet ji salên nêzîk re hene: "îsal" (ev sal; vê salê), par (sala berî vê, sala borî, sala çûyî), pêrar (du sal berî vê, du sal berî niha, sala berî par), sala bê(t) / were (sala piştî vê).

Wek din, diyarkirina salan bi alîkariya hejmaran e. Bo nimûne:

- pênc sal berî niha
- piştî deh salan
- sala 1995 / 1995an / 1995ê
- salên 60an / 60ê
- sedsala bîstem(în) / bîstan / bîstê

Wek ku tê dîtin, hejmar dikare bikeve berî peyva "sal" ("pênc sal berî niha", "piştî deh salan") yan jî piştî peyva "sal" (sala 1995...).

Gava ku hejmar bikeve berî peyva "sal", hejmar bi xwe di rewşa neçemandî û bêravek de ye anku xwerû ye ("pênc sal berî niha", "piştî deh salan"). Lê peyva sal dikare xwerû be ("pênc sal berî niha") yan jî çemandî be ("piştî deh salan").

Eger peyva "sal" bikeve berî hejmarnavekê, ew bi raveka xwe ya yekhejmar "-a" yan jî ya pirhejmar "-ên" bi hejmarê ve tê girêdan:

- sala 1995 / 1995an / 1995ê
- salên 1980yan

Eger mebest tenê salek be, wek "sala 1995 / 1995an / 1995ê", ew dikare li gor devokan biguhere. Kurmanciya navendî paşgira "-(y)an" (bi devkî "-(y)a" dide dûv hejmara salê:

- sala 2010an (du hezar û dehan)
- sala 1993yan (hezar û neh sed û sêyan / sisiyan)

Kurmanciya rojhilatî di navên salên kit de ne paşgira "-(y)an" lê ya "-(y)ê" dixebitîne:

- sala 2010ê (du hizar<sup>7</sup> û dehê)
- sala 1993ê (hizar û neh sed û not û sêyê / sêê / sê)<sup>8</sup>

Paşgirên "-(y)an" û "-(y)ê" di nivîsînê de bi çend awayên ji hev cuda tên dîtin, wek:

- sala 2010an / 2010ê
- sala 2010'an / 2010'ê
- sala 2010-an / 2010-ê

Em formên bêxalbend anku wek "sala 2010an / 2010ê" pêşniyaz dikin ji ber ku ti erkê 'yan - li vê derê di navbera van hejmaran û paşgirên wan de nîne anku ew ne zerûrî ne û tenê xwandin û nivîsînê dirêjtir û girantir dikin.

Ji bilî van herdu forman, herwiha formeke din jî di herdu komdevokên kurmancî de peyda dibe ku hejmar tê de bêyî paşgir tên bikaranîn:

- Sala 2010 (sala du hezar û deh) em çûn wê derê.
- Sala 1995 (sala hezar û neh sed û not û pênc) ew li vê derê bûn.

Dîsa di meseleyan salên ji yekê zêdetir de jî kurmanciya navendî paşgira "-(y)an" û kurmanciya rojhilatî jî paşgira "-(y)ê" bi kar tîne:

- navendî: salên 1960an / 60an (salên hezar û neh sed û şêstan / salên şêstan)
- rojhilatî: salên 1960ê (salên hizar û neh sed û şêstê / salên şêstê)

Wek ku me li jortir jî çend caran gotiye, ev paşgirên "-an" û "-ê" yên bi hejmarnavan ve ne paşgirên çemandin û tewandinê ne lê paşgirên dariştinê ne ku hejmarên rêzî ji hejmarên bingehîn saz dikin. Loma kurmanciya navendî li gel salekê jî (bo nimûne "sala 2005an") û komeke salan jî (bo nimûne

<sup>7</sup> Di kurmanciya rojhilatî de navê hejmara 1000 "hizar" e, ne wek kurmanciya navendî "hezar".

<sup>8</sup> Di kurmanciya rojhilatî de dengê Y yê kelijandinê di axiftinê de adeten nayê bihîstin loma bi devkî mirov forma çemandî ya peyva "sê" nabêje "sêyê" lê "sê-ê" yan jî tenê "sê".

"salên 60an") her heman paşgira "-an" bi kar tîne û kurmanciya rojhilatî jî li gel salekê jî (bo nimûne "sala 2005ê") û komeke salan jî (wek mînak "salên 60ê") dîsa heman paşgira "-ê" dixebitîne.

Li gel peyvên nûçêkirî "dehsal, sedsal, hezarsal" yan jî formên wan yê bi rêya soranî ji farisî deynkirî "dehe, sede, hezare" (bi inglîzî "decade, century, millennium") yan hevwateriyên wan yê ji erebî wergirtî "qirn<sup>9</sup>, esr" dîsa di kurmanciya navendî de "-an" û di kurmanciya rojhilatî de jî "-ê" mimkin e:

- navendî: sedsala bîstan, esra bîstan, qirnê / qirna bîstan
- rojhilatî: sedsala bîstê, qirnê / qirna bîstê

Lê ji bilî van herdu forman, di zimanê nivîskî de herwiha forma bi paşgira "-em / -emîn" ya sazkirina hejmarên rêzî ji hejmarên bingehîn jî mimkin e:

- sedsala bîstem(în), esra bîstem(în), qirnê / qirna bîstem(în)

Bikaranîna paşgirên "-em / -emîn" herwiha li gel peyva "sala" hingê jî mimkin e gava ku mirov behsa hejmartina salên bûyerekê dike:

- sala çarem min xwandina xwe xilas kir (formên din: salan çaran / çarê)

Lê bikaranîna van paşgirên "-em / -emîn" li gel peyva "sala / salên" ne mimkin e eger mebest ji salên salnameyê bin anku formên wiha nînin yan şaş in:

- \*sala 1995em
- \*salên 1960em

## 12.2. Hejmar di diyarkirina mehan / heyvan de

Mehên (heyvên, hîvên, mangên) salê dikarin bi navên mehan an jî hejmarên mehan bînin diyarkirin.

<sup>9</sup> "Qirn" ji erebî ketiye kurdî û farisî lê erebî bi xwe jî ew ji yûnaniya kevn "xronos" wergirtiye.

Di kurdî de çend desteyên cuda yê navên mehan li kar in lê meseleya "rastiya wan" yan "şaşiyên wan" dûr û dirêj e û li vê derê ne mijara me ye. Li vê derê bes e em bibêjin ku mirov dikare bibêje ku, bo nimûne, mehên biharê dikarin bi navên "adar, nîsan, gulan" ji hev bîr cudakirin.

Awayekî din yê cudakirina mehên biharê bi hejmaran e:

- adar: meha sêyem(în), meha sêya(n), meha sisiya(n), heyva sêyê, heyva sê-ê, heyva sê
- nîsan: meha çarem(în), meha çaran, heyva çarê
- gulan: meha pêncem(în), meha pênc(n), heyva pêncê

Ji van formên bi paşgirên "-em(în)" (sêyem / sêyemîn, çarem / çaremîn, pêncem / pêncemîn) tenê di zimanê nivîskî de hene û ji paşgira ji soranî wergirtî yan jî bi rêya soranî ji farisî wergirtî "-em(în)" hatine çêkirin.

Formên bi paşgira "-an / -a" yan "-yan / -ya" di zimanê nivîskî de jî hene û eslê wan devokên kurmanciya navendî ye. Formên bi "-ê / -yê" jî aidî kurmanciya rojhilatî ne û hin caran di zimanê nivîskî de jî tên dîtin lê ne bi qasî formên kurmanciya navendî.

### 12.3. Hejmar di diyarkirina rojên mehê de

Di kurdî û piraniya zimanên din de jî rojên mehê tenê bi hejmaran tên diyarkirin û ji rojên mehan re ti navên taybet nînin (bidin ber navên rojên hefteyan li jêrtir). Her meha salê ya salnameya zayînî / mîladî ji 28 – 31 rojan pêk tê û bi hejmaran tê diyarkirin.

Di kurdî de navê hejmara rojê berî navê mehê tê. Di kurmançî de hejmara rojê bi raveka "-î" yan jî "-ê" bi hejmara mehê yan navê mehê ve tê girêdan. Navê mehê di kurmançî de bi paşgira "-ê" diçeme:

- 21î adarê (bîst û yekî adarê) / 21ê adarê (bîst û yekê adarê)
- 5î gulanê (pêncî gulanê) / 5ê gulanê (pêncê gulanê)

Eger li şûna navê mehê, hejmara mehê were xebitandin, hingê hejmara mehê xwerû dimîne anku naçeme:

- 21î 3 yan 21î sê (bîst û yekî sê) / 21ê 3 yan 21ê 3 (bîst û yekê sê)



Lê eger di navbera wan de peyva "meh / heyv / hîv / mang" hebe, hingê hejmara mehê dikare li gor devokan bi çend awayên ji hev cuda be:

- xwerû: 10î meha 4 (dehî meha çar)
- bi paşgira -a(n): 10î meha çara(n) – bi taybetî di kurmançiya navendî de
- bi paşgira -ê: 10î heyva çarê – xaseten di kurmançiya rojhilatî de
- bi paşgira -em(în): 10î meha çarem(în) – tenê bi nivîskî

## 12.4. Hejmar di diyarkirina rojên hefteyê de

Peyva "hefte" yan "heftî" bi xwe ji hejmara "heft" peyda bûne.<sup>10</sup> Ne tenê hefte lê piraniya navên rojên hefteyê jî ji hejmaran peyda bûne:

- yek-şem, du-şem, sê-şem, çar-şem, pênc-şem

Ji bilî navên rojên hefteyê, rojên hefteyê dikarin herwiha bi hejmaran jî bên diyarkirin, bo nimûne:

- roja çaran ya wê hefteyê
- roja şeşan a hefteya çaran

Nimûneyên li jor ji kurmançiya navendî ne û hevberên wan di kurmançiya rojhilatî de wiha ne:

- roja çarê ya wê heftiyê
- roja şeşê ya heftiya çarê

Di zimanê nivîskî de ew dikarin herwiha bi vî awayî jî bên gotin:

- roja çarem(în) ya wê hefteyê
- roja şeşem(în) ya hefteya çarem(în)

Yan jî bi peyvrêziyeke din:

- çarem(în) roja wê hefteyê
- şeşem(în) roja çarem(în) hefteyê

<sup>10</sup> Peyva "hefte, heftî" di farisiya niha de "heftê", di farisiya kevntir de jî "hefte" bû. "Hafta" ya tirkî ji zimanên îranî hatiye wergirtin.

## 12.5. Hejmar di diyarkirina demên saetê de

Di şevûrojê de 24 saet hene. Ti navên taybet ji saetên şevûrojê re di kurdî de (û piraniya zimanên din de jî) nînin loma diyarkirina wan bi hejmarnavan e. Gava ku mirov bixwaze bibêje ka saet çend e yan çend bû, hingê ew bi hejmarên neçemandî tên diyarkirin:

- Saet du ye.
- Saet şeş bû.
- Saet hê nebûye çar.

Eger mirov bixwaze bibêje ku filan tişt li bêvan saetê qewimiye yan dê biqewime, hingê mimkin e ku ew bi forma xwerû were bikaranîn:

- Em saet çar hatin.

Lê herwiha mimkin e ku ew di kurmanciya rojhilatî de bi paşgira "-ê" û di kurmanciya navendî de jî bi paşgira "-an" (bi devkî "-a") were xebitandin:

- rojhilatî: Em seet çarê hatin.
- navendî: Em saet çara(n) hatin.

Hin caran mirov mirov daçeka "li" yan jî dordaçeka "di ... de" li gel wan dibîne lê bi taybetî "di ... de" li vê derê ji kurdî zêdetir ji tesîra paşgira rewşa tê de "-da, -de, -ta, -te" ya tirkî ye:

- Em li saet çarê hatin.
- Em di saet çaran de hatin. (bidin ber tirkî: biz saat dörtte geldik)

Lê paşgira "-em(în)" ya vê dawiyê ji soranî wergirtî yan jî bi rêya soranî ji farisî wergirtî belavî vê nebûye û di soranî û farisî bi xwe de jî bo diyarkirina saetan nayê bikaranîn.

Beşên zêdetir ji saeta temam bi alîkariya peyvika "û" tên diyarkirin:

- Saet çar û deh e (yan: Saet çar û deh deqe/deqîqe/xulek e)
- Saet pênc û çarêkek e (yan: Saet pênc û pazde deqe/deqîqe/xulek ye)
- Saet sê û nîv e

Beşên ji saetekê kêmtir lê ji nîv saetê zêdetir dikarin bi du awayan bên gotin:

Yan wek nîv saetê û beşên ji nîv saetê kêmtir anku bi alîkariya peyvika "û". Bo nimûne:

- Saet du û çil e (yan: Saet du û çil deqe/deqîqe/xulek e)
- Saet şeş û pêncî û çar e (yan: Saet du û pêncî û çar deqe/deqîqe/xulek e)

Yan jî (bi zêdetir bi giştî) bi diyarkirina beşa ji saeta were kêmtir. Ew bi piranî bi peyvika "kêm" tê diyarkirin:

- 2:45: Saet sê kêm çarêkek e
- 2:40: Saet sê kêm bîst e
- 4:55 Saet pênc kêm pênc e

Ji bilî vî awayê serdest, herwiha awayekî din bi taybetî li Bakurê Kurdistanê heye ku kêm-zêde wergera formula tirkî ye:

- 4:50 Ji pênc(n) re 10 heye (yan: Ji pêncan re 10 deqe/deqîqe/xulek heye) – bidin ber tirkî "beşe 10 dakika var"

Ji bilî lêkera "heye", herwiha lêkerên "maye", "divê", "kêm e" jî li hin deran tên bikaranîn. Bo nimûne dîsa 4:50:

- Ji pênc(n) re 10 (deqe/deqîqe/xulek) maye
- Ji pênc(n) re 10 (deqe/deqîqe/xulek) divê
- Ji pênc(n) re 10 (deqe/deqîqe/xulek) kêm e

Peyva serdest û xwemalî ya bi maneya "15 deqe/deqîqe/xulek" gotina "çarêk" (li hin deveran "çarîk") anku "yek ji çarê/çaran" e.<sup>11</sup> Lê li hin deveran herwiha peyva ji erebî wergirtî rib' / rub' jî tê xebitandin.

Bo ku mirov diyar bike ku filan tişt di bêvan saet û deqeyê de qewimiye yan dê biqewime, herdu komdevokên kurmanciya navendî û rojhilatî dikarin van heman formên neçemandî anku xwerû jî bi kar bînin:

- Bername dê saet deh û pênc (deqe) dest pê bike
- Bernameyê saet deh û pênc (deqe) dest pê kir

<sup>11</sup> Hevwatera wê ya tirkî "çeyrek" ji zimanên îranî hatiye wergirtin.

Lê herdu komdevok dikarin hejmara dawiyê yan jî navdêra li pey hejmara dawiyê biçemînin, devokên navendî bi paşgira "-a(n)", devokên rojhilatî bi paşgira "-ê":

Navendî:

- Bername dê saet deh û pêncan (yan: pênc deqeyan) dest pê bike
- Bernameyê saet deh û pêncan (yan: pênc deqeyan) dest pê kir

Rojhilatî:

- Bername dê saet deh û pêncê (yan: pênc deqeyê) dest pê bike
- Bernameyê saet deh û pêncê (yan: pênc deqeyê) dest pê kir

Gava ku mirov behsa vekişîna / xayandina demê bike û di demê de nîv saet hebe, hingê hejmara saetan dikeve berî peyva "saet" lê peyva "nîv" dikeve dûv wê:

- du saet û nîv (ne "\*du û nîv saet" – bidin ber tirkî "iki buçuk saat" yan inglîzî "two and a half hours" – lê di inglîzî de forma "two hours and a half" ya nêzîktirî forma kurdî jî li kar e.)

## 12.6. Çend caran?

Di hin zimanan de li şûna peyvên kurdî "carekê, du caran, sê caran" û hin "carên din" yên destpêkî navên xwe yên taybet hene ku ne ji peyva bi nameya "car" û hejmara wê carê hatine çêkirin.

Bo nimûne, di inglîzî "once" tê maneya "carekê", "twice" dibe "du caran" û "thrice" wateya "sê caran" dide. "Once" bi zelalî têkilî peyva "one" (yek), "twice" hevrehê peyva "two" (du) û "thrice" jî eleqedarî peyva "three" (sê) ye lê di ti ji van gotinan de peyva inglîzî ya bi wateya "car" ya kurdî anku "time" nehatiye bikaranîn.

Di zimanên kevn yên îranî de jî peyvên wisa hebûn. Bo nimûne, bi avestayî avestayî peyva "hekirit" wateya "carekê", "biş" maneya "du caran" û "thriş" jî raman "sê caran" dida.

Di kurdî û zimanên din yên îranî yên niha de peyvên wiha serbixwe nemane. Li cihê wan hejmarên bingehîn li gel peyva "car" yan hevwaterê wê ya din, bo nimûne di farisî de "bar", tê bikaranîn. Ev "bar" a farisî ya bi wateya "car" di kurdî de jî bo nimûne di peyva "dubare" de cih girtiye.

Tek peyva ku mirov dikare texmîn bike ya bi maneya "du caran" yan "cara duyem" peyva "dîsa(n)" e. Lê ew jî ji hejmara "du" zêdetir têkilî peyva "(ya/yê/yên) dî/din" e.

### 13. PARHEJMAR

Mebest ji **parhejmaran** (herwiha "parjimar, ker, kert", bi inglîzî "fraction") hejmarên netemam in ku yek yan çend beşên ji tevahiyekê diyar dikin, bo nimûne:

- $1/2, 1/3, 1/4, 1/5...$
- $2/3, 2/5, 3/7...$

Di kurdî û piraniya zimanên din jî navekî xwerû bo  $\frac{1}{2}$  yan  $1/2$  heye ku bi kurmancî "nîv" e, bi soranî "nîw", bi farisî "nîm", erebî "nisf", tirkî "yari", bi inglîzî "half" e û hwd. Ew maneya beşek ji herdu beşên ku tevahiyê pêk tînin dide. Bo nimûne "nîv saet" anku "30 deqe / deqîqe" anku beşek ji herdu beşên ku dibin saetek anku 60 deqîqe.

Wek din binavkirina parhejmaran bi piranî ji navên hejmarên bingehîn hatiye çêkirin. Peyva herî berbelav ya wiha çêkirî di kurdî de "çarêk" (yan "çarek") ku maneya  $\frac{1}{4}$  anku beşek ji her çar beşên tevahiyê pêk tînin dide. Bo nimûne "çarêkek" yan "çarêkeke saetê" anku "15 deqîqe" ku yek ji çar beşan e ku pêkve dibin 60 deqîqe anku saetek.

Peyva "çarêk" ji hejmarên "çar-yek" pêk hatiye. Hevwateya wê *rib', rub'* – ku carinan di kurdî de jî tê bikaranîn – ji erebî hatiye û ew jî têkilî peyva erebî *erbe'e* (çar) e. Hevwateya peyva "çarêk" di inglîzî de "quarter" e ku ew jî ji latînî hatiye û têkilî peyva "quattro" anku "çar" e. Hevwateya peyva "çarêk" di zimanê tirkî de "çeyrek" e ku ji zimanekî îranî hatiye wergirtin loma naşibe peyva tirkî "dört" (çar) lê peyva îranî "çar".

Wek prensîp, di kurdî de mimkin e ku beşek ji hemû hejmarên din jî bi heman awayî were diyarkirin anku bi qalibê "hejmara mezintir + yek / êk":

- $1/3$  sêyek / sêyêk (anku "ji sê beşan beşek" yan "beşek ji sê beşan")
- $1/5$  pêncyek / pêncêk
- $1/6$  şeşyek / şeşêk
- $1/10$  dehyek / dehêk
- $1/20$  bîstyek / bîstêk

- 1/100 sedyek / sedêk
- 1/1000 hezaryek / hezarêk

Lê di pratîkê de, ji bilî peyva "çarêk", ev awayên parhejmaran pir kêmtên bikaranîn. Li şûna wan, zêdetir yek ji van formên gotin (parhejmara 1/5 wek nimûne):

- yek ji pêncan / ji pêncan yek (kurmanciya navendî)
- yek ji pêncê / ji pêncê yek (kurmanciya rojhilatî)

Eger beş ji yekê zêdetir bin, hingê qalibê "hejmara mezintir + hejmara biçûktir" ne mimkin e anku formên wiha di kurdî de nayên gotin:

- \*pêncdu (2/5)
- \*heftsê (3/7)

Bo diyarkirina parhejmarên wiha, formên wek van tînan xebitandin:

- du ji pêncan / ji pêncan du (kurmanciya navendî)
- du ji pêncê / ji pêncê du (kurmanciya rojhilatî)
- sê ji dehan / ji dehan sê (kurmanciya navendî)
- sê ji dehê / ji dehê sê (kurmanciya rojhilatî)

Ji bilî paşgira "-an" (bi devkî "-a") kurmanciya navendî li gel çend hejmarên dehişkî yan sedîkî paşgira "-î" jî bi kar tîne:

- 1/20 yek ji bîstî / ji bîstî yek
- 3/100 sê ji sedî / ji sedî sê

Bo diyarkirina yek yan çend beşan ji sed beşên ku tevahiyê pêk tînin anku %, di kurmancî de bi alîkariya daçeka "ji" tînan bikaranîn. Kurmanciya rojhilatî bi piranî paşgira "-ê" dide pey peyva "sed", carinan paşgira "-a(n)". Kurmanciya navendî bi piranî paşgira "-î" bi peyva "sed" ve dike û carinan jî paşgira "-a(n)":

- 5/100 yan 5 %: "pênc ji sedî/sedan" yan "ji sedî/sedan pênc" (kurmanciya navendî)
- 5/100 yan 5 %: "pênc ji sedê/sedan" yan "ji sedê/sedan pênc" (kurmanciya rojhilatî)

Ji bilî daçeka "ji" ya kurmancî, carinan di bin tesîra soranî de di kurmancî de daçeka "li" di hin devokên ser sinorê soranî û di hin nivîsên ji soranî wergerandî de tê xebitandin. Carinan jî hem di kurmancî û hem jî di soranî de daçeka "der" (tê de, li) ya farisî di diyarkirina % de tê xebitandin:

- pênc der sed (5/100)

Bi taybetî jî gotina farisî "sed-der-sed" gelek caran di kurdî de jî bi maneya "bi esehî, bi piştrastî, bi dilniyayî" tê xebitandin.

www.arasivakurdî.org

## 14. BILÊVKIRINA FORMÛLAYÊN MATEMATÎKÊ

Mebesta me ji bilêvkirin an bêjkirina anku telefizkirina formûlayên matematîkê li vê derê ew e ka di zêdekirin (+), kêmkirin (-), carkirin (x) û parvekirinê ( $\div$  yan /) de hejmarên kurdî û peyvên li gel wan çawa tên gotin.

Çendîn awayên cuda di nav xelkê de bo gotina van formûlayan hene û herwiha gelek pêşiyazên cuda yên binavkirina nîşanên matematîkê, bo nimûne +, -, x û  $\div$  û herwiha bo bilêvkirina van formûlayan hatine kirin. Li jêr em ê her yekê ji van bi kurtî bidin nasîn û têbîniyan berê xwandevevanên xwe bidin gotûbêjên dirêjtir li ser van meseleyan.

### 14.1. Zêdekirin

Piraniya – eger ne tevahiya – kurmançîaxivan bi devkî formûlaya bi + bi peyva "û" dibêje. Li cihê nîşana wekhevî yan yeksaniyê (=) jî çend peyvên cuda tên bikaranîn ku hinek ji wan ev in (nimûneya me "2 + 3 = 5"):

- du û sê dibin pênc
- du û sê dikan pênc
- du û sê dibe pênc
- du û sê dike pênc

Çendîn awayên "zanistî" bo cihê vî awayê gotinê bigirin hatine pêşniyazkirin<sup>12</sup> lê ti lihevkiyên di navbera pêşniyazkerên wan de nîne. Ev awayê jorîn yê devkî ji hemûyan zêdetir tê bikaranîn, ji hemû siviktir û hêsantir e û hêjayî bikaranînê ye.

Lê hejî gotinê ye k uhin formên din jî yên devkî yên kêmtir bikarînayî hene, bo nimûne:

- duyan li sêyan zêde bikî, dibe/dibin pênc

<sup>12</sup> Bo suhbetêke dîr û dirêj di navbera çendîn kesan de, binêrin koma "Zimanê Kurdî" li ser Facebookê: <https://www.facebook.com/groups/zimaneKurdi/search/?query=Ji%20qenciya%20xwe%20v%C3%AA%20hesab%C3%AA%20bi%20peyv%20gotinan%20biniv%C3%AEsin%3A%202%202B%203%203D%205>



- duyan danî ser sêyan, dike/dikin pênc

## 14.2. Kêmkirin

Awayê herî berbelav yê bilêvkirina nîşana – di formûlayên matematîkê de bi kurmancî de bi peyva "kêm" e. Wek di zêdekirinê de jî, li cihê nîşana wekhevîyê (=) dîsa peyvên wek "dibe, dike, dibin, dikin" tên gotin. Bo nimûne:  $5 - 2 = 3$ .

- pênc kêm du dibe sê
- pênc kêm du dike sê
- pênc kêm du dibin sê
- pênc kêm du dikin sê

Dîsa gelek varyantên kêmtir tên bikaranîn jî di zimanê devkî de hene, wek nimûne:

- duyan ji pêncan kêm bikî, dibe sê
- duyan ji pêncan bixwî/rakî/biavêjî, dike sê

Herwiha çendîn awayên "zanistî" di vê meseleyê de jî hatine pêşniyazkirin<sup>13</sup> awayê jorîn yê devkî ji hemûyan zêdetir tê bikaranîn, ji hemû siviktir û hêsantir e û hêjayî bikaranînê ye.

## 14.3. Carkirin

Bilêvkirina nîşana  $x$  di formûlayên matematîkê de di piraniya – eger ne tevahiya – kurmancî de bi peyva "caran" (bi devkî "cara") ye. Bo nimûne  $2 \times 3 = 6$ :

- du caran sê dibe şeş
- du caran sê dike şeş

<sup>13</sup> Bo varyantên devokî û pêşniyazên çêkirî, dîsa binêrin koma "Zimanê Kurdî":

<https://www.facebook.com/groups/zimaneKurdi/search/?query=Spas%20bo%20bersiv%C3%AA%20we%20li%20ser%20pirs%C3%AA%20p%C3%AA%20C5%9Ftir.%20Niha%20j%C3%AE%20kerem%20bikin%20v%C3%AA%20hesab%C3%A%20bi%20peyv%20gotinan%20bib%C3%AAjin%3A>

Carinan li cihê peyva "caran", forma wê ya neçemandî "car" tê xebitandin (di soranî de jî ew neçemandî di van formûlayan de tê bikaranîn):

- du car sê dibe/dike şeş

#### 14.4. Parvekirin

Nîşana parvekirinê (lêkvekirinê, dabeşkirinê) anku ÷ yan / li gor devokan bi çend awayên ji hev cuda tê bilêvkirin. Di kurmançiya navendî de ew bi piranî bi lêkera "parve kirin", di kurmançiya rojhilatî de bi lêkera "lêkve kirin" e û di soranî de jî bi piranî wek "dabeş kirdin" e ku wek "dabeş kirin" ketiye kurmançiya nivîskî jî.

Hejmarnav dikarin bi pirhejmarî bên bikaranîn, wek:

- şeşan li duyan parve bikî, dibe/dike sê
- şeşan li duyan lêkve bikî, dibe/dike sê
- şeşan li duyan dabeş bikî, dibe/dike sê

Yan jî hejmarnav dikarin bi yekhejmar bên çemandin:

- şeşê li duyê parve bikî, dibe/dike sê
- şeşê li duyê lêkve bikî, dibe/dike sê
- şeşê li duyê dabeş bikî, dibe/dike sê

Di bilêvkirina formûlaya parvekirinê de jî hin varyantên ji van yên li jor diyarkirî piçekê cuda jî hene yan hatine pêşniyazkirin<sup>14</sup>, bo nimûne:

- şeşê li duyê par bikî
- şeşan li ser duyan lêkve bikî

<sup>14</sup> Binêrin bo nimûne:

<https://www.facebook.com/groups/zimaneKurdi/search/?query=D%C3%AEda%20gelek%20spas%20bo%20bersivdana%20pirs%C3%AA%20p%C3%AA%20C5%9Ftir.%20Niha%20kerem%20bikin%20v%C3%AA%20hesab%C3%AA%20j%C3%AEd%20bi%20peyvan%20gotinan%20bib%C3%AAjin>

## 15. DENGNASIYA HEJMARAN

Di dengnasiya hejmaran de bi kêmî ev her sê tişt giring in: peydabûna dangan di hejmaran de, guherîna dengên hejmaran û kirpandina anku girankirina kêteyên hejmaran.

Ji bilî navên hejmarên "sifir, milyan, milyar" û navên hejmarên mezintir (û herwiha hejmara rêzî "ewil" û varyantên wê), hemû hejmarên din yê di zimanê kurdî de bi eslê xwe xwemalî û ji rehên hindûewropî û/yan îranî ne. Loma dengnasiya wan hejmaran jî wek prensîp divê li gor dengnasiya giştî ya zimanê kurdî be. Lê dîsa jî hejmarnav bi dengnasiya xwe hin taybetmendiyên din hene ku di birrên din yê peyvan de yan peyda nabin yan jî nadir in. Em ê behsa van taybetmendiyên dengnasiya hejmarnavan di beşa "15.1. Peydabûna dangan di hejmaran de" bidin.

Di jêrbeşa "15.2. Guherîna dengên hejmaran" de em ê li xusûsiyetên giştî yê guherîna dengên hejmaran binêrin, bi taybetî gava ku hejmarên pêkhatî ji hejmarên sade tên çêkirin.

Di jêrbeşa dawiyê ya vê beşê de anku di "15.3. Kirpandina hejmaran" de em ê berê xwe bidinê ka di kurdî de kîjan kêteya yan hejmarê tê kirpandin an girankirin û ka kirpandina hejmaran li gel birrên din yê peyvan hevger e yan jî nakok e.

### 15.1. Peydabûna dangan di hejmaran de

Li pêştir li ber her navê her hejmarê bi dirêjahî hatiye behskirin ka ew peyv çawa tê nivîsîn û gotin. Loma li vê derê em ê yek bi yek ji

Ji ber ku piraniya hejmarnavên kurdî xwemalî ne û pir ji mêj ve ye ku di zimanê me de tên bikaranîn, mirov texmîn dike ku ew dê di gor qeyd û bendên giştî yê dengên kurdî bin. Ev bi pira nî rast e. Lê eger mirov hinekî kûrtir lê binêre, dê bi hêsaniyê bibîne ku hejmareke ne kême ya diyarde û fenomenên dengnasî di hejmarnavan de hene ku di dengnasiya kurdî ya giştî de nadir û heta xerîb in jî.

Ji hejmarnavên xwerû, bi kêmî di van hejmaran de ji aliyê dengnasiya zimanê kurdî de hin tiştên ecêb hene:

- yek, du, heft, sed

Herwiha di hemû varyantên navê hejmara 90 de jî (not, nod, newet, newed, nehwêt, nehwêd, nehwêrt...) li gor şertên giştî yên dengnasiya kurdî tiştên seyr û sosret hene.

Kerem bikin em yek bi yek li van hejmaran binêrin û cudahiyên wan yên ji dengnasiya giştî ya kurdî diyar bikin.

## Yek

Navê hejmara "yek" yek ji kêm peyvên kurdî ye ku bi dengê Y dest pê dike.

Ne tenê Y li destpêka peyvên xwemalî yên kurdî nadir e lê kurdî adeten kurdî dengê Y ji peyvên esil-biyani jî diavêje. Loma di kurmançî de "Yûsif, Ye'qûb" yên ji erebî wergirtî<sup>15</sup> bûne "Ûsiv, Aqob" û peyvên tirkî yên wek "yaprak, yol, yürüyüş" bûne "aprax/îprek, êriş"<sup>16</sup>.

Di zimanên kevn yên îranî de dengê Y hinekî li destpêkê peyda dibû lê ew adeten di zimanên îranî yên nû de bûye C yan J. Loma bo nimûne "yesne-" ya avestayî niha di farisî de "cešn" û di kurdî de "cejn" e. Peyva "yehûd" ya ji berê ve ji zimanên samî ketî zimanên îranî êdî di kurdî de bûye "cihû".<sup>17</sup>

Herçi çend peyvên xwemalî yên bi Y dest pê dikin in, bo nimûne "yar" û "yarî", tarîxiyên li destpêka wan "e-" hebû ku paşî jê ketiye. Bo nimûne pehlewî "eyar" lê kurdî û farisî "yar".

Eger em ji aliyê dîrokî ve li peyva "yek" binêrin, bi eslê xwe dengê Y li destpêka wê tine bû. Bo nimûne, avestayî "eêwe", sanskrîtî "êke", latînî "unus", inglîzî "one", rûsî "odîn"...

Niha di piraniya devokên kurdî de û herwiha di farisî de jî Y li destpêka vê peyvê heye. Lê di kurdî de jî li hin deveran Y li destpêka wê peyda nabe. Bo nimûne, di kurmançiya rojhilatî de forma serdest "êk" e. Di zazakî de di hin devokan wek "jew, jû" tê gotin (li şûna forma "yew" ya hin devokên din yên zazakî). Anku Y-ya vê peyva zazakî wek Y-yên din yên destpêkê di zimanên îranî de bûye C/J.

<sup>15</sup> Erebi bi xwe jî ew ji îbrî/îbranî wergirtine.

<sup>16</sup> Di soranî de herwiha "yavaş, yonca" yên tirkî jî bûne "hêwaş, wence" (hêdî, nefel).

<sup>17</sup> Ketina D ji paş vokalan di kurdî de diyardeyeke giştî ye, bo nimûne farisî "bad, bûd" lê kurdî "ba, bû".

Anku dengê Y li destpêka peyva "yek" gelek ecêb e. Di peyvên din de Y yan ji destpêkê ketiye yan jî guheriye lê di "yek"ê de ew li peyvê zêde bûye! Sebebê zêdebûna wê li navê hejmara 1 nayê zanîn.

## Du

Peyva "du" (2) yek ji kêm peyvan e ku dengê U li dawiya wê peyda dibe. Peyvên din "tu" ya cînavê duyem yê yekhejmar û peyvika "tu/çu" (hîç) e lê ev peyv jî di axiftinê de gelek caran dibin "ti/çi".

Di soranî de navê hejmara 2 adeten wek "dû" tê gotin û nivîsîn. Dengê Û ji dengê U zêdetir li dawiya peyvan peyda dibe, bo nimûne "bû, çû, dû(v), gû, kû (li kû?), mû, rû, sû (sûn, hesûn), şû (şû kirin), tû (dara tûyê)".

Lê navê hejmara 2 di kurmancî de zêdetir bi dengê U ye û standard jî wisa tê nivîsîn. Dengê sekunder yê hejmara 2 di kurmancî de "di" ye. Lê ne "u" û ne jî "i" bi berfirehî nayên dawiya peyvan – dengê "i" hinekî ji dengê "u" zêdetir ji ber ku ew di daçekên "bi, di, ji, li" de peyda dibe.

## Heft

Dengê H wek di navên Hesên û Hisên de (bi alfabeya erebî ح) bi texmîna hin kesan dengê erebî ye ku di peyvên kurdî yê xwemalî de peyda nabe. Lê hemû kurmancîaxiv û soranîaxiv<sup>18</sup> vî dengî di navê hejmara "heft" (7) de dibêjin. Bi gotineke din, navê hejmara "heft" bi H-ya wek di navê Hesênî de tê gotin, ne wek H-ya di peyva "heval" de<sup>19</sup> tevî ku "heft" peyveke esil-kurdî ye û ti têkiliya wê bi erebî ve nîne (di erebî de navê hejmara 7 "seb'e" ye).

Di kurmanciya navendî de gelek peyvên din jî yê xwemalî anku xwerû kurdî bi H-ya wek di navê Hesênî de tên gotin, bo nimûne "hemû, hezar, hirç, heyşt / heşt". Lê di kurmanciya rojhilatî û soranî de ev hemû bi H-ya wek "heval" tên bilêvkirin û tenê "heft" bi H-ya wek di navê Hesênî de tê gotin.

Kurmancî û soranî bi piranî H-ya wek di navê Hesênî de di peyvên ji erebî wergirtî de diparêzin, bo nimûne "hîle, helal, heram, hewz, hefs" lê di peyvên xwemalî de di kurmanciya rojhilatî û di soranî de tenê di peyva "heft" de H-ya Hesênî heye.

<sup>18</sup> Lê ne zazakîaxiv û farisîaxiv.

<sup>19</sup> Bi alfabeya kurdî-erebî mirov navê vê hejmarê wek حهفت dinivîse (H-ya wek "Hesên"), ne wek ههفت (H-ya wek "heval").

Ev ji aliyê dengnasî ve tişteki ecêb e ji ber ku di eslê navê hejmara 7 de H-ya wek di navê Hesenî tine bû û wek din jî di zimanên îranî û zimanên hindûewropî de ev deng nadir an nedîtî ye. Tiştê hê jî ecêb ew e ku peyvên ji "heft"ê çêkirî yên wek "hefte/heftî (7 roj), heftê (70), heftsed (700)" bi heman H-ya wek "heft" (H-ya Hesenî) ne lê "hevde/hivde" (17) di kurmanciya rojhilatî de dîsa bûye H-ya wek di peyva "heval" de.

## Sed

Navê hejmara "sed" bi awayan ji aliyê dengnasî ve ecêb e. S-ya wê di nav zarên kurdî de qet nebe di kurmancî û soranî de bi S-ya qelew e (bi alfabeya erebî ص) wek "se(g)" anku "kûçik". Di farisî de niha ew bi S-ya zirav tê gotin lê ji awayê nivîsîna wê (صد) diyar e ku demekê ew di farisî de jî bi S-ya qelew dihat gotin.

S-ya qelew di kurdî de di gelek peyvên din de jî heye, bo nimûne "sal, sar, sond" lê adeten ew tenê li berî vokalên A, O peyda dibe û li pêş vokala E di peyvên xwemalî de hema-hema nedîtî ye, ji bilî peyva "sed" bi xwe û herwiha peyva "se(g)" anku "kûçik".

Tiştê din yê ji aliyê dengnasî ve ecêb di peyva "sed" de D-ya li dawîya wê ye. Adeten di kurdî de di peyvên xwemalî de D ji pey vokalan ketiye. Loma bo nimûne di farisî de mirov dibêje "bad, bûd" lê di kurmancî û soranî de "ba, bû" û di zazakî de "va, bî".

Di nav peyvên xwemalî yên kurdî de ti peyveke din nabînim ku D li pey vokalê nabe ji bilî peyva "sed". Di rastiyê de di zazakî de D di vê peyvê de nîne û loma mirov bi wî zarî dibêje "se" (pirhejmar "sey"). Lê kurmancî û soranî forma "sed" ya D li dawiyê bi kar tînin ku li gor dengnasiya giştî ya kurdî ecêb e. Sebebê parastina D li dawîya peyva "sed" (yan jî veğerandina D-ya ji dawîya wê ketî) mimkin e ku bi mebesta rêgirtina li ber şaşkirina hejmara 100 li gel hejmarên 3 û 30 be çunkî eger 100 "se" bûya, dê di axiftin û bihîstinê de şaşbihîstina wê li gel "sê" û "sî" hêsan bûya. Yan jî mimkin e – û belkî ihtimal e – jî ku kurmancî û soranî bi çavkirina li farisî forma "sed" parastibe yan jî forma "sed" dîsa li cihê "se" bi cih kiribe.

## 15.2. Dengguherîn di hejmarsaziya kurdî de

Gava ku navên hin hejmarên mezintir ji hejmarên biçûktir tê çêkirin, hin guherînên dengî di hejmaran de peyda dibin. Bo nimûne, li van hejmaran binêrin:

- heft / hevde, hivde / hef(t)sed, hef(t)sid
- heşt / hejde, hijde / heş(t)sed, heş(t)sid
- pênc / pênc(c)sed, pênc(c)sid
- deh / çarde(h)

Guherînên dengî yê navbera hejmarên 1 – 9 û hejmarên 11 – 19 li gel nasandina hejmarên 11 – 19 yek bi yek hatine behskirin û sebebên wan dengguherînan yê dîrokî li wê derê hatine pêşkêşkirin.

Ji bilî sebebên dîrokî yê cudahiyên van dangan, wek din dengguherîn li gor dengnasiya giştî ya zimanê kurdî ne.

### Sivikbûna koma konsonantî

Yek dengguherînên serekî ketina yek ji sê konsonantan e gava ku ew tîn ber hev. Loma “heft + sed” di gotinê de dibe “hefsed” anku T ji komkonsonantên FTS dikeve. Herwiha “heşt + sed” dibe di axiftinê de dibe “heşsed” anku T ji koma ŞTS dikeve. Herwiha “pênc + sed” di gotinê de dibe “pênsed” anku C ji koma NCS dikeve.

Ev diyarde ne tenê di hejmaran de lê herwiha di birrên din jî yê peyvan de diyar dibe. Bo nimûne:

- dest + -mal → destmal → desmal
- dest + -pêk → destpêk → despêk
- pênc + şem → pêncşem → pêşem (herwiha → pêşem)

### Dengguherîn ji ber tesîra lertzê

Guherîna din ya giştî veguhastina dengên bilerz F / Ş bi hevberên wan yên bilerz V / J ye ji ber peyva li pey tê ku “-deh” e anku bi dengê D dest pê dike ku ew jî wek V / J dengekî bilerz e:

- heft + deh → \*heftdeh → \*hefdeh → hevdeh
- heşt + deh → \*heştdeh → \*heşdeh → hejdeh

### Ketina H ji dawîya hejmarnavan

Ketina yan peydabûna dengê H di gelek zimanên din de jî di hin peyvan de ne sabit e. Ew dikare ji peyvên heyî bikeve yan li peyvên ku berê tê de tine bû zêde bibe. Di soranî de ew qet li dawîya peyvê nemaye. Di kurmançî de ew wek prensîp li her dera peyvê peyda dibe. Lê ew dikare di hin peyvên ji eynî rehî de hebe û zerûrî be û din yên din yên dîsa ji heman rehî de peyda nebe.

Bo nimûne, piraniya kurmançîxivan hejmar 10 bi navê “deh” dinasin ku H tê de heye. Di kurmançî de herwiha li dawîya navên hejmarên 11 – 19 li piraniya deverên kurmançîxiv peyva “deh” heye (yazdeh, diwazdeh, sêzdeh, çardeh...) lê piraniya kurmançîxivan wê bêyî H-ya dawiyê dibêjin (yazde, diwazde, sêzde, çarde...)

### Guherîna E bi I

Tarîxiyên piraniya E-yên peyvên hindûewropî yan îranî di kurmançî de (û bi rêjeyeke mezin lê ne bi qasî kurmançî herwiha di soranî de jî lê ne di zazakî yan farisî de) bûne I. Loma bo nimûne zazakî



“keredene, berdene, merdene, wesar” û farisî “kerden, borden, morden, behar” lê soranî “kirdin, birdin, mirdin, behar” û kurmançî “kirin, birin, mirin, bihar”.<sup>20</sup>

Guherîna E bi I di kurmançî de bihêz e lê tiştê ecêb ew e ku em vê dengguherînê li gel navên hejmarên 1 – 9 nabînin. Loma em dibêjin “yek, şeş, heft, heşt, neh”, ne “\*yik, \*şiş, \*hift, \*hişt, \*nih”. Anku dengnasiya hejmarnavên 1 – 9 li gor dengnasiya giştî ya kurmançî hinekî surprîz e.

Lê gava ku em li hejmarên mezintir binêrin, em dikarin bi hêsanî bibînin ku li hinek deveran hewl tê da ku di hejmaran de jî E bikin I. Bo nimûne:

- “hivde(h)” li şûna “hevde(h)” (di peyva “heft” de E heye lê di “hivde” de bûye I)
- “hijde(h)” li şûna “hejde(h)” (di peyva “heşt” de E heye lê di “hijde” de bûye I)

Hemû kurmançîxav navê hejmara 100 ya serbixwe wek “sed” anku bi dengê E dibêjin. Lê gava ku behsa ji yekê sêdetir sedan tê kirin, hinek dever (lê ne hemû) dengê E di peyva “sed” de bi I vediguhêzin:

- “dusid” li şûna “dused”
- “sêsid” li cihê “sêsed”
- “nehsid” ji dêlva “nehsed”

### 15.3. Kirpandin di hejmarnavan de

Di dengnasiyê de mebest ji kirp an kirpandinê (bi inglîzî “stress”) ew e ku kîteyê an beşek ji peyvê ji kîteyên din girantir an xurttir tê gotin. Li gor qeyd û benda giştî kîteya dawiyê ya navdêr, rengdêr û lêkerên (lê ne hokerên) neçemandî û bêravek tê kirpandin anku girankirin an xurtkirin.<sup>21</sup> Bo nimûne (kîteya kirpandî hatiye **qelew** hatiye nivîsîn):

<sup>20</sup> Di soranî de guherîna E bi I ne hindî kurmançî bihêz e loma daçekên soranî E parastiyê “be, de, le” lê kurmançî E di wan de jî kiriye I “bi, di, li, ji” – hevrehê “ji” ya kurmançî di soranî de nemaye.

<sup>21</sup> Bo giranî û kirpê di dengnasiya kurdî de bi berfirehî binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/12/04/girani-di-dengnasiya-kurdi-de/>

- navdêr: **havîn**, **zivistan**, **welat**
- rengdêr: **mezin**, **biçûk**, **qelew**
- lêker: **kirin**, **gotin**

Eger peyv yekkîteyî be, hingê ew kîte tê kirpandin anku hemû peyv kirpandî ye.

Di meseleya kirpandin û girankirina dengê de hejmarnav bi piranî (bo istisnayan li jêrtir binêrin) jî wek navdêr, rengdêr û lêkerên neçemandî û bêravek in anku kirpandina li dawîya peyva neçemandî û bêravek e.

### Kirpa hejmarên bingehîn

Ji ber ku hemû navên hejmarên 1 – 9 yekkîteyî ne, ew nav bi tevahiya xwe ve kirpandî anku xurtkirî tîr gotin. Anku:

- **yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh**

Ji hejmarên mezintir jî ev yekkîteyî ne:

- **deh, bîst, sî/sih, çil, şêst, not, sed**

Piraniya hejmarên din yên kurdî dukîteyî yan dirêjtir in.

Navên hejmarên 11 – 19 di kurmançî de xwedî du desteyên ji hev cuda ne lê navên herdu destan jî bi piranî dukîteyî ne û kîteya dawiyê (anku kîteya duyem) kirpandî an girankirî ye (di nimûneyan de beşa kirpandî hatiye **qelew**kirin):

- desteya yekem (kurmançiya rojhilatî û kurmançiya navendî): **yaz-de**, **sêz-de**, **çar-de**, **paz-de**, **şaz-de**, **hev-de**, **hej-de**, **noz-de**<sup>22</sup>

<sup>22</sup> Li vê derê me tenê varyanteke navên nav hejmaran daye lê ji aliyê kirpandinê ve varyantên din jî (bo nimûne “yazdeh, yanzde, yanzdeh” yan “yanze” ya soranî) bi eynî awayî ne anku dukîteyî ne û kîteyam dawiyê/duyem kirpandî anku girankirî ye.

- desteya duyem (kurmanciya rojavayî): dew-**yek**, dew-**du**, dew-**sê**, dew-**çar**, dew-**pênc**, dew-**şeş**, dew-**heft**, dew-**hest**, dew-**ne(h)**

Di desteya yekem de navê hejmarê 12 wek “di-waz-de(h), du-waz-de(h), di-wanz-de(h)” tê nivîsîn anku wek ku sêkîteyî be. Lê di rastiye de “diwaz- / duwaz- / diwanz- / duwanz-“ wek “dwaz- / dwanz-“ anku wek yekkîteyî tîn gotin.

Hejmarên desteya duyem gelek caran di zimanê nivîskî de bi awayê “de-hû-yek-, de-hû-du, de-hû-sê...” tê nivîsîn heçku sêkîteyî bin lê di axiftinê de tenê dukîteyî ne û wek “dew-yek, dew-du, dew-sê...” tîn gotin. Lê di vê desteyê de navê hejmarên 12 û 13 herwiha varyantên “dew-di-**du**” û “dew-si-**sê**” jî hene ku bi rastî jî sêkîteyî ne û kîteya sêyem jê kirpandî ye.

Ji dehhejmaran navên hejmarên 50, 70, 80 dukîteyî ne:

- pênc-**cî**, hef-**tê**, heştê

Navê hejmarê 90 bi formên xwe yê serdest “not, nod” yekkîteyî ye lê di hin devokan de bi van forman e dukîteyî ne û kîteya wan ya duyem/dawiyê kirpandî ye:

- neh**wed** / neh**wet** / neh**wêt** / neh**wêd** / neh**wêrt**...

Navê hejmarên sedhejmarên 200 – 900 dukîteyî ne û dîsa kîteya duyem

- dused, sêsed, çarsed...

Navê hejmarên 1 000, 1 000 000 û 1 000 000 000 dukîteyî ne û dîsa kîteya duyem/dawiyê kirpandî ye:

- he-**zar**, mil-**yon**, mil-**yar**

Herwiha “bil-**yon**” û “tril-**yon**” jî dukîteyî ne lê “kat-ril-**yon**” û hin hejmarên mezintir sêkîteyî yan dirêjtir in. Lê dîsa jî kîteya dawiyê kirpandî ye.

Navê hejmarê 0 carinan wek “sifr” û carinan jî wek “sifr” tê nivîsîn. Ji aliyê dengnasî ve ew “sifr” anku yekkîteyî ye. Eger ew wek dukîteyî were hesabandin, hingê kîteya yekem kirpandî ye anku “sifr”. Ev ne li gor dengnasiya hejmarên kurdî ye û loma çêtir e ku mirov wê wek yekkîteyî bihesibîne û wek “sifr” binivîse.

### Kirpa hejmarên rêzî

Kirp an giraniya peyvê di hejmarên rêzî de ne li ser paşgira “-em, -emîn, -a(n), -ê” lê li ser kîteya dawiyê ya wê hejmara bingehîn e ku hejmara rêzî jê hatiye dariştin:

- **yekem, yekemîn, yekê**
- **duyem, duyemîn, duyan / diduyan, duyê**
- **dehem, dehemîn, dehan, dehê**
- **bîstem, bîstemîn, bîstan, bîstê**

Di vê diyardeyê de paşgirên sazkirina hejmarên rêzî ji wek paşgirên çemandin û ravekkirinê ne, ne wek paşgirên peyvsaz in.<sup>23</sup>

### Hejmarên hevniwîs lê ne hevkirp

Peyvên “heftê” û “heştê” hem navên hejmarên bingehîn yên 70 û 80 ne û hem jî formên çemandî yên hejmarên 7 û 8 in û herwiha di kurmanciya rojhilatî de navên hejmarên rêzî yên 7 û 8 in:

- Heftê kes li wê derê bûn. (70 kes)
- Destê min li heftê ket. (Li hejmara 7).
- Ew di pêşbirkê de bû yê heftê. (yê heftem – piştî şeşên din)

Lê gava ku mebest hejmarên 70 û 80 be, hingê giraniya peyvê li ser kîteya dawiyê ye:

- **heftê, heştê** (wek pêncî, newet/nehwêt...)

Lê gava ku mebest ji “heftê” û “heştê” hejmarên rêzî yên 7 û 8 an jî formeke çemandî ji hejmarên 7 û 8 be, hingê kîteya yekem kirpandî ye ji ber ku paşgirên çemandin û girêdanê nekirpandî ne û giranî li ser kîteya dawiyê ya beşa neçemandî ya peyvê ye:

- **heftê, heştê** (wek “**yekê, duyê, sêyê, çarê, pêncê...**”)

<sup>23</sup> Bo paşgirên peyvsaz, binêrin: <https://zimannas.files.wordpress.com/2016/08/peyvsazi-kiteb1.pdf>

## 16. RASTNIVÎSÎNA HEJMARNAVAN

Mebest rastnivîsîna hejmarnavan bi dîtina me çend pirsan di hewîne ku em ê li vê derê rêz bikin û dû re li ser her yekê ji wan rawestin:

- çawaniya nivîsîna navê her hejmarê (bo nimûne navê her yek ji 1, 2, 8, 12, 30, 90, 1000...)
- nivîsîna bi hev re yan ji hev cuda ya hejmarên pêkhatî (bo nimûne 21 bi awayê "bîst û yek", "bîstûyek" yan "bîst-û-yek" yan jî 200 bi awayê "dused" yan "du sed" yan "du-sed"...)
- diyarkirina hejmarnavan bi hejmaran (1, 14, 243, 2 000) yan jî bi navên hejmaran (yek, çarde, du hezar...) yan jî beşek bi hejmaran û beşek jî navên hejmaran ("2 hezar")
- nivîsîna paşgiran bi hejmaran ve (bo nimûne "sala 2000an", "sala 2000'an" yan jî "sala 2000-an")

### 16.1. Nivîsîna navên hejmaran

#### Rastnivîna tilhejmaran

Awayên serdest û standard yên tilhejmaran di kurmanciya nivîskî de wiha ne:

- **yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh**

Ti cudahiyeke mezin ya di nivîsîna tilhejmaran de di zimanê nivîskî de nîne tevî ku 1 carinan bi awayên "êk, yêk", 2 bi şeweyên "di, dû" û 8 jî carinan bi şiklê "heşt" tê dîtin. Tilhejmar gelek caran di nivîsan de bi navên xwe (yek, du, sê...), ne bi nîşanên xwe (1, 2, 3...), tên nivîsîn û loma standardiyê baş peyda bûye.

Di devokên navendî de hejmarên 2 û 3 di rewşa serbixwe de (gava ku ew nakevin berî ti navdêrekî) formên xwe yên dubare hene ku awayên wan yên serdest wiha ne:

- didu, sisê

## Hejmarên dehgir

Hejmarên dehgir çendîn awayên cuda hene. Ew hinekî li gor devokan ji hev cuda ne. Di nivîsan de ew bi piranî bi nîşanên xwe (11, 12, 13...) – ne bi navên xwe (yazde, diwazde, sêzde...) tînin nivîsîn. Loma ti standardiyêke bêguman peyda nebûye. Hinek nivîskar formên wan yê giran û dirêj tercîh dikin (wek "diwanzdeh") ji ber ku bi qenaeta wan ew form "orijîntir" in. Hinek nivîskar jî formên kurttir dinivîsin (wek "dozde") ji ber ku bi dîtina wan ew zimanî "hêsantir" yan "xweştir" dikin.

Piraniyar reha û mutleq ya devokên kurmançî (û herwiha tevahiya soranî jî), formên bi "-de" bi kar tînin, ne formên bi "-deh":

- yazde, diwazde, sêzde (ne "yazdeh, diwazdeh, sêzdeh...")

Herwiha hejmara devok an deverên ku dengê N di hinek ji hejmarên dehgir de bi kar bînin pir kême û dîsa piraniya reha û mutleq alîgira formên bêyî N ye:

- yazde, diwaz, pazde... (ne "yanzde, diwanzde, panzde...")

Herwiha gava ku hejmarên dehgir paşgiran digirin, "-de/-deh" dibe "-da(h), -dê" (ne "-deha(n), -dehê"):

- kurmançiya navendî: cara pazda(n) (ne "cara pazdehan")
- kurmançiya rojhilatî: cara pazdê (ne "cara pazdehê")

Ev jî delîla wê yekê ye ku piraniya devokên kurmançî – eger ne hemû dengê H li dawiya hejmarên dehgir (11 – 19) qebûl nake. Divê zimanê nivîskî jî qedrê vê rastiye bigire. Loma divê tercîha hejmarên dehgir wiha be:

- **yazde, diwazde, sêzde, çarde, pazde, şazde, hevde, hejde, nozde**

Di hin devokan de navê hejmarên 17 û 18 wek "hivde, hijde" tînin nivîsîn lê ji hejmarên 7 û 8 diyar e ku dengê orijîntir E ye (hevde, hejde) û madem ku ev form bi berfirehî di devokan de jî hene, divê tercîha standardkirinê wiha be:

- hevde, hejde

### Rastnivîsîna dehhejmaran

Navên dehhejmaran (10, 20, 30... 90) di kurmancî de kurt in û loma gelek caran di nivîsan de jî bi navên xwe (wek "deh, bîst, sî, çil...") tê nivîsîn li gel ku carinan bi nîşanên xwe jî (10, 20, 30, 40...).

Ji ber ku ew di nivîsan de gelek caran bi navên xwe tînin nivîsîn, standardiyêke têra xwe baş peyda bûye. Li gel çend formên cuda yê devokî jî, formên serdest û standard di zimanê nivîskî de wiha ne:

- **deh, bîst, sî, çil, pêncî, şeş, heftê, heştê, not**

### Rastnivîsîna hejmarên mezintir

Forma tekane ya navê hejmara 100 di tevahiya kurmancî û soranî de "sed" e. Bo hejmarên 1 000, 1 000 000, 1 000 000 000 çendî formên cuda hene lê formên serdest û standard wiha ne:

- hezar, milyon, milyar (ne "hizar, mîlyon, mîlyar")

Bo sedhejmaran di hin devokan de "-sid" tê bikaranîn (du sid, sê sid) lê forma serdest û standard bi "sed" e:

- **du sed, sê sed, çar sed...**

Çend sedhejmar di axiftinê de tînin sivikkirin (wek "pênsed, şesed, hefsed, heşsed/hesed, nesed") lê di nivîsînê de formên serdest û standard yê nesivikkirî ne:

- **pênc sed, şeş sed, heft sed, heşt sed, neh sed**

## 16.2. Bi hev ve yan ji hev cuda?

Yek ji pirsên serekî yê rastnivîsîna hejmarnavan meseleya nivîsîna hejmarên pêkhatî bi hev ve yan jî ji hev cuda ye. Bo nimûne, gelo 21, 300, 12 000 û 1997 çawa binivîsin binivîsin:

- "bîst û yek", "bîst-û-yek" yan "bîstûyek"?
- "sê sed", "sê-sed" yan "sêsed"?
- "diwazde hezar", "diwazde-hezar" yan "diwazdehezar"?
- "hezar û neh sed û not û heft", "hezar-û-ne-seh-sed-û-not-û-heft" yan "hezarûnehsedûnotûheft"?

Ji ber ku hejmarên dirêj, bo nimûne 1997, kêman caran bi navên xwe tên nivîsîn, ti standardiyeke berçav di zimanê kurdî de li ser meseleya bi hev ve yan jî ji hev cuda nivîsîna navên hejmarên pêkhatî peyda nebûye. Hin kes her peyvê ji hev cuda dinivîse, wek "hezar û neh sed û not û heft". Hin kes hin hejmaran bi hev ve dinivîsin, bo nimûne wek "hezar û nehsed û not û heft" yan "hezar û nehsed û notûheft". Lê pir bi degmen û nadirî hemû rêza hejmaran bi hev ve tê nivîsîn, wek "hezarûnehsedûnotûheft".

Di piraniya zimanên din de jî ti standardiya reha û mutleq di nivîsîna bi hev ve yan jî nivîsîna ji hev cuda ya rêzehejmaran peyda nabe. Hem zimanên cuda li ser meseleyê li hev nakin û hem jî di nivîsîna bi heman zimanî de nivîser li hev nakin.

Lê mirov dikare bo rastnivîsînê argumenteke wiha pêşkêş bike:

Nivîsîna hemû rêzehejmarê bi hev ve xwandina wê pir dijwar dike. Loma xwandin û fehmkirina merema rêzehejmareke wek "hezarûnehsedûnotûheft" gelek dijwar e. Loma ne baş e ku hemû rêzehejmar bi hev ve were nivîsîn.

Li aliyekî din, nivîsîna hin beşên rêzehejmarê û cudakirina hin beşên din ji wê dibe sebebê keyfîyet û dûvdiliyê û ti lojîk û mentiq tê de namîne. Bo nimûne, eger em 1997 wek "hezar û nehsed û not û heft" (hevgihandina "neh" û "sed"ê) yan "hezar û nehsed û notûheft" (hevgihandina "neh-sed" û "not-û-heft"ê), çima em "hezar" û "nehsed"ê yan "nehsed" û "notûheft"ê negihînin hev? Anku ev rêbaz jî nabe.

Li ber me hê jî du alternatîv dimînin. Bo nimûne, em dikarin hejmara 2997 bi van awayan binivîsin:

- du hezar û neh sed û not û heft
- duhezar û nehsed û not û heft



Di forma jortir de her peyv ji hev cuda hatiye nivîsîn. Di forma duyem de hejmarên ku "û" di navbera wan de heye ji hev cuda hatine rêzkirin lê hejmarên ku "û" di navbera wan de nîne bi hev ve hatine nivîsîn.

Bi texmîna min ev herdu awa jî baş in lê madem ku ti zerûrî nîne ku illeh em "du" û "hezar" yan "neh" û "sed" bi hev ve binivîsin, bo hêskirina rê û rêbaza rastnivîsînê, baştir e ku mirov wek qeyd û bendeke giştî bibêje:

- **hejmarnavên rêzehejmarê û herwiha peyvika "û" hemû ji hev cuda tên nivîsîn.**

Lê hêjayî gotinê ye ku navên hejmarên 11 – 19 bi desteya xwe ya "yazde, diwazde, sêzde, çarde, pazde, şazde, hevde, hejde, nozde" bi zerûrî bi hev ve tên nivîsîn anku nivîsîna wan wek "yaz de, diwaz de, sêz de..." ne mimkin e ji ber ku "yaz, diwaz, sêz..." ne peyvên serbixwe ne.

Lê navên heman hejmarên 11 – 19 bi desteya xwe ya "deh û yek, deh û du, deh û sê" (ku di kurmanciya rojavayî de tên bikaranîn) dikarin – û divê – ji hev cuda bên nivîsîn.

### 16.3. Nivîsîna bi hejmaran an hejmarnavan?

Yek ji mijarên rastnivîsîna hejmaran jî ew e ka mirov di nivîsînê de kengî wan bi hejmaran (bo nimûne wek "1, 14, 243, 2 000") û kengî jî bi navên hejmaran (wek "yek, çarde, du sed û çil û sê, du hezar") binivîse?

Wek prensîp, herdu awa jî rast in. Lê bo parastina kurtiya nivîsînê û herwiha bo hêskirina têgihiştinê, rêzehejmar bi navên xwe nayên nivîsîn eger ji gelek peyvyan pêk bên. Loma bo nimûne nayê tercîhkirin ku mirov binivîse "du sed û çil û sê" yan "hezar û neh sed û not û heft" lê baştir e ku ev rêzehejmar bi hejmaran wek "243" û "1997" werin nivîsîn.

Lê rêzehejmarên ku bi navên xwe kurt bin, dikarin di nivîsan de bi navên xwe bên nivîsîn, bo nimûne "yek, heft, bîst, heftê, sed, hezar". Ne tenê rêzehejmarên yekpeyvî lê yên dupeyvî jî gelek caran di nivîsan de bi navên xwe tên diyarkirin, bo nimûne "çar sed", "sê hezar", "şeş milyon".

## 16.4. Nivîsîna paşgiran bi hejmaran ve

Carinan di hevokan de nîşanên hejmaran (1, 2, 40, 132, 1 000...) herwiha hin paşgir jî (bo nimûne "a, -an, -em, -emîn, -ê, -ên, -î...") jî tên nivîsîn gava ku ew (bi rastî yan jî bi texmîna nivîserên wan) ew paşgir pêdivî û lazim bin.

Hin caran paşgir yekser bêyî ti tiştêkî din bi hev ve tên zeliqandin, bo nimûne:

- sala 2017an (kurmanciya navendî), sala 2017ê (kurmanciya rojhilatî)
- kesê 3yem

Carinan jî îşareteke xalbandiyê (bo nimûne - yan ' yan jî :) di navbera hejmarê û paşgirê de tê bicihkirin. Wek mînak:

- sala 2017-an, kesê 3-yem
- sala 2017'an, kesê 3'yem
- sala 2017:an, kesê 3:yem

Kurdînivîsên alîgirên bikaranîna yek ji van îşaretan li hev nakin ka divê kîjan îşaret were bikaranîn. Li aliyekî din, alîgirên ti ji van îşaretan jî nikarin isbat bikin ka çima bikaranîna îşaretê pêdivî û zerûrî ye. Loma bi qenaeta me ti ji van nîşanan neyên bikaranîn çêtir e. Anku em ya herî baş ew e ku em wiha binivîsin:

- **sala 2017an, sala 2017ê**
- **kesê 3yem**

Li aliyekî din, mirov dikare bipirse ka gelo bikaranîna paşgiran bi xwe jî bi rastî zerûrî ye? Di rastiye de mirov dikare van hejmaran bêyî paşgir jî binivîse û ji tekst û kontekstê diyar e ku eger wek "sala 2017" hatibe nivîsîn jî, mirov her wê wek "sala 2017an" (li gor kurmanciya navendî) yan jî wek "sala 2017ê" (li gor kurmanciya rojhilatî) dixwîne.

Dîsa "kesê 4" jî heta eger paşgir li pey nehatibe nivîsîn jî, mirov fehm dike ku ew bi kurmanciya nivîskî wek "kesê çarem", bi kurmanciya rojhilatî wek "kesê çarê" û bi kurmanciya navendî jî wek "kesê çara(n)" tê gotin.

Anku nenivîsîna paşgiran hem nivîsê kurttir û xweştir dike û hem jî rê dide xwandevanî ku hejmara bêpaşgir bi paşgira devoka xwe bixwîne.

Hejmarên rêzî di piraniya zimanan de herwiha dikarin bi nuqteyekê (.) jî bê diyar kirin. Hingê "5" tê maneya "pênc" û "5." jî tê wateya "pêncem, pêncemîn, ya/yê/yên pêncê (kurmanciya rojhilatî), ya/yê/yên pêncan (kurmanciya navendî)".

www.arasivakurdî.org

## 17. PEYVSAZIYA DIN JI HEJMARAN

Li pêştir me bi berfirehî behsa hejmarsaziyê ji hejmaran kiriye anku çawa hejmarên mezintir ji hejmarên biçûktir tên yan hatine çêkirin, bo nimûne:

- çar + deh → çarde(h), deh û yek
- pênc + deh → pa(n)zde(h), deh û pênc

Herwiha me diyar kiriye ku hinek ji hejmarên ku sade yan xwerû dixuyin – bo nimûne "sî" û "çil" – di rastiyê de ji hevberên xwe yê tilhejmar in, "sê" û "çar". Heta hejmara "bîst" jî ji hejmara "du" hatiye çêkirin.<sup>24</sup>

Herwiha hinek idiyên pesindnekirî yan ne-esehî yê li ser hindê jî hene ku heta hinek ji tilhejmaran jî ji hin navdêran (ji navê hin tiştan) hatine çêkirin. Lê ev peyvsazî di dema makezimanê proto-hindûewropî de bûye. Di kurdiya niha de û di piraniya zimanên din jî yê niha de êdî adeten hejmarnav ji peyvên ji birrên din (navdêr, rengdêr, lêker...) nayên çêkirin.

Berevajî wê, hejmarnav bi xwe di sazkirina hinek peyvên ji birên din de beşdar dibin. Li jêr em ê vê peyvsaziya bi hejmarnavan binasînin.

### 17.1. Hejmarnav di pêkanîna peyvên ne-hejmar de

Mebest ji "pêkanîn"ê li vê derê sazkirina peyvan bi hevghandina du yan zêdetir peyvên serbixwe ye bo çêkirina peyveke nû. Pêkanîn dikare xwerû be anku ji du peyvên serbixwe yê hevghandî be (bo nimûne "du-dil") yan jî bi alîkariya navgirekê be (bo nimûne "hevûdu" ji "hev-û-du").

<sup>24</sup> Li beşa li ser nasandina dehhejmaran binêrin bo dîtina çawa peydabûna van dehhejmaran.

**Navdêr û hejmarnav**

Navdêr û çend hejmar jî dikarin peyvên nû pêk bînin. Bi taybetî jî hejmarên “yek” û “du” di van peyvên de cih digire. Endam dikare navdêr, rengdêr an hoker be. Bo nimûne:

- dudil (ji du = hejmar, dil = navdêr) anku kesa/ê bêbiryar, kesa/ê ku nikare yan newêre biryara xwe li ser tiştekî bide
- ducan / dugiyan: bihemle, girane, bizarr, zarok di zikê de
- çarriyan / duriyan (çar / du + rê + yan): cihê ku du rê di ser hev re derbaz dibin anku mirov dikare bi çar aliyan ve biçê
- dupê (bo nimûne mirov), çarpê (gelek heywan), sêpê (maseya / mêzeyê agir li bin hilkişî)
- yekser (dîrekt, rasterast)
- dusibe (kêmtir herwiha: sêside, çarsibe, pêncsibe...)

**Nîşander û hejmarnav**

Nîşander û hejmarnav jî dikarin bi hev re peyvên pêk bînin. Ji nîşanderan axlebe peyva “her” beşdar dibe:

- heryek, herdu, hersê, herçar...

**Cînav û hejmarnav**

Hejmarnav “du” li gel cînavê “hev” peyvekê pêk tînin:

- hevdu

Ew herwiha bi alîkariya peyvika “û” jî dibe:

- hevûdu

**Cînav û hejmarnav**

Bi du hejmarnavan di kurmanciya rojhilatî de cînavêk tê çêkirin:

- “yek(û)du, êk(û)du” (anku “hevdu, hevûdu, hevûdin”)

Peyvika "û" bi piranî di "yekûdu, êkûdu" de tê bikaranîn lê herwiha formên "yekdu, êkdu" anku bêyî "û" jî hene.

## 17.2. Hejmarnav di dariştina peyvên ne-hejmar de

Mebest ji "dariştin"ê li vê derê sazkirina peyvan ji yek an çend peyvên serbixwe û bi zêdekirina yek an çend pêşgir an paşgir an e. Bi taybetî ji hejmara "yek" (an varyanta wê "êk") li gel paşgir an komeke peyvên navdêr tên dariştin:

- yekîti (hevgirî, tifaq, ittifaq), yekîne / yeke (unît, wehdet; kom, firqe), yekane (tek zaroka/ê dêbabên xwe)

Hemû hejmarên yek – pênc di sazkirina navên rojên hefteyê de beşdar dibin:

- yekşem, duşem, sêşem, çarşem, pêncşem

Bi henekî herwiha: "şeşem" (în, eynî, cume) û "heftşem" (şemî, sebt).

## 17.2. Hejmarên biyanî di peyvên ne-hejmar de

Bi taybetî di gelek peyvên ji zimanên ewropî wergirtî de hejmarnav hene. Bo nimûne:

- unîversal, unîversîte, unîversûm, unît (ji "un-" ya latînî ya bi maneya "yek")
- bisiklêt, biskiwêt (ji "bi-" ya latînî bi wateya "du")
- triyatlon (ji latînî yan yûnanî "trî-" anku "sê")
- kadro, kadir (ji latînî "quottor" anku "çar")
- Pentagon (ji yûnanî "pêntê-" anku "pênc")
- dekatlon (lîstika dehcûreyî, ji yûnanî "dêka-" anku "deh")
- sent, sentîmetre (ji fransî "cent" ji latînî "centum" anku "sed")
- kîlo(gram), kîlometre (ji yûnanî "xîlfoi" anku hezar)

Gotina devkî "fiftî-fiftî" (nîv bi nîv yan 50 % bo her yekê ji herduyan) ji inglîzî "fifty-fifty" anku "pêncî-pêncî (ji sedê)" hatiye.

Ji bilî van peyvên ji zimanên ewropî, herwiha hin peyvên ji hejmarnavan çêkirî ji zimanên Rojhilata Navîn, bi taybetî ji erebî jî ketine kurdî. Bo nimûne:

- itihad, tewhîd, wehdet, Wehîd, Wehîda (ku hemû ji erebî ji rehê "w-h-d-" anku "yek" hatine çêkirin)

Peyva *rib'*, *rub'* bi maneya "çarêk, ¼" li Başûr, Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê li kar in ku ji erebî hatiye wergirtin û hevrehên peyva erebî *erbe'e* (çar, 4) in.

Ji tirkî jî du-sê peyvên argoyî (kolankî, tabûyî) yên hejmarnav tê de derbazî axiftina kurdî (qet nebe li Bakurê Kurdistanê) bûne:

- ûçkaxitçî (hîlebaz, fêlbaz – ji tirkî "ûçkağıtçı" ji "ûç" anku "sê")
- otuzbîr, otizbîr (lîstikeke bi kaxizan yan jî "destperkê, masturbasyon, onanîzm" ji tirkî "otuz bir = 31)

Ev peyv û yên li jortir yên ji zimanên ewropî bi xwe di wan zimanan de hatine çêkirin û ji wan hatine wergirtin, ne di kurdî bi xwe de hatine pêkanîn an dariştin.

Carinan jî hin hejmarên biyanî di axiftina kurdî de li cihê hejmarên kurdî tîn gotin. Bo nimûne, tişteki normal e ku mirov li Bakurê Kurdistanê ji devê gelek kesan niha gotina "sala iki bin on yedi" anku "sala 2017" bibihîze. Di nav kurdên Başûr û Rojavayê Kurdistanê de mirov gelek caran gotina "miye-bil-miye" (sed ji sedê, 100 %) dibihîze ku ji peyva erebî "miye" (sed) e. Li Rojhilatê Kurdistanê mirov gotinên wek "hezareha, sedeha" (hezar, sedan) yên farisî dibihîze.

## 18. PEYVRÊZIYA HEJMARNAVAN

Mebesta me ji "peyvrêziya hejmarnavan" li vê derê hem peyvrêziya anku dora hejmarnavan di nav rêzehejmarê de û hem jî dora hejmarnavan li gel birrên din yê peyvên heman komikê (frazê) ye.

### 18.1. Peyvrêziya hejmaran di rêzehejmaran de

Qeyd û benda giştî ew e ku di kurdî û piraniya zimanên din de jî di rêzehejmarê de hejmara mezintir berî hejmara biçûktir tê:

- bîst û yek
- sed û bîst
- sed û bîst û yek
- hezar û sed û bîst û yek

Lê eger mebest ji dubarekirina heman hejmarê be û paşgira "û" nekeve navberê, hingê hejmara dubareker berî hejmara dubarekirî tê:

- 200: du sed (ne "\*sed du")
- 4 000: çar hezar (ne "\*hezar çar")

Di navên hejmarên 11 – 19 de di desteya "yazde(h), diwazde(h), sêzde(h)..." de hejmara biçûktir li berî hejmara mezintir e (bo nimûne "çar-deh", ne "\*deh-çar"). Lê di navên heman hejmaran de di desteya kurmanciya rojavayî "deh û yek, deh û du, deh û sê..." de dîsa hejmara mezintir berî hejmara biçûktir tê.

### 18.2. Peyvrêziya hejmaran di komikên navdêrî de

Di komikan anku frazan de hejmarên bingehîn adeten berî hemû endamên din yê komikê tên û bi ti ravekan (izafeyan, qertafan) bi wan ve nayên girêdan. Bo nimûne:

- du xanî
- du xaniyên kevn



- du xaniyên pir kevn
- du xaniyên pir kevn yên li nav bajarî

Eger navdêr di komikê de tine be lê cînavên xwedîtiyê hebin, hingê hejmar bi ravekê bi cînavî ve tê girêdan:

- duyên min (li cihê "du xaniyên min")
- yekî min (li şûna "yek xaniyê min" yan "xaniyekî min")

Hejmara "yek" bi piranî diçe dûv navdêran û pê ve tê girêdan û li pey konsonantan sivik dibe û wek "-ek" tê:

- mal-ek (li cihê "yek mal")
- mal-ek-ê (li şûna "yek mal-ê")

Hejmarên rêzî yên bi paşgirên "-em" û "-emîn" dikarin bikevin berî navdêran yan jî dûv wan. Eger berî navdêran bin, naçemin û ravekê nagirin. Lê eger piştî navdêran bên, navdêr bi ravekê bi wan ve tên girêdan:

- duyem(în) kes
- kesa/kesê duyem(în)

Hejmarên rêzî yên bi paşgirên "-a(n), -ê" tenê dikarin li dûv navdêran bên û bi ravekê bi wan ve tên girêdan. Ew nikarin bikevin pêşiya navdêran:

- mala çaran / çara / çarê (ne "\*çaran mal, çara mal, çarê mal")

Ji hejmarên rêzî yên din yên bi wateya "yekem", hemû dikarin li dûv navdêran bên:

- kesa/ê ewil / ewilî / ewilîn
- kesa/ê pêşî / pêşîn / pêşiyê
- kesa/ê berahîkê


Peyva "pêşîn" û varyantên wê "pêşî, pêşiyê" nikarin bikevin pêşiya navdêran loma tiştêkî wek "\*pêşîn kes" yan "\*pêşî kes" şaş in. Herwiha "berahîkê, berahiyê" jî nikare li berî navdêran be.

Peyvên "ewil, ewilîn" – lê ne forma "ewilî" – dikarin herwiha bikevin berî navdêran jî:

- ewil(în) kes (= kesa/ê ewil / ewilî / ewilîn)

## E. B. Soane

### Rêzimana zimanê kurmancî anku kurdî



Kitêba nivîskarê inglîz Ely Bannister Soane, kurtkirî S. B. Soane "Grammar of the Kurmanji or Kurdish Language" (Rêzimana zimanê kurmancî anku kurdî) sala 1913 hatiye çapkirin û yek ji çend kitêban e ku wî nivîskarî li ser kurdan û Kurdistanê nivîsîne.

Kitêb ji 290 rûpelan pêk tê û ne tenê kurmancî lê – berevajî navê kitêbê – herwiha behsa rêzimana soranî jî dike. Ew yekem kitêba li ser

rêzimana kurdî ye ku di heman demê de du lehceyên serekî yên kurdî – kurmancî û soranî – bi hev re dide nasîn.

170 rûpelên pêşîn yên pirtûkê li ser rêzimana kurdî ne. 160 rûpelên paşîn jî ji ferhengokeke inglîzî-kurdî pêk tên. Di beşa rêzimanê de gelek nimûne hene ku pêşî bi inglîzî hatine nivîsîn û dû re li kurmancî (an bi gotina nivîskarî "koma bakurî", bi inglîzî "Northern Group", kurtkirî NG) û li soranî ("koma başûrî", "Southern Group", SG) hatine wergerandin. Soane kitêba xwe li gor birrên peyvan parve kiriye, wek "alfabe, navdêr, cînav, rengdêr, hoker, lêker..." û hewl dide wan yek bi yek bide nasîn û awayên bikaranîna wan diyar bike.

Hê ji destpêkê ve diyar e ku Soane ne zimannasekî pîşeyî (profesyonel) e û serê xwe bi hin mijarên ne li gor rêbazên zimannasî ve gêj dike, bo nimûne li ser meseleya hindê ka kîjan devok "paqijtirîn" kurdî ye – helbet vê mijarê serê gelek rêzimannivîsên biyanî yên din jî yên hevdemiyên Soane tevlihev dikir.

Soane xwastiye ku zimanê kurdî bi berfirehî nas bike û bide nasîn loma hewl daye ku herdu zaravayên serekî mil bi mil pêşkêş bike. Hêjayiyên kitêbê dulehceyîtiya wê,

nimûneyên wê yên mişe (pirr, zehf), kurteberhemên wê yên edebî yên bi kurdî û li inglîzî wergerandî û herwiha ferhengoka wê ya heta demeke dirêj jî berfirehtirîn ferhenga inglîzî-kurmancî bû. Di ferhengê de hewl hatiye dan ku peyvên kurmancî û soranî li jêr stûnên cuda bîn dan eger ji hev cuda bin.

Tevî ku piraniya nimûneyên Soane rast in jî (tê de gelek yên şaş jî hene) lê ji aliyê rêzimanî ve Soane qels û lawaz e û di şirovekirinên wî de xeletiyên zîq û beloq hene. Bo nimûne, ew hê li destpêkê idia dike ku di kurdî de cinsê rêzimanî peyda nabe.

Kovara *Kanîzar* û malpera *Zimannas* tevahiya vê kitêba 100-salî pêşkêşî xwandevarên xwe yên hêja dikan:

<https://zimannas.files.wordpress.com/2017/01/soane.pdf>

Şeş salan piştî vê kitêbê anku sala 1919, Soane kitêbeke din ya rêzimana kurdî bi navê "Elementary Kurmanji Grammar" (Rêzimana kurmancî ya destpêkî) li Bexdayê da çapkirin. Berevajî navê kitêbê, ew ne li ser rêzimana kurmancî lê li ser soranî – hê jî deqîqtir li ser devoka Silêmaniyê – ye. Em ê wê kitêbê jî di hejmarên bîn de binasînin.

## CUDAHIYA EDEBIYATA DEVKÎ Û EDEBIYATA NÎVÎSKÎ

## PEYVIKA "KU"

## Nûdem Hezex

## Destpêk

Cara ewil "Ku"yên di pirtûka "Erdên Bihûştê yên Winda" de bala min kişandibûn. Hejmara wan ez şaşwaz kiribûm. Di heft hevokên rûpela yekê de 17 "ku" hebûn. Di rûpelên dî de jî kêzêde 11-12 "Ku" dihatin hijmartin. Bi hejmareke kurtasî û kêzêde "ku" yên di pirtûkê de ji hejmara 5000 an dibûrin. Min pirtûk ya bi zimanê tirkî jî kirî û tê de li "ki" yên di zimanê tirkî de weke "ku" yê tê bikaranîn geriyam. Gelekî bi min balkêş hat; "ki" tê de nebûn.

*"Kabaran öfkesi dinmeyince, bu evin rahmetli dedesinden ona miras kaldığını ve ne kadar değerli olduğunu anlattı. Onun ilk kez duygulandığını ve gözlerinde yaşlar belirdiğini görünce çok şaşırđım."* (EKİNCİ Y. 2012:32)

*"Wexta KU kela ya rabûyî danenî, qal kir KU ev xanî mîrate bû, KU ji rehmetiyê bapîrê wî jê re mabû, û bê çî qasî granbuha bû. Gava KU ez çav pê ketim KU cara ewil bû ew dilzîz dibû û kela girî lê radîbû, ez pir şaş mam."* (EKİNCİ Y. 2013: 35)

**"ku"ya di edebiyate devkî de gelekî tê bikaranîn, çima di dengbêjiyê de xwiya nake?**

**Bi vê pirsê ketime rê.** Min du cildên **Antolojiya Dengbêjan** yên Şaredariya Diyarbekirê çapkirî bi dest xist û di nav klamên dengbêjiyê de li "ku" yan geriyam. Gelekî balkêş bû, di kurteçîroka jiyana dengbêjan de "ku" li hev diketin lê di klaman de yek ji bo dermên a bibe nimûne xwiya nekir.

Piştî wê rojê kengî min pirtûkek an nivîsarek bixwenda binê "ku"yên tê de min xêz kirin û hijmartin. Min dît; **Ji Ehmedê Xanî, Meleyê cizîrî** ve ta **Erebê Şemo "ku"** ya bi qewlê **Celadet Bedirxan "Ko"** di edebiyata kurdî de bûye peyveke sereke û hinbihin weke vîrûsekê di zimên de cihê xwe xwirt kiriye û belav bûye. Niha kîjan nivîsarê bixwênim di ber xwe re, ji nîşka ve dibişirim.

"Yaqûtifiroşan di kêf elmas-i şikestin

Ev şefheya elmas-i KO neqqaşî reqem da"

(CİZÎRÎ. M (2004). 27)

"Ew qulzimê rûm û behrê tacîk

Hindî KO bikin xurûc û tehrîk"

(XANÎ E (2004). 47)

#### I- DÎ PÎRTÛKÊN RÊZIMÊN DE BİKARANÎNA"KU" YÊ

Li hemû pirtûkên di dest xwe de geriyam, min ji bo vê mijarê kêma nîşe bi dest xistin. Ji Celadet Bedirxan û vir ve di hemû pirtûkên rêzimên de tê bikaranîn û ti nav lê nehatiye kirin. ên heyî jî ne zelal in.

#### Mînak: 1

Di pirtûka **Kamuran Bedir Xan** ya bi navê "**Kolay Kürtçe**"

*Rêzkirina gotinên rêgezên hevoka pêve "Yan cümle Öğelerinin Söz dizimi"* de wiha dibûre.

#### 1-Kirde (Özne)

heyfe **ko** kes banî min ne kir.

(Ne yazık kimse beni

çağırmadı.)

Yê **ko** qenc dihebîne, qenc diêşîne.

(İyi seven, iyi incitir(seven

ağlatır.)

#### 2-Lêker (Yüklem)

Daxwaza min hemî ewe **ko** hon bextiyar bin.

(Tek dileğim sizin mutlu olmanızdır.)

**3- Pêveniştî (Koşuntu)**

Ez hêvîdarim **ko** hûn poşman nebin.

(Umarım pişman olmazsınız.)

**4-bireser (Nesne)**

Bawer dikin **ko** hemî qenc in.

(Bütün çocukların

iyi olduğuna inanılıyor.)

**5-Biresera neyekser (Dolaylı tümleç)**

Divê bifikirin **ko** wext dibore

(zamanın geçtiğini

düşünmeleri gerekir.)

6-..

**7- Biresera navdêr (İsim tümleci)**

Stêrin yên **ko** dibiriqin

(Parlayan yıldızlardır.)

**8-Biresera Rengdêr (Sıfat tümleci)**

Ew şayeste ye **ko** şabeşekê bidin te

(O ödül almayı hak etmiş.)

**9-Biresera kirde (Zamir tümleci)**

Ji we re ye **ko** ez dibêjim

(Bu söylediklerim sizedir.)

**11-Biresera lêker a yekser (Dolaysız fiil tümleci)**

Ez dizanim **ko** hûn li wê bûn.

(Biliyorum ki ordaydınız.)

**12- Biresera lêker a neyekser (Dolaylı fiil tümleci)**

Ez guman dikim **ko** ew bê.

(Geleceğini umuyorum.)

(BEDİR XAN K. 2011: 248)

**Mînak: 2**

Hevoka pêve/Yan cümle:

1-Hevoka bi grêdekekê li hevoka resen grêdayî 1-Temel cümleye bağlaçla bağlı yan cümle

Ez bawer dikim **ko** ew nesax e.

(sanıyorum ki o hastadır.)

2-Hevoka bi grêdekeke cînav li hevoka resen grêdayî 2-Temel cümleye bağlaç zamiriyle bağlı yan cümle

Ew e mirovê **ko** min duhî dît.

(Bu dün

gördüğüm adamdır)

(BEDİR XAN K. 2011: 241)

**Mînak: 3**

Hoker/zarf

Hokerên demkî / zaman zarfları

wextê ko

Hokerên şik û erêkirinê / Olumlama ve kuşku zarfları

Dibe ko, heye ko

(BEDİR XAN K. 2011: 222-224)

**Mînak: 4**

Raveka Hokeran

"Xwendekara **KU** li jor rûniştiye

Çemê **KU** li aliyê rojava"

"Nîşe: Gelek gihanek jî bi gihaneka "ku" re tên bikaranîn û dibine gihanekên din.

Beî ku, çawa ku, çima ku, çîko, bi qasî ku, da ku, heta ku, hetanî ku, heyanî ku, ta ku, dema ku, eger ku, ji ber ku, jibona ku, kenga ku, li şûna ku, wexta ku, wele ku..."

(TAŞ Ç. 2013 : 69)

**Mînak: 5**

**Bahoz Baran** di nivîsara xwe ya di derheqê "ku" yê de dibêje;

"Di pirtûkên rêzimanê\* de li ser "ku" yê pir nayê sekinandin. Di hinek pirtûkan de tê gotin **KU** "ku" gihanek e, çend mînak tên dayîn û hew. Vê dawiyê hinek pirtûk jî "ku" yê bêtir weke cînavkê nîşan didin û çewtiyekê dikan. Dema **KU** em bala xwe baş bidinê, em ê bibînin **KU** "ku" di zimanê me de cihekî berfireh û girîng digire û hinek peywirên cuda digire ser xwe. "Ku" li gorî peywira xwe ya bingehîn gihanek e, herî pir weke gihanekê derdikeve holê; dema **KU** beriya navdêrekê tê û pirsyariyê çê dibe rengdêr. Weke din, dema **KU** navdêra "der"ê dikeve "ku" ji ber **KU** ciyê wê jî digire, tenê li wê derê peywira cînavkê digire ser xwe.

**A. Ku'ya Gihanek**

**“Ku”** bi piranî weke gihanekê tê bikaranîn. Dema **KU** du hevok bi hev ve tîr girêdan, beriya gotinê, dema **KU** em hevoka yekê/a din vediguhezînin, di lêkernavên hokerî û rengdêrî de, di raweya divêtiyê de, di qalibên gihanekan de, di qalibên daçekan de derdikeve holê.

**1. Di hevokên hevedanî de:**

**Mînak:** Ez nehatibûm **KU** ez te bibînim. Ew reviya **KU** wî negirin. Min jê stend **KU** ji me re nebe pirsgirêk.

**2. Di axaftinan û hevokên veguhestî de:**

**Mînak:** Diya min dibê je ku: “Ji wan bawer nekin.” Ez dibêjim **KU** hûn wisa bikin nabe. Berfînê got ku, mamoste ji me xeyîdiye.

**3. Ji bo raweya şertê:**

**Mînak:** **KU** hûn bixwin ez ê ji we re bistînim. **KU** ew bê, em nikarin biaxivin. **KU** tu herî, dê pir baş be.

**4. Ji bo lêkernavên hokerî:**

**Mînak:** Dema **KU** em ji gund dihatin, ew li ser rê bû. Piştî **KU** em çûn, baran bariya. Berî **KU** ez bê, min çar pirtûk xwendin.

**5. Ji bo lêkernavên rengdêrî:**

**Mînak:** Hevalê **KU** nan dixwe, ne ji me ye. Pirtûka **KU** çap bû, ya min bû. Nanê **KU** şewitiye tu bixwe.

**6. Bi raweya divêtiyê re:**

**Mînak:** Divê **KU** ew jî bî mala me. Lazim e **KU** em xwe bigihînin wan. Divê **KU** tu wisa nekî.

**7. Bi lêkerên alîkar re:**

**Mînak:** Dibe **KU** em jî bî dibistanê. Dixwest **KU** bi me re were malê. Dikir **KU** bihata.

**8. Bi qalibên gihanekan re:**

**Mînak:** Ji bo **KU** em nan bixwin em çûn. Ji ber **KU** tu nehatî, bername betal bû. Em hatin da **KU** te bibînin.

**9. Bi qalibên daçekan re:**

**Mînak:** Heta **KU** ji te tê baş be. Weke **KU** min got, dengê xwe neke. Qasî **KU** ez dizanim, ew ne yekî baş e.

**B. Ku'ya Rengdêr**

**Mînak:** Ev, **KU** der e? Ew çû **KU** derê? Ku der warê me ye?

**C. Ku'ya Cînavk**



**Mînak:** *Ew çû ku? Tu ji KU têyî? Ew bi KU ve çû?*

...

**"Weke KU em dibînin, "ku" pişt û stûna kurdî ye, divê em li "ku" yê xwedî derkevin, kurdî û "ku" pir li hev dikin; KU "ku" tune be kurdî nikare li ser piyan bisekine."**

Nîşe: Li ser malpera Nefelê nivîseke Arif Zêrevan a bi navê "Ferqa di nêvbera »ko«, »ku« û »kû« de" heye. Di wê nivîsê de li ser bingeh û sedemên guherîna denga tê sekinandin. Arif Zêrevan ji Mem û Zînê jî mînakên dide, qala Hawarê dike û "ko", "ku" û "kû"yê di wateyên cuda de rave dike. Lê li gorî min ziman li gorî demê xwe."(MALPER 2)

**Mînak: 6**

**Samî Tan di pirtûka Rêzimanê Kurmancî de wiha dibêje;**

*"Her wekî ji navê wê jî diyar e, gihanek bi serê xwe ne xwediyê tu wateyê ne, lê bêjeyan, komê û hevokan bi hev ve grê didin, an jî peyvekê, komê bi hevokekê ve grê didin."* (TAN S. 2011: 195-)

Di nav gihanekên di hejmêrê de "ku" bi tena serê xwe nabûrîne lê bi hin peyvên dî re bi kar tîne; *"Dibe ku, Dema ku, heta ku, ji ber ku,"*

Di nav mînakên dayî de ;

*"Tu herte **dibe ku** ew jî li pey te were."*

*"**Dema ku** tu çûyî, ji min re nameyan bişîne."*

*"Dayika min **ji ber ku** karê wê hebû, nehat."*

*"**Çima ku** min alîkariya wî kir, ji min xeyidî."*

*"**Çer ku** hat, pirsra te kir."*

*"Hate malê, **da ku** karê xwe bike."*

*"**Heta ku** tu neyêyî, ez dev ji te naqerim."*

*"**Ku** zû were, dê bigihêje min.)"*

(TAN S. 2011: 196)

## II- DÎ ZÎMANÊ EDEBIYATÊ DE BİKARANÎNA "KU"YÊ

**"Dibe KU li Baroyê be, an jî dibe KU çûbe dadgehê.."** (DÎLSOZ O. 2012: 11)

*Dibe li Baroyê be, an jî dibe çûbe dadgehê.*

"Saman xwe li deriyê camîn ê **KU** cihê Trîskê lê ye bada û kete hundir, weke her roj danê sibe, çavên wî yê kilmişkî **KU** xew hê jî li ser bû, rûyê wî yê **KU** zor dida xwe **KU** kenekî rêveberek li hember karmenda xwe lê pist dikir û pozbilindiyeke bêhemdî pê re peyda dikir, silaveke bi serlêvkî li Trîskê veda, piştî wê dengê xwe piçekî dî kiz kir û jê xwest **KU** wan der û beran hinekî bide hev. (DÎLSOZ O. 2014 49)

"Hinga **KU** weke zarokekî li bende bû **KU** wêneyê **KU** jî bin xarîfa duyem **KU** Cemşîd Xeyalî Heman karzanî û micidiyê dadigirt bibîne, Xeyalî serê xwe jî ber dumana **KU** jî devê çaydan difûriya li ser kélekê kirî got: " Tu rahije a Proust, bila vé carê Çehov jî min re be." ... "Ji nîşkê ve pê wiha bû **KU** ne mîna yekî **KU** van tiştan dike -yan jî yekî **KU** jixwe van tiştan dike-lê mîna yekî **KU** wan xeyal dike û...." (KULEK C. 2014: 49-31)

"Gelî mêvanan, min bibexşînin, **KU** ez giriyame."... "Lijneya **KU** Dara pê re bû jî bi maşîne nêzîkî kolana teng ya **KU** mala dayê Nesîma tê de bûbûn." (OZDEMÎR M. 2011: 72-104)

"got **KU** gelek nexweş hene, ew tenê ye û ew ê nikaribe di wextê **KU** texmîn dikir de bê malê." (DEMÎR S. 2013: 10)

*"got gelek nexweş hene, ew tenê ye û ew ê nikaribe di wextê texmîn dikir de bê malê."*

"Ne **KU** min nevêt Simkocan, nizanim bê ji **KU** dest pê bikim, jê wêdetir ev nediyariya **KU** bêhn li me çikandiyê rê nadê **KU** ez li ser peymanê..." (OZMEN Ş. 2008: 19)

*\*(Ne ku) **KU** li vir hewce ye. (ji ku) (kû)Cînavk e ...rê nade ez li ser peymanê...*

"Demek dirêj bû **KU** neçûbû derekê."... "Bi derbekê re li xwe hay bû **KU** vê carê hîsek xerîb, **KU** naşibe hîsên heta niha, lê peyda bûye." (WAR R. 2013: 17/18)

*\*Demek dirêj bû neçûbû derekê.*

*\*(hevoka didoyan tevûlev e)*

"Ez dibêim de ka **KU** ez vegeyriyam em ê li ser biaxivin. Mamoste û Rojnamegerê hevalên min jî têra xwe şîretan li min dikin, **KU** ez hay ji xwe hebim û dibêjin: me bê agahî nehêle. Ez dilê wan dikim çî **KU** ez ê wan agahdar bikim û em xatir ji hev dixwazin." (SAVCI F. 2013: 21)

"Şagirtan, me hemûyan, dizanibû **KU** ji bo wî Nacî Efendî êdî di vê navberê de li odeya resimkirinê, **KU** ji bo wî odeya vexwarina eraqê bû, mijûlî vexwarina eraqê ye!"

(PÎRBAL F. 2013: 13)

*\*Hevok bi raveka zincîrîn saz bibe **KU** ji holê derdikeve.*

"Tena tiştê **KU** ez û meleyê îranî bi hev grêdidan, dilsafîbûn û kawikiyeke wî ya wiha bû **KU** dihişt ez li bîra xwe bêm." (PÎRBAL F. 2012: 10)

*\*Hevok ne safî ye."tişta ku" bibe "tiştê" wate xera nabe.*

"Hemû rengên **KU** çavan hildidan li ser te bûn, hemû bihnên **KU** dilan hildidan ji te difûriyan." (DÎLDAR R. 2012: 7)

*\* pirjimarî him li rengdêrê û him jî li lêkerê heye. Balkêş e.*

*\*Hemû rengên çav hildidan li ser te bûn, hemû bihnên dil hildidan ji te difûriyan.*

"Lê mixabin **KU** min ji milletê xwe re tu xebat nekiriye." (SABRÎ O. 2011: 15)

*\*ku" ya li vir gihanek e. Hevok bêgihanek jî bêwate nabe. \*Lê mixabin, min ji milletê xwe re tu xebat nekiriye.*

"ji rêvîngên **KU** ji gelî derbas dibin haydar in." (SAÏDPOUR N. 2002: 9)

*\*ji rêvîngên ji gelî derbas dibin haydar in.*

"Bayekî wisan **KU** tu dibe qey ne ji bo **KU** bêhna min bîne ber min, lê ji bo **KU** min bifetisînê tê." (ZERAQ D. 2014: 69)

*\*wateya hevokê bê "ku" bi rawekdanê hê saftir dibe.*

*\*Bayekî wisan, tu dibe qey ne ji bo bêhna min bîne ber min, lê ji bo min bifetisînê tê.*

"Ev cenga **KU** giyanên **hezarê kesan** li ber lingan biribû.", "**Ji kêfa re ez difiriyam**, gava min didît **KU** wê û xwîşka xwe ya mezin bi gokê dilizîn. Min qet nizanîbû **KU** ev hezkirin e, ev gayê **KU** ez di nav herdu qiloçên xwe de hilgirtim.", "ez dihatim **KU** ez biteqim,", "Vê bêhna **KU** berê wî da nexweşaneyê dînan, piştî **KU** herî bi xeter di dîrokê de anî ziman.", "**KU dik para genimê wan tev de tar û mar dike**" (YÛSÛV H. 1998: 12-13-31)

*\*gava min didît ew û xwîşka xwe ya mezin bi gokê dilizîn ji kêfê ez friyam.*

*\*"digel ku" Cara yekê Min ev peyv dît.*

"Heya **KU** tizbiyên min yên kehreban ne kevin destê we, bizanibin **KU** ez sax û silamet im. Li benda nêçîra xwe me. Dema **KU** tizbiyên min bo we hatin, bizanin ez nazîvirim ba hewe. hêvî ji min bibirin." (COLEMERGÎ Î. 2001: 17)

*\*Heya tizbiyên min yên kehreban ne kevin destê we, bizanibin ez sax û silamet im. Li benda nêçîra xwe me. Dema tizbiyên min bo we hatin, bizanin ez nazîvirim ba hewe. hêvî ji min bibirin."*

"Dibe **KU** di ber xwe de gotibe.", "Dikir **KU** ji hiş bikeve" (NEHAYÎ E. 2012: 11-12)

*\*Dibe di ber xwe de gotibe. Dikir ji hiş bikeve.*

"Li payizê, gelek caran gur dihatin heya nêzîkî gundê me, xwe davêtin nêv kerî a pez dibirin. Dadê a bavo ji bo selarneta pezê **KU** me diçêrand, gelek ditirsiyan. Tirsê wan a mezin, nemaze, ji bo min ba; ewan dizanîn **KU** zarokêkî wek min nikare xwe ji guran biparêze. Her êvar gava min kerî tanî mal, **bêrî KU** tu pez jê kêmbê, dê a bavê min bi dengêkî bilind, ser hev: «Şikir ji Xwedê! Şikir ji Xwedê **KU** roj bê xisar derbaz ba!... », digotin."

(ŞEMO E. 1989: 26)

"Li payizê, gelek caran gur dihatin heya nêzîkî gundê me, xwe davêtin nêv kerî a pez dibirin. Dadê a bavo ji bo selarneta pezê me diçêrand, gelek ditirsiyan. Tirsawana mezin, nemaze, ji bo min ba; ewan dizanîn zarokekî wek min nikare xwe ji guran biparêze. Her êvar gava min kerî tanî mal, bêrî **KU** tu pez jê kêmbê, dê a bavê min bi dengê bilind, ser hev: «Şikir ji Xwedê! Şikir ji Xwedê **KU** roj bê xisar derbaz ba!... », digotin."

\*me du "ku" derxistin yê din nederxistin

"Dizanim **KU** mirin bi hêz e, dizanim **KU** kes li derveyî jiyaneke bi mirinê sînorkirî najî, lewra dixwazim jiyana xwe ji bendên mirinê rizgar bikim, dixwazim bi nivîsandinê hinekî mirina xwe dereng bixînim, hinekî di rûpelan de bijîm, kî zora mirinê dibe? Nivîskar! Çi zora mirinê dibe? zeviyên sipî yê **KU** hêdî hêdî tilûrên tîpan ref bi ref li ser datînin."

(DOST J. 2012: 3)

\*Dizanim; mirin bi hêz e, dizanim; kes li derveyî jiyaneke bi mirinê sînorkirî najî, lewra dixwazim jiyana xwe ji bendên mirinê rizgar bikim, dixwazim bi nivîsandinê hinekî mirina xwe dereng bixînim, hinekî di rûpelan de bijîm, kî zora mirinê dibe? Nivîskar! Çi zora mirinê dibe? zeviyên sipî yê hêdî hêdî tilûrên tîpan ref bi ref li ser datînin.

"Di welêt de çiqas bijîşk hebûn, tev şandibûn qada şerr, kitkitên **KU** mabûn jî ne dikarî li pêş tirpana mirinê **KU** nexweşiya tîfo bê dilovanî dişixuland rawestin."

(SEBRÎ O. (Dij) 12)

"1958 model bir Ford'umuz vardı.", "Bu inancı gülünç bulanların da **başka türlü görünmeyen daireler** içinde olduğunu ve **bunun dışına çıkamadığını** çok sonra anlayacaktım.", "Taxsiyek me ya Ford hebû, **KO** modelê wê 1958 bû.", "Gellek salên din pişt re, ez *têgihîştim*, yê **KO** vê çemberê wek pêkenî dibînin, ew bi xwe jî di nav hin çemberên **KO** nayên dîtin de ne û nikarin derkevin dervayî vê çemberê."

(MUNGAN M. 2008: 17-19), (MUNGAN M. 2014: 14-16)

\*Mînakeke gelekî balkêş e.

\*Fordeke me ya 1958 model hebû

"Kabaran öfkesi dinmeyince, bu evin rahmetli dedesinden ona miras kaldığını ve ne kadar değerli olduğunu anlattı. Onun ilk kez duygulandığını ve gözlerinde yaşlar belirmediğini görünce çok şaşırdım.(EKİNCİ Y. (2012: 32)

"**Wexta KU** kela ya rabûyî danenî, qal kir **KU** ev xanî mîrate bû, **KU** ji rehmetiyê bapîrê wî jê re mabû, û bê çiqasî granbuhê bû . **Gava KU** ez çav pê ketim **KU** cara ewil bû ew dilzî dibû û

kela girî lê radîbû, ez pir şaş mam." (EKÎNCI Y. 2013: 35)

*\*Ku" ya li pişt wexta, gava, dema tu wateyê nadiyê. Mînak: Gava KU ez çav pê ketim/ Gava ez çav pê ketim/ Gava çav pê ketim*

"Edebîbyeta welatî, ew edebiyet e, **KU** ji jîna milletî, ji hiş û dilê wî, ji dîrok û çîrçîrokên wî, ji stran û lajyên wî hiltêt. Kaniya wî, dilê millet, hiş û heyata wî ye. Tinê ev edebiyet e, **KU** germ rengîn, bibin û xwedan ronahî ye."(Kamiran Bedirxan-Hawar 1)

"**Gava** em edebiyata klasîk beramberî ya îro dikin, em dibînin **KU** em îro gelekî jar û li paş mane. Ev jarî û lipaşmayîna me, mixabin **KU** bi sedemên siyasî ve girêdayî ne."

**(CEWERÎ F. 1994: 4)**

*\*mixabin bi sedemên siyasî ve girêdayî ne.*

1-Taxsiyek me ya Ford hebû, **ko** modelê wê 1958 bû

2-Gava **KU** ez çav pê ketim **KU** cara ewil bû ew dilzîz dibû û kela girî lê radîbû, ez pir şaş mam.

3-Demek dirêj bû **KU** neçûbû derekê.

4-Rê nadê **KU** ez li ser peymanê...

5-zeviyên sipî yên **KU** hêdî hêdî tilûrên tîpan ref bi ref li ser datînin.

Em ji van hevokan "ku" yan rakin gelo vê wate vegûheze?

1-Taxsiyek me ya Ford a modelê wê 1958 hebû

2-Gava ez çav pê ketim, cara ewil bû ew dilzîz dibû û kela girî lê radîbû, ez pir şaş mam.

3-Demeke dirêj bû, neçûbû derekê.

4- Rê nadê ez li ser peymanê ....

5- Zeviyên sipî yên hêdî hêdî tilûrên tîpan ref bi ref li ser datînin.

*Vegûhestin dibe?*

### III- DÎ DENGÊJIYÊ DE BİKARANÎNA "KU"YÊ

1-

Di pirtûka **X. Ç. MÛRADOV** ya bi navê "**Klamêd Cimaeta Kurda**" de di nav **56 klamên li 53 rûpelan** de **2 "KU"** hene. Di klama "**Rizgano**" de dibûrin.

(1) "Ew dara sipindarê **KU** hêşîn bûye hewşa mala bavê teda, bejna min merûma xwedêye,"

(2) "Lê ew teyrê qereqûşî **KU** hatibû serê kewê gozel lêdabû," (MALPER 5)

\*Min ji **Şeroyê Biro û çend dengbêjên dî** gûhdar kir "**KU**" tê de nabûrin.

2-

Di du cildên **Antolojiya Dengbêjan** ya Şaredariya Amedê çapkirî de, di vegotina kurtejiyana dengbêjan de (vegotina amadekaran e) "**KU**" gelek in lê di nav gotinên klamên dengbêjiyê de "**KU**" yek tenê jî nîne.

3-

Di pirtûka **Yaşob Tilermenî** ya bi navê **KİTİM** de transkripsiyona klama **Fatim Axa û Mihemedê Hoska** heye. **15-16** rûpel in. Di nav wan gotinan de du caran "**KU**" dibûre.

Ev "ku" yên li serê hevokê bi wateya "eger" "**Ku karê te van gotin û galgala hanê bê**" "**Ku karê te ev gotin û galgala hanê bin**" (TILERMENÎ Y. 2005: 132)

\*Nivîskar ji dengê **Rifatê Darî** nivîsiye. Min ji Rifatê Darî gûhdar kir. Li wir dibêje "**Go**" Ew "go" di nivîsê de bûye "**Ku**" (MALPER 6)

4-

Di Pirtûka **Ahmet Aras** a bi navê "**Evdalê Zeynikê**" de di nav transkripsiyonkirina

gotinên klamên Evdalê Zeynikê de gelek "**KU**" hene.

\*Gava mirov wan stranên gûhdar dike "ku" tê de nayên bihîstin/dîtin; Ew "**KU**" Ahmet Aras ji ber xwe kirine navberan de. **Di klamen de ne nînin.** transkripsiyoneke xerabe hatiye kirin.

5-

Di pirtûka **Heciyê Cindî** ya bi navê "**Klamên Cimeta Kurda**" (240 rûpel in),

di 14 rûpelên nivîsara pêşgotinê de 46 "**KU**" hene, rûpelên mayî tev transkripsiyonkirina gotinên klaman e û di wan gotinên **330** klaman de ""**KU**" yek tenê jî nîne.

6-

Di herdu cildên Pirtûkên "**Klam û Stranên Kurdî**" yên **Cewad Merwanî** amadekirin de

di nav 1567 stranên kurmançî û soranî de "**KU**" naye dîtin. Di stranên soranî de "**ke**" kêmtên xwiyayî.

7-

Di Pirtûka "**Strana Kurmançî**" a **Cankurd** berhevkirî de tenê di klama Derwêşê Ebdî de "**KU**" tên xwiyayî.

"Xwe berda bû serê riya, **KU** Derwêşê here ser Çîl Osman e,"

"**Wextê KU** şêx Evdî salixê Cee'ferê Gêsan, bi herdu zilama ra"

"**Wexta KU** ew zilama rûnişt li ser doşekan e,"

"Haza **KU** mêrkê bi sed mêran e,"

"Gava **KU** bikeve şerê hîmê binê berrîyê leheng û hûtan e,"

"Bînanî nerê, **KU** têkeve pêşîya heft qenter devê di kerwan e,"

"Kî yê **KU** here bîne cewaba eskerê Çîl Osman e,"

"**Ku** ro tê dengê kose û Misriyan e,"

"Go: Lawo! ew êla **KU** tu dibêjî, êla axayê mîrê Milan e,"

"Gava **KU** van zilama hev ra xeberdan e,"

\*Min ji **Şakiro û gelek dengbêjê dî** Guhdar kir; ""**KU**" tê de nabûrin. jêderka Cankurd kîjan dengbêj e em pê nizanin(nenivîsiye). (MALPER 7)

8-

LOKMAN TURGUT di teza xwe de ya bo zaningeha Gotteburgê (Cembelî fils du prince de Hekkarî)

Ji dengê;

**Bedranê Mala Sivûk** "ku" yek jî nîne. (2 "kû" yên cînav hene)

**Reşîdê Omerî** 2 "ku" hene.

1-"Erê heke ti dixwazî **KU** ti ji mêhvana re bikê taştêyo"

2- "weke mişkê **KU** ti bi melkes bikujê, halê wî ti nîne."

\*Peyvên weke "Heta, heçî, gava, wextê, roja" nêzî sedî di klamê de dibûrin lê li pişt wan "ku" nînin.

9-

Di nav gotinên stranên M. Arif Cizîrî, Hesên Cizrawî, Seîdê Hemo (Seyid Axayê Cizîrî), klamên Meryemxan, yên Kawîs Axa dixwînin de "**ku**" nînin.

Mînak; (MALPER 8)

10-

Di pirtûka "**Sedsala qêrînekê-Karapatê Xaço**" a **Salih Kevirbirî** nivîsandî de 37 klamên

Karapatê Xaço de, tenê "ku" yek heye. di klama ez ê kal bûm de dibûre;

"*Qisûra wê **KU** heye*"

\*Bo "**Ku**" di vê hevokê de bêwate ye dibêm qey bi şaşî hatiye nivîsîn.

11-

Di du bantên dengbêj **Bêmal Rajanî** de (1937-1988) "ku" naye bikaranîn. Li gora agahiya Mecîd Cinîkanlo li herema Serhedê û rojhilata kurdîstanê bajarê Êrmiyê jiyaye. Bo wê mijara me mîna keke baş û balkêş e. (MALPER 9), (MALPER 10)

**12-**

Di nav gotinên 29 klam û stranên **Huseynê Farê** yên Ayhan Meretov nivîsî de (69 rûpelan de ) 8 ku tên xwiyayî.

**"Keçikê KU da derî wey dolabê dolabê"**

**"Xweşikê KU da derî can dolabê dolabê"**

Ayhan MERETOV Dengbêj Huseynê Farê

(MALPER 11: KOVARABÎR)

\*Min klam ji çend jêderkan gûhdar kir, wiha dibêje.

keçikê **bi kû da diherî wey dolabê dolabê**

Xweşikê **Bi kû da diherî can dolabê dolabê**

(MALPER 12)

**13-**

Di nav Klamên di pirtûka "Şakarên Muzîka Kurdî" a Şaredariya Bajarê Mezin A Amedê derxistî de klamên qeydên wan di navbera 1803-1930 an de hati kirin de "KU" nînin.

(YAŞ Z.2015)

**14-**

Di pirtûka Cegerxwîn a bi navê "Folklorê Kurdî" de di nav vegotina wî de "KO" hene lê di nav gotinên klam û stranên de "KU" nabûrin.

**15-**

Di kitêba Memê Alan ya Roger Lescot nivîsî de gelek "KO" dibûrin. Roger Lescot transkripsiyona destanê ji dengê dengbêj Miço û bi alîkariya Celadet Bedirxan nivîsiye.

Lescot ji bo Miço wiha dibêje: Miço Memê Alan ji bavê xwe girtibû, bavê wî jî ji kurdekî Behdînanî fêr bûbû.

Ev dengbêj hê jî li Meqtelê (suriye) dijî. Ew ji eşîra Berazî ya li Başûr e. **Kêmasiyeke Miço jî sistbûn û**



**xwarbûna zimanê wî ye.** Kurmanciya wî ew çend di bin tesîra erebî û tirkî maye ku hem ji aliyê şêwe, hem jî ji aliyê zelaliya xwe ve ji kurdî bêtir dişibe zimanekî din." ( LESCO. R 2010: 9)

Gava destana Mem û zîn ji Aşîk Selîmê Cizerî were guhdarkirin neyîniya "Ku" yan vê bê dîtin. (MALPER: 15)  
(MALPER: 16)

16-

**Di kitê ba Kaniya Stranan ya Yaşar Kaplan amadekirî de nêzî 700 stranên kurdî yên di 700 rûpelan de "ku" qet nehatine bikaranîn. Yek jî bo nimûne naye wê xwiyî. Ev kitêb çavkaniyeke bi zanistî hatî amadekirin û, ewle ye.**

#### IV- DÎ FERHENGAN DE "KU"

##### Ferhenga Yekbûnê: Kurdî-Tirkî "Ku":

1- ise, eğer, ki

2- nere, neresi, nerde, nerede,

##### Ferhenga Zana Farqînî Kurdî-Tirkî "Ku":

I- 1-:ki, 2-ise, 3-eğer, 4-se-sa -dilek şart eki

II- 1-nere, 2-nereye

##### Ferhenga Wikîferheng "Ku"

1. girêdek

peyvek e du hevokan bi hev ve girê dide lê ti wateyê lê zêde nake: Ez dizanim **KU** tu nayê. Dizanim tu nayê.

Hewate go (1) ko (2)

2. Çi derê Baştir: kû

3. Çi peyvek devokî ye li şûna çi: *Te **KU** got? Te çi got?*

4. eger, şayet

"Ku tu werî li civaka Kurdîstanê binêrî bi taybetî li ya gundan tê bibîni KU kur hîn dema nû ji dayika xwe dibe li malê desthilatdarê keçê ye."

( <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-deniz/nameyeke-hest-u-ramani-ji-jine-re.html>)

ji îranî, hevrehê soranî (ke), (ki), pehlewî ki, pazendî

## V- "KU" ÇI YE?

Niha em li mijara xwe vegerin. **Bahoz Baran** gotibû **"ku" pişt û stûna kurdî ye, KU "ku" tune be kurdî nikare li ser piyan bisekine."**

## Çima "ku" di vê gotinên klamên gelerî û di dengbêjiyê de nîne?

ka em vê pirsê bibersivênin. **"Dema ku"** ya di nivîsara Bahoz Baran de, çima di **zimanê gel** de ( zimanê dengbêjiyê ye) **"dema"** ye? Ka em lê binêrin.

**"ê, a û ên" di zimanê kurdî de çi ne?**

Bi serê xwe **cînavkên xwedîtiyê,**

ne bi serê xwe **pêvekên xwedîtiyê** ne.

bi peyva pişt xwe re dibin gelek tiştên dî (paşê em ê li vê mijarê vegerin)

Di zimanê farisî û di soranî de zayend nîne. Ji ber wê di wan zimanan de di her sê rewşan de tenê cînavê heye ya tê bikaranîn . Ji bo zimanê kurdî xwedîzayend e, di zimanê kurdî de sê cînavên xwedîtiyê hene.

**ê (yê)-** nêr/yekjimar, **a (ya)--**mê/yekjimar û **en (yên)-**pirjimar

Ji bo ev pêvek û cînavên xwedîtiyê peyva li pey xwe bi xwe ve grê didin, grêdek in, ango gihanek in.

Em li nivîsên xwe yên li jor vegerin.

**Bahoz Baran** li gelek deveran gotiye **"Dema ku..."**

**Kamran Bedir Xan** dibêje **"Stêrin yên ko dibiriqin."**

**Çetîn Taş** gotiye "Xwendekara **KU** li jor rûniştiye.", "Çemê **KU** li aliyê rojava."

(Nimûneyên di pirtûkên dî de jî dişibin van mînakên)

**Pirs:** Çima em "ke" ya farisan an jî soraniyan ya cinavk û pêveka xwedîtiyê di pişt cinavk û pêveka xwedîtiyê yên bi kurdî bi kar tînin û dubare dikin?

-Di klamên dengbêjiyê de "ku" li pişt **a, ê û ên** tên bikaranîn?

-Na

-Çima di zimanê edebiyatê de heye?

-Nizanim wele. Çima?

-Sedema vê **Ehmedê Xanî û Meleyê Cizîrî** ne.

-Çawa? Çi elaqeya wan bi vê mijarê heye?

-Wiha bêjim ezbenî. Gava tu şaheserên wan yên orjînal dixwînî tiştêkî fêhm dikî?

-Kê

-Çima?

-Ez ji kû bizanibim çimaya wê?

-Ez bibêjim. Wan li medreseyan karê zanistiyê kirine. Zanistî û îlm bi zimanê erebî û

farisî xwendine. Ji ber vê ji zimanê gel dur ketine û zimanekî tevlihev bi kar anîne. Kesên karê edebiyatê dikin jî ew ji zimanê xwe re kirine bingehên û bi gelek awayan şopandine. Lê belê dengbêji li ser koka xwe, li ser zimanê gel şîn bûye û jiyana xwe domandiye. Dengbêjiyê ziman sosyalîze kiriye û gihandiye vê demê. Gava **Celadet Bedirxan** rêzikên zimanê kurdî nivîsî ji klam û gotinên berê (*gotinên pêşyan*) bi rê ketiye û bi wî awayî zayend, tewang, daçek, hoker, lêker, ravek û yên dî kifş kirine. Ka li mînakên li jor binêre em "ku"yan jê biavêjin çî ji wan kê dibe?  
**"Dema ku..."**

"Stêrin **yên ko** dibiriqin."

*Stêr in yê dibiriqin*

"Xwendekara **KU** li jor rûniştiye."

*Xwendekara li jor rûniştî*

"Çemê **KU** li aliyê rojava."

*Çemê li aliyê rojava.*

-Tiştêk kê dimîne? a, ê û ên karên xwe nakin?

**a- "KU" Ya Gihanek/Grêdek:** Gava mirov peyvekê ji hevokê derxbixe û wate venegûheze mirov fêhm dike hewceyî bi wê peyvê nîne. Ka em bi hev re li çend mînakên binêrin.

**mînak:**

Diya min dibêje **ku**: "Ji wan bawer nekin. " *Diya min dibêje: "Ji wan bawer nekin."*

Ez dibêjim **KU** hûn wisa bikin nabe. " *Ez dibêjim; hûn wisa bikin nabe.*

Berfînê got **ku**, mamoste ji me xeyîdiye. " *Berfînê got, mamoste ji me xeyîdiye."*

**b- "KU" ya Cînava Gihanek /Grêdek:** Tercîhek e. Dibe di van hevokan de bi gihanekê hevoka hoker û lêker bi hev re were grêdan. Ev form mantalîteya farisî ye. Ketiye zimanê tirkî jî. Lê niha di zimanê tirkî de nivîskarên modern û postmodern vê rêzîkê tercîh nakin û bi kar na'ynin.

-Ez nehatibûm **KU** ez te bibînim. (*Ez nehatibûm te bibînim*)

***Ji bo dîtina te ez nehatibûm.***

-Daxwaza min ew e **KU** hûn bextiyar bin. (*Daxwaza min ew e hûn bextiyar bin.*)

***Daxwaza min bextiyariya we ye.***

**c- "KU" Ya Cînava Xwedîtiyê/Rengdêra Xwedîtiyê:**

**Di edebiyata nivîskî de**      **Di edebiyata devkî de(dengbêjî)**

"Ê ku"                              "Yê ku"              "Ê"              "Yê"

"A ku"              "Ya ku"              "A"              "Ya"

"Ên ku"              "Yên ku"              "Ên"              "Yên"

Yên **KU** xwarinê dixwin.                              Yên xwarinê dixwin.

"**KU**" ne cînava xwedîtiyê ye. Cînavên xwedîtiyê "**ê, a, ên**" in.

bikevin pêşiya lêkerê; wan dikin rengdêr

**Ê mayî**

**A revî**

**Ên girtî**

-Keçika min **a** xwarinê naxwe. Kurê min **ê** çûyî çiyê.

**Rengdêrên xwedîtiyê**

(Possessive Adjectives)

**cînavên xwedîtiyê**

(Possesive Pronouns)

**a/ê/ên** min

My

Mine

**a/ê/ên** te

Your

Yours

<b>a/ê/ên wî</b>	His	His
<b>a/ê/ên wê</b>	Her	Hers
<b>a/ê/ên wî</b>	Its	Its
<b>a/ê/ên me</b>	Our	Ours
<b>a/ê/ên wan</b>	Their	Theirs

This is my car.	<b>Ev erebeya min e</b>	it is mine	<b>Ev a min e</b>
She is my mader	<b>Ew diya min e</b>	She is mine	<b>Ew a min e</b>
He is my father	<b>Ew bavêmin e</b>	He is mine	<b>Ew ê min e</b>

**a/ê/ên him "rengdêrên xwedîtiyê" him jî "cînavên xwedîtiyê" ne.**

\*Qertaf(pêvek) be rengdêr e, cê be cînav e.

Mînak: ji tirkî

<b>bu araba benimdir</b>	<b>Ev erebe ya min e</b>
<b>bu benim arabamdır</b>	<b>Ev erebeya min e</b>
<b>bu elma benimdir</b>	<b>Ev sêv a min e</b>
<b>bu benim elmamdır</b>	<b>Ev sêva min e</b>

**d- "KU" Ya Şert û Mercê (ing. "if")**

Ev "ku" navdêr e. Di serê hevokê de ye. Bi wateya "Eger, heke, şayet" dide.

**KU** tu biçî ez ê jî biçim.

**e- "KU" ya Bi lêkerên alîkar re:**

em dixwazin **KU** tu li vir bî Em dixwazin, tu li vir bî

Divê **KU** ez bixebitim Divê bixebitim

**f- " KU"Ya Lêkera Rengdêr**

**Lêkera rengdêr ("î" Ya li dawîya koka lêkerê demê nîşe dide)**

*Ê mayî, A revî, Ên girtî,*

**Di edebiyata nivîskî de Di edebiyata devkî de(dengbêjî)**

ê **KU** pere dîtî ê pere dîtî

**a** **KU** sêv xwarî **a** sêv xwarî

**ên** **KU** ketin erdê **ên** ketin erdê

**g- "KU" Ya Paşkît:** Çikû, çimku, neku, weku, taku, daku..

**NIŞE:** Gelek kes "kû" ya cînav jî dikin "ku" û bi vî awayî dinivîsin. Çewtiyeke rastnivî ye. -li kû  
yî

-bi kû de çûyî?

-ji kû bizanibim. ;

**" KÛ" cînava cihî ye** (kîjan cih: kû)

## VI- DÎ ZIMANÊN DÎ DE "KU"

### a- Di zimanê farisî de

**"KE" ye,** Cînava xwedîtîyê jî -Î- ye.

**Di soranî de çar wateyên "Ke" yê hene.**

**Ke:** ku

**Ke:** dema (ku) Gava (ku) Wexta (ku)

**Ke:** madem, pa madem: Ke wa ye. bo nayê (madem wa ye çima naye?)

**Ke :** ger, eger, heke, heger, heko heku

*"E'zîzim beyanî, KE gul e tirê derêjê*

*Ke bulbul denalê, KE sofi dête niwêjê*

*Le kûncî qefez da, be sed nale dexwênim*

*Henawim nemawe, LEBER çi naye şînim*

*Le hîciranî wîsalît, le dewirî xet û xalit*

*Heta hem dexwênim denalênim*

*Heta newgulî xom we dest dênim*

*Xezêmî giyan, LEBER çi nayê şînim*

*LEBER çawî ciwanit, leber cergî be xwênim*

*Gul u lale pişkût, dewir dewirî gulane*

*Gulî min depîşkwê, beharî du dîlane*

*KE bulbul denalê, delê kwa gulî sûrim*

*Henewim nemawe, demêke le to dûrim*

*Delên ewro behare, beharî dû dîlane*

*KE bulbul deka razî dildarî*

DEGEL kone yarî cefakarî

LEBER ehare e'zizim, beharî du dîlane

Ke bulbul dexwênê, LESER pelikî gulane

Le baxî gulan da, her toy taqe gulî min"

(MERWANÎ C. 2010: 57)

Bo farisî ye û ahenga wê bi denga re nabe nivîskar û zanyarên tirk ji vê peyvê hez nakin. Bêtir kesên nû fêrî zimanê tirkî bûne bi kar tînin. Di zimanê rojane û zimanê malê de bêtir ji aliyê kesên nû fêrî tirkî bûne tê bikaranîn.

#### b- Di Zimanê Tirkî de

##### qertaf:

**Cînava pêwendiyê "Ali'nin arabası, Ayşe'ninkinden daha güzeldir." Erebe ya Elî ji ya eyşê**

##### xweşiktir e

seninki

a te

##### rengdêra diyarkirinê:

- Duvardaki resmi ben yaptım.

**Wêneyê li dîwêr min çêkir**

- Akşamki yemeği çok beğendim.

**Min xwarina êvarê pir eciband**

- Penceredeki çiçek, soğuktan dondu. **kulîlka li pencerê ji serma hişk bû**

##### gihanek/grêdek:

Nasıl ki? çawa ku?

demek ki nexwe ku

bilmem ki nizamim **ku**

diyorlar ki dibêjin ku

olur ki dibe ku

Benim ki ez im ku

Benimki a min e ku

Mademki, halbuki,

belki, belkî

sanki, dibe ku

çünkü,                      çikû  
oysaki             halbûkî

## HİN NÎŞE

**1- Transkrîpsiyon:** Min gelek dengbêj û stranbêj gûhdar kirin. Li rastî gelek Şaşîtî û çewtiyên transkrîpsiyona klam û strana hatim. Min dît; Kesên ev kar kirin ew "ku" xistine navberan de. Mînak: Pirtûka **Ahmed Aras**.

Di hin klaman de di gûhdarkirinê de "ku" nînin lê di nav gotinên klamê yê hatin transkrîpsiyon de hene . **Mînak:**DÎLBER / Dengbêj Reso

"Ê lê Dîlberê xwezila min îro bi ci û meqam û meskenê **KU** niha tu lê...

*De ha yar ha yar ha yar ha yar ha yar de ha yar yar yar yar ha yar yar,*

*ha yar yar de yar yar ya ha yar.. yar yar yar yar dîlbera min yar... yar.*

*Dîlberê xwezila min bi ci û meqam û meskenê **KU**\* anha tu lê.."( MALPER 14)*

Gotin û Awaz: Şaîr-**Dengbêj Reso** Berhevkar: **Salihê Îdirê** Redaksiyon: **Ebdurehîmê Mûşî** \*Min ev klam gûhdar kir "ku" di nav gotinan de nabûre.

Di devoka hin Dengbêjan de carinan "KU" tê bikaranîn. Mînak: **Mradê Kinê. Di heman stran an jî klamê de carinan bi kar tîne carinan jî nayne..**

Bi piranî kesên karê transkrîpsiyonê kirine karê xwe baş nekirine. Gelek caran jêderk û çavkaniya wan ne kifş e. Gelek caran peyvên dengbêj negotî xistine navberan de an kê nîvîsîne an jî dengê tîpan veguhestine. Hewce ye di karê transkrîpsiyonê de mîna di çavkaniyên kitêban de çawa rûpela çavkaniyê tê dan divê di deng de jî dema qeydê (mînak 00.18.30) kifş be. Yê karê xwe baş kirine jî hene. Mînak: **Zeki Gürür**.

Hewce ye transkrîpsiyoneke baş li qeydên dengbêjiyê bibe û li navendekê were arşîvkirin.

**2- Statîstik:** Nivîskarên "ku" yê gelekî bi kar tînin yê sereke Kawa Nemir, Şener

Ozmen,Ciwanmerd Kulek, Silêman Demir, Helîm Yusiv in. (di rûpelekê de kêmezêde 8-11 "ku")



Di hin romanên kurdî de "kû" ya cînavk jî weke "ku" ya gihanek hatine nivîsîn. Hin nivîskar jî Mîna Celadet Bedirxan ji bo "ku" yê "Ko" yê bi kar tînin.

**3-Pirs:** Di navbera wateya van mînakên li jêr de (Bi "KU" û bê "KU) çi cûdahî heye?

"Heke **KU** tu biçî" Heke tu biçî

"Seeta **KU** ez biçim malê" Seeta ez biçim malê

"Dikim **KU** herim" Dikim herim

**4-"Li gel" , "Di gel":** Di hemû xwendin û gûhdarkirinên gotinên klaman de li rastî peyvên "Li gel" , "Di gel" nehatim.

**Leber, Leser, Legel: Bi soranî**

Li ber li ser bi... re: Bi kurmancî

\* Di edebiyata nivîskî de, li şûna daçeka **bi...re "Li gel" û "De gel"** tê bikaranîn.

**5- Rengdêrên hejmara rêzgirtî: forma "em/emin- (yekem/în) " "em/emîn (duyem/in) ":** Di hemû xwendin û gûhdarkirinên gotinên klaman de, rastî forma peyvên "yekem (yekemîn) ", "duyem (duyemin)" nehatim. bi "ê. a, ên" ê ev form heye.

**Mînak:** Di klama Derwêşê Ebdî de dibûre:

Birano! **Perda yekê** cîhê rûnistina mêran û hût û lehengan e.

**Perda duyê** cîhê rûnistina anima û canikan e.

**Perda sêyê** cîhê kebanî û serkarê di malan e.

**Perda çarê** cîhê kalê li ber sêlan e.

**Perda pêncê** cîhê tewinkerana, belê dikin neqs û nemûsan e.

**Perda şeşê** dibêjim hoza miyan e.

**Perda heftê** koza berxan e, li pist perdê da cîhê tewla meinegiyan e.

....

**Mînak:** Di klama **Erebê** ya **Hisênê Farê** de dibûre

min ê digo **ew a mezin** bi kêr nayê,

ez ê bînim ji bona şivan û gavanên gundiyan,

**a diduyan** ji min ra nabe,

ez ê bînim ji bona kuftik û şamboyreke

teresê van mardîniyan,

a sisiyan kineka orte bû, di çax û benga min lawikê xelkê ra,

## ENCAM

Ziman mîna mirovan bi xwîn, bi goşt û rih û can e. Di dîroka mirovantiyê de, li erdnîgariya xwe, li xwezaya xwe dizên û li wir dijiyin. Zayîna zimanan, pêkhatina ne hesan e. Zayîna wan bi hezar salan didome. Hin ziman di demê de hê geştir dibin û bi pêş ve diçin, xwirtir dibin. Hin ziman jî xwe nû nakin, kevin dibin û tenê di rûpelên dîrokê de navên wan dimîne. Weke mirovan, carinan tendurestiya wan xera dibe, nexweş dikevin. Heke nexweşiya xwe çareser nekin, derman nekin dimirin jî. Hin ziman hene di şert û mercên zor de, li ber xwe didin û ji bo bijiyîn, berxwedana xwe didomînin. Bi demê re şer dikin. Zimanê kurdî di nav wan zimanên li ber xwe didin de zimanekî herî sereke ye û mîna keke bi serê xwe ye.

Dengbêjiyê û ziman hevdu xwedî kirîne, jiyandîne, sosyalîzasyona gel pêk anîne, gihandiye vê demê. Rola dengbêjiyê, di jiyîn û berxwedana zimanê kurdî de, gelekî grîng e. Bi saya vî karî ev zimanê hevpar di nav rûpelên dîrokê de cihê xwe girtiye, civaka xwe pê xwedî kiriye û bi kedên wê civak mezin bûye. Ji ber vê sosyalîzasyonê ye, dengbêj ji kîjan heremê be jî, vegotina wê qeç tê fêmkirin. Heke ev sosyalîzasyona civakî nebûya kesekî Botî ve çawa ji klameke dengbêjê Serhedê an kesekî ji Serhedê vê çawa klameke yekî Botî fêm bikara? Ji bilî fêmkirinê vê çawa klamên hev bigotana?

Heke bi kurahî mirov li mijarê binêre, vê bê dîtin; ji Êrîvanê heya Bexdayê ji wir jî heya Enqereyê di vê erdnîgariya jev dur de, bi zimanekî hevpar, bi zimanekî civakî klam hatine gotin û gelên vê civakê dengê hev gihandine hev. Her çiqasî devokên hereman jev cê bin jî, zimanê dengbêjiyê ew nêzî hev kirine û zimanekî hevpar efirandiye. Di dema radyoya Êrîvanê û radyoya Bexdayê de rola dengbêjiyê berfirehtir bûye. Ji ber vê; "Zimanê dengbêjiyê" ji "zimanê malê" xwirtir bûye. *Em dikarin bi xêra stranê li ser gelek bîr û boçûnên kurdan yê derheqê; siruşt, jin û mêr, zarok, diyardayên siruştî, çînen civakê, mirovahî, şer û lêkdan, aştî û pêkhevîn jîn û mirinê helkevin.*(KAPLAN Y.2015:21)

Mîna hemû zimanên cîhanê hin nexweşî û vîrûs bi zimanê me jî ketine; lê zimanê me dest ji lebatî û jena xwe bernedaye. Di vê sedsala dawî de li şûna edebiyata devkî edebiyata nivîskî cih girtiye û rojbiroj cihê xwe geştir û finda dengbêjiyê kêmtir kiriye.

Zimanê edebiyata kurdî ji destpêkê heya îro rêya xwe ji zimanê dengbêjîyê, ji zimanê gel, ji zimanê malê dûr xistiye. Gelek sedemên vê encamê hene.

Helbet zimanê edebiyatê vê ji zimanê dengbêjîyê geştir, dewlemendtir û xwirtir be. Divêtî ye edebiyata nivîskî ji ya devkî berfirehtir be. Çikû edebiyat nivîskî efirandinên kur, derûniyên nedarîçav, teşeyên xwemalî û vegotinên afirîner dixwaze. Ev kar jî zimanê mirov, ji qada zimanê rojane, bi gotineke dî; zimanê malê digihîne qada zimanê hûnerî ya edebiyat pê tê kirin. Ev rewş di edebiyata kurdî de berevajî hatiye bikaranîn. Gava mirov zimanê edebiyata devkî (dengbêjî) û zimanê edebiyata nivîskî li ber hev radixe, ev kêmasî bi zelaî xwe darîçav dike.

Heke gotinên klamên dengbêjîyê ji gelek alî û hêlên rêzimên ve werin analîzkirin; xwirtbûna bikaranîna zimên/rêzimên û hevoksaziya edebî (hevokên dirêj, ravekên zincirîn û hemayên weke wan) vê bê dîtî.

### Mînak 1: Erebê / Hisênê Farê

....

*"te yê wez kirime şehrekî ji şehrên Hema,*

*rîşikên dorê weşyane gulik pê ve neman,*

*te yê wez kirime pepûkek ji pepûkên serê daran û keleman,*

*te yê wez kirime kalekî ji kalên zeman,*

*ji sîh û sê diranî diranekî di devê min de nema,*

*te yê wez kirime masiyekî ji masiyê gola Xelîl û Evdilrehman,*

*kerbavê dînê te yê wez girtime berê min daye sûra Bedena Diyerbekira şewitî*

*çarşaya Mêrgehmedê çiqas çeçqal û beqalên li dora Bedenê hene,"*

\* Stran heya dawiyê bi hevokên dirêj û ravekên dirêj in û "ku" tê de nabûre.

(MALPER 4)\*Transkrîpsiyona kilamê ji aliyê **Zeki Gürür** ve hatiye çêkirin.

### Mînak 2: Delalê Qerecdaxê

..

Milyaketê wan li ezmana ji hev du hezkirine bi destê hev girtine bi welatê xerib û qurbetê da hev du revandin e. Ewê bibêjin keremkin, heqê mehra we li ser min e.

..

Were delal; Hatiye **mala etarê darê** xelk û elem kişyane ser bazarê xelkê ji delalê dilê xwe ra kirî bû kil û neynik min ji delalê dilê xwe ra kirî bû **derbê mîrata enextarê**.

..

Ez **dizê şeva nîvê şevê** mêvanê hemez mezin 33 ê biskê zerî qurbana çavê reş û belek, deqa bin qirikê, taximê sîng û beran, mubareke cotê memika.

...

De kula dilê min **kekê serê segmanê enexdar** Reisê xortan e.

..

Were delal; Bêbexto bi te ra geriyam salekê sal û wext, dilê xelkê ket mal û dewletê, dilê min ket bejna ta zirav girêdana rexta...

Tê dengê pêxvasa, welîna lawê bava, qîrîna goştê kebabê ez terka bejna zirav, xelkê têlî nakim, hetanî xwê şîn ne be, qantir nezê, gawûr najo ser îslam e.

....

**Ez nizanîm te di pê xwe ra, Temya min kara xezala li kê kir.**

Were delal; **Mala delalê dilê min** dike barke,

..

**Min dî berfa dabû ser baranê,**

...

Dor bedenê hatim Qerejdaxa şewitî, Textê Mamdalê, tamam cîw û meqamê min û te ne.

**Tu were destê xwe di nav bera destê min ke, em hev du birevînin, Xwe berdîn welatê xerib û qurbetê, dawiya me Gazî enteb e, pêşiya me germa Edene.**

*\*Evdilhadî Mihemed- Kovara Roja Nû*

Berbang - Ay Delal ( Delalê Qerecdaxê)

(MALPER 13)

**Mînak 3: Were de lay lo siwaro**

Ca dilê min dayê dînê rebenê nebûye kûreka ji kûrêd van hedada

Îro şerekî giranê li me hatiye kirinê xîveta Şerefxana wêran

Li mabeyna herdu giran herdu milan lo herdu cada

Îro dê bilanê serê min biba qurbanî serê kekê minê Nadir Begê delal

çawanê li serê meydanê li binê meydanê li nava komêd siwarêd neyaran da

hat û qevda simbêlên zerî zer sosinî girt û her bada

Îro gulêd sêtîran û mawîzeran û eyneliyan

Li serê meydanê li binê meydanê têne kekê minê Nadir Begê bi elbika wa bi serada

Dê bilanê sala di ber vê salê kuleke ji kulêd xezebê bikevîte

nav mala Îsivê Ebdal Begê û Mala Zoro

Çawa derbeka risasî dane bejn û bala kekê minê Nadir Begê delal

Belê heyfa min dihête li wê heyfê îro ji xwe ra negehişte çi meqsed û çi mirada

Were de lay lo siwaro heyran

Ca dilê min dayê dînê rebenê nebûye kûreka ji kûrêd van ciqsiyan

Îro şerekî giranê li me hatiye kirinê xîveta Şerefxana şewitî

Li mabeyna herdu giran herdu cadan lo herdu siyan

Îro dê bilanê serê min biba qurbanî serê kekê minê Nadir Begê delal

çawanê li serê meydanê li binê meydanê li nava komêd

siwarêd neyaran û dijminan hat û kire qêrîn û van gaziyan

Belê ser serê kekê minê Nadir Begê delal bûye gjêna

gulêd sêtîran û mawîzeran û eyneliyan

Dê bilanê sala di ber vê salê kuleke ji kulêd xezebê bikevîte

nav mala Îsivê Ebdal Begê û Mala Zoro

Çawanê bi xafil qeda derbeka dane bejn û bala kekê mine Nadir Begê delal

belê heyfa min dihête li wê heyfê termê egîdê mala

babê min mabû meydanê li nav komêd van neyar û xweyîyan

**(Nêrweyî, Fezledîn. (2011). xiregul, Straned Kock û Dîwanan (laswje).**

**Dihok: Çapxana Spîrêz.r. 321. (bnr: KAPLAN Y. 2015:23)**

### **Mînak 5: Çendî bi naz im**

*Çendî bi naz im*

*Ez ebdala Xudê nazêd xwe bo kê kem*

*Teresê teresbabê mêran j'wê ve hat û qutegopalek zenda min dayî*

*Ez ebdala Xudê neşiyabûm lîfika qerepoşiya xwe çêkem*

*Qebeheta darê dinyayê min kirî çî bû çî nebû*

*Şevê dî sêbara şevê mayî kurelawikê delal hate pişt konî*

*Tewafa xal û nîşanêd gerdenê*

*Min ebdala xudê neşiya bêxatir rêkem*

*Çendî bi naz im*

*Hun, min ebdala Xudê nenazînin*

*Çengekî mêwîjan biken koşa min gwîzan ber min bixîşînin*

*Eger ez hayîş nebûm min bikene pişt dadokekê*

*Malêd der û cîranan hun bigerînin*

*Eger qetûqet ez hayîş nebûm*

*Hun min mabeyna bûk û zavayêd salê binivînin*

*Çendî bi naz im*

*Şengenazdaroka malêd baban nazandî*

*Kuriko dîno evî teresê teresbabê mêran destê xwe êxiste gopalekî wergerandî*

*Zend û bazinêd min ebdala Xudê şkandî*

*Xizêma kepê min ebdala Xudê livandî*

*Guhara heyderî guhê min bizdandî*

*Destekî minê şkandî yê dîtir yê xilandî*

*Qebeheta darê dinyayê min kirî çi bû çi nebû*

*Şevê dî sêbara şevê mayî kurelawikê delal hate pişt konî*

*Min ebdala Xudê bêhnekê ber xwe da nivandî*

*Çendî bi naz im*

*Hun, min ebdala Xudê nenazînin*

*Çengekî mêwîjan biken koşa min gwîzan ber min bixîşînin*

*Eger ez hayîş nebûm min bikene pişt dadokekê*

*Malêd der û cîranan hun bigerînin*

*Eger qetûqet ez hayîş nebûm*

*Hun min mabeyna bûk û zavayêd salê binivînin*

(KAPLAN Y. 2015: 11-12)

**Mînak: 6 (ji çendek klamên di kitêba Şakarên Muzîka kurdî de)**

**Kawîs Axa-Gênc Xelîl**

"Ser çav bikme tok û ser hefsarê G3enc Xelîl bînim siwar bikim li kimêtekî tal e.

Belê bila dişa bin me li Usmaniya da pê da pê da xware bila kes lava li kurmamê min nekin belê nebêjin siwarekî kur be çendî bê kar û bar e."

"Nefes nefes qelûnê xwe hilda dibe Ewsa, dibe yar bi xwidê rabim qelûnekê bo kurmamê xwe têkim qelûna tirkî kîşane baskê Stenbole modînek bi kale mal e."

**Kawîs Axa-Mîvano**

"Keçik dibe milê min ê selatî bilêlim şewqa dikevim nav livînê dilê min ji malî dinyayê ji min tê di kurteka li ser mi bixe şansê me xarî nîşane keve ber deynekî mizgînî belê leşew bidete min bi demê bazidî li dest de kemerek li piştê xizêmeke Aramî tevî taseke cerba li serî guhêreka heyderî xenî bikeve malî dinyayê yanî mîvano."

**Tahir Se'îdê Ebo Zaxoy(l) î- Çeto Lo Lawo**

"Bila xwide daxwaza lawê mi tasekî ava kanya Belesîmo zozanê jorê nemayê xatîne.."

**Seîdê Hemo-Derwêşî Evdî**

"Nebêje Derwêşê Evdî kilikîna sebebeka çavê cemidî li min bixwesta'w û min ê dest bavêta cot^we zer memika xwe rebenê biqewarta.."

**Resoyê Gopala-Nêçîrvano**

"Nêçîrvanê sibe li bozekî kûmî çar salî siwar bi rojê berjêrî reşî kevnî melezi egîto xezala te berê xwe da vî hemberî."

Mijara "KU" yê ji bo liberhevkirina zimanê devkî û zimanê edebiyatê ne beşeke bitenê ye lê beşeke sereke ye. Bahoz Baran wiha gotibû; **"ku" pişt û stûna kurdî ye, divê em li "ku" yê xwedî derkevin, kurdî û "ku" pir li hev dikin; KU "ku" tune be kurdî nikare li ser piyan bisekine."**

Gelek rêzimanzan **"KU"** yê bi tena serê xwe nakin "gihanek" jî. Bi hin peyvên dî yên weke "Dema ku, ji ber ku, ta ku, heta ku ..." re dikin cotgihanek.

Di edebiyata tirkî de ji bo kesê gihaneka "ki" di nivîsarên xwe de gelekî bi kar tine re



dibêjin: "Zimanê wî lawaz" e." Di edebiyata modern û postmodern a zimanê tirkî de "ki" yan gelekî kêr bi kar tînin. Ji xwe mirov bi baldarî kesekî nû fêrî tirkî guhdar bike vê bê dîtin ka çiqas gelekî "ki" yan bi kar tîne.

Di zimanê me de jêgeriya "ku" yê çima nîne ? Bersivên vê pirsê gelek in. Heke em li ser piçekî biramin em ê erêkirina mafdariya Bahoz Baran bikin. Îro wilo lêhatiye, ti nivîskarê kurd nikare bê "ku" yê hevokan saz bike û vebêje. Jê wêdetir gelek nivîskar di hevokekê de heya 5-6 "ku" yan jî bi kar tînin. Ji bilî xerabûna genetîk û sazûmaniya zimên, ne estetîk e û li mirov xweş naye.

Dibêjin; "**KU**" realîteya zimanê me ye û êdî ketiye zimên de. "çewtî" gava bingeh digirin rast tînin qebûl kirin. Gelo "Wilo" ye?

#### ÇAVKANÎ

TAN S.(2011) Rêzimana Kurmancî: Îstanbul: Weşanên Enstîtuya kurdî ya Stenbolê

EKÎNCI Y. (2012) Cennetin Kayıp Toprakları: İstanbul: DK Yayınları.

EKÎNCI Y. (2013)Erdên Bihûştê Yên Winda / W:Kawa Nemir: İstanbul: DK Yayınları.

CİZİRÎ. M (2004) Dîwan:Stockholm: Weşanxaneya Nefel.

XANÎ E. (2004) Memozîn: Stockholm: Weşanxaneya Nefel.

BEDİR XAN K. (2011) Kolay Kürtçe: İstanbul: Doz Yayınları.

TAŞ Ç. (2013) Kurmancî: İstanbul: Dîwan yayınevi.

DİLSOZ O. (2012) Berbiska Zer: Stenbol Weşanxaneya Awesta.

DİLSOZ O. (2014) Hevrazên Çiya: Stenbol Weşanxaneya J&J.

KULEK C. (2014) Defterên Perrîdankan: Stenbol Weşanxaneya Awesta.

OZDEMİR M. (2011) Sê Tilîlî: İstanbul: Weşanxaneya Ronahî.

DEMİR S. (2013) Li parka bajêr: İstanbul: Weşanxaneya Do.

OZMEN Ş. (2008) Rojnivîska Spînoza:İstanbul : Weşanxaneya Lîsê.

WAR R. (2013) Feqiyê Teyran: İstanbul : Weşanxaneya Ava.

SAVCI F. (2013) Ber Bi Binxetê: Stenbol Weşanxaneya Awesta.

PÎRBAL F. (2013) Santiago De Compestela: Stenbol: Weşanxaneya Awesta.

PÎRBAL F. (2012) Hotel Europa: Stenbol: Weşanxaneya Awesta.

DİLDAR R. (2012) Li Dû Xezalekê: İstanbul : Weşanxaneya Ava.

SABRÎ O. (2011) Hevalê Çak: Ankara: Weşanxaneya Lîsê.

- SAÏDPOUR N. (2002) Viyan: İstanbul: Weşanxaneya Sî.
- ZERAQ D. (2014) Nexşên Li Giyan: Ankara: Weşanxaneya Lîsê.
- YÛSÏV H. (1998) Jinên Qatên Bilind: Stenbol: Weşanxaneya Awesta.
- COLEMERGÎ Î. (2001) Cembelî: Stenbol Weşanxaneya Awesta.
- NEHAYÎ E. (2012) Gulên Şoran: W:Besam Mistefa Stenbol: Weşanxaneya Awesta.
- ŞEMO E. (1989) Şivanê kurd: Parîs: Enstitut kurde de Parîs.
- DOST J. (2012) Mijabad: Stenbol: Weşanxaneya Awesta.
- SEBRÎ O. (...) Bîranîn. Çapa dijîtal: Weşanên Malpera Amûdê.
- MUNGAN M. (2008) Cinên Pereyan, /W:FeratDilgeş: İstanbul Weşanxaneya Doz.
- MUNGAN M. (2014) Paranin Cinleri: İstanbul: Metis Yayınları
- BEDÎRXAN K. (1932) Hawar 1: Çapa Dijîtal
- CEWERÎ F. (1994) Kovara Nûdem hejmara 10.
- X. Ç. MÛRADOV ya bi navê "Klamêd Cimaeta Kurda".
- ANTOLOJIYA DENG BÊJAN (2011) C/I/II Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür.
- TÎLERMENÎ Y. (2005) Kitim: Amed: Weşanxaneya Lîsê.
- ARAS A. (2004) Evdalê Zeynikê: İstanbul: Evrensel Basım Yayın.
- CÎNDÎ H. (2008) Klamên Cimeta Kurda: Yêrean: Weşanxaneya Lîmûş
- MERWANÎ C. (2010) Klam û Stranên Kurdî: /C/I-II: Stenbol: Weşanxaneya Awesta.
- CANKURD (2001) Strana Kurmancî: Kovara Mehname: 7
- LOKMAN TURGUT Cembelî fils du prince de Hekkarî.
- HASAN A./HESENÊ M. Dengbêj û Stranên me C/I-II. e-Pirtûk
- KEVÎRBÎRÎ S. (2009) Sedsala Qêrînekê-Karapatê Xaço: İstanbul; Weşanxaneya Do
- KEVÎRBÎRÎ S. (2002) Filîte Quto: Stockholm: Weşanxaneya Nefel
- KAPLAN Y. (2015) Kaniya Stranan: Stenbol: Weşanxaneya Nûbihar
- MALPER (1) Nivîskar: Xurşîd Mîrzengî Dîrok: 2006 Amadekar: Ayhan Meretowar  
(<http://www.serhed.org/modules.php/modules.php?name=News&file=article&sid=477>)
- MALPER (2) BARAN B: KU ( <http://www.amidakurd.net/qunciknivis/ku>)
- MALPER (3) VÎDEO (<https://www.youtube.com/watch?v=Xwor1JXp1dw>)
- MALPER (4) VÎDEO (<https://www.youtube.com/watch?v=hwYLkT470w8>)
- MALPER (5) VÎDEO (<https://www.youtube.com/watch?v=tWzGGA4Qe84>)
- MALPER(6) VÎDEO (<https://www.youtube.com/watch?v=FF2gB0uJhP8>)
- MALPER (7) VÎDEO ([https://www.youtube.com/watch?v=2tY\\_KJwPCe8](https://www.youtube.com/watch?v=2tY_KJwPCe8))

MALPER (8) VÍDEO (<https://www.youtube.com/watch?v=Q5G-00FnkTI>)

MALPER (9) DENG (<https://soundcloud.com/eliriza-sipahi/kaseta-1e-piska-2e>)

MALPER (10) VÍDEO (<https://www.youtube.com/watch?v=5KN4Yt4Bt9s>)

MALPER (11) KOVARABÎR: (<http://www.kovarabir.com/2010/04/a-meretowar-dengbej-huseyne-fare/>)

MALPER (12) VÍDEO (<https://www.youtube.com/watch?v=Kxv9fPyOSCI>)

MALPER (13) VÍDEO (<https://www.youtube.com/watch?v=dDYXLhbzat4>)

MALPER (14) VÍDEO (<https://www.youtube.com/watch?v=J3ud-691OL8>)

YAŞ Z.(2015) Şakarên Muzîka Kurdî: Amed: Şaredariya Bajarê Mezin A Amedê.

CEGERXWÎN (1988) Folklor a Kurdî: Stockholm: Weşanên Roja nû

SADINÎ M.X (2010) Feqiyê Teyran: Stenbol: Weşanxaneya Nûbihar

SADINÎ M.X (2010) Mele Huseynê Bateyî: Stenbol: Weşanxaneya Nûbihar

LESCOT R. (2010) Memê Alan: Stenbol: Weşanxaneya Avesta

MALPER (15) VÍDEO: <https://www.youtube.com/watch?v=T75M9pKFIUU>

MALPER (15) VÍDEO: <https://www.youtube.com/watch?v=vxV9RzzXdZU>

**Orhan Varol**

## TÊKILIYA ZIMANÎ YA KURDÎ-TIRKÎ

Tesîra zimanên serdest li Kurdistanê anku tesîra erebî, farisî û bi taybetî jî ya tirkî li ser zimanê kurdî gelek caran di gotin û nivîsînên kurdan de tîn dubarekirin. Heta niha ev mijar di çarçoveya rexnekirin û gazinkirina ji tesîra tirkî (yan erebî yan farisî) li ser kurdî de maye. Kesên ku behsa wê mijarê kiriye, zêdetir bi armanca nefretkirina li rewşê û peyda kirina revê ji vê tesîr û tîkiliyê nivîsiye yan li ser axiftiye.

Lê heta niha kêma bi zanistî û zimannasî li ser hatiye nivîsîn ka ev tesîr û tîkiliya kurdî û tirkî (yan erebî yan farisî) çî ye û çawa ye. Tesîr an tîkiliyan zimanên behskirî li ser axiftina kurdî zêdetir mijara henek û tinaziyan bûye û li ser nivîsîna kurdî jî babetê rexnekirin û xweacizkirinê bûye.

Bawernameya anku teza doktorayî ya **Orhan Varol** *Türkçe-Kürtçe Dil Etkileşimi* (Tîkiliya zimanî ya tirkî-kurdî) ji Zanîngeha Enqereyê hewl dide bi awayekî zanistî-zimannasî nêzîkî meseleyê bibe. Varol bi xwe kurd e lê teza xwe bi tirkî nivîsiye.

Mijara wî ne kurdiya nivîskî ye lê ew di teza xwe de tîkiliya kurdî û tirkî di axiftina 25 kesên ji Wanê yê kurdîaxiv û tirkîaxiv de vedikole û şirove dike.

Wek ku tê payîn, Orhan Varol jî gihiştiye wê qenaetê ku di nav kesên duzimanî (kurdîaxiv û tirkîaxiv) de, bi piranî tirkî zimanê tesîrker û kurdî jî zimanê tesîrlêkirî ye. Anku di axiftina kesên kurdîaxiv û tirkîaxiv de (ku di pratîkê de hemû kurd in), axlebe tirkiya wan tesîrê li kurdiya wan dike lê kurdiya wan kêma tesîrê li tirkiya wan dike yan jî qet lê nake.

Ev lêkolîn wek destpêka vekirina meseleya tîkiliya kurdî û tirkî yan kurdî û zimanekî din bi awayekî zanistî-zimannasî baş e lê mixabin di çarçoveyê gelek teng de maye. Varolî tenê zimanê devkî wek çavkaniya berhevdana tesîr û tîkiliyê girtiye ber behsê. Tevî ku kitêb soza pêşkêşkirina tesîr û tîkiliya tirkî-kurdî bi berfirehî dide jî lê di pratîkê de bi piranî bi peyvên ji tirkî wergirtî ve dimîne.

Tesîr û tîkiliya zimanan ji peyvên wergirtî gelek zêdetir e. Bo nimûne, roj bi roj awayên bêpif ("nerm", bi inglîzî "unaspirated") yê Ç, K, P û T li Bakurê Kurdistanê li ber windabûnê ne ji ber ku di

bin tesîra tirkî de awayên bêpif jî dibin bipif ("req", inglîzî "aspirated") lê Varol behsa tesîrên dengnasiyê nake. Yan jî dengê kurdî "i" di axiftina gelek kesan de wek dengê "ı" yê tirkî tê gotin tevî di eslê xwe de i-ya kurdî ne hevdenga ı-ya tirkî ye. Herwiha peyvrêziya (çawaniya rêzkirina peyvan li pey hev di hevokan de) kurdî jî bi gelek awayan dikeve bin tesîra tirkî. Herwiha peyvrêziya (çawaniya rêzkirina peyvan li pey hev di hevokan de) kurdî jî bi gelek awayan dikeve bin tesîra tirkî.

Ne guherîna van dangan û ne jî ev peyvrêzî tenê bi axiftina kesên kurdî baş nizanin ve girêdayî ye lê herwiha di zimanê nivîskî de, di nav qiseker û nivîserên kurdiya nivîskî û "pîvankî" (standard) de jî diyar e. Varol ji van û gelek mijarên din jî bêdeng e.

Varol hinekî behsa morfolojîyê bike jî, dîsa bi giranî mijûlî meseleya peyv û îdyomên ji tirkî neqilkirî axiftina kurdî dimîne. Lê haydarbûn ji peyv û frazên wergirtî ne zêde balkêş e. Di zimannasiyê de di meseleya tesîr û têtikiliyên hê jî giringtir tesîr û têtikiliyên morfolojîyê anku teşenasîyê û fonolojîyê anku dengnasiyê ne. Ev mesele jî li benda vekolînên zanistî-zimannasî yên bîn in.

Kovara Zimannas û malpera Zimannas hemû lêkolîna Orhan Varolî *Türkçe-Kürtçe dil etkileşimi* (Têtikiliya zimanî ya tirkî-kurdî) li vê derê belav dîkin:

<https://zimannas.files.wordpress.com/2017/01/orhan-varol-doktora-tez.pdf>

## ZIMANAN ÇON DEMIRIN?



**Nûsînî: Profesor David Cystal**

**Wergêran le Inglîsîyew: Hesên Qazî**

Zimanêk tenê katêk demirê duwayîn kesî qisey pêdeka bimirê. Yan renge katêk bimirê dûyem kesî ke qisey pêdeka bimirê, çunkû ew demî îtir kes nîye qisey pêbika.

Mirdinî zimanêkî taqane şitêkî naasayî nîye. Be dirêjayî mêjû zor komellge hebûn û le nêwçûn, û be nemanyan zimanekeşyan nemawe. Bo wêne Hittite, ew demî kip bû ke şaristanîyetekey le serubendî Incîlî kon da tuwawe û bizir bû. Bellam ewey lem rojgare da deqewmê, be berawird legell rabirdû şitêkî ewpeñî asayîye. Êsta zimanan be radeyekî berbillaw kip debin û namênin. Le 6000 û ewende zimaney ke emîro le cîhanda hen nizîkey nîweyan lem sedeyey êsta têyda dejîn namênin: Ewe dekate 3000 ziman, le 1200 manganda. Wate, be şêweyekî mamnawincî her dû hewtûyey carêk zimanêk le cîhan da demirê û namênê.

Ême ewe çon dezanîn? le mawey bîst sî sallî rabirdû da, zimannasan le sertaserî cîhan be kokirdinewey zanyarî û berawird kirdinyanewe xerîk bûn. Eger ewan zimanêk bibînnewe ke tenê çend axêwerêkî mawetewe, û kes gwê nadate ewey zimaneke rabigwêzê bo mindallan, aşkiraye degene ew bawerîyey ke zimaneke berew ewe deçê be zûyî bimirê. Eger zimanêk kemtir le 100 axêwerî hebê, çarenûsêkî xirap çawerîyey deka û wê naçê bituwanê bo maweyekî dirêj bimênêtewe û bijî. Lêkollîneweyek ke le sallî 1999 da kirawe nîşan deda %96 zimanekani cîhan tenê %4 xellik qiseyan pêdeken. Nîgerani û peşewîyekî ewto nabîndirê lewey ke ew hemû zimane de metirsî dan.

Ew zanyarîyaney ke le sallî 1999 le layen Enîstîtûy Zimannasî *Summer* we ko kirawnetewe bûnî 6784 zimanyan sax kirdûwetewe, ke sebarete be 6060 lew zimanane zanyarî be destewe ye.

Le nêw ew zimanane da 51 zimanî ewto hebûn ke tenê yek axêweryan mawetewe - 28 lew zimanane her le Austeralia bûn. Her be pêyew zanyarîye nizîkey 500 ziman le dinyada hen ke kemtir le 500 kes qiseyan pêdeken; 1500 ziman ke kemtir le 1000 kes; û 5000 ziman ke be şêweyekî sersûrhêner kemtir le 100 000 kes pêyan deduwên.

### Bo çî Ewende Zor?

Boçî ew hemû zimane zore demirin? hokarî cîyawaz le karesatî xořiskîyewe bigre, ta degate şêwey corbecorî tuwandnewey kultûrî, û cênosayd debne hoy nemanî ziman.

Komellgey piçûk le şuwênî takkewtû û kelela be hasanî dekrê lenêw biçin yan bûlerze, tofan, lafaw, û bellay dîke le ser rûy zewî pakyan katewe. Şuwênêkî jîyan le wane ye le ber keşuheway nabadill nekrê bimênêtewe yan le ber barudoxî abûrî- wekû qatuqîrî û be taybetî wîşikessallî nemênê. Komellgeyan dekrê be rêgey ew nexoşîyaney dêne nêwyan bimirn - le xurwêkewe bigre ta degate sermabûnî asayî, û be taybetî lem rojgare da, le ber Aids. Tenanet tuwandnewey kultûrî heřşeyekî gewretire. Zorbey qeyranekanî henûkeyî le cûllanekanî berbillawî kultûrîyewe serçawe degirn ke 500 sall lemewber destîpêkird, ew katey ke kolonyalîzim jimareyekî kem le zimane zallekanî, wekû Inglîsî, êspanîyayî, Purtuxallî û Feřanseyî be dinya da billaw kirdewe.

Katêk kultûrêk le kultûrêkî dîke da detuwêtewe, akamî ew řûdawaney wa karlêkerîyan le ser zimanî jêr metirsî da debê wê deçê le hemû şuwênêkî wek yek bin. Ewe be sê qonaxî berbillaw da têdepeřê. Yekemyan guşarêkî zore le ser xellik bo ewey be zimanî zall qise biken - wate ew guşarey le serçawe sîyasî, komellayetî, yan abûrîyekanewe dê. Ew guşare dekrê ' le serewe ra bo xwarewe' bê, be rêgey handan, amojgarî, yan ew qanûnaney le layen hukûmet yan dezgayekî neteweyîyewe derdekrên: yan dekrê le ' xuwarewe ra bo serewe ' bê, be rêgey rewî baw yan guşarekanî çaw be serewe bûnî girûpî de çuwarçêwey komellgeyek da ke axêweranî zimaneke beşêkî lê pêk dehênin: yan dîsan, dekrê çî arasteyekî rûnîşî nebê, û le akamî kirdewey dûlayeney nêwan hokarî komellayetî sîyasî û komellayetî abûrîda serhellênê ke tenê ta řadeyek nasrawin û pêyan zandirawe. ' Be dest hênanî çilonayetîyekî baştir le jîyanda ' be hoyekî giştî dandirawe bo ewey kesêk biřyar bida zimanî zall fêr bê.

Bellam guşar û pallepestoke le her kwêwe hatibê, akamekey - qonaxî dûwem – birîti ye le dewreyekî peyda bûnî dîzimanêti, ke xellik be şeweyekî le zêde le zimane nwêyekeyan radên le katêkda hêştazanîn û têgeyîştinî zimanî konî xoyan parastûwe. Duwaye, zor car be xêrayî, ew dîzimanêti bûne destdeka be le kurtî dan. Ê zimanî kon cêge bo zimanî nwê çol deka. Ewe degate qonaxî sêyem, ke lew qonaxe da berey lawtir be awayekî lezêde le zimanî nwê radên û fêrî debin, û zîyatir xoy pê denasnewe, û zimane yekemekey xoyan kemtir be lebar dezanin bo pêdawîstîyekanî xoyan. Ewe zor car hawkate le gell hest be şerim kirdin bo bekarhênanî zimanî kon, hem le layen daykûbawkanewe û hem le layen mindallekanîyanewe.

Daykûbawkan heta dê kemtir û kemtir zimane koneke legell mindallekanyan, yan le katî amade bûnî ewan da be kar dehênin: û katêk mindallî zîyatir le çuwarçêwey komellgey nwê da çawîyan be dinya depîşkwê û le dayik debin, gewresallan deretanî kemtir peyda deken bo ewey bew zimane wate zimane konekeyan legellyan biduwên. Ew binemallaney ke berdewam debin le ser bekarhênanî zimane koneke hest deken binemalley zor kem hen bew zimane qîseyan legell biken, û be karhênanî zimaneke le layen xoyanewe rûkirdêkî nêwxoyî peyda deka û debête şitêkî naasayî û akamekey degate peyda bûnî lehcey binemalleyî. Le derewey mallê, mindallan îdî bew zimane legell yektirî qise naken, û le mawey jîyanî wecêk da- car car tenanet le mawey desallanda – dîzimanêtiyekî saxlem le çuwarçêwey binemalle da detuwanê bibê be nîwe zimanêtiyekîy wuşyarane, û eweş bibê be tak zimanî ke eweş zimane koneke hengawêk le xamoş bûn û neman nizîkitr dekatewe.

### **Pêdawîstîy Be Bûjandinewe**

Gelo dekirê hîç şitêk bîkrê? be raşikawî îdî zor direnge bo ewey şitêk bîkrê bo yarmetî zorêk le zimanan, katêk ke axêweran zor kem yan zor pîrbîn, û katêk ke komellge serqallî parastin û manewey xoyetî û çî derfetî bîrkirdnewey le ziman nîye.

Bellam zor le zimanan le wez'êkî awa cîdî û be metirsîda nîn. Zor car, katêk ziman be cîdî heşeşey nemanyan lê dekrê û le jêr metirsî dan, dekrê karî ewto bîkrên bo ewey gîyanêkî tazeyan be berda bîkrêtewe, eweş wegeş xistinî pêvajoy bûjandineweye.

Katêk komellgeyek pê dezanê zimanekey de metirsîda ye, detuwanê têkoşanekanî bikate yek, û he ngawî ewto hellbhênetewe ke be řastî bîkrê zimaneke bibûjênêtewe. Bo serkewtin lew kare da,



hellbet hemû hewllêk debê be awayekî dirust bikrê. Komellgeke xoy debê wîstî rizigarkirdinî zimanekey hebê. Û ew kultûrey ke parçeyek le wîye pêwîstî bewe heye ke rêzî zimane kemayetîyekanî bigrê. Ew kare derfet û deretanî madî pêwîste, bo ewey bikrê dewrey pê rêk bixrê, kerestey xwêndin û mamostay bo dabîn bikrê. Dîyare pêwîstî be hebûnî zimannasanîş heye, ke be erkî seretayî girdewekoyî û be bellgeyî kirdinî zimananewe xerîk bin.

Be bellgeyî kirdinî ziman - aste kirdinî ( be bekarhênanî hem deng û hem film ), şitell kirdin û lêkdanewey, nûsînewey, dîyare ewane karî serekîne ke debê bikrên. Hebûnî deretanî perwerde û pêwîstîy xwêndewarîş girînge. Xellik debê bituwanin bixwênnewe û binûsn, bo ewey boxoyan yan zimanekeyan bituwanê dahatûyekî hebê le şaristanîyetêk da ke heta dê zîyatir xwêndewarîy-kampîyutêr perey têda destênê.

Bellam hoyekî dûwemîş heye, û ewîş giştî be ewe bestirawetewe le cêda ême boçî debê le xemî zimananî seremerg dabîn. Ew serincdan û le xem da bûney ême her debê le ber ew hoye bê ke ême le xemî nemanî regezêkî ajell yan rûwekêk dayn. Çunke ewe çeşnawçeşnî lem hesareyey ême têyîda dejîn kemtir dekatewe. Hellbet lêre da mebestiman le çeşnawçeşinî û corawcorî rûnakkîrî û kultûrî lew hesareye daye, nek corawcorbûne bîyolojîkekey. Bellam ew babetane her yekin. Le zimanêk da gişt mêjûy komellgeyek û beşêkî gewre le nasêney kultûrî ew guncêndirawe. Cîhan çil pîne û muzayîkî xeyall û awatane. Tenanet le kîsdanî kutêk lew muzayîke zerer û le destçûnêke bo hemwan.

ême dekirê zor şit le xeyall û awatî xellkî dîke fêr bîn. Car car ew fêrbûne be tewawî layenî kirdeweyî heye. Bo wêne katêk dezanîn pîşkî gelîy le naw gelêkî xocêyî da çon nexoşîyek derman deka û lêyî fêr debîn - ew fêrbûne le xellkî dî carcar layenî rûnakkîrî heye . bo wêne zêde bûnî wuşyarî û lêzanînî ême sebarete bew dinyayey têyda dejîn. Wek ewey ke pêwendîy nêwan zimanan hêndêk şitman sebarete be cûllanekanî berayî şaristanîyeteke bo degêrêtewe. Û hellbet zor car şitî nwê sebarete be ziman xoy fêr debîn . akarêk ke be rastî ême deka be miro. Ca boye zorgirîng e ew zimanane herçî zûtir aste bikrên û bellgeyan le ser ko bikrêtewe. Be her zimanêkî ke kip debê û namênê, serçaweyekî dîkey be pêz sebarete be tebî'etî tuwanayî zimanî miroyî le dest deçê . ke êsta îdî be giştî her 6000 serçawey ewto hen.

## Zimanêk Be Çi Şêweyek Deparêzdirê

Gelo ême detuwanîn her wa be hasanî çendîn hezar zimanan biparêzîn? hellbet, eger wîst û îrade û deretanî abûrî hebê ewe dest deda. Başê billêyî ou çondî tê biçê?

Dîyare katêk ême bîr lew hengawaney dekeynewe ke debê lew rêbaze da hellbigîrên, kareke be herzan tewaw nabê . nardinî zimannasan bo meydanî lêkollînewe, perwerde kirdinî şîkar û lêkolerewey xocêyî, piştîwanîkirdin û yarmetîdanî komellgeke be serçawey zimanî û dabîn kirdinî mamosta, amade kirdinî rêziman û qamûs, nûsînî made û kereste bo dekar kirdin le fêrgekanda . û bo mawey çendîn sallan, çunkû maweyekî zor dexayênê heta zimanêkî jêr metirsî bibûjêndirêtewe. Dîyare helumerc le şuwênêkewe ta şuwênêkî dî zor cîyawaze boye asteme be giştî basî lêwe bikrê. Bellam eger her salley biñ 100,000 dollar bo her zimanêk terxan bikrê ewe le rastîyewe dûr nîye. Eger ême ew biñe dirawe le mawey sê sallanda bo her kam lew 3000 zimanane terxan bikeyn; ewe deka 900 mîlyon dollar.

Ba ser rastî keynewe û billêyn mîlyardêk dollar, gelo ewe dirawêkî zor nîye? renga zor bê bellam debê ew biñe zore le pêwendîyekî rûn û aşkira da bibînîn. Ew biñe pareye dekate hêndêk zîyatir le dahatî rojêkî OPEÇ le newit, be şêwey mamnawincî le sallêkda. Yan biñêkî kem le sûd û qazancekanî rêkxirawe serekîyekanî kampîyutir. Ewe karêkî baş debê eger eu kompanîyaney ke le akamî becîhanîbûnda zemîney cênosaydî zimanîyan le sedeyî rabirdû da pêk hêna, her ew dezgayane bin ke zimanekan û kultûrekanî dinya le kip bûn û kûjanewe rizgar ken û bîyanparêzin. Ê ewe karêkî şîyawî kirdine.

Hêştê lew biware da serkewtinêkî berbeçaw nekrawe, çunkû ne pare le ber dest da bûwe û ne wîst û îradey sîyasî hebûwe, û sebarete be zor nimûnan carê zor zûye bigutrê gelo manewey dirêjxayenyan desteber dekirê yan na. Bellam hêndêk nimûney serkewtûy benêwbangîş hene ke deyselmênin eger îrade û amrazî pêwîst hebê zor kar dekrê. Renge nimûney here benêwbang û pêzandiraw çilonayetî zimanî 'lbrî modêrn bê, ke wekû zimanî resmî Israyîlî modêrn zîndû kirayewe. Duwaye nimûney zimanî Wêllzî be desteweye, tenya zimanêk de nêw zimane Sêltîkekanda ke nek her le kip bûn û neman rizigarî bûwe, bellkû nîşaney pêşkewtin û bexoda hatinîşî pêwe dîyare. Hellkewtî zimanî

Wêllzî êsta be pêy dû maddey qanûnî sebart be ziman deparêzdirê, bêtu seferî Wêllz biken amade bûn û dekarîrdinî le zêdey le hemû kwêyek debînin û bedereweye.

Lew serî dîkey dinya, zimanî Maorî le New Zealand be rêgay sîstîmekewe ke pêy dellên hêlaney ziman, û yekemcar le sallî 1982 da wegeř kewit parêzrawe. ew hêlananey ziman rêkxirawî ewton ke mindallanî xuwar temenî pênc sallanyan le keş û hewway mallê da têda dehawêndirênewe û be berdewamî le jêr kartêkerî zimanêke dan. Ew kesaney lewê kar deken hemû axêwerî zimanî Maorî û ser be komellgey xocêyîn. Amanc lew piřoje ye eweye katêk mindallan ew hêlanane becê dehêllin tewaw le zimanêke rahatibin, û katêk gewre debin xoyan bibin be nimûne û sermeşiq bo wecî nwêy mindallanî piçkolle.

Le sertaserî cîhanda nimûney ewto hen. Bernameyekî zimanî dîkey ewto le Hawaii beřêwe çû û akamî zor dillxoşkerî bo zimanî Hawaii lê kewtewe. Heman şit bo zimanî Tahiti (le Tahiti) û zimanî Yukagir (le Siberia) kirawe. Le Emrîkay Bakûrî, Navaco, Seneça w Mohawk lew çendîn zimane xocêyîyanen ke le wurûjanî meyl û wuşîyarî komellge xocêyekan le xuwarewe kelkyan wergirtûwe û eweş hawkat bûwe legell piştîwanî sîyasî le "serewe ra", le şiklî hengawnanewe bo desteber kirdinî mafî zimanî. Û katêk ew zimaney xerîkî bûjanewe û zîndû bûneweye dereceyek le otonomî sîyasîşî le pişt bê, ew demî bexoda hatin û pêşikewtinî ewendey dîkeş çawrakêş e, her wek le nimûney zimanî Fayroyî (Faeroese) da debînin, ke le duřgekanî fayrwê (Faeroe) qisey pêdekrê, duway ewey dewletî Danmark coreyek le otonomî bo ew duřgenişînanane selmand.

zimanêk dekrê le lîngefirtey seremergîşda rizigar bîkrê. Nimûney eweş çilonayetî zimanî Ainu ye le japon, ke duway sallanî dirêj le kemterxemî legell kirdin û serkutkiranî geyîştîbûwe hallêkî ewto tenê heşt kes ma bûn qiseyan pêdekird û hemûşyan be salldaçû bûn. Legell eweşda, sîyasetekanî nwêy hukûmet, boçûnî taze û meylêkî erêyî lê lewtewe bo parastin û hêştinewey ew zimane. Çendîn kesî "nîwe-axêwer" bew zimane – xellkî ewtoy ke pêyan xoş nebû bew zimane qise biken le ber boçûnî nerêyî Japonî axêweran. han diran bo ewey ke dîsan bibnewe be axêweranî çalakî zimanêke. Ew meyle bûjayewe û êsta le nêw mindallanîş da perey pêdedrê, û zimanêke ahêkî weber hatûwetewe û le pêwendî giştîda zor zîyatir dekar dekirdirê û toley sallanî dîr û dirêjî kemterxemî legell kiranî dekatewe.

Çendîn le zimananî řesenî Australiyayî ke be şêweyekî cîdî le jêr metirsî dabûn, le sayey hewll û têkoşanî komellgekan, xebatî zimannasanî Australiyayî, û yarmetî rêkxirawe zimanî û kultûrîye

xocêyîyekan da êsta parêzrawin û bûjêndirawinetewe. Û eger made û kerestey baş le ber dest dabê, tenanet zimananî kûjawe û mirdûş dekrê zîndû bikrênewe û gîyanyan be berda bikrêtewe. Zimanî Kurna, le Xuwarûy Australia le nimûney ew zimananeyê. Ew zimane bo mawey sedeyek deçû ke îdî qisey pênedekira û kip bibû, bellam bellge û keresteyekî baş le ser ew zimane parêzrabû ca, katêk bizûtneweyekî behêz bo bûjandnewey perey send, derefetî ewe rexa zîndû bikrêtewe.

Dîyare ew zimaney ke zîndû kirawetewe her heman zimanî mak nîye, ew biwarey nîye ke zimane makeke heybûwe, û zorbey wuşe konekanîşî nemawin, bellam her nebê dekrê wekû yek le nîşanekanî nasênay ew xellke bê ke be zimanî xoyanî dezanin. Û heta ewkatey ke xellik berdewam bin wekû nîşaneyek le nasênay xoyan bînrênin, û amadeyî eweyan têda hebê le ser bekarhênanî berdewam bin: detuwanê erkî nwê û wuşey nwê wekû hemû zimanêkî zîndûy dî pêş bixa.

Hêştâ zor zûye dabêy ew zimane zîndûkirawane pêşbînî bikrê, bellam le hêndêk le beşekanî cîhan da boçûnî erêyî sebarey bewan heye û piştîwanî cemawerîyan lê dekrê ke eweş pêşmercî manewey zimane. Meylêkî ewto dekirê le Birîtanîya bibîndirê, le şiklî cûllanewey beguř bo piştîwanî kirdin le bûjandnewey zimananî Çornîş û Manx ke duwayîn axêweranyan zor le mêje nemawin û seryan nawetewe. Be rêgeyekî awa çaweřuwan nekiraw bellam dillgermane da lewaney bibînîn koy giřt zimaneke dinya le barî hejmarîyewe zîyad bika.

### **Bedîl: Le Kîsdanî Hetahetayî**

Rizgarkirdin û parastinî zimanan hem be giran radewestê, hem katî pêdewê û hem debê wuzeyekî zorî bo bext bikrê; bellam ew erkê heta billêy be nîrx e û le cêy xoy daye.

Asteme miro le qûllî ew hest be xoşî û şanazî kirdine têbiga katêk xellik boyan derdekewê zimanekeyan detuwanê bijî û bimênêtewe. Her awaş asteme miro bew xefet û pejareye bizanê ke ledest danî zimanêk sazî deka, Eger bo xoy tecrubey nkirdibê. Nûserî Australayî David Malouf, le çîroke kurtekeyda " Taqe Axêwerî zimanekey" ew heste awa gellalle deka (1985):

"Katêk bîr le zimaneke dekemewe ke îtir çibiř li zarî miroyanda nageřê miçuřkêkî awa be leřim da dê ke qûlltir e le mirdinî xom, çunkû ewe mirdinî le ser yek kellekebûy giřt mirovayetî ye".

Mirdinî ziman wek hîçkam le şikllekanî dîkey bizir bûn naçê. Katêk xellik demirin, nîşaney amade bûnî xoyan le cîhanda, le şiklî ew cêyey lêy jîyawin, kêlî goçekanyan û kare destîyekanyan le duway xoyan be cê dehêllin . be wuşeyek konînenasî xoyan dehêllnewe, bellam katêk zimanêk demirê, ke pêştir bellgey le ser konekrawetewe û aste nekrawe, wek ewe waye ke qet nebûbê.

**serçawe:** David Crystal, *How Language Works*, Penguin Books, First published 2006

www.arasivakurdî.org

## EV ZIMAN NE BÊALFABE YE!

Ev du roj in kesekî ji berê ve ji min re nenas bela xwe ji min venake. Bi tirkî ji min re nivîsî, min bersiva wî neda. Dû re nivîsî "Hewal ma tu tirkî nizanî?" Min bersiv da ku ne kamil lê dizanim û fehm dikim. Rabû bi tirkî bi dirêjahî ji min re nivîsî ku ji alfabeya kurdî nerazî ye. Min jê re got ku gengeşeya li ser alfabeya kurdî ne bi tirkî lê bi kurdî tê kirin. Bi hevokeke kurt ya kurdî bersiva min da ku "alfabe tine ku pê binivîsim."

Gotineke pêşiyar heye, dibêje "Ecela bizinê hatiye, xwe li nanê şivanî dide".<sup>[1]</sup> Îcar ruh û psîkolojiya hinek kesan xirab bûye, radibin tirra xwe li koşk û civata zimanê kurdî dikin.

Desteyeke ji van mirovan jî ew in ku xwe ji xwe zanatir û şarezatir didin nasîn û hemû xelk û alema heyî dîn û ehmeq dihesibînin.

Birreke ji van kesan jî li dahol û zirnaya "ev alfabe ne baş e, divê ev alfabe were guherandin" didin. Heçku bibêjin ev alfabe ne bi dilê min e, loma divê ev milletê 40-50 milyonî rabe alfabeyeke ku ferman dikim bi kar bînin û pê binivîsin.

### Kurdî xwedî çendîn alfabeyan e

Gelek millet û zimanên wan alfabeyek heye. Dewleyî serê hesûd û çavnebaran, kurdan û zimanê kurdî ne alfabeyek lê sê alfabe jî hene. Kurdî dikare bi alfabeya latînî, bi alfabeya erebî<sup>[2]</sup> û bi alfabeya krîlî jî were nivîsîn.

Bi her yekê ji alfabeya latînî û bi alfabeya erebî bi hezaran kitêb hatine weşandin, bi sedan malper an hezaran blog hene, bi dehan TV û radyo kar dikin û hwd.

Kurdî heta vê dawiyê bi krîlî jî dihat nivîsîn lê êdî krîlînivîs jî bi dilê xwe derbazî latînînivîsê bûne.

Herdu alfabeyê me yên serekî (latînî û erebî) zêdeyî 99 % standard in û zimanê bi wan tê nivîsîn jî (çi kurmancî û çi jî soranî be) 80 – 90 % standard e.

Tenê zimanên ku sedsalekê yan bi sedsalan zimanên resmî yên dewletan an imparatoriyan bûne, rêje û nisbeteke standardiyê ya ji zimanê me yê nivîskî bilindtir peyda kiriye.

### Ti alfabe ne bêtêmasî ne

Yên ku radibin doz û daxwaza alfabeyêke din dikin, dibêjin ku di alfabeya kurdî de kêmasî hene loma divê em alfabeyêke nû çêkin an jî gelek herfên din li alfabeyê zêde bikin.

Lê pirsgerêka serekî ne alfabe lê nezaniya mirovan e. Eger wan hay ji ziman, zimannasiyê û alfabeyên zimanên din hebûya, wan dê bi hêsanî bidîta ku di her zimanî de kêmasiyên alfabeyê hene. Bi gotineke din, alfabeya ti zimanê li ser darê vê dinyayê ne kamil û bêtêmasî ye.

Li cîranên xwe binêrin, di alfabeya zimanê erebî, di alfabeya tirkî û di alfabeya farisî de, di hemûyan de bi dehan kêmasî hene.

Bo nimûne, nenivîsîna vokalên kurt wisa dike ku gelek peyvên ne hevdeng di erebî de bi heman awayî tînen nivîsîn. Di farisî de ev heman pirsgerêk heye. Li aliyê din di farisî de peyvên esil-erebî bi hin herfên erebî tînen nivîsîn (bo nimûne bi D, S, T û Z yê qelew) tevî ku ew deng di farisî de di peyvên esil-erebî de jî nayên gotin. Di tirkî de deng hene ku nayên gotin (bo nimûne Ğ) û hin dengên ne wek hev bi eynî herfê tînen nivîsîn (bo nimûne K-ya wek K-ya kurdî ya bipif/req di peyda "kedi" anku "kitik, pisîk" de û K-ya zêdetir nêzîkî Q-ya kurdî wek di peyva "akşam" anku "êvar" de).

Ne tenê di van zimanan de lê di her zimanî de kêmasî yan tevliheviyên alfabeyê hene. Bo nimûne, di piraniya zimanên ewropî de C wek du dengên ji hev cuda (carinan wek K û carinan jî wek S) tê gotin. Herfa Y carinan konsonant e (wek di kurdî de) û carinan jî vokal e (di hin zimanan de hevdenga "î" ya kurdî û di hin zimanan de jî hevdenga "ü" ya tirkî ye).

Di inglîzî de heman herfa A dikare wek A-ya kurdî were gotin (bo nimûne di peyva "father" anku "bab/bav" de), wek E-ya kurdî (bo nimûne "hand = dest"), wek EY-ya kurdî ("tame = kedî"), wek Ê-ya kurdî ("bare = rût, tazî")...

Di fransî de piraniya vokalan li dawiya peyvê nayên gotin, bo nimûne "petit" (bixwîne "pêtî" anku "biçûk"), "sans" (bixwîne "san" anku "bê, bêyî, nîne") û hwd.

Anku di ti zimanî de alfabeyê 100 % kamil û bêkêmasî nîne. Lê her millet li ser bikaranîna alfabeya xwe berdewam e û ji alfabeya xwe razî ye û qedir û qîmetê wê digire.

Em kurd xwedî du-sê alfabeyên hêja ne. Lê em ji xwelîbiseriya xwe ji ti ji wan nerazî ne. Yê ji alfabeyên heyî nerazî jî li ser ti alfabeyê nû jî li hev nakin lê her yek dixwaze alfabeya xwe li ser me hemûyan ferz bike!

Ehmeqiya mezin jî ev e!

\*\*\*

Me berê jî nivîsiye ku alfabeya heyî têra zimanê kurdî dike û zêdekirina herfan dê ne xizmetê lê zîyanê li me bike. Kerem bikin bixwînin:

- **Gelo em hewceyî zêdetir herfan in?**

## TÊBÎNÎ

[1] Gelek versiyonên wê hene, bo nimûne "ecela bizinê hatiye, nanê şivên dixwe", "ecela bizinê hatiye, bela xwe li şivên dide" û hwd lê mesele her eynî ye.

[2] Hinek dixwazin jê re bibêjin "alfabeya aramî" lê ev tenê dijîtiya erebî ye. Alfabeya kurdî-erebî pir dişibe alfabeya erebî û pir kêr dişibe alfabeya aramî. Binêrin: [https://en.wikipedia.org/wiki/Aramaic\\_alphabet](https://en.wikipedia.org/wiki/Aramaic_alphabet)



## FERHENGOKA NIFIRÊN KURDÎ

Umid Demirhan

### PÊŞEK AN JÎ ÇIMA NIFIR

Berhevkirina zargotina qadeke gelekî berfireh e û nifir jî beşeke vê qadê ne. Bi taybetî nifir hêmayeke bingehîn a zargotina gelên bindest e, wekî ku dijûn jî hêmayeke bingehîn a gelên serdest e. Ji ber vê yekê, nirxandina nifiran derûnî û rewşa civakî ya gelekî aşkera dike. Gava mirov li nifiran dinêre: rewşa jinên belengaz, kesên sitemzede, mehrûm, bêpar, belengaz, hêrshatî, reben dibîne. Mixabin heta niha ji aliyê derûnînasiyê û derûnînasiya civakî ve li ser nifirên kurdî lêkolîneke zanistî nehatiye kirin û wekî rêbazeke berxwedanê ya li hemberî dagirkeran nehatiye nirxandin.

### BERHEVKIRINA NIFIRAN

Wekî zarokekî kurd der û dora salên 1972an li gundekî Bazîdê hatibûm dinyayê û hetanî neh-deh saletiya xwe min bajar nas nekiribû. Di maleke bê televîzyon de çîrok û destanên kurdî ez xew re dikirim û jiyana min a rastî-nîgaşî bi kurdî bû. Di destpêka salên 80î de li dibistaneke amadehiyê ya tirk hatim qeydkirin; lê min zaroktiya xwe bi xwe re anîbû bajêr. Salên 90î cara yekemîn rojnameyê kurdî ya bi navê Rojname hatibû weşandin û tê bîra min ku ew serdanpê xwendibû. Sala 92an ez li Stenbolê bi serêdîtorê yekem ê kovara Nûbiharê Sebah Kara re bibûm nas û min dest bi xwendina rojnameya Welat kiribû. Di navbera salên 92-98an de ez ji bo xwendina zanîngehê li Misirê jiyabûm; lê min gelek pirtûkên kurdî bi xwe re biribûn wan deran jî. Destpêka sala 2000î ez teze zewicîbûm û ji bo xebatê dihatim Stenbolê. Rojê hevalekî qala kurseke zimanê kurdî kir û ez li Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê geriyam, min cihê peyda kir. Ji ber ku kurdiya min baş bû gerînendeyê kursê Mewlûd Çetînkaya ez li asta duyemîn qeyd kiribûm. Li vê kursa ku li Fatiha Stenbolê xizmeteke gelemperî dida Samî Tan waneyên rêzimanê, Zana Farqînî waneyên peyvnasiya kurdî, Milazim Ozcan waneyên wêjeyê û Polat Can jî waneyên pedagojiyê didan. Piştî ku min bawernameya xwe wergirtibû ez vegeyriyabûm Bazîdê û min dest bi berhevkirina numûneyên zargotina kurdî kiri bû. Ev

xebata min ê heweskariyê dûrî rêbazên akademîk bû: min numûne bêyî navê xwediyê gotinê, bêyî cih û dema bihîstinê tomar dikirin.

Di vê berhevkarîyê de nifirên kurdî gelekî bala min dikişandin. Zimanê nifiran hem rewan bû hem jî hemû peyvên neyînî radixistin ber çavan. Wekî numûne: ez cara yekem rastî ewqas navên nexweşîyan hatibûm. Ji bo ferhengszekî her peyveke têkildarî navên nexweşîyan wekî zêrê zer bû. Dema ku min ev nifirên têkildarî nexweşîyan dibihîstin, min pirs dikir bê ka ev çito nexweşî ye, çawa peyda dibe û encama wê çi ye. Ev peyvên neyînî yên ku di van nifiran de derbas dibûn wê bi kêrî bijîjkan û derûnînasan jî bihatana. Lewre min bi baldarî ew li ba xwe tomar dikirin. Her wiha min ferhenga xwe ya kurdî bi kurdî jî (Demîrhan, Ferhenga Destî, 2007) bi van numûneyan dagirtibû.

### LÊKOLÎNEKE PIÇÛK LI SER NIFIRÊN WEŞANDÎ

Rojekê kete bîra min ku li ser înternetê jî li nifirên kurdî bigerim. Mala wî ava be ku serokê berê yê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê (Çend Nifir Ji Kaniya Folklorê Kurdî I-II-III, 2014) ligel pêşgotinekê bi qasî sed heştê nifirî berhev kiribû û di sê beşan de li ser malpera PENa Kurd dabû weşandin. Her wiha vir de wê de gelek malperên kurdî nifir li ser înternetê belav kiribûn: tirsik.net; agire-serhildan.com; ferhengamed.com; mirbotan.com; bijwen.sozlukspot.com.

Van rojên dawîn li ser nifirên kurdî berhemeke xweser a Mistefa Gazî jî hatiye weşandin; lê mixabin ji ber ku li Hewlêrê hatiye çapkirin negihîşte ber destê min.

### ENCAM

Ev nifirên rêzkerî encama berhevkirina min a bi salan e. Her çiqas min hinek ji wan li ser înternetê peyda kiribin jî, piraniya van nifirên li jêrê berhevkirî li der û dora Bazîdê tîn bikaranîn; lêbelê gelek nifirên deverên din jî tê de hene. Min piraniya nifirên herêma Bazîdê ji devê pîrejin û mirovên belengaz bihîstine.

Ji ber ku min ew yeko yeko û di demeke dirêj de bihîstine/berhev kirine ne mumkin e ku gotindarê her gotinê nîşan bidim. Jixwe di destpêkê de armanca min ne berhevkirina nifirînan; lêbelê nîşandana rehên peyvan bi gotinên rojane yên gel bû.

Hêvîdar im ku zimannas û derûnînas li ser wan bixebitin û bigihêjin biryarên zanistî yên nêzikî rastî yê.

**A**

1. Af û nifirên pêxemberan li pey te bin/ li te rêz bin!
2. Agir bi derê te keve!
3. Agir bi mala te keve!
4. Agir bi ser we de bibare!
5. Agir bikeve mala te!
6. Agir di tifika de nemîne!
7. Agir li loda te bikeve û tu xwe li ber germ bikî!
8. Agir li mala bavê keto!
9. Agir pê ketî!
10. Agir te germ neke!
11. Aşê te bixeriqe!
12. Av negihe ser te!
13. Ava reş bi çavê te de bê!
14. Ava tofanê li te rabe!
15. Ava zer di canê te de bê xwarê!
16. Avê bibînî nê nê nebînî, nê nê bibînî avê nebînî!

17. Axa sar te nehewîne!

**B**

18. Ba li çongên te bikeve!
19. Bav (dê, bira, xwîşk, ap ...) lê mirî!
20. Bav li pêşiya kur ketî!
21. Bav û birayê te bi miradê te şa nebin!
22. Bayê sor bi ber devê te bikeve!
23. Bayê sor bi kezeba te bikeve!
24. Bayê Şimşatê li te rabe!
25. Bedena te reş-hêşîn be!
26. Belaya xwe di ber piyên xwe de bibînî!
27. Belebani di ser te de total bibin!
28. Belg bi dara te ve nemînin!
29. Belgên dara te biweşin!
30. Bendê pişta te biqete!
31. Benikê doxîna te biqete!
32. Benikê konê te biqete!
33. Ber avêtiyê!
34. Berê xwe nediyo!

35. Bereketê ji emrê xwe nebînî!

36. Bextê te reş be! 37.

Bêîman herî huzûra Xwedê!

38. Bêmele herî!

39. Bêmiraz çûyî!

40. Bêriya berazan li hevşiyê te be!

41. Bi bin erebeyekê kevî û goştê te bi tekan ve bigire!

42. Bi çifta dewarekî çûyî!

43. Bi girêşreşê ketê!

44. Bi guhanreşê ketê!

45. Bi nikulreşê bikevî!

46. Bi pêsoşkê bikevî!

47. Bi qotikê ketî!

48. Bi ro de çûyî!

49. Bi sewnêsiyê ketî!

50. Bi sibehê neketî!

51. Bi tewekê ketî!

52. Bi xewtêşê ketî!

53. Bibe dasî û bikeve qirika te!

54. Bibî xweliya êrgûn!

55. Bicehimî!

56. Bidî derzî-derman û emirbilah daynî ber serê xwe!

57. Bihar (havîn, payîz, zivistan) bi ser de nehatî!

58. Bi nalenal ji vê dinyayê bicehimî û herî!

59. Birûsk li te keve!

60. Birûska esmanê heftan lê ketî!

61. Bixwî û pê vereşî!

62. Bixwî; lê sekî pê vereşî!

63. Bizrê we biqele!

64. Bobelîsk li te rabe!

65. Brûsk li mala te bixe û tu tenê ji nav re herî!

66. Brûsk li mala te xe!

67. Bûk di çavê te de şîn bibe!

68. Bûka te di mala bavê xwe de bimîne!

## C

69. Can dayî! 70. Canê te ji kul û derdan xalî nebe!

71. Car li serê te bêne hev!

72. Cegera te bişewite!

73. Cehimî!

74. Cendekê te bibe pîneyê Sîço!

75. Cigera te biperite!

76. Cigera te di devê te re were!

77. Cigera te kun be!

78. Cihê wî cehneme be!

79. Cil û palaz te nehewînîn!

80. Cirma xelqê were ber derê te!

81. Cûcika wî pirç pê ve neyê!

## Ç

82. Çav kor bûyo!

83. Çav li destan bibî!

84. Çav rijîyo!

85. Çav rijî bûyo!

86. Çavê te di mista min keve!

87. Çavê te li deriya be!

88. Çavên te çavên Çeko bibin!

89. Çavên te ji hêsiran xalî nebin!

90. Çermê te biwere/biweşe!

91. Çêtiyên te werin xwarê!

92. Çi girtî di dêst de pûç bûyî!

93. Çingînî li tasa te keve!

94. Çiraya te vemire/damire!

95. Çiraya te çirûsk bi ber nekeve!

96. Çika te agir pê negire!

97. Çûna te hebe hatina te nebe!

## D

98. Dara te hêşîn nebe! 99. Dara te sêr be!

100. Debara te berî biharê biqede!

101. Delav neçe ser zeviya te!

102. Delîl û dêran bibî!

103. Dengê te bibire!

104. Derdê bêderman bikeve canê te!

105. Derê bavê bişkê!

106. Derdê bêderman lê rabûyî!

107. Deriyê mala bavê te girtî be!

108. Deriyê te bi heft hejên guhîjê girtî bin!

109. Derman di çongên te de nemîne!

110. Dest kişiyayî!

111. Destan dar negirtî!

112. Destê te negire!

113. Destên te hêleşanan nehejînin!

114. Dev li te negere!

115. Dev li te xwar bibe!

116. Devê te li kêvir bikeve!

117. Devê te li kevirê reş bikeve!

118. Dewletê tu li ser dewletan bigerî!

119. Dewletê zewala te ji Xwedê be!

120. Dê û bavê te xêrê ji te nebînin!

121. Di agirê cihenemê de bişewitî!

122. Di aranê de mayî!

123. Di ber de jehr bî!

124. Di ber de jehra marê reş bî!

125. Di ber de mayî!

126. Di ber doza xelqê de herî!

127. Di ber te de bimîne!

128. Di binçengan da kînor hato!

129. Di erdê de herî xwarê!

130. Di firnikên te re were!

131. Di hembêza axa sar de bisitirî!

132. Di hingilan de bi dar ve bûyê!

133. Di mala we de şîv hebe, taştê nebe!

134. Di olama xelqê de mirî!

135. Di pozê te re were!

136. Di şîna bavê te de hêsirên te bimiçiqin!

137. Di xeneqa te de bimîne!

138. Di xewê de marek li te vene!

139. Dil ji kulan xalî nebûyî!

140. Dil û hinavên te di devê te ra werin!

141. Dilê te bişewite!

142. Dinya li ber çavên te reş be!

143. Diran di devê te de nemînin!

144. Dîzika te nekele!

145. Dû ji kuçikên te ranebe!

146. Dûman li ser kuleka te nekeve!

## E

147. Emrê te emrê gulîka biharê be!

148. Emrê te kin/kurt bibe!

149. Emrê te pûç bibe!

150. Emrê te qut be!

151. Erd li ber piyan qelişî û tê de çûyî!

152. Erd li per piyê te veqelişe, heta navikê tê de herî xwarê û kes dest nevêje te!

153. Erd û esman li te bîn hev!

154. Erebeke bêplaqe lê xistî!

155. Erzehala te here ba Xwedê!

156. Ev newal tijî zêr bibin, libek nebe nesîbê te!

157. Ewk li te biqelişe û şûjin bi dest te nekeve!

158. Ewkê te bibe rîs û bi te ve dar de bibe!

159. Eyd di ser te re derbas nebe!

160. Ez reşê te girêdim! Ê

161. Êş serê te keve!

162. Êş û ûş li te rabin!

163. Êşa mirîşkan bi te bikeve!

164. Êşa zirav bi te bikeve!

165. Êtixî ji mala te, soxî ji navê te kê m nebin!

166. Êvar bi ser de nehatî!

## F

167. Felek li serê te bigere!

168. Fireng li hatî!

169. Firê neketî!

170. Firî ku firî bûyo!

171. Firîkî bifirîkî!

## G

172. Gerden cêr bûyî!

173. Gerden heliyayî!

174. Gewrêş bi gewriya te bikeve!

175. Girara te nekele!

176. Girî ji mala we kê m nebe!

177. Goşt dîtî, diran bi dêst neketî!

178. Goştê te birize!

179. Goştê te bibe xurê/xwarina mişk û maran!

180. Goştê te bihele!

181. Goştê te li erdê, hestiyê te li bin piyan be!

182. Gula çapliyê li bin çengê te bikeve!

183. Gula çardexurê li binçenga te bikeve!

184. Guleyek li navçavê ketî!

185. Gulî kur bûyê!

186. Gulla berbanga sibê li te keve!

187. Gulla serê sibê li te keve!

188. Guran xwarî!

189. Gurrî bî! 190. Gû li gorê bûyî!

## H

191. Har bibî û li serê sergoyan bikevî!

192. Har bûyo!

193. Havîn di ser te re nebihure!

194. Heliyayî!

195. Heneya zavayan/bûkan li kefa destê xwe nebînî!

196. Her du lingên te bi hev re bişkên ku tu ji xwe re rûnî.

197. Herî û li min nezivirî!

198. Herî, qe venegerî!

199. Heska te biqelişe!

200. Hestiyê piştê lê xaşe bî!

201. Hestiyên te birizin!

202. Heta ku xweş bî îman li ber reş bî!

203. Heta ku xweş bibî ji xelqê re pale bibî!

204. Heta ku xweş bî hemasa pale bî!

205. Heta mirinê qe tu rindiyê nebinî!

206. Hetanî dawiya emrê xwe nalînî bikî!

207. Hevalê kûçikan bûyî!

208. Hevalê telaqreşan bî!

209. Hêlikreşek te bixesîne!

210. Hêşiya konê te biqete!

211. Hêta te bişkê!

212. Hêtereş li hêta bikeve!

213. Hişk bûyî! 214. Hundir qetiyayî!

215. Hundir qul bûyo!

216. Hundir reş bûyo!

217. Hûn bibin gur bi hev kevin!

218. Hûn bibin gurê serê çileyên û bi hev de bikevin!

219. Hûr ji dêv re hatî!

220. Hûr û rûviyên te di devê te re bên!

Î

221. Îlancix di gewriya te de were!

222. Înşeleh tu dê bi ber biavêjî! (bi tenê ji bo jinan)

J

223. Jana zirav bi te da were!

224. Jehr be/li te bibe jehr!

225. Jehr bi ber ketî!

226. Jê avêtî!

227. Ji binî ve hejiyayî!

228. Ji birçînan hişk bûyî!

229. Ji dergehê Xwedê mehrûm bî!

230. Ji hevalan mayî!

231. Ji hêrsan biteqî!

232. Ji îman û Quranê mehrûm bûyî!

233. Ji îro dernekevî sibehê!

234. Ji kerban bimirî!

235. Ji koç û keriyên bimînî!

236. Ji lillah ketî!

237. Ji rehma Xwedê bêpar bimînî!

238. Ji taqet bikevî!

239. Ji tînan segkî hilehil bikî!

240. Ji vir neçî dera han!

241. Ji xeberdanê bikevî!

242. Ji xewê ranebûyî!

243. Ji xêran bêpar bûyî!



**K**

244. Kalîna pêz ji ber derê te neyê!

245. Kef bi devê te ketî!

246. Kepaze bûyî!

247. Ketî ber lepan û çav li destan bî!

248. Kesek nalenala te nebihîze!

249. Kevçiyê te qul be!

250. Kevçiyê te qul bibe!

251. Kevçiyê te zon negire!

252. Kevir bi ser de barî!

253. Kevir û kuçik li te bibarin!

254. Kevir û kuçik li te bibarin!

255. Kevirê te li ser kêvir nemîne!

256. Kezeb ji dêv re hatî!

257. Kezeb peritiyo!

258. Kezeb xwê biyo!

259. Kezeba te bihele!

260. Kezeba te biwerime!

261. Kezeba te qul bibe!

262. Kezeba te tîkeyên xwîne bin û ji devê te re bên!

263. Kezeba te were xwarê!

264. Kezew li te reş bibe!

265. Kêlekên te li ser nivînan birizin!

266. Kêranê xaniyê te bişkê!

267. Kilim kilim li ser daweta te nekeve!

268. Kilîta reş li derê te keve!

269. Kit ji mala te nemîne!

270. Kizirî!

271. Kînor di qûna te de derkeve!

272. Koça te ji keriyên bimîne!

273. Kodika te tijî bibe!

274. Koka te bibe koka gûlika biharê!

275. Koka we biqele/vemire!

276. Konê te bişewite û bibe rijî!

277. Konê te nekeve tev konan!

278. Kor bûyo!

279. Kotan li koka we rabe!

280. Kotanê Eysa Pêxember li koka we rabe!

281. Kul bi ber ketî!

282. Kul di mala te keve!

283. Kul, jan, dev, diran, bigire pişik û parxan!

284. Kula derê biharê lê xistî!

285. Kula Helebê bikeve mala wî/ di mala te keve!

286. Kula salê te da derkeve!

287. Kulê biro!

288. Kulê li kezebê xistî!

289. Kulfetê te li te gurê har be!

290. Kumê te tu carî tel nebe!

291. Kund li warê bavê te bixwînin!

292. Kunêr di kuna te de derkeve!

293. Kurê te li te bimire!

294. Kurê te tev kuran nebe!

295. Kurm bikevin laşê te!

296. Kuştîyê di ber xelqê de bî!

297. Kûçîkê har te bigire!

## L

298. Lawo lawo tu xêrê bikî, tu qe nebinî!

299. Lebat di çongên te de nemîne!

300. Lehî li sexeleyê te xe!

301. Leteme werin ber derê te!

302. Lê binêrî û bibehecî!

303. Lêkend her sê sexelên te bi ro de bibe!

304. Lê zeherman man bî!

305. Li ber bobelîskê çûyî!

306. Li ber çêm ji tînan bimirî!

307. Li ber deriyan bimînî!

308. Li ber heft deriyan bigerî!

309. Li dewsa avê xwîn bimîzî!

310. Li dinyaya din destê Şêx Evdilqadir di pêsîra te be!

311. Li hevalan binêrî û bihelî!

312. Li min av û xwîn bûyî!

313. Li pêş xelqê bendîkê doxîna te biqete!

314. Li serê sergoyan ketî!

315. Li te bibe goştê berêz!

316. Li te bimbarek nebe!

317. Li te heram bibe!

318. Li te nebe sibeh!

319. Li te porkurê!

320. Li te postê berazan be!

321. Li te xwîna xinzîr be!

322. Li te zeher û ziqûm be!

323. Ling kişiyayî! M 324. Mal mîrat bûyo!

325. Mal şewitiyo!

326. Mala bavê te bişewite!

327. Mala bavê te xirab bibe!

328. Mala te belavbelavî bibe!

329. Mala te berê bayî bikeve!

330. Mala te bi serê te da bixele/bihelişe!

331. Mala te bibe kelefe û kelefe jî bibe warê  
bûman!

332. Mala te bişewite!

333. Mala te here ber mîratê!

334. Mala te here devê kulê!

335. Mala te ji xelqê re bimîne!

336. Mala te kerkene bibe!

337. Mala te li ser piştê xezalê be û tu bidî pey  
kûsiyî!

338. Mala te ne ava!

339. Mala te pîneyê malan bibe!

340. Mala te qefa kendalekî be û kendal bi ser  
de hilweşe!

341. Mala te serê te bixwe!

342. Mala te wêran be!

343. Malik bûyî hêlîna kundan!

344. Malik lê mîrate bûyî!

345. Malik wêran bûyî!

346. Malika wan li heft mîrateyan bigere!

347. Mar bi te ve bide!

348. Maran lê xistî!

349. Marê kor bi te vedel!

350. Marê reş lê xistî/li te vedel!

351. Menzîl qut bûyo!

352. Mergê mergkurtan bi ber te bikeve!

353. Mero gur li te bicivin û goştê te ji hestiyên  
bikin!

354. Meyt hilato!

355. Meytê te li ber tava havînê genî bibe!

356. Meytê te li erdê bimîne!

357. Mezelê te nekeve nava tu mezelan!

358. Mêjiyê te di pozê te ra were!

359. Mêjî tev li hev bûyo!

360. Mêjî vala bûyo!

361. Min ji te xêr nedîto!

362. Min reş girêdayî!

363. Min xêr ji te nedît; tu jî xêrê ji mirazê xwe  
nebînî!

364. Miradê te di çavê te de bimîne!

365. Miradê te di qirika te de biqurmiçe!

366. Miraz bûyî!

367. Miraz di çavan de mayî!

368. Miraz pê nekirî!

369. Mirazê te di çavên te de çortan be!

370. Mirazê te di pozê te de were!

371. Mirazê te mirazê gûlika biharê be!

372. Mirazê te mirazê qijikê be/qijika kor bibe!

373. Mirazê te tev mirazan nebe!

374. Mirazê te di qirika te da bimîne û tu şa nebî!

375. Mirin bi peretî bi dêst neketî!

376. Mirin xwestî, lê bi dêst neketî!

377. Mitikê ketiyo!

378. Mitriban gotine: Em mînanî şêx û meleyan nabêjin ku bila kesek bimire û em sakoyê wî li xwe bikin; lê em dibêjin ku bila şahî û seyran hebin, def û zirne lê xin û em jî şabaş û xelatan berhev bikin. Gumana min wisa ji Xwedê heye ku îro beriya sibehê sakoyekî te jî tunebe ku şêx û mela li xwe bikin; loma jî cenazeyê te li erdê bimîne! Şahî û seyrana te vegere şîn û merezan! Li te hesret be ku şabaşan belav bikî!

379. Mîza şêtîn tev be!

380. Mor li derîyê te keve!

381. Moz bi gunên te vede!

382. Moz bi zimanê te vede!

## N

383. Nan lê hesret bûyî!

384. Nanê baçîk bi dest we nekeve!

385. Nanê cehî/gêris bi destê te nekeve!

386. Nanê te li ser piştî kêvrîşkê bibe!

387. Nanê tisî bi destê te nekeve!

388. Nav neketî nava deftera mişkan jî!

389. Nava gunên te bixwire!

390. Navê te agir, dostê te barût be!

391. Negihêjî kêrê!

392. Ne ji Xwedê tirsîyayî ne jî ji bendeyan şerm kirî!

393. Negihîştî kêrê!

394. Nenîkên te tunebin ku xwe pê bixwirî!

395. Nexweşiya te li te heştobe be!

396. Neyarê te bibe qiraskê serê te!

397. Nifirên Mûsa Pêxember li pey we bibe!

398. Nimêja sibehê şeytan di kerika guhê te de bimîze!

399. Nivîn lê pîj hatî!

## O

400. Ocaxa te kor be!

401. Ocaxa te kor, deriyê te mor be!

402. Ocaxa we ji kok da vemire!

403. Oxira te ne ya xêrê be!

404. Oxira te oxira Qolo be!

405. Oxira te oxira Zahirê Kerî bibe!

**P**

406. Para guran bûyî!

407. Parçeparçeyî bibî û parçeyê te yî herî  
mezin guhê te bimîne!

408. Parçê mezin guhê te be!

409. Pars kirî!

410. Pel bi dara te ve nemînin!

411. Pelê dara te biweşin!

412. Pepûk bi ser te de bixwînin!

413. Perdeya rûyê te biqete!

414. Perpitiyo!

415. Pêpûkê!

416. Pirtikên te li esmanan bin!

417. Pişikreşî bûyî!

418. Pişrûka hişk bi dest te nekeve!

419. Pişt şkestî!

420. Pişt xwe rast nekirî!

421. Piyê te bi ber piyê te nekeve!

422. Pîj bi çavê te re here!

423. Por kurê!

424. Porê te kur be!

**Q**

425. Qanser li te were/derkeve!

426. Qe gir nebî!

427. Qe mezin nebûyî!

428. Qijdeyê te li min teberik bibe!

429. Qijik bi ser ketî!

430. Qijika qijikê bi ser ketî!

431. Qijika reş bi ser ketî/bi ser te de hatî!

432. Qijikan çav derxistî!

433. Qir bi koka we bikeve!

434. Qirika te şil nebe!

435. Qorika te bişike!

436. Qudûm di çongan de nemayî!

437. Qurbana zarên xelqê bûyî!

438. Qutiya te tijî, rûviyê te rast nebe!

439. Quzilqurt be!

**R**

440. Rebî lo lo di mala wî de nemînin!

441. Rebî tu eydê nebîne!

442. Rezê we teriz lê xe!

443. Rêx bi ber ketî!

444. Ro li ser mala te neçe ava!  
 445. Roja ku tu qilim dilim dilîzî qeşmerok bi te bilîzin!  
 446. Roja reş û qîra qijikê para te be!  
 447. Roja xwe nedîtî!  
 448. Rojê bi qaydekî biçilmisî û bipişirî!  
 449. Rûyê reş be!  
 450. Rûçikê te li min hesret bibe!  
 451. Rûreşî bi ser te de bê!  
 452. Rûviyên te di devê te re bên!

**S**

453. Satircemî bî!  
 454. Se û kûçik li te rêz bin!  
 455. Sed û bîst û pênc caran bihetikî  
 456. Seg bi ser de vereşî!  
 457. Segekî kefen revandî!  
 458. Segkî bicehimî! 4  
 59. Serê te bixwe!  
 460. Serê te li keviyekî bikeve!  
 461. Serê te qe bilind nebe!  
 462. Serê wî di nav mêran de bilind nebe!  
 463. Serî bi binî ve bûyî!  
 464. Serî qûç bibe, binî pûç bibe!

465. Sewta te bibire!  
 466. Sêl nanê wî nepijîne!  
 467. Sikûmê te li min hesret bibe!  
 468. Sitar lê hesret bibî!  
 469. Star bi serê te nekeve!  
 470. Stêrka te negihêje esmanê heftan!  
 471. Stûyê te di ber te da bimîne!  
 472. Stû şkestî!/Stûyê te bişkê!  
 473. Stûna bavê te bişkê!  
 474. Stûna xaniyê te bişewite!  
 475. Stûyê te di heftê cihê de bişkê!  
 476. Sûra rehmê di dil de nemayî!

**Ş**

477. Şapat bi ser te de were!  
 478. Şepe li mala te bikeve!  
 479. Şepirze bûyî!  
 480. Şetele li te bikeve/rabe!  
 481. Şeteleya bihar û payîzan lê ketî!  
 482. Şexte li te xe!  
 483. Şeytan guhê te de bimîze!  
 484. Şitla te hêşîn nebe!

485. Şîva miriyan lê çûyî/lê hesret bûyî!

**T**

486. Taşirxanî bûyî!

487. Taştiya te hebe, şîva te tunebe!

488. Taya mirinê bi te keve!

489. Te çawa agir berda heyata min heyata te  
jî agirdadayî bibe!

490. Te çawa mala me xera kir Xwedê jî mala  
te xera bike!

491. Te keziya min qusandê!

492. Te qirika min tehl kir, Xwedê jî ya te tehl  
bike!

493. Te rût bikin û daynin ser teneşîrê; lê  
segekî gurî ava te biçêlpîne!

494. Têpa xelqê hemasa li sêrî bûyî!

495. Tertexanî bî!

496. Teşqeale pêşîra te bernedin!

497. Teşta te êrd negire!

498. Text û tacê te belav bûyo!

499. Têr nexwarî!

500. Tiliya te bi hine nebe!

501. Tirtûl bi ber ketî!

502. Tî bûyî û arava kincan bi dêst neketî!

503. Tî û birçî mirî!

504. Tîra Xwedê lê ketî!

505. Top lê keto!

506. Topa Xwedê lê ketî!

507. Topa Êris li te keve!

508. Tu avê ji teyr û tilûran bixwazî!

509. Tu belaya xwe di ba Xwedê de bibînî!

510. Tu bext-mirada nebînî!

511. Tu bê dûnde herî!

512. Tu bêmiraz herî!

513. Tu bêûrt herî!

514. Tu bêwêrt biçî!

515. Tu bi cinan bikevî!

516. Tu bi goştê canê xwe kevî!

517. Tu bi guleyeke neşûştî herî!

518. Tu bi halê ne tu hal kevî!

519. Tu bi wê hesretê herî!

520. Tu bi miradê xwe şa nebî!

521. Tu bi saxî bikevî gorê!

522. Tu bi xewê kevî û jê ranebî!

523. Tu bi xuriyan herî!

524. Tu bi xwe de bikevî û zirara te negihêje tu  
kesî!

525. Tu bibî beniştê devê xelqê!

526. Tu bibî jûjî!

527. Tu bibî komek hestî, bikevî ber vî destî!

528. Tu bibî movik û hestî!

529. Tu bibî piç û parî û her parçeyekî te di tûrekî de veşêrin!

530. Tu bibî piç û parî!

531. Tu bibî şîva guran!

532. Tu bi kefa segê har herî!

533. Tu bikevî ber destê dêmariyan!

534. Tu binerd bî!

535. Tu biqurçimî!

536. Tu car riya te rast neçe!

537. Tu çiçiqî bibî!

538. Tu derpiyê sor li ber serê xwe nebînî!

539. Tu di ava gûyî de bixeniqî!

540. Tu dîn bibî bi çiyana bikevî!

541. Tu dîn bibî bi laşê xwe bikevî!

542. Tu dîn bibî û bi çolan/bi çiya û baniyan bikevî!

543. Tu eydê nebînî!

544. Tu firofehşî bibî!

545. Tu goştê xwe biruçikinî!

546. Tu gûnê nebînî!

547. Tu har bibî!

548. Tu heft salan mala bavê xwe nebînî!

549. Tu herî û venegerî!

550. Tu herî, bêser û bêberate herî!

551. Tu hewciyê ker û kûçikan bî!

552. Tu ji destê xwe bibinî!

553. Tu ji her du çavan bibî û kesek destê te negire!

554. Tu ji her du çavan bibî!

555. Tu ji her du çavan mehrûm bibî

556. Tu ji kokê ve biqurçimî!

557. Tu ker û lal bibî!

558. Tu kes li deriyê te nexel!

559. Tu li çol û çiyana şeveder bimînî!

560. Tu li çolê bêav bimînî!

561. Tu li serê riyana berate bî!

562. Tu nanê gilgil nebînî!

563. Tu nebêjî ox!

564. Tu nebêjî xwezî bi îro!

565. Tu parçeparçeyî bibî!

566. Tu porê xwe bi ser bav û birayên xwe de kur bikî!

567. Tu qe mezin nebî!

568. Tu qe tunebî!

569. Tu rezîl û riswa bibî!



570. Tu sêwî bibî!

571. Tu şeveder bimînî!

572. Tu teslîmî dîwan û edaleta Xwedê bibî!

573. Tu têkevî ber destan/destê min!

574. Tu tim qiriktehl bî!

575. Tu tu/qet tu gûnan nebînî!

576. Tu tu xêrê ji xwe nebînî!

577. Tu û şahî rastî hev neyên!

578. Tu xweş bî, di halê reş de bî!

579. Tu xweş bî, hemasa nexweş bî!

580. Tuxmê we biqele!

581. Tuxmê/tûra we biqele!

582. Tûka gewriya te bimiçiqe!

583. Tûka sar merhema rûyê te be!

584. Tûka xelqê jê re gulav bûyî!

585. Tûrê parsê li mil bî! / Tûrikê parsê ji destê te nekeve!

586. Tûrra we hesret be/teberik bibe!

## Û

587. Ûrt qeliyayî!

## W

588. Waqîna zarokan neyê guhê te!

589. War reş bûyî!

590. Warê bavê te bibe kavil!

591. Warê te perê merzelan be!

592. Wey diran di devê te de nemîn!

593. Wêrtas bûyê!

## X

594. Xanî bi ser de tep bûyî!

595. Xebera nexêrê ji te re were!

596. Xeneqa te cêr bibe!

597. Xeneqreş li xeneqê ketî!

598. Xeneqûtk li xeneqa te keve!

599. Xezeb li te bibare!

600. Xezeba Xwedê ji te re were/li ser te bibare!

601. Xêrekê ji xwe nebînî!

602. Xêrê jê nebînî!

603. Xêrê ji ciwaniya xwe nebînî!

604. Xêrê ji emrê xwe nebînî!

605. Xina te bi berê bayî bikeve!

606. Xişxişe li destên te bikeve!

607. Xîret xîreta berazan bibî!

608. Xurê guleya bêbavekî bûyî!

609. Xwarina te gil û gemar be!

610. Xwedê atara te bibirîne!

611. Xwedê bêîman kuştî!

612. Xwedê bike kasika kembera te hemasa di ber xelqê de bişkê!

613. Xwedê bike ku boçikan bi te ve girê bidin!

614. Xwedê bineşe hesret/teberik kirî!

615. Xwedê cil û nivîn lê heram kirî!

616. Xwedê hê lê hesret kirî!

617. Xwedê îman jê standî!

618. Xwedê jê birî!

619. Xwedê kerema Xwe lê nekirî!

620. Xwedê kindirê te biqetîne!

621. Xwedê koka we biqelîne!

622. Xwedê lê nehatî rehmê!

623. Xwedê lê xwedîtî nekirî û Pêxemberî lê şifaetî nekirî!

624. Xwedê paşepêl li kerê siwar kirî!

625. Xwedê qe ji bintînan dernexistî!

626. Xwedê rehetiyê nedê!

627. Xwedê riswa kirî!

628. Xwedê ruh standî!

629. Xwedê sitamî lê nekirî!

630. Xwedê sûra rehmê ji ber dil derxistî!

631. Xwedê şewqê nevêje mala we!

632. Xwedê te gurî bike!

633. Xwedê te hê rûreş bike!

634. Xwedê te ji ber destan dernexe!

635. Xwedê te kevir bike!

636. Xwedê te nehêle!

637. Xwedê te nesitirîne! 638. Xwedê wêrtas kirî!

639. Xwedê ya qenc neke nesîbê te!

640. Xwedê yeka te neke didu!

641. Xwelî li sêrî bî!

642. Xweziyê bi savêra sêg bînî!

643. Xwîn di dêv ra hato!

644. Xwîn vereşiyayî!

645. Xwîn-kêm vereşî!

646. Xwîn/cirm were ber derê te!

## Y

647. Yeka te nebe didu!

648. Yeka xerab ji te re hatî!

## Z

49. Zeviya te zîwan bigire!

650. Zik lê têr nebî!

651. Zik lê werimî!/perçifî!

652. Zikê te bi sulba bêbavekî hilpingire!

657. Zimanê te bi ber diranê te bikeve!

653. Zikê te bi tir û fisên xelqê têr be!

658. Zimanê te bi esmanê devê te ve bigire!

654. Zikê te têr nebe!

659. Zimanê te ji devê te vekişe!

655. Zikê te zer bibe û dermanê te jî li ba min  
bibe!

660. Ziqûm bibe!

656. Ziman di devê te de biwerime!

661. Ziravê te biqete!

### Çavkani

Demîrhan, Umîd. (2007), Ferhenga Destî, Bazîd, Weşanxaneya Sewadê, published also on the website <http://daxistin.ferheng.org/ferhengadesti.pdf> (02.06.2014) Kaya, Hasan. (2004), Çend Nifr ji Kaniya Folklorê Kurdî – I, II, III, online, published on the Pen-Kurd website: <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-kaya/cend-nifirkaniya-folklorê-kurdi.html> (26.05.2014) <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-kaya/cend-nifir-kaniya-folklorê-kurdi-2.html> (26.05.2014) <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-kaya/cend-nifir-kaniya-folklorê-kurdi-3.html> (26.05.2014) Gazî, Mustafa. (2006), Nifir û Duayên Kurdî, Hewlêr, Enstîtuya Kelepora Kurdî, <http://bnk.institutkurde.org/catalogue/detail.php?pirtuk=1767> (02.06.2014) Nifirên Dayikên Kurd, <http://www.ferhengamed.com/p/14390/nifirê-n-dayikê-n-kurd> (02.06.2014) Nifirên Kurdî, <http://www.tirsik.net/p/1895/nifirên-kurdi> (02.06.2014) Pirbûna Nifirên Kurdî, <http://www.tirsik.net/p/2907/pirb-na-nifir-n-kurd> (02.06.2014) Nifirên Kurdî, <http://www.agire-serhildan.com/nifir-n-kurd-t16556.html?s=3ffaf39b2f01486124b4259e0322aae4&> (02.06.2014) Nifirên Kurdî, <http://www.mirbotan.com/zimani-kurdi/228137-nifirên-kurdi.html> (02.06.2014) Nifirên Kurdî, <http://bijwen.sozlukspot.com/w/nifirên-kurdi/> (02.06.2014)

## Ziwan û dîyalektê kurdî

Seîd Veroj

### 1. Ziwan û dîyalektî

Wexto ke mewzû ziwan bo, kilmevate bo zî gerek vernî de ziwanî ser o îzehatêk bêro kerdiş. Ziwan, tenîya xezîneyêk vateyan û sîstemê rêzbiyayîşê ênan û hacetêk têkilîya navbeyna mêrdiman nîyo, eynî wext vîrê ma yê tarîxî yo. Heme çîyo ke aîdê mêrdimî yo û bi mêrdimî ya têkildar o, bi ziwanî reyde îfade beno. Bi wasîteyê ziwanî ma şênê xebat û keda mêrdimandê verê xo bimusê, bişinasnê û dewrê neslandê neweyan bikê. Ewro zî her milletêk bi ziwanê xo şinasyena. Ziwan, hişê millet o, ay milletê ke ziwanê xo vinî bikê, ray û şopa ênan werte ra wedaryena, yê bi xo zî vinî benê.

Xebata der heqê ziwanî de, nîzdî 400 seran V. Z. ra bi xebatandê ziwanzan Panînî yê Hindî dest pê kerda. Labelê xebatê lînguîstîkî ancax peynîya seserra 19. de dekewtî çarçeweyêka ziwanzanistîye û xebatê dîyalektolojî zî hîna vêşî bîyê. Peydabîyayena ziwan û dîyalektan ser o, bêj bi bêj teorî ameyê pêşkêşkerdene. No nûste de yew bi yew dîyarkerdena nê bêj teorîyan mimkun nêbo zî, dîyarkerdena çarçewa û tayê xusûsîyetanê esasî yê bedêlîyayîşê ziwanî û peydabîyena dîyalektan, armanca nê beşê xebata ma ya. No beşê xebate xo de, ma do bi giranîye ser behsê bedêlîyayena ziwanî û dîyalektan bikê.

Bêguman mesela ziwan û dîyalektan, yew meseleya zaf mûhîm û kehan a xebata zanistîya lînguîstîk a. Gama ke behsê ziwanî bibo, hawayê cîyayê ziwanan ê ke sey dîyalekt yan lehçe yenê namekerdiş zî vejîyenê vera ma. Heta ewro na mesela ser o munaqeseyî bîyê, no derheq de tarîfê cîya-cîyayî bîyê, labelê yew tarîf û îzehato maqul o ke her kes ser o hemfikir bo nêbîyo.

Peydabîyena cîyayî û bedêlîyayîşê ziwanî, xusûsîyetêk tarîxî û esasî yê ziwanî yo. Çimkî ziwan zî sey çîdê ganî yo, zemanî mîyan de bedêlîyeno. Rojgaro ke ziwanî peyda bîyê û heta ewro, her bêj têkilîyê komanê mêrdiman bîyê sebebê bedêlîyayîşê ziwanan, peydabîyayîşê dîyalektan, kom û komikanê kulturî yê cîya-cîyayan. Eynî wext de têkilîyê komanê merdîman; têkilîya ênan a pêwa ciwîyayîşî, dînî,

tarîxî, sîyasî, îqtîsadî, kulturî, qewimîyayîşê hedîseyandê xozayî û komelî zî bîyê sebebê dayîş û girewtîşî û bedêlîyayena zîwan û kulturandê cîyayan. Peynîya nê têkilîyan de, hem zîwanê welatandê cîya-cîyayan û hem zî goreyê ca û herêman, zîwan xo mîyan de bedêlîyeno. Seke zîwanzano namdar F. De Saussure zî vano: “Zemanî mîyan de bedêlîyayîşê zîwanî, bîyo sebebê peydabîyayena dîyalektandê cîyayan.” [1] Peynîya têkilîya zîwanan de, verê heme çî vate û tayê şeweyê vatişê ênan bedêlîyenê. Ray ray no bedêlîyayîş hende gird beno ke qisekerdoxê eynî zîwanî zî zor yewbine fehm kenê yan zî nişênê yewbine fehm bikê. Goreyê ca û warandê cîyayan, bi no hawa bedêlîyayîşê yew zîwanî ra vajîyeno *dîyalekte (lehçe)*. Labelê tarîfêko standard ê dîyalekte çînî yo.

Zîwanzano almanij Ludwig Paul vano “bêntarê ‘zîwan’ û ‘dîyalekte’ de hîç sînorêko qethî û ‘xozayî’ çînî yo. Kes şêno di şeweyanê cîyayan yê yew zîwanî hetê kulturî ra sey dîyalekte, sewbî hetana zî sey di zîwanê cîyayan tarîf biko. Mesela “zîwan û dîyalekte”, goreyê tarîfkerdiş û xusûsiyetê ênan, mimkun o ke hetana yew dereca keyfî bo zî.” [2] John Loyns zî vano: “Bêntarê dîyalektandê zîwanêk de yan zî bêntarê dîyalektandê zîwananê hemberyanê yewbine de dîyarkerdişê sînorêkê mutleqî mimkun nîyo” [3] Tayê zîwanzanî zî dîyalekte, sey “şeweyêk qisekerdiş”ê zîwanî tarîf kenê. Bi kilmîye ma şênê vajê ke tarîfê “dîyalekte” ser o, yew çarçeweya dîyarkerde û sînorêko mutleq çînî yo. Gelek zîwanzanî nê tarîf û sînorî, goreyê fikir û ewniyayîşê xo, tarîfêk kenê. Mîsal; “Zîwanê erebî yo ke ewro Sûriye ra bîgîre heta Misir û ewca ra heta rojavayê vakurê Behra Sipî, mîyanê Afrîqa û Nêmgirawa Erebi de yeno qisekerdiş, dîyalektê erebî yê cîya-cîya yê.” [4] Zaf cayan de qisekerdoxê erebî ke bi dîyalekta xo ya qisey bikerê, yewbine fehm nêkenê. Ma şênê nê bêj mîsalan, qandê sewbî zîwan û milletan rê zî bidê.

Bîlhesa hetê sîyasî ra merkezîbîyayîşê dewletan yan zî peydabîyayîşê dewleta modern, mesela standardbîyayîşê zîwanî vet meydan û ey zî bi xo wa problemê dîyalektandê cîyayî ardî meydan. Çimkî wexto ke ma bala xo bidê xebatandê dîyalektolojî, dîyar beno ke nê tewir xebatî, peynîya seserra 19. de hîna vêşî bîyê.

No qisim de, ma do bi kilmî hetê tayê xusûsiyetandê zîwanî ra behsê têkilîya dîyalektandê kurdî; zazakî, kurmancî û tayê zîwanandê grûba Hind-Arî bikê. Gerek ma vernî de dîyar bikê ke na xebate de veteyê zazakî, *dimilî*, *kirdî* û *kirmanckî* eynî mana de ameyê vatiş. Kelîma kurd/kurdî zî, hem zaza/zazakî û hem zî kurmanc/kurmanckî gêna xo mîyan. Sey zîwanandê bînan, zîwanê kurdî de zî tayê şewe û dîyalektê cîya-cîyayî estî. Bêguman sebebê tarîxî, sosyal, ekonomîk û sîyasî yê

peydabîyayîşê nê dîyalektan estî. Tiya de ma do yew bi yew nê sebeb ser o nêvinderê, labelê sey ke cor ra zî ame dîyarkerdiş, ke rayna ma tarîfê dîyalekte bîyarê xo vîrî: ware û mintiqandê cîyayan ê yew koma qiseykerdoxandê ziwani mîyan de, bi şewe û hawayê cîya-cîyayan qiseykerdişê yew ziwani, bi vateya dîyalekte (lehçe) yeno namekerdene.

Wexto ke ma nê tarîfî xo çiman vera bigîrê, rojgaro verên ra hetana ewro kurdî zî xo mîyan de gelek bedêlîyaya, tira dîyalektî û şeweyê cîya-cîyayî peyda bîyê. Labelê sey ke Kurdîyê Bîtlîsî zî vano: “nê lehçeyê cîyayî, xezîneyêka fewqalede ya çekûyandê ziwani yî”. [5]

Gerek ma naye bizanê ke peydabîyayîş û bîyayena dîyalektanê cîyayan, rastîyêka tarîxî ya heme ziwanan a. Kurdî zî nê ziwanan ra yew a, ziwani û abirîyayîşê dîyalektanê kurdî ser o zî fikrê cîya-cîyayî estî. Ferqê cîyabîyayena nê fikran çiyoy? Ma do dewamê nê birrî de, fikrê cîya yê ke der heqê na babete de ameyê vatiş dîyar bikê û ciwabê persê cîyayey û nîzdîyey dîyalektandê kurdî bigeyrê.

Ayê ke wazenê ziwani “kurdî” tena sey kurmançî, soranî û yan zî yewna dîyalete nîşan bidê, armanca ênan çî bena wa bibo, mîyanê çemberêk teng û tund ê lînguîstîk ra nêvejenê teber. Çîmkî peydabîyayîşê dîyalektan û şeweyanê cîya yê yew ziwani, tena bi qaydeyandê lînguîstîkî ya îzah nêbenê. Bi xûsusîyetê lînguîstîkî wa, tarîx, kultur, folklor, adet û toreyê yew komelgayî zî dîyarkerdişê ziwani û lehçeyê ênan de unsûrê esasî yî.

Ziwani ke dinya de peyda bîyê; wazenê wa merde yan zî ganî bibê, goreyê xûsîyetê ênan ê xomîyan û pêroyî, kome bi kome cêra aqitnayene yan zî tesnîfkerdena ênan, mewzûyê lînguîstîkî yo. Tesnîfkerdena ziwanan, yan goreyê xûsîyetê gramerê ênan yan zî goreyê mêrdimayîya ênan a tarîxî yena dîyarkerdiş. Ziwani kurdî zî bi dîyalektanê xo ya, berhemê têkilîya tarîxî ya kome û komikandê komelgaya kurdî yo. Wexto ke ma biwazê ziwandê dinya mîyan de cayê ziwani û dîyalektandê kurdî dîyar bikê, gerek ma verê heme çî têkilî û mêrdimayîya kurdî û ziwandê bînan dîyar bikê.

## 2. Ziwani kurdî bi dîyalektanê xo ya, koma ziwandê hînd-awrupa

mîyan de şaxêk ziwani arî (aryanî) yo

Ziwanandê dinya mîyan de koma ziwanandê hînd-awrupa, komeka hera û dewlemend a û wayîrê çimeyandê tewr kehênan a. Ziwanê kurdî zî bi dîyalektandê xo ra, koma ziwanandê hind-awrupayî mîyan de ca gêno. Ziwanê hind-awrupayî xo mîyan de benê di şaxî:

2.1. Şaxê Hînd-Awrupayî.

2.2. Şaxê Asyayî.

**2.1. Şaxê Hînd-Awrupayî:** “Ziwanê hînd-awrupa, malbatêka tewr dewlemend a ziwanandê dinya ya, û çimeyê ayê nûşte yê 4000 serrî estî.” [6] Ziwanê ke na grube mîyan de ca gêne, seke cêr de ameyê dîyarkerdiş, kome bi kome cêra abirîyenê;

2.1.1. *Ziwanê germenî:* Almankî, îngilizkî, flamanî, norveçî, swêdî, îzlandayî, hollandî û danî.

2.1.2. *Ziwanê romenî:* Fransizî, îspanyolî, îtalyanî, portekîzî, katalanî, romenî, ladîno û provenalî.

2.1.3. *Ziwanê silavî:* Rusî, sirpî, xerwatî, boşnakî, lehî, bulgarî, makedonî û slovenî.

2.1.4. *Ziwanê keltî:* Bretonî, galî, îrlandayî û îskoçî.

2.1.5. *Ziwanê baltikî:* Lîtvani û letonî.

**2.2. Şaxê Asyayî:** Ziwanê asyayî zî xo mîyan de benê di şaxî; ziwanê hindî û ziwanê îranî. “Eserê tewr kehêne na grube *Veda* yî û bi ziwanê sanskrîtî ameyê nûstîş.” [7] “Ziwanê hindî û ziwanê îranî, 2000 serre verê V. Z. cêra abirîyayê.” [8]

2.2.1. *Ziwanê hindî:* Na grube mîyan de ziwanê sey sanskrîtî, hindî, pencabî, bengalî, urduyî, seylanî, keşmîrî, sindî û sewbî ziwani gruba hindî estî. Nê ziwanan mîyan de sanskrîtî, sey ziwaneke tewr verên yê gruba hindî yeno qebûlkerdiş.

2.2.2. Ziwanê arî(aryanî-îranî)[9]: Ziwanê tewr verên ê na grûbe, ziwanê Avesta yo. “Ziwanê Avesta û sanskrîtîya Veda gelek pê manenê”[10]. Ziwanê grûba arî, goreyê sazbiyayîşê gramere xo, xo mîyan de benê çehar şaxî: 1-Grûba bakûr, 2- Grûba başûr, 3- Grûba rojhelat û 4- Grûba rojawayî.

Goreyê na tesnîfkerdene, kurdî dekewena mîyandê grûba rojawanê vakurê Îranî û farisî zî dekewene mîyandê grûba rojawanê başûrê Îranî. Na grube mîyan de zî kurdî û dîyalektê xo, pehlewî û farisîya verên û farisîya newa, peştûnî, belûcî, osetî... ca gênê.[11] Grûba ziwanandê rojawanê vakurê Îranî mîyan de kurdî[12]; ziwanêk xoser o, xusûsiyetê eyê xas û tarîxêk ayê qedîm esto. Binya û eslê xo de heme xusûsiyetanê ziwanê arî xo mîyan de paweno. Ne şiklêkê herimîyaye yê ziwanê farisî û ne zî yew dîyalekta farisî ya. “Çimkî senî ke her ziwanê germanî, almanî nîyo, her ziwanê îranî jî farisî nîyo.”[13]

Seke cor de zî ameyo vatiş, grûba ziwanê hindî-arî mîyan de sanskrîtî, avestayî, pehlewî û farisîya newa, kurdîya qedîm û dîyalektê xo, peştûnî, belûcî û dêrî ca gênê. Sanskrîtî û avestayî, na grube mîyan de ziwanê tewr qedîmî yê. Ziwanzan û cêgêrayoxî, ziwanê avestayî û pehlewî, sey di çimeyê kevnare yê farisî û kurdî qebûl kenê. Labelê çimeyê kevnare yê nê her di ziwanan yew bo zî, gerek ma naye zî bizanê ke farisî û kurdî di ziwanê xoser ê cîya yî. Seke Mc. Carus û Minorskî zî vanê, “Kurdî eslê xo de bi tamamî farisî ra cîya ya”[14] Bêguman cigêrayoxê ke winî vanê gelekî yê, tenê Mînorskî nîyo. Wexto ke ma ewro roj zî şopa nê her di ziwanandê qedîman (sanskrîtî û avestayî), hetê kelîman ra, hem bi dîyalekta zazakî û kurmancî ya û hem zî bi farisîya ewroyêna pê muqayese bikê, no xusûsiyet aşkera aseno.

Avestayî	Farisî	Zazakî(dimilî)	Kurmancî
“angušta	engoşte	engişte	pêçî, tilî
asman	asman	asmên	asîman
asta	estxuan	este, aste	hestî
âtar	ateş	adir	agir



awra	ebr	awr, hawr	ewr
azem	men	ez	ez
bara	bar	bar	bar
bereza	bolend	berz	bilind
cakuša	çakoş	çakûş	çakûş
çi, çina	çe	çi, çina	çi
daêwa	dîv	dêv/dêw	dêv
drajah	derazî	dergê	dirêjî
dujd	dozd	dizd, dijd	diz
duma	dim	dime	duv
gão	gâv	ga	ga
garema	germ	garm, germ	germ
goşah	gûş	gweş, goş	guh
hapta	heft	hewt, hot	heft
hizû	zebân	zûn, zon	ezman
hunara	honer	huner	huner

huşka	hoşk	hûşk, wûşk	hişk
mazga	meğz	mezg	mejî
mizda	mojde	mijdanî, mizgîn	mizgîn”[15]
“pancan	ponc	panc	pênc
raeşa	rîş	rêş/rîş	rîş
raoxşna	rûşn	roşn	ronahî
sâra	ser	sare	ser
sarata	sard	sard	sar
ters	ters	ters	tirs
teşte	teşt	teşt	teşt
ūrî	se	hîrî	sê
wafra	berf	vewre	befr
wahrka	gorg	verg	gur
wohuna	xun	gunî	xun
xara	xer	her	ker
yewan	cewân	cewan, ciwan	ciwan

zairita	zerd	zerd	zer
žnã	danisten” [16]	zan	zanîn

Prof. Dr. Abidin İtil bale kaşkeno “pêmendîşeya mabêna zîwanê sanskrîtî û zîwanê hemberyanê ênan[17] û seba dîyarkerdişê tesîr pêkerdena her di zîwanan zî mîsalanê balkêşan dano.” [18]

Sanskritî	Avestayî	Zazakî(dimilî)	Kurmancî
“aşva	aspa	astor	hesp
bhrâtar	bratar	bra	bra
cana	zana	za	za
duhitar	dughter	keyna	dot
go	gao	ga	ga
haridaya	zardaya	zare	dil
hima	zima	zimistan	zivistan
mâtar	mâtar	ma, maye	dê
pitar	pitar	pî	bav
şvasura	khusura	visture	xezur
vacra	vazra	virso	birûsk

varãha	varaza	xoz	baraz
vãta	bãda	va	ba
vayu*	vaya	va	ba”[19]

Seba ke ferqê mabêna koma ziwandê hînd-arî û şaxê ênan bi zelalîya bêro dîyarkerdene, lazim o ca bi ca hawayê bedêlîyayîşeya veng, vate û rêzbîyena vateyan bêro bidegêrayîş.

Wexto ke ma bala xo bidê vateyandê corênan, dîyar beno ke hetê xezîna vateyan ra koma ziwandê hind-arî çiqas nîzdîyê yewbin ê. Na nîzdîyêye terefê gelek cêgêrayoxan ra zî ameya vînayîş û dîyarkerdiş.

### 3. Der heqê zivan û dîyalektanê kurdî de, kê vato çî?

Bêguman sey heme ziwanan der heqê zivan û dîyalektanê kurdî de zî fikrê cîyay estî. Ez wazena etîya de biney behsê tesnîfkerdişê dîyalektanê kurdî bika û no derheq de çî ameyo vatiş, bîyara şima vîrî. Qandê naye rê zî, ma do behsê fikirdê tayê nûştux û kurdologê ke zivan û dîyalektanê kurdî ser o xebitîyayê bikê. Heta ewro heme dîyalekt û şeweyandê kurdî ser o xebatêka bi serûbere û besbîyaya bi ma dest nêkewta yan zî xebatê winayênî zaf kemî bîyê. Belkî xebatê akademîk ê ke ewro ra pey bêrê kerdiş, bibê sebebê nawitiş û akertişê yew rêçida newa. Labelê gerek ma na zî bizanê ke xebata ma ya ewroyêne zî çinîbiyaye ra dest pê nêkerda. Heta ewro der heqê zivan û dîyalektandê kurdî de gelek çî ameyê vatiş û nûstiş. Ez wazena ke bi kilmîye ênan ra behsê tayê vatiş, çime û xebatan bika.

Eke ma hawayêko kronolojîk behsê enî eseran û vatişan bikê, vernîya hemine de *Şerefname* yeno. *Şerefnameya Şerexan Begî* de çehar dîyalektê ziwandê kurdî ameyê hûmartiş: 1- kurmanç, 2- lor, 3- kelhur, 4- goran.[20]

*Şerefname* ra pey *Seyahetnameyê Ewliya Çelebî* yeno. Wexta ke ma *Seyhatnameyê Ewliya Çelebî* ra bewnî, kê şênê vajê ke der heqê kurdolojiyê de agadarîyê zaf mûhîmî tede estî, labelê etîya de ma wazenê giraneye ser hetê ziwani ra bide bewnî. “Serra 1655 de seyah Ewliya Çelebî û Melek Ehmed

Paşa, bi munasebeta seferêke ver bi Wanî ra kewenê ray û gelek cayanê welatê kurdan gêrenê. Çelebî der heqê na sefer û gêrayîşê xo de yew eser nûseno û nameyê eserê xo zî *Seyahatname* nano pa. *Seyahatname* de, behsê şiyês dîyalektanê ziwani kurdî keno û nameyê ênan zî wina rêz keno: Mehmûdî, avnikî, zazayî, loloyî, cîloyî (hekkarî), şîrvanî, cîzrewî, pisanî, sincarî, harîrî, erdelanî, soranî, xalitî, çekvanî, îmadî, rojkî.” [21] Wina aseno ke Çelebî nameyê eşîran, mintiqa, şêwe û dîyalektan tîmîyan kerdo. Gama ke ma ênan sey dîyalektan tesnîf bikê; tena lurrî, soranî, erdelanî û zazakî manenê. Ê çekûyê bînî zî, kes şêno vêşaneya ênan sey nameyê eşîran yan zî şêweyê kurmancî û soranî qebûl bikê.

Xebata pedagogê armenî Haçatur Abovyanî(1809-1848) zî tesîrêko giran îranologandê Rûsya sero kerdo. No semed ra Abovyan sey pîyê kurdolojîya Rusya yeno qebûlkerdiş. Abovyan zî dîyalektanê ziwane kurdî bi namebê kurmancî û zazakî di şaxî keno.

Abovyanî ra pey, xebata Peter J. A. Lerchî (1828-2884) yena, ke sey hîmdar û viraşttoxê kurdolojîya Sovyetî yena qebûlkerdiş. Goreyê belgeyandê ewro, “metnê verênî yê zazakî (dimilî) zî ey bi xo, goreyê fek û vatişdê kurdê ke lejdê Rusya-Osmanîyan de esîr kewtibî, pêser kerdî. Serra 1857-58 de, nê nûste û metnî St. Petersburg de yenê çapkerdiş û vilakerdiş. Ferhengê vernî yê zazakî-rusî zî, serra 1858 de yeno nûstiş. Eynî wext de Albert von Le Cod zî, tayê metnê folklorê kurdî bi dîyalekta kurmancî û zazakî ya pêser kerdî û serra 1903ê Berlîn de dayê çapkerdiş û vila kerdî.” [22]

Bêguman mesela materyalê dîyalekta zazakî û nûstişê aye, zaf mûhîm a. Ewro roj ma destê de eserê ke şiklê verên ê zazakî û tekamûlê ayê tarîxî binawnê çinî. Eke dokomentê arêkerde yê Peter J. A. Lerchî (1858) nêbê, agadarîya ewroyî gore, nûste û kitaba verêne ya zazakî *Mewlûdê* (1899) Mela Ehmedê Xasî yo. Naye ra pey zî, *Mewlûdê* miftîyê Sewêreke Mela Usman Efendîyê Babijî yo, ke serra 1903ê de nûsîyawo û 1933 de zî Şam de ameyo çapkerdene.

Major E. B. Soane zî der heqê ziwane kurdî û ferqê mabêna dîyalektandê ênan de vano:

“Lehçeya mukrî û gilandê aye ra teber Kurdistan de sewbîna lehçe û şêweyî zî estî û pêro zî xo sey kurdandê xasan qebûl kenê. Nê lehçan ra yewêda tewr mûhîm zî lehçeya zazakî ya. Zazayî, kurdan mîyan de grûbêda gird a û derûdorê Diyarbekir, Ezirngan û tayê cayandê Anatolya de ciwîyenê. Vêşaneya ênan mintiqa koyan de ciwîyenê, zaf tund û cesûr î. Bi yew lehçeya saf a arî qalî kenê.

Lehçeya ênan hem lehçeya mukrî ra û hem zî lehçeyandê bînan ê kurdî ra cîya ya. Winî fehm beno ke na lehça ênan, yew lehçeda xoser a û zaf rewna farisîya kehan ra abiryaya. Sey ziwandê arî, gerek na lehça ser o zî xebate bêro kerdiş. Lehçeya zazakî; farisî ra vêşêr nizdîyê ziwandê kurdî ya”[23]

Sir H. C. Rawilson, benda “Kurdistan” a *Ansiklopedîya Britannica* de der heqê ziwandê kurdî de winî vano: “Ewro ziwandê esasî yê kurdan kurmancî ya, zazakî û goranî zî dîyalektê cîya yî.” [24]

M. Emîn Zekî Beg, Madson Grantî ra neqil keno û vano: “Esrê III. ê V. Z. ra na heta ziwandê kurdî de hîrê dîyalektî peyda bîyê: Dîyalekta kurmancî, babanî û zazakî (dinbilî).” [25] Û eynî wext de Zîya Gokalp ke bi xo çermûgij o, dîyalektanê ziwandê kurdî no hawa tesnîf keno: 1- kurmancî, 2- zazakî, 3- soranî, 4- gûranî û 5- lûrî.[26]

Sernûşttoxê kovara *Kurdistan* Mehmed Mîhrî zî vano, “Esasen ziwandê kurdî di qismî yo: Kurdî û goranî. Goranî zî xo mîyan de bena di şaxî: hewramanî û zazakî.” [27]

Roger Lescot û Celadet Alî Bedirxanî ke “*Gramera Kurdmancî*” hadirnaya, der heqê dîyalekt û şêweyanê ziwandê kurdî de vanê: “1- kurmancî, 2- soranî, 3- dumilî (zazakî), 4- goranî (û gelek şêweyê herêmî yê ênan)” [28] estî.

Kemal Badilli zî, vano çehar birrê ziwandê kurdî estî: “1- kurmancî (kurdmanc/ kurmac/kirmanc/kirmaç), 2- lûrî (lûr, lor, ler), 3- goranî (hewramî, ewremanî, zaza/ dimilî), 4- kelhûrî yan zî soranî.” [29]

Prof. Marûf Xeznedar zî, tesnîfkerdişê mamoste Tewfîq Wehbî esas qebûl keno û dîyalektanê ziwandê kurdî winî tesnîf keno: “1- kurmancî (a-kurmancîya serû, b-kurmancîya xwarû-soranî), 2-goranî (hewremanî)/ zazayî, 3- lûrî (bextiyarî, feylî, kelhûrî, lekî zî sey fekê na dîyalekte qebûl keno).” [30]

Sey ziwandêko kehan ê arî(îranî), têkilîya pehlewî û ziwandê kurdî û dîyalektandê ey ser o zî fikrê cîyayî estî. Wexto ke ma rind bala xo bidê vateyandê ênan, bi hawayêko zelal aseno ke zazakî çiqas nizdî pehlewî û farisî ya, kurmancî zî ehende nizdî ênan a. Mîsal;

Kirdkî (Zazakî)	Pehlevkî	Kurmancî
acêr	azêr	jêr
adir	ater, atur, ateş	agir
ameyene	ameten	hatin
ard	ard	ard, arvan
asin	asên	hesin, asin
asmên, asmîn	asman, esman	asîman, asman
bes	ves	bes
ciwîyayîş	cîvîşnîh, zîsten, cenîh	jiyîn, jîyan, jîn
çere	çerek	çêre
çime	çeşmek	çavî, çavkanî
darû	darû, darûk	darû, derman
derg	derg, diraz, degr	dirêj
dest	dest	dest
mezg	mezg	mêjî
resayîş	resîten	gihîştin, gîhan

sêne	sênek	sîng
sole	şorek	xwê
şamî	şam	şîv
şane	şanek	şeh
şew	şep	şev
va	vay, vat	ba
varan	varan	baran
vazdayîş	vazîşin	bazdan
velg	velg, verg	belg
veng	vang	deng
verg	gurg	gur
vewre	vefr	befr
virso, bilîsk	virozak	birûsk”[31]

Nê agadarîyana pey ma şênê vajê ke helbet bi hawayêko mutleq dîyarkerdena tarîxê cirabîyayîşê yew zivan û dîyalektandê eye asan nîyo, labelê ma şênê vajê ke nê zivanî pêro têmîyan de sey parçeyêk azbeta zivanandê arî (îranî) yenê qabûlkerdiş.



Ziwanzan Qanatê Kurdo zî kitaba xo ya *Gramera Ziwane Kurdî (Kurmancî û Soranî)* de, ziwane kurdî sey çehar dîyalektan cêra abirreno: 1- kurmancî, 2- zaza, 3- lûrî, 4-goranî.[32]

Cîgerxwîn zî zaf nûste û şîrandê xo de zazakî sey yew dîyalekta kurdî qebûl keno û kitaba xo ya *Awa û Destûra Zimanê Kurdî* (1961) de zî eynî fikrî tekrar keno. A. Balî zî dîyalektanê ziwane kurdî sey hîrê saxî dîyar keno: “1- kurmancî, 2- soranî, 3- zazakî.” [33]

Agadarî û bawerîya nê kordolog û zanyaran ra zî dîyar beno ke ma kurdîya kevnare, sey yew azbat qebûl bikê kurmancî, soranî, hewramî û zazakî zî dekiwenê mîyandê aye azbate. Kes şeno vajê ke nê dîyalektan mîyan de zî bîlhesa hewramî, goranî û zazakî hîna nîzdî yewbine asenê.

Nê agadarîyê corênan ra dîyar beno ke ziwane kurdî zî xo mîyan de gelek dîyalektan ser o par beno. Ke ma baş bala xo bide, beşê “morfolojî” ya na xebate de zî dîyar beno ke nîzdîyeya mabênê dîyalektandê kurdî, ferqê ênan ra zaf vêşî ya. Hetê tarîxî û komelnasî ra zî, kok û rûçikê etnîkî yê qisekerdoxanê nê ziwane û lehçeyan şino pêser û yew o. Ayê ke çend dîyalektanê ziwane kurdî û tayê xusûsiyetanê eyê esasî bizanê, ên (în) do bivînê ke ferqê dîyalektanê kurdî, ferqê dîyalektanê ziwandê bînan ra vêşêr nîyo.

#### **4.Vateyê zaza û zazakî, dimil û dimilî, kird û kirdkî,**

##### **kirmanc û kirmanckî kamcin mana de ameyê gurênayîş?**

Wexto ke ma bala xo bidê belge û nûsteyandê tarîxî, seba zazakî/dimilî/kirdkî/ kirmanckî û qisekerdoxandê zazakî rê, hem xo mîyan de û hem zî terefdê şarê xerîbî ra vate û kelîmeyê cîya cîyayî ameyê nûstîş û telafûzkerdiş. Ewro roj qisekerdoxê zazakî, ca bi ca xo bi nameyê “zaza”, “dimilî”, “kird” û “kirmanc” tarîf kenê, ziwane û dîyalekta xo zî bi namedê “zazakî”, “kirdkî”, “dimilî” yan zî “kirmanckî” danê şinasnayîş. Kelîmeya “kird”, mintîqa Gêl û Pîranî de mana dîyarkerdişê yew ferqê tebeqa sosyolojîk zî yena vatiş. No derheq de Zîya Gokalp zî vano: “Qewmanê kurdan nameyê cîya-cîyayî nayê xo ra û yewbîna. Mîsal; êyê ke kurmancî qisey kenê xo ra nêvanê “kurd”, vanê ma “kurmanc” î û zazayana zî vanê “dûnbûlî”. Ay ke zî zazakî qisey kenê xo ra vanê “kird” û kurmancan ra zî vanê “kirdasî”. Tirkî zî, “kurmanc”an ra vanê “kurd” û “dunbulî”yan ra zî vanê “zaza”. Bîzatîhî ne qisekerdoxê zazakî û ne zî ê kurmancî bi xo kelîma “zaza” nêxebitnenê.[34]

Wexto ke ma bala xo bidê nûsteyandê verênan yê “zazakî”, na tespîta Zîya Gokalp û sewbî kesê ke winî vanê raşt vejîyena. Hem P. Lerch de û hem zî *Mewlûdê* Mela Ehmedê Xasî de zî seba xo sinasnayîş dayene kelîma “kirdî” ameya xebitnayîş. Xoceyê Xasî peynîya *Mewlûdê* xo de winî vano: “Temam bi viraştîşê *Mewlûdê kirdî*, bi yardimê Xaliqî û bereketê pêxemberê ma”. [35]

Yew qîsmê dêrsimijê ke bi dîyalekta dimilî qisey kenê xo ra vanê “kirmanc”, bi umûmî kurmancan ra zî vanê “kirdas” û dîyalekta ênan ra zî vanê “kirdasî” yan zî “kirdaskî”. [36]

Nûrî Dêrsimî zî zazakîya Dêrsimî sey zîwanê xas ê kurdan qebûl keno û vano: “Zîwanê zazakî yê ke Dêrsimijî qisey kenê, bêguman zîwanê bawkalandê înan ê Med û Arîyan o.” [37]

Kemal Badilli zî vano: “Zazayê Turkiya, xo kurdê esil qebûl kenê û xo ra vanê kird û kurdandê bînan ra, yanî kurmancan ra zî -bi mana hûrdî vînayîşî de- vanê kirdasî. [38] Prof. Mehrdad R. Izady zî der heqê na mesela de vatişê Bazil Nikitinî neqil keno û vano: “semedo ke qiseykerdoxê dimilî zaf vêşî herfa /z/ xebitnenê, kurmancan ênan ra vato “zaza”. [39]

V. Minorskî zî vateyê “dimilî” û “deylemî” pêwa girêdano û vano vatedê Andreasî gore, mabêndê “zazayan û deylemîyanê verênan de mêrdimayî esta.” [40] Gerek ma xo vîrê nêkê ke nûste û kitabandê cîyayan de, gelek formê cîya cîya yê nûstişê kelîma “dimilî” estî: “dimilî”, “dumbilî”, “dinbilî” û “dimilî”. Zaf cayan de zî formê kelîma “dimilî”, sey nameyê yew eşîre vêreno. Mîsal *Şerefname* de “dinbilî”, sey nameyê eşîrêka êzidî ya derûdorê Musil û Şamî vêrena. [41] Ewro zî tayê mintiqan de bi nameyê “dumbilî”, “dimbilî” û “dumilî” eşîrî estî.

Robert Olson zî vateyê “zaza”, “deylem” û “goranî” sey vateyê pêwa têkildar qebûl keno û vano: “Zazayê zîwandê xo ra vanê dimilî, ke no zî, îhtimalê têkilîya ênan û deylemîyanê vakurê Îranî ano kesî vîrî. Lehça kurdî ya zazakî, kurmancî ra -ke vêşaneya eşîretandê Kurdistana Bakurî pê qisey kenê- vêşêr nîzdîyê lehça goranî ya.” [42]

Vateyê “zaza” û “dimilî”, tayê çimeyan de zî manaya nameyê eşîran û cayan de ameyo nûstiş. Tayê nûstox û çimeyê bînî zî vateyê “zaza” bi vatedê “zevezan(zozan)”, “zevezanîye”, “zavzan”, “zewezan”, “zewzan”, “zozanîye” û “zûzan” ra girêdanê. [43]

Wexto ke mesela “zaza” yan zî “zazakî”, “kurd” yan zî “kurmançî” bibo û kes behsê tayê nûşttoxandê îdeolojîya fermî ya tirkî nêkê, belkî manîpûlasyonê ewroyênî zî raşt fehm nêbenê. Der heqê na mesela de Nazmî Sevgen vano: “zazakî ziwaneke tîmîyanek o û eslê xo de zî tirkî ra peyda bîyo.” Peydabîyayîşê kelîma “Zaza” zî tirkandê Oxuzan ra girêdano û vano: “Za” nameyê yew lajê Oxuzxanî bî. Qewmanê îptîdaî seba ke vatişê nameyê yewheceyî şidênaye telafûz kerdênê, nameyê “Za”yê lajê Oxuzxanî zî bi hawayê “za-za/zaza” ameyo vatiş.[44] Hayrî Başbuğ zî, na mesela ser o vateyê nîzdî vatişê Sevgenî tekrar keno û vano: “Tayê mêrdimî qestî ra, bi nîyeto xirab û pêşînhikum “zaza”yan mefhûma “kurd”an mîyan de mutala kenê. Labelê no hikum, vera realîta tarîxî tam tezatêk teşkîl keno... Kurmançî zî û zazakî zî di lehçeyê cîya yê tirkî yê. Goreyê fikirdê ma; nameyê “zaza (za-za)”, bi bedêlyayîşê nameyê “su/aw”(su-su) ra peyda bîyo.”[45]

Kê şênê mîsalanê winasarênan hîna derg û vêşî bikê, feqet ez vana qey seba zelal kerdiş û aşkere kerdişê nê beşê xebata ma, agadarîyê corênî, têkilîya tarîxî û manaya xebitnayena nê vateyan bi zelalîye dîyar kenê.

## 5. Nûsteyê dîyalekta zazakî

Wexto ke mesela dîyalektê ziwaneke kurdî û bîlhesa zî zazakî bo, gerek kes biney behsê dokument û nûsteyandê zazakî (dimilî) zî biko. Çimkî yew nîşanê dewlemendîya ziwanan zî, nûste û hecmê nûstişê ziwaniyo. Ewro roj nûste û dokumentê zazakî yê ke ma destê de estî zaf kemî yê. Hetê nûstişî ra dîyalekta zazakî lawaz a, henda kurmançî aver nêşîya. Eke ma nûsteyê hewramî û goranî xanedê zazakî ser o nêhesibnê û ewro ra pey sewbî dokumentê newe yê zazakî cayandê tarî ra nêvejî roşnayê, nûste û dokumentê ke mabênê serrandê 1856-58 de terafê Peter Lerchî ra bi namedê “*Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nord-Chalder*” ameyê pêserkerdiş, sey dûkomentê verênî yê zazakî qebûl benê. Nê materyalandê folklorîkanê zazakî de, hem kelîma “**kird**” û hem zî “zaza” ameyê nûstiş. Vateya “kird”, pênasîya ênan bi xo ya. P. Lerc mesela “*Qauxê Nêrib û Hêynî*” de, vateyê Xelef Axay no hawa neqil keno: “*Xelef Axayî va ki eskerî xoe ra: Baunî (bawnî) axaler, ma şuenî kauxe, metirsî, eskerî Deqma Begî zavû, hema piyeru Tirk î, nişênî ma de kauxe bikî, ma piyerû canmirdî kirdan î, miyerdeî aşîran î, metersî, ma ha şuenî, heta ki sereî mi niwenu, şima çewîrî çî çinu...*”[46] Wexto ke ma bala xo bidê nê metnan, eke tayê kemaneya alfabeya nûstişê metnan nêbo, sey ziwaneke eyro yê mintîqa Nêrib o, qet nêbedêlyayo.[47]

Nînan ra teber, ma şênê vajê ke nûste û nûstîşê zazakî (dimilî, kirdkî, kirmancî), no demeyo nîzdî de yanî serrandê 1975î ra na heta roj bi roj vêşî bîyê. Nê serran de kovara *Tîrêj* û rojnameyê *Roja Welat* de tayê helbest û nûsteyê folklorîk ê zazakî ameyê çapkerdiş. Ewro zî tayê kovaran û malperan de nûsteyê zazakî yenê çapkerdiş û velakerdiş. Wexto ke behsê xebat û nûstîşê zazakî bibo, hewceyo ma verê hemine xebata kovar û *Grûba Vateyî* bîyarê xo vîrî. Bêguman dîyalekta zazakî tena kovara *Vate* de nê nûstîyena, kovarê sey *Armanc, Hêvî, War, Bîr, Tija Sodiri* û ê bînan de zî nûsteyê bi dîyalekta zazakî ameyê çapkerdiş û velakerdiş.

## 6. Cayê ke qiseykerdoxê zazakî(dimilî) tede vila bîyê

Ewro der heqê hûmara nifûsê qiseykerdoxandê zazakî de fikrê cîya-cîyayî estî. Goreyê tayê vatişan, bi texmînî nîzdî 2,5-3 mîlyonî qiseykerdoxê zazakî estî û tayêna zî reqamêka hîna girde vanê. Cêgêrayox û nûstox Osman Aydin zî vano “goreyê hûmartîşê nifûsê serra 2000î (14.388.784), %6.54ê nifûsê Kurdistan Bakurî, bi lehça dimilî (zazakî) qisey kenê.” [48] Dîyar o ke der heqê na mesela de fikrê cîyayî estî. Bêguman heta ke xusûsî dew û şeharandê kurdan de û umumî zî tayê şehar û metropolandê Turkiya de, bi hawayêko raşt û aşkera nifûsê qiseykerdoxê zîwan û dîyalektandê kurdî nêbêrê tesbîtkerdiş, xerîteya dîyalektanê kurdî nêvirazîyo, dîyarkerdişê nîsbetê qiseykerdoxandê zazakî zaf zehmet o. Çimkî zaf cayê ke bi nifûsê xo pêro zaza yenê qebûlkerdene, ke ma rind bala xo bidê dîyar beno ke ewcayan pêro zaza nîyê, nifûsêkê mûhîm ê kurmancan zî ewca de esto.

Wexto ke ma bala xo bidê cografa velabîyayîşê eşîretan û zîwanê ênan, no hal hîna zelal dîyar beno. “Kurdistan de zaf eşîretî estî ke yew mintîqa de dimilî (zazakî), yew mintîqa de kurmancî, yewna mintîqa de zî soranî û hewramanî qisey kenê. Mesela: Eşîra Heyderan, Dêrsim de zazakî, Wan de kurmancî û başûrê Kurdistanî de zî soranî qisey kenê; eşîra Lolan, Dêrsim de zazakî, mintîqa Wan û Hekarî de zî kurmancî qisey kenê; eşîra Demenan, Dêrsim de zazakî, mintîqa Sêwaz, Wan û Hekarî de zî kurmancî qisey kenê; eşîra Şadiyan Dêrsim, Çewlîk, Muş û Qereqoçana Xarpête de kurmancî û qeza Madenî de zî zazakî qisey kenê; eşîra Îzolî Çewlîk, Dêrsim, Elazîz, Melêtiya û Sorek de kurmancî û qeza Pûtûrge ya Melêtiya de zî zazakî qisey kenê; Xormekê Çewlîke tayê dewê ênan zazakî û tayêna zî kurmancî qisey kenê... ” [49] Yanî cayê qiseykerdoxanê dimilî(zazakî) yewpare nîyo.

Mehmed Mîhrî seha ewroyên a vilabîyayîşê zazayan sero winî vano: “Zazayî; binkîyê qismêk wîlayetandê sey Erzerom, Xarpêt, Dîyarbekir, Bedlîs û Azerbaycanî yê.” [50] Ay wîlayet û qezayê ke

bi temami yan zî qismî zazakî qisey kenê: zafiya nifûsê sûka Çewlîke; zafiya nifûsê Dêrsimî bi zazakî qisey kenê; qismêke muhîm ê mîyanê sûka Dîyarbekir û zafiya qezayanê sey Pîran, Hêne, Gêl, Çermûk, Çingûş û qismêk Lice û Qulp; qismêke mîyanê sûka Xarpête û qezayê ayê sey Palî, Maden, Xuleman û 15-20 dewê mintiqa Qerebegan; nîsbetêke kemî mîyandê sûka Ezirganî de û mintiqa Qerdere ya mabêna qeza Tekman û Pilûmuriye de nizdî 30 dewî zazakî qisey kenê; wîlayetê Semsûrî de tena qeza Aldûşî, Riha de qismêkê qezaya Sêwrege, Bedlîs de 15ê dewê Modkan, Mûş de zî qismêke kemî yê qeza Vartoye, qorî qezayandê Sêwaz, Erzirom, Sêrt û cayanê bînan de zî koloniyê dîyalekta qiseykerdoxanê zazakî estî. Ma şênê vajê nê cayê ke cor ra ameyê hûmaritiş, ênan ra teber, dîyaspora de û metropolandê Tirkîya de zaf vêşî nêbo zî tay nifûsêk qisekerdoxandê zazakî esto.

\*\*\*

Peynîya nê beşî de, sey ke cor de gelek cigêrayoxan zî dîyar kerdo, ma şênê vajê ke kurdî zî sey heme ziwandê dinya, xo mîyan de dîyalekt bi dîyalekt cêra abirryena. Zazakî zî enê dîyalektan ra yew a. Gerek kê bîyayena dîyalektanê cîyayan sey çîdêk negatîf nê, sey xezîneyêk dewlemend a ziwani bivînê. Bîyayena dîyalektanê cîyayan, “tenîya xûsusîyetêk ziwandê kurdan nîyo; dinya de neteweyê ke ziwandê ênan tewr sererast û dewlemend o, dewre bi dewre edebîyatêk ênan ê se seran esto, hema zî lehçeyê ênan estî, ganî yê û sey wexto verên qalî benê.”<sup>[51]</sup> Dewamê na xebate de zî dîyar beno ke ferq û nizdîyeya ziwani û dîyalektandê bînan û bîlhesa zî yê koma arî çî hend o seke, yê zazakî û kurmançî zî kemî-vêşî ehend o. Nizdîyeya mabênê dîyalektandê kurdî, ferqê ênan ra zaf vêşî ya. Hetê tarîxî û kulturî ra zî, kok û rîçikê etnîkî yê qiseykerdoxandê nê ziwani û dîyalektandê eye şino pêser û yew o.

[1] Prof. Dr. Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları, 5. Baskı, Ankara, 1995, r. 145

[2] Ludwig Paul, *I. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, 2011, r. 20

[3] F. De. Saussure, Neqilkerdox: Prof. Dr. Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 1995, r. 146

[4] Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları, 5. baskı, Ankara-1995, r. 142

[5] Kurdîyê Bîtîsî, *Jîn*, h.: 14 (1919), wergera M. Emîn Bozarlan, Weşanxaneyê Deng, Sweden, 1985

[6] Steven Roger Fischer, *Dilin Tarihi*, çev.: Muhtesim Güvenç, Türkiye İş Bankası Yayınları, İstanbul, Haziran 2013, r. 75

[7] Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları, 5. baskı, Ankara, 1995, r. 125

[8] C. V. Ceram, *Tanrıların Vatanı Anadolu*, çev.: Esat Mermi Erendor, Remzi Kitapevi Yayınları. 2. baskı, Ankara, 1984, r. 184

[9] Kelîma “îran”î, “aryanî”ya sanskrîtî ra peyda bîya. Na xebate de wexto ke ma vanê îranî, qestê ma tena ziwanê farisî (persî) nîyo.

[10] Korhan Kaya, *Hindistan’da Diller*, İmge Yayınları, Ankara, 2005, r. 23, 24

[11] “Belgeyê tewr kehên ê grûba hind-îranî, belgeyandê Mîtanîyan mîyan ra vejîyayê. Mîtanîyan, vakurê Mezopotamya de, nîzdî 1500 serrî verê bîyayîşê Îsayî dewletêk viraşt bî.”(Korhan Kaya, *Hindistan’da Diller*, weş. İmge, 2005, r. 70)

[12] No nûste de kelîma “kurdî”, cayê “kurdîya qedîme” û dîyalektanê kurdî de ameya nûstîş. Etiya de wexto ke ma vanê “kurdî”, qestê ma, hem kurdîya qedîm a û heme zar û lehçeyê ke kurdîya tewr verên ra peyda bîyê; sey kurmancî, kirmanckî (kirdkî/ zazakî/ dimilî), soranî, hewramî, goranî, lurî, kelhurî û ayê bînî yê.

[13] Zuhdi El Dahoodî, *Kürtler: Tarih Kültür ve Yaşam Mücadelesi*, Deng Yayınları, r. 162

[14] Mc. Carus & Minorsky, *Kürtlerin Menşei ve Kürt dili incelemeleri*, çeviren: Doğan Kılıç Şihhesenanlı, Sönmez Neşriyat ve Matbaacılık, İstanbul, 1963, r. 46

[15] M. Siraç Bilgin, *Zarahuştra Gathalar*, Doz Yayınları, r. 170, 184

[16] Armîn Kesrevî, *Xud Amûzî Xetî Avestayî*, rûp: 4, 5, 7, 8, 9, 10, 14, 15, 17, 18, 19, 22, 23, 29, 31, 33, 34 <http://www.zoroaster7.persianblog.com>, <http://www.avesta.org/yasna/hasna.htm>, 10/04/2013

[17] Korhan Kaya, *Hindistan'da Diller*, İmge Yayınları, Ankara, 2005, r. 79

[18] Ke hemberyanê ênan Mîtanî û Kassîdî yê. Mîtanî, V. Z. serrê 1500-1300 de, vakurê Mezopotamya de Sûrya ewroyên ra bigîre heta Filîstin vela bîbî. Kassîdî zî, V. Z. serrê 1750-1170 de, Babîl de hukûm kerdo (Korhan Kaya, *Hindistan'da Diller*, İmge Yayınları, Ankara, 2005, r. 79)

\* No vate, zîwanê sanskrîtî de yeno mana "Homayê Vayî". bn. Korhan Kaya, *Hindistan'da Diller*. İmge Yayınları, 2005, r. 27

[19] Korhan Kaya, *Hindistan'da Diller*, r. 24-25, İmge Yayınları, Ankara, 2005. Wexto ke ma bala xo bidê bedêlîyayîşê vengandê mabêna zîwanê sanskrîtî-avestayî, ma veynenê ke vengê /s/ yê /h/ reyde, /h/ yê /z/ reyde, /c/ yê /z/ reyde, /şva/ yê /spa/ û /spa/ zî yê /xu/ reyde bedêlîyenê. b., ç.v., İmge Yayınları, Ankara, 2005, r. 24-25

[20] Şeref Xan, *Şerefname*, Hasat, 4. Baskı, İstanbul, 1990, r. 20, Sewbî zî bewnî: Mc. Carus-Minorsky, *Kürtlerin Menşei ve Kürt Dili İncelemeleri*, Sönmez Neşriyat ve Matbaacılık, İstanbul, 1963, r. 48

[21] Martîn Bruinessen, *Studia Kurdica, Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebi'nin Notları*, hej: 1-3, weş. Enstituya Kurdî ya Parîsî, Nîsana 1985, r. 18

[22] Joye Blau, *Kürtçe Dilbilim ve Sözlük Çalışmaları, Studia Kurdica*, No:1-3, Paris, Nisana 1985, r. 65

[23] M. Emin Zekî Beg, *Kürtler ve Kurdistan Tarihi*, 4. Baskı, çev.: Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2012, r. 297

[24] Neqilkerdox: Bilal N. Şimşir, *Kürtçülük(1787-1923)*, Bilgi Yayınları. 3. Baskı, İstanbul/ 2009, r. 519

[25] M. Emin Zekî Beg, *Kürtler ve Kurdistan Tarihi*, 4. Baskı, çev.: Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2012, r. 290

[26] Ziya Gokalp, *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınları, Nisan 1992, r. 27

[27] Mehmed Mîhrî(M.M), *Mukaddimet-ül İrfan*, Necmî İstikbal Metbası, İstanbul, 1918, b.. <http://www.kovarabir.com/mehmet-mihrim-m-mukaddimet-ul-irfan/>, 15/06/2013

[28] Emîr Celadet Bedirxan, & Roger Lescot, *Kürtçe Dilbilgisi*, Doz Yayınları, İstanbul, 1997, r. 9

[29] Kemal Badilli, *Türkçe İzahli Kürtçe Gerameri(Kurmançça Lehçesi)*, Med Yayınları, 2. Baskı, İstanbul, 1992, r. 22, 23

[30] Prof. Maruf Xeznedar, *Zimanê Kurdî*, <http://www.kovarabir.com/dr-maruf-xeznedar-zimane-kurdi/>, 17/06/2013

[31] Malmîsanij, *Ferhengekê Kirdkî(Zazakî)-Pehlevkî-Kurmanckî*, çap: Apec, Sweden, 1997

[32] Qanatê Kurdo, *Gramera Zimanê Kurdî (Kurmancî-Soranî)*, Koral Yayınları, İstanbul, 1990, r. 7

[33] A. Bali, *Kürtçe Dilbilgisi (Türkçe İzahli)*, Alan Yayınları, Mart 1992, r. 35

[34] Ziya Gokalp, *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınları, Nisan 1992, İstanbul, r. 27

[35] Mela Ehmedê Xasî, *Mewlûdê Nebî*, Fırat Yayınları, İstanbul, 1994, r. 42

[36] Malmisanij, *Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri*, Deng Yayınları, İstanbul, 1996, r. 11



[37] Dr. Nûrî Dersimî, *Kurdistan Tarihinde Dersim*, Doz yayınları, İstanbul, r. 65

[38] Kemal Badilli, *Türkçe İzahli Kürtçe Gerameri(Kurmançça Lehçesi)*, Dipnot: 2, Med Yayınları, r. 22

[39] Izady, Mehرداد R, *Bir el Kitabı Kürtler*, Doz Yayınları. r. 299

[40] *İslam Ansiklopedisi*, Cilt: 6, r. 1112

[41] Şeref Xan, *Şerefname*, Hasat yayınları, 4. Bask, 1990, r. 21

[42] Robert Olson, *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said Ayaklanması*, Özge yayınları. Ankara, 1992, r. 145-46

[43] Malmisanij, *Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri*, Kasım 1996, Deng Yayınları, b. notê binên ê 153, r. 11

[44] Nazmî Sevgen, *Zazalar ve Kızılbaşlar: Coğrafya-Tarih-Hukuk-Folklor-Teogoni*, Kalan Yayınları, Ankara, r. 34

[45] Hayri Başbuğ, *İki Türk Boyu: Zazalar ve Kurmanclar*, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Ankara-1984) , r. 17-33

[46] Peter J. A Lerch, *Forschungen über die kurden und die iranischen Nordchaldar*. Band I, St. Petersburg 1857, r. 78

[47] b., qismêk çîroka ke ay metnan mîyan de ameya velakerdiş: “Zemanê veriyê yew(yau) mêrde û cênîyay (cênîai) xoe bî, yew (yau) keîna û yew lac tera bî. Cenîya eyî merde, peynîde mêrde şî yewna cênî arde. Di serrî vînerî, yew keyna aya cênî ra bî. Na cênî bîye dişmenê lacek û keyneka veryêne.

Keîneke şuena golikan de; keîneke rocêkî yereyî golikana yena, ek birayê xoe çînu, persêna cênîyay bawukî xoe, vana ki: Birayê mi ça yo? Cenêke keynek ra vana ki: Birayê tue şîyu key xalanê xoe.

Keînek aya şu ra kuwena, hau(hawn) veyênena, ek birayê xoe kiştu, eîştu zîndan. Sibah wardena, baukê xoe ra vana: Bawo mi emşewe yew hewn dî, eki cenîyay tue(to) birayîê mi kiştu, eîştu zîndan. Baukê keyneke xoe ra va ki: Xêr bo, senî birayê tue(to) kişêno?

Keînek va ki: bau(bawo), mi haunê(hawunê) xoe de dî, birayê mi kiştu, eîştu zîndan, ez ha warzenua, şuena golikan de, yerey yena keîye, eke birayê mi ameu (amewo), ez zama weşu, xeyir ke biraê mi nêameû ez hênî tuerî golikande nêşuêna, ez etîya nêvindena.

Baûkê keyneke xoe ra va ki: Ewru ti şue golikande, ez gêrena, eke mi biraî tue dî, bizani ki: Ek cenîa mi şima de saxe na, xeîr ki mi biraî tûe nêdî, ne ez vindena ne ti viunde.” Lerch, Peter J. A.: *Forschungen über die kurden und die iranischen Nordchaldar*. r.: 80-81. Band I St. Petersburg 1857

[48] Osman Aydın, *Li Kurdistanê Bakûr Struktura Demografîk*, [www.lemonde-kurdi.com](http://www.lemonde-kurdi.com), h.:19

[49] Seyîdxan Kurij, *Zazalar ve Zazaca Yazınının Tarihçesi*, <http://www.kovarabir.com/seyidxan-kurij-zazaca-yazininin-traihcesi-II>, 18/06/2013

[50] Mehmed Mîhrî (M. M.), *Mukaddimet-ûl İrfan*, Necmî İstikbal Metbası, İstanbul, 1918, b. <http://www.kovarabir.com/mehmet-mihrim-m-mukaddimet-ul-irfan/>, 15/06/2013

[51] Kurdîyê Bîtîlîsî, *Jîn*, hej: 14(1919), wer.: M. Emîn Bozarlan, Weşanxaneya Deng, Sweden,1985

## NAVNASÎ

Nav dikarin li ser du beşên serekî bên parvekirin: *navên giştî* û *navên taybet*. Navên giştî navên wisan in ku gelek navkiryên wan hene. Bo nimûne, "sêv, dikan, gund" navên giştî ne ji ber ku gelek sêv, gelek dikan û gelek bajar hene. Navên giştî li gor taybetmendiyan tiştan li wan tên kirin. Tenê hin fêkiyên li gor hin taybetmendiyan sêv in lê di heman demê de hemû fêkiyên ku ew taybetmendî hene sêv in. Her devera ku 100 – 1000 kes lê bijîn û ji şengehên din dûr be, dikare wek "gund" were binavkirin. Lê mirov nikare ji cihekî sed hezar yan milyon kes lê dijîn re bibêje "gund". Navên giştî di kurdî û piraniya zimanên latînivîs<sup>25</sup> de bi herfên hûr (biçûk) tên nivîsîn eger ne li destpêka hevokê bin.

Navên taybet navên xusûsî yên kesan, cihan û berhemana in. Bo nimûne, Hesên, Diyarbekir, Şerefname (kitêba Şerefxanê Bedlîsî ya li ser tarîxa kurdan) navên taybet in. Navên taybet dikarin tekane nav bin: bo nimûne, em tenê bajarekî bi navê Diyarbekir nas dikin, ti bajarên din yên bi wî navî nînin.

Lê navên kesan tevî taybetiya xwe jî kêma çare tekane ne: gelek kes hene ku navê wan Hesên e. Lê dîsa jî Hesên navekî taybet e. Sebebê vê ew e ku mirov adeten ne ji ber hin taybetiyên xwe yên kesî wek "Hesên" hatiye binavkirin. Ji bilî navê "Hesên" bi xwe, ti xusûsiyeteke nîne ku bi hemû Hesênên dinyayê re hebe û bi kesên din re tine be.

Bo nimûne, gava ku mirov sêvekê cara yekem dibîne, mirov li gor tecrûbeyên xwe yên berê dikare bibêje ku ew jî sêv e. Lê eger mirovî bi dehan yan sedan Hesên nas kiribin jî, gava ku mirov Hesênêkî nû dibîne, mirov nikare tenê li gor tecrûbeyên xwe bibêje ku navê wî Hesên e. Sebebê vê ew e ku navên taybet bi keyfî anku dûvdilî li kesan hatine kirin: mirov nikare navê her fêkî bike "sêv" lê wek prensîp mirov dikare navê her zarokê nûbûyî bike "Hesên". Herwiha mirov nikare navê kiteke fêkî

<sup>25</sup> Di almanî de hemû navdêr (navên giştî û yên taybet) bi serherfa gir tên nivîsîn.

biguherîne û ji “sêv”ekê re bibêje “ji niha pê ve ev pirteqal e”<sup>26</sup>. Lê mirov dikare navên taybet biguherîne: “Hesenek” dikare ji niha pê ve navê xwe bike, bo nimûne, “Azad”.

## NAVÊN TAYBET

**Navnasî** (*onomastîk, onomatolojî*, bi inglîzî *onomastics, onomatology*) ew beşa zimannasiyê ye ku lêkolînan li ser navên taybet anku navên mirovan û cihan dike. Navnasî li du beşên serekî tê parvekirin:

- 1) **tîponîmî** anku **toponomastîk** anku **navên deveran** (gund, bajar, welat, çem, robar, çiya...). Mirov dikare bi kurdî navê *devernavnasî* lê vê beşê bike.
- 2) **antroponomastîk** anku **navên kesan** (pêşnav, paşnav, bernav<sup>27</sup>...). Mirov dikare bi kurdî navê *kesnavnasî* li vê pişkê bike.

Ji van beşên navnasiyê, ev nivîsar dê tenê li ser kesnavnasiyê anku navên kesan raweste. Ji navan jî, em ê bala xwe bidin yê kurdî. Eger hin nimûne ji navên zimanên din hebin jî, ew tenê bo ronkirina navnasiya kurdî hatine pêşkêşkirin.

Bi qasî ku em jê agadar im, vekolîna navnasiyê di kurdî de tiştekî nû ye. Rast e ku çendîn lîste û katalogên navan li ber dest in lê ew ne lêkolînên li ser navan in. Piraniya wan heta hewl nedaye ku navên kurdan anku navên ku kurdan li zarokên xwe kirine kom bikin. Armanca wan ya serekî ew bûye ku hin navên “kurdî” pêşniyazî dêbaban bikin daku ew navên “erebî” yan tirkî li zarokên xwe nekin.

<sup>26</sup> Helbet navên giştî jî dikarin biguherin: bo nimûne, “kitêb” di devê gelek kesan de û li ber qelemê pir kesên kurdînivîs bûye “pirtûk”. Lê guherandina “kitêbekê” bi “pirtûkekê”, hemû kitêban bi carekê dike “pirtûk”. Mirov nikare tenê kitêbekê ji nav kitêban bibijêre û navê wê bike “pirtûk” û bibêje ku yê mayî ne “pirtûk” in lê “kitêb” in.

<sup>27</sup> Li ser bingehê peyvên bernav, pêşnav, paşnav, em ê bo mebesta vê nivîsarê herwiha hin peyvên nû jî yê bi paşpirtika “-nav” çêkin, wek “kesnav, devernav, hunernav...”

## Navên kurdan û navên "kurdî"

Di nivîsên li ser navan yan û di lîsteyên navan de heta niha lêkolîn li ser hindê nehatine kirin ka navên kurdan li xwe û zarokên xwe kirî çî ne û çawan in anku ka navên çî û çawa di di civaka kurdî de hene. Heta niha zêdetir li ser wê hatiye nivîsîn "giring e mirov navên kurdî li zarokên xwe bike" û "va ye ji we re navên kurdî". Di lîsteyên wiha de adeten cih ji navên esil-erebî re nayê dan heta eger ew di nav kurdan de pir berbelav jî bin lê carinan hin bernavên eslê wan erebî jî cih digirin. Bo nimûne, di lîsteya jênotkirî de navên esil-erebî yên wek Reşîd, Fatma, Xecîca wek navên kurdî nehatine dan lê bernavên wan Reşo, Fatê, Xecê wek navên kurdî hatine qebûlkirin.<sup>28</sup>

Armanca vê nivîsê ne ew e ku giringiya navên "kurdî" bi ti kesî bide qebûlkirin. Herwiha armanc ne ew e jî ku tenê behsa navên "kurdî" bike. Armanca vê nivîsê vekolîneke zanistî / objektîv ya li ser navên kurdan e: hemû navên ku di civaka kurdî de heyî, eslê wan "kurdî" be, erebî be, tirkî be yan ji kû jî be.

Helbet rêzkirina her navê heyî yan etîmolojîya her navî yan jî varyantên her navî li derveyî mijara vê nivîsarê ye. Lê di vê nivîsarê de em ê hewl bidin bi awayekî giştî behsa hin prensîp û rêbazên bingeîn yên navên kurdan bikin. Gelo navên çawa di civaka kurdîziman de hene, ew ji kû hatine, motîv û mijarên wan navan çî ne, navên ji zimanên din hatî çawa guherîne û hwd.

## CÛNÊN KESNAVAN

### Pêşnav û paşnav

Nav dikarin li ser çend beşan bîn parvekirin. Niha li seranserê dinyayê parvekirina serekî li gor pêşnav û paşnavan e. Pêşnav ew nav e ku kesek wek takekes tê nasîn. Paşnav jî ew nav e ku gelek wek endamê malbata xwe yan binemala xwe pê tê nasîn.

<sup>28</sup> Bo lîsteyeke wiha, binêrin bo nimûne: <http://www.amouda.com/navenkurdi.htm>

Bo nimûne, pêşnavê serokê niha yê Kurdistanê Başûr Meşûd e û paşnavê wî jî Barzanî ye. Di malbata xwe de tenê ew bi navê Mesûd heye lê hemû malbata wî bi paşnavê Barzanî tên nasîn: Mistefa Barzanî, Idrîs Barzanî, Nêçîrvan Barzanî, Mesrûr Barzanî...

Ev rêbazeke giştî ya pêşnav û paşnavan e: di malbatê de adeten tenê kesek bi eynî pêşnavî ye lê adeten hemû malbata bi heman paşnavî ye.

Di kurdî û piraniya zimanên Rojhilata Navîn û Ewropayê de pêşnav berî paşnavî tê. Lê bo nimûne li Rojhilata Asyayê paşnav (malbatnav) li pêş e û takekesnav li pey tê

Pêşnav û paşnav bi hev re kesnav in anku navên kesan in.

## Pêşnav û cins

Piraniya pêşnavan tenê bo jinan yan jî tenê bo mêran in anku hin nav tenê li keçan û hin jî tenê li kuran tên kirin. Bo nimûne, di kurdî de Azad, Ehmed û Serbest tenê navên mêran in. Eyşê, Gulistan, Fatma tenê navên jinan in.

Hin navên mêrêan yên bi eslê xwe erebî yan îbrî dikarin bi paşpirtika “-a” yan “-e” bibin navên jinan:

- Cemîl → Cemîla
- Fehîm → Fehîma
- Hisnî → Hisna

Ev heman diyarde di gelek zimanên ewropî de jî heye:

- Aleksander (Iskender) → Aleksandra
- Mikael (Mîkaîl) → Mikaela
- Gabriel (Cibraîl, Cibrîl) → Gabriela

Hin navên nû yên kurdî hê jî cinsê xwe sabit nekiriye yan jî cinsê wan li gor deveran diguhere. Bo nimûne, Dilşa li Bakur û Rojavaya Kurdistanê adeten wek navê jinan li kar e. Lê hevreh û hevwatera wî navî, bi varyanta Dilşad li Başûrê Kurdistanê navekî mêran e. Di gelek lîsteyên navên “kurdî” de gelek caran hin nav hem wek yên jinan û hem jî wek yên mêran tên pêşkêşkirin. Bo nimûne, Çinar, Gewher, Gelawêj, Mîna, Mendê, Şîrîn, Şeyda wek navên mêran jî hatine qebûl kirin lê min bi xwe heta niha ew tenê wek navên jinan bihîstine. Bi lêgerîna jî min mîrên bi wan navan peyda nekirin.

Herwiha Diyar, Lezgîn wek navên jinan di lîsteyê de hatine qebûlkirin lê min bi xwe qet wisa nebihîstine û tevî lêgerînan jî peyda nekirine.<sup>29</sup>

## Babnav, dênav, zaroknav

Li cihê paşnavan, di kurdî de û di gelek zimanên din yê rojhilatî de adeten **babnav/bavnav** (patronîm) yanî navê babê anku bavê mirovî li cihê paşnavî tê bikaranîn. Di kesnavên *Azad Ehmed* û *Jiyan Ehmed* de *Ehmed* bavnav anku babnav e. Ehmed babê Azadî û Jiyanê ye û wan duyem navê xwe ji wî wergirtiye. Adeten pêşnav û bavnav li pey hev tên bêyî ku bi izafeyê bi hev ve bên girêdan. Lê girêdana bi izafeyê jî mimkin e:

- Azadê (kurê) Ehmed(î)
- Jiyana (keça) Ehmed(î)

Carinan li gel pêşnav û bavnavî, herwiha bapîrnava (û babkalknav) jî tên bikaranîn. Bo nimûne, navê nivîserê vê vekolînê li gor vê rêbazê *Hisên Mihemed Yûsif Serhan* e. Ji aliyê rastê ve yek yan zêdetir ji van navan dikarin bên rakirin anku neyên gotin yan nivîsîn:

- Hisên Mihemed Yûsif Serhan
- Hisên Mihemed Yûsif
- Hisên Mihemed
- Hisên

Di kurdî de hin caran li cihê bavnavî, **dênav** (dayiknav, matronîm) anku navê dayikê we paşnav tê bikaranîn. Naskirîtirîn nimûne ihtimalen *Hesenê Metê* ye. Nimûneyeke din wergerandina navê Îsa pêxember e ku bi kurdî *Îsa kurê Meryemê* ye ku wergerandina ji erebî ye.

Ji bilî bavnav û dênavan, hin kes herwiha bi **zaroknavan** (teknonîm) anku navê zarokê/e xwe tên nasîn. Ev adet bi taybetî di nav ereban de heye û bi peyva *kunye* tê nasîn. Di erebî de zaroknav bi formûlaya *Ebû + navê zarokê/ê* ye (ebû tê maneya “babê / bavê filan kesî/ê). Nav bi piranî yê zaroka/ê mezin e, navê kuran hinekî ji yê keçan zêdetir tê bikarnîn.

<sup>29</sup> <http://www.amouda.com/navenkurdi.htm>

Di nav nivîskarên kurd de, mirov dikare *Bavê Nazê* wek nimûneyek ji zaroknavan bide. Herwiha hin jinên bi zaroknavê xwe naskirî jî hene, bo nimûne helbestvan *Diya Ciwan*<sup>30</sup> ku mebest ji navê wê ne ew e ku ew bi xwe ciwan anku spehî ye lê ku navê kurê wê Ciwan. Adeten zaroknav tenê bernavên kesnavan in, ne navên kesan yên resmî ne. Bo nimûne, bernavê hunermend Mihemed Şêxo *Bavê Felek* bû. Di erebî de û ji erebî wergirtî kurdî jî, bernavê giştî yên kesên bi navê Hisên dikare herdem wek *Ebû Elî* tevî ku wan ti zarokên bi navê Elî tine bin jî.

## Bernav

**Bernav** (bi inglîzî *nickname*) adeten formên kurtkirî yên ji navên resmî yên kesan in. Ew bi piranî di axiftinê de, di gazîkirinê de, di navbera kesên heval û hevnas de tên bikaranîn. Lê di hin haletan de bikaranîna bernavan dikare wek heqaret yan biçûkkirina kesan jî were fehmkirin.

Di kurdî de çendîn awayên çêkirina bernavan hene. Adeten mirov dikare piraniya pêşnavan bi van formûlayan bike bernav:

Formûlaya bernavên mêran	Nimûne
<b>kîteya 1. ji pêşnav_î + konsonanta piştî kîteya yekem + -o</b>	Ehmed → Ehmo Azad → A-zo Mihemed → Miho

Formûlaya giştî ya bernavên jinan jî wiha ye:

Formûlaya bernavên jinan	Nimûne
<b>kîteya 1. ji pêşnav_î + konsonanta piştî kîteya yekem + -ê</b>	Gulistan → Gulê Xecîca → Xecê Leyla → Leylê

Li hin deveran paşpirtika navên mêran û yan jinan di hemû yan di gelek navan de bûye yek. Di gelek devokên kurmanciya rojhilatî de “-o” dikare li gel navên jinan jî were bikaranîn:

<sup>30</sup> [https://ku.wikipedia.org/wiki/Diya\\_Ciwan](https://ku.wikipedia.org/wiki/Diya_Ciwan)



- Hinar → Hino
- Xecîca → Xeco

Li aliyekî din, di kurmanciya navendî de, paşpirtika navên mê "-ê", carinan li gel navên mêran jî tê bikaranîn:

- Ehmed → Ehmê (li cihê "Ehmo")

Guherîna paşpirtika mêtîtiyê "-ê" bi paşpirtika nêrtîtiyê "-o" di kurmanciya rojhilatî de bê guman ji yekkirina herdu cins û zayendan e. Guherandina "-o" bi "-ê" di kurmanciya navendî de jî mimkin e ku ji yekkirina herdu cinsan yan jî ji "bêcinskirinê" be. Lê ew herwiha dikare ji encama yekkirina paşpirtika girêdanê / izafeyê û paşpirtika halê çemandinê be. Bo nimûne:

- Ehmed → Ehmedê Osman / Osmên → Ehmê Osman / Osmên → Ehmê

Hin nav tam li vê formûlayê nakin. Bo nimûne, *Ibrahîm* li gor vê rêbazê divê bûba \**Îbro* lê bûye *Îbo*.<sup>31</sup> Herwiha li gor formûlaya li jor *Fatma* divê bûba *Fatmê* lê bûye *Fatê*.<sup>32</sup> Hin nav jî yan nikarin li gor vê formûlayê bibin bernav yan jî di pratîkê de peyda nabin:

- Serbest → \*Serbo / \*Serbê
- Heyat → \*Heyê / \*Heyo

Carinan hin guherînên din jî di navan de peyda dibin:

- Ehmed → Ehmo → Hemo / Hemê<sup>33</sup>

### Hunernav û kodnav

Gelek nivîskar û hunermendên kurd ne bi navê xwe yê resmî lê bi navekî hunerî berhemên xwe afirandine. Carinan ev ji tirsê hatingirtinê, carinan tenê bo xweşiya hunerî û hin caran jî ji ber herdu sebebên hatiye kirin. Bo nimûne, helbestvan Şêxmûs Hesen baştir wek Cegerxwîn û hunermend

<sup>31</sup> Berevajî vê, forma Biro (ji Birahîm) li gor vê formûlayê ye.

<sup>32</sup> Ji aliyê hevdemî ve ev nav li vê formûlayê nake lê ji aliyê dîroka dengnasî ve, *Fatê ji Fa-time / Fa-tî-me* ye û li gor vê formûlayê ne awarte û istisna ye, tam li gor wê ye.

<sup>33</sup> Bi soranî Heme, mimkin e ku her sê jî herwiha ji navê *Mihemed* bin.

Ismail Aygün jî zêdetir wek Şivan Perwer tê nasîn. Navên wiha wek *navên hunerî* yan *hunernav* (bi inglîzî *stage name*) tên nasîn. Ew ne tenê di nav kurdan de lê li seranserî cîhanê peyda dibin.

## PÊŞNAVÊN KURDAN JI KÛ TÊN?

Navên kesan xwedî paradoks û dijheviyeke berçav in: ji aliyekî ve ew gelek xusûsî ne ji ber ku zarok li ber dilê dêbabên xwe gelek şîrîn in û dêbav dixwazin navên xweş û/yan bixêr bidin wan. Li aliyekî din, navên kesan berbelav in û gelek kesên bi eynî navî hene.

### *Navên ji îbrî-erebî*

Di rastiyê de nav hem di nav kurdan de, hem li Rojhilata Navîn û herwiha li Ewropayê û welatên din yê Rojava jî pir navneteweyî ne. Piraniya navên kesan li Rojhilata Navîn, li Ewropayê, li Amerîkayê û li piraniya Afrîkayê û li Bakur û Navenda Asyayê ji her sê dînen îbrahîmî (cihûtî, filetî, îslam) ne. Gelek ji yê ku em wek navên îslamî yan erebî dizanin, di rastiyê de digihin îbrî anku cihûtîyê. Çend nimûne ji navên mêran yê esil-îbrî yê bi rêya erebî û îslamê ketine kurdî *Îbrahîm, Îsa, Mûsa, Îshaq, Îsmâil, Mîkaîl, Cibraîl, Yaqûb, Yehya, Zekerya...* Herwiha çend nimûne jî ji navên jinan: *Hacer(a), Hawa / Hewa, Meryem, Zehra*. Navên wiha (bi varyantên cuda-cuda) hem li di nav misilmanan de û hem jî di nav file û cihûyan de berbelav in.

Lê ji erebî bi îslamê re herwiha gelek nav hatine ku esil-erebî ne anku ne ji îbrî yan aramî ne. *Mihemed, Hesên, Hisên, Fatma, Xecîca, Zeyneb* hin ji van navan in.

Navên ji erebî ji mêj ve di kurdî de hebûne loma hin ji wan wisa guherîne ku hema-hema êdî mirov nas nake. Bo nimûne, navê serlehengên dastana Mem û Zînê, yê yekem ji Mihemed e, ya duyem ji Zeynebê peyda bûye:

- Muhammed → Mehemed → Mehmed → Memed → Memo / Memê → Mem
- Zeyneb → Zêneb → Zêno → Zîno → Zîn

Ketina yan neqîlbûna vokala destpêkê diyardeyeke berbelav e:

- Ibrahîm → Birahîm (→ Birehîm → Birho → Biro)
- Ismaîl → Simaîl (→ Simayl → Simo → Simko)

- Ehmed → Ehmo → Hemo (herwiha Hemê, bi soranî Heme)

Herwiha ketina Y jî ji destpêkê peyda dibe:

- Yûsif → Ûsiv
- Ye'qûb → Yaqûb → Aqûb → Aqûv
- Yehya → Ehya

Carinan metatez (guherîna cihê deng) peyda bûye:

- Meryem → Meyrem (→ Meyro)

Herwiha bernavê Miço / Miçê jî bi rêya metatezê ji navê meşhûr Mistefa peyda bûye lê guherînên din jî lê çêbûne:

- Mustefa → Mistefa → Misto / Mistê → \*Mitso / \*Mitsê → Miço / Miçê

### Navên êzidiyan

Navên bi eslê xwe ji îbrî yan erebî ne tenê di nav misilmanên sinî û şîî de hene. Tevî ku gelek êzidî niha qebûl nakin ku dîne wan ji îslamê peyda bûye, di rastiyê de navên êzidiyan jî ji erebî ne. Cudahiya berçav ya li gel navên sinî û şîîyan ew e ku êzidî ne formên "resmî" yên navên erebî lê bernavên wan bi kar tînin.

Wek nimûne, mirov dikare navê gelek nivîskarên kurd yên êzidî rêz bike ku navê wan bi temamî yan jî beşek jê bi eslê xwe ji erebî yan îbrî ye: *Casimê Celîl, Emînê Evdal, Erebe Şemo, Fêrîkê Ûsiv, Heciyê Cindî, Têmûrê Xelîl, Xelîlê Çaçan...* Herwiha serokên êzidiyan, bo nimûne *Şêx Adî yan Mîr Tehsîn*.

### Navên îranî-kurdî

Berî îslamê helbet di nav kurdan de jî hin navên îranî û ihtimalen hin navên ji zimanên din yên deverî jî li kar bûn. Lê bi rastî tiştekî zêde derbarê van navan nayê zanîn ji ber ku takekesên kurd hema bêje qet berî hatina îslamê nayên nasîn. Kawa/Kawe dikare wek tekane nimûne bê dan lê ew jî gelek problematîk e: 1) ew hem kesekî mîtolojîk e û bi ihtimaleke pir mezin ne kesekî tarîxî ye anku di

rastiyê de tine bûye û 2) Kawe û newroz di nav hemû gelên îranî de tên behskirin û pîrozkirin û ti tişt nîne me piştrast bike ku Kawe illeh kurd bû, ne bo nimûne faris yan ji miletekî din yê îranî bû.

Hin ji navên îranî gelek kevn in. Bo nimûne Behmen, Nahid, Dara, Xisro... Lê gelo di rastiyê de ev nav çiqas di nav kurdan de herdem hebûne û heta roja îro hatine, ev cihê şik û gumanê ye. Di rastiyê de gelek ji navên îranî yên dîrokî yên ku niha tên bikaranîn, “kevnên nû” ne: ew ne yekser ji serdemên berî îslamê di civaka kurdî de hatine heta ku ghiştine niha lê van dawiyên ji farisî hatine neqilkirin. Gelek zehmet e ku mirov kurdên pîr yên bi van navan bibîne. Ev jî diyar dike ku tevî kevniya xwe jî, ev nav di nav kurdan de nû ne.

Ji bilî van, hin navên din jî yên îranî yên bi rêjeyî (nisbî) kevn hene, wek Newzad û Şêzad. Herdu nimûne dîsa jî ji farisî neqlî kurdî hatine kirin û di wan de “-zad” ya farisî (ji “zad-en” ya farisî) ya beramberî “-za” (ji “za-n” ya kurdî) diyar e. Bi heman awayî di rastiyê de jî navên Ferhad û Azad (û peyva “azad”) neqilkirinên ji farisî ne. Ew hem di nav kurdan de navekî bi rêjeyî nû ye (mirov pîremêrên bi wî navî nabîne) û hem jî ji aliyê dengnasî ve di kurdî de divê ew “aza” bûya (wek di gotina pîran de “gerdena me aza bikin” de) ji ber ku di peyvên xwemalî de D ji kurdî ketiye:

- kurdî: ba, bû, zû...
- farisî: bad, bûd, zûd...

Navên bi kurdî (ne erebî-îbrî û ne jî farisî) vê dawiyê berbelav bûne. Piraniya wan maneyeke diyar didin anku ji navekî giştî hatine wergirtin. Gelek jê navên gul û giyayan in, wek nimûne: Nêrgiz, Hinar, Hêro / Hîro, Binefş – hin ji van herduyên dawiyê wek navên jinên navsere û pîrejinan jî dikarin bên dîtin.<sup>34</sup>

Hin nav ji demsal yan mehan hatine avakirin: Bihar, Havîn, Adar. Hin navên cihên cografî ne, wek Çiya û Robar. Hin bi karên gundewariyê ve girêdayî ne, wek Şivan ku dikare bi simbolî wek “serkêş, pêşeng, rêber” jî were fehmkirin. Bi vê mebesta rêberiyê, serkêşiyê yan qehremaniyê jî gelek nav hatine çêkirin, wek Rêber, Gernas, Egîd, Helmet<sup>35</sup>, Dilêr.

Wek navê Dilêr, gelek navên din jî ji peyva “dil” hatine çêkirin – belkî ji ti peyveke din ewqas navên kurdî nehatine dariştin: Dilber, Dildar, Dilovan, Dilvîn, Dilşa(d), Dilşêr...

<sup>34</sup> Bo nimûne, Hêro Talebanî ku xanima Celal Talebanî ye.

<sup>35</sup> Di rastiyê de Helmet ji erebî “hemle(t)” e û Egîd yan ji erebî ‘eqîd (fermandar) e yan jî ji tirkî yiğit (wêrek, bîsteh, cesûr) e.

Vê dawiyê gelek bernavên “şoreşgerî” yan “partîzanî” (ku wek “kodnav” tên nasîn) wek navê şervanan yan gerîlayan hatine çêkirin. Hin ji wan cengnav in (bi navneteweyî *nom de guerre* ji fransî = navê cengê). Gelek ji wan navan ji navên taybet yê cografî hatine wergirtin, wek Botan, Qendîl, Amed... Paşî hin dêbavan ev nav wek navên resmî jî li zarokên xwe kirine.

### Navên ji tirkî

Li Bakurê Kurdistanê di nav kurdan de jî gelek kes bi navên bi eslê xwe tirkî ne. Ji navên jinan bo nimûne Aynur (tavheyv), Yıldız (stêr) û ji yê mêran jî wek mîna Deniz (derya, behr) û Yaşar (jîndar, dijî). Herwiha navên esil-erebî yan jî esil-îranî li gor rastnivîsîna tirkî hatine nivîsîn: Enver (Enwer), Kadri (Qedrî), Mehtap (ji farisî Mehtab bi maneya “tavheyv”). Herwiha mirov dikare nimûneyên wek *Serhan* bide ku ji peyveke îranî (ser) û yeke tirkî (han = xan, serleşker) bide. Nimûneyeke din ya bi heman awayî Mîrxan e: ji *mîr* ji bi rêya îranî ji erebî *emîr* û ji *xan* ya tirkî-mongolî.

Ji bilî vê dawiyê, kêma kesnavên tirkî ketine kurdî ji ber ku heta destpêka sedsala bîstem tirkan jî wek kurdan bi piranî navên ji erebî bi kar dianîn. Lê mirov dikare *Cengîz*, *Têmûr* û *Têlî* wek çend nimûneyên nadir yê navên bi eslê xwe tirkî-mongolî bide ku ne tenê li Bakurê Kurdistanê lê li gelek deverên din jî di nav kurdan de hene û hebûne.

## PAŞNAVÊN KURDAN JI KÛ TÊN?

Paşnav navê binemala kesan e. Binavkirina bi paşnavan di civaka kurdî û rojhilatî bi giştî de jî ne diyardeyeke kevn e. Li Tirkîyê û Îranê ji destpêka sedsala bîstem ve dest bi bikaranîna paşnavan hatiye kirin. Li welatên erebî, Başûr û Rojavaya Kurdistanê jî di nav de, paşnavan hê bi temamî cihê xwe di civakê de negirtiye û bi rêjeyî kêma kes bi paşnavan tên nasîn. Li van beşên Kurdistanê bavnava zêdetir li kar in.

Li Bakur û Rojhilata Kurdistanê paşnavên tirkî û farisî li kurdan hatine ferzkirin. Ev ferzkirin bi taybetî jî li Tirkîyê xurt bû: hem nav bi temamî tirkî de, hem jî ti têkiliya wan ya rast bi xwediyê ve nîne. Heta paşnavê gelek kurdan wek Türk (tirk) yan heta Öztürk (xwerû-tirk) jî hatiye danîn. Yek ji xusûsiyetên

gelek paşnavên tirkî (ku li ser kurdan jî hene) paşpirtika “-oğlu” (kur) e ku wergera yekser ya ji paşpirtika “-son” ya paşnavên hin zimanên ewropî ye.

Heman werger di farisî de jî bi paşpirtika “-pûr” heye ku di paşnavên gelek kurdên rojhilatî de jî li kar e. Paşpirtika din ya berbelav di paşnavên farisî de “-zade” (-za, -zarok) ye. Dîsa paşpirtika “-nijad” jî heye. Di hin paşnavên îranî de paşpirtika ermenî “-iyan” heye ku dîsa di paşnavên hin kurdên Ermenistanê de jî li kar e. Farisî herwiha wek kurdî paşpirtika “-î” jî bi kar tîne.

Paşnavên xwemalî yên kurdî ji navên malbatan, binemalan, eşîran, gundan, bajaran yan deveran hatine çêkirin. Bo nimûne, gelek kesên ji gundê Hirorê yan Bamernê li Behdînan paşnavê xwe kiriye Hirorî yan Bamernî. Bo nimûne, nivîskar û yan rojnamevan Behcet Hirorî, Newzad Hirorî, Sidqî Hirorî yan serbalyozê Iraqê li Swêdê Ehmed Bamernî.

Wek paşnavên li gor eşîran, me li jor Barzanî nivîsiye. Mirov dikare paşnavê serokkomarê berê yê Iraqê û sekreterê giştî yê Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê Celal Talebanî jî bibêje, herwiha bo nimûne helbestvan Bedirxan Sindî ku ji eşîra sindiyan ya zaxoyî ye. Ji heman Zaxoyê, gelek kesan ew paşnav li xwe kiriye, bo nimûne hunermendên stranbêj Eyaz û Erdewan Zaxoyî.

Carinan hin kesan paşnavê xwe ji devereke berfirehtir jî wergirtiye. Mirov dişê şair Hêmin Mukriyanî (ji devera Mukriyan ya Rojhilata Kurdistanê ku Mehabadê û derdorên wê bi xwe ve digire) yan jî romannivîs Diyar Bohtî yan jî ferheng saz Kamêran Bohtî wek nimûne pêşkêş bike.

## Witûwêj sebarete be firezimanî

### Siyawêş Goderzî

Goderzî: Mafî zimanî û yeksanî zimanî ew çemkanen ke lem sallaney dwayî da kewtûnete rojev. Lew songey ewe le beranber rwangey serdestî tekzimanî basî firezimanî û firekultûrî dekrêt. Berinamey emcarey ' gelî azad tay bet bo bas û şrovey firezimanî û fire kultûrî terxan dekey in û bo ew mebestesê êsta berrêz kak Hesenî Qazî le study o y e. kak Hesenî Qazî bexêr bêy !

Qazî: zor spast dekem. zor xoşhällm ke le berinamey ' gelî azad ' da beşdarî dekem legell berrêzt.

Goderzî: zor spas bo toş kak Hesen. kak Hesen dezanîn ke tiy orî firezimanî, be giştî bas û xwasî firezimanî le astî Kurdistan da le lay en duktur emîrî Hesenpûr û her weha cenabitewe kewte rojev le sallanî rabrdû da, bellam em têoriy e, firezimanî le xoy da wek mêjû bakgrawnd û paşxanêkî dîkey heye le astî cîhan da. pê m xoşe ber lewey bêy ine ser basî Kurdistan û hatinî em têoriy e û baskrdinî em têoriy e le Kurdistan da le astî cîhan da paşxanî em têoriy e bas bikey i. spast dekey in.

Qazî: diyare eger ême temaşay hellkewtî zimanekan bikey in le astî cîhanî da, wek dezanîn jmareyekî zor ziman hebin ke ew zimanane hemûyan le barey resmîy et û fermî bûnewe renye le hemû wullatan 'ey inî hellkewtiyan nebê, bellam eweyaşkiray e ewey e ke zor be degmen wullatêk debîndrêtewe ke her taqe zimanêkî têda bê. Dekrê billêy in zorbey wullatan firezimanîn, bellam lewaney e be hoy cor becorî mêjuwîy yan siyasî zimanêk be ser zimanêkî dîke da seretî pêdrabê, bellam be giştî eger leberçaw bigirîn meseley firezimanêtî her beşêke le prrosey xoy hebûnî ziman le wullatanî cor be cor da. Diyare grînge eweman leber çaw bê le barî mêjuwîy ewe mafî zimanî dekrê billêy in be şewey konikrêt teqrîben le sallî 1948 bem lay ewe le qanûn û çwarçêwe nêwnetewey iyekan da basî lêwe kirawe, ewîş be pesindkiranî pey maninamey cîhanî mafî mirov le sallî firezimanî ke lewêda êşareyek kirawe be mafî zimanî. Diyare pêş eweş amajeyawa hebû bo wêne le sedey 19 eger le nêw dû wullatan le serhêndêk şit tewafuq kira bê, lewane bo nimûne be gelêk, grûpêk yan desteyekî êtinîkî mafî zimanî bidrê, bellam ew mafe le çwarçêweyek û ya qalbêkî nêwneteweyîda basî lêwe nekirawe. be dway ewe da mafî zimanî çendîn qonaşî birriy we heta gey şituwete ew serdemey ke ême qsey lê dekey in û be tay betî le sallî 1970 kan bemilay ewe, diyare

ew qsaney ke êsta dey kem hêndêk hâletî cîhanşmûlî heye, le sallanî 1970 kanewe le ser ew meseley e qûlltirbûnewe ziyatir buwe û be tay betîş le pêwendî legell ew bwaraney zanistî ziman ke pêwendî pey da dekatewe be bekarhênanî ziman eweş lew sallane da ziyatir çûte pêşê û be tay betî le zanistî zimaninasî le emirîka ke bo yekemcar serî helldawe eger bikrê basî bikey in lewê çemkî zimaninasîy komellay etî zor qûll buwetewe.

Goderzî: kak Hesên dezanîn ke be giştî hatinî ew base bo Kurdistan, yanî le naw behsî kurdî da, bo xoy em base tûşî corêk rêaksiy onêkî billêy in dij krdeyeyekî tundî hemelay ene bû, ewîş le jêr karîgerî nasîy onalîzimî kurdî be giştî û rwangey tek zimanî ya be giştî billêy in netewe – dewllet. le rastiya da em bîrokey e ke, ême dezanîn ke Kurdistan çend zimanî têday e û çend zirawaşî têday e. Bellam be giştî êwe hatinî ew base bo Kurdistan be tay betî be kê ebsinewe, diyare lêre mebestm le barî teorîkewey e? Qazî: şitêk heye ewîş ewey e ke mafî zimanî û netewe bûn, netewe bûniy etî, zor çuwe deball yekewe, beyektirî grê drawe, yanî le zor nimûney cîhanî da eger temaşa bikey in yekêk le xeslletekanî ke detwanê neteweyek le neteweyekî dîke dekrê ciya bikateyeyekêk le hokarekan detwanê ziman bê, diyare ewe giştî niy e; le cêgayawa heye ke ziman ew hâletey niy e û ew rolle nagêrrê. ca ewey ke ew base çon hatuwete Kurdistan û bo hatuwete Kurdistan zor tebîî y e ke eger gelî kurd le her beşêkî Kurdistanê le ber çaw bigirîn leber ewey le mafekanî xoy bê beş buwe û betay betîş be hatine aray nûsîn û billawbûnewey çapemenî û formûle krdirî boçûn, ew şitane, eger ewe le pêwendî legell Kurdistanî 'êrraq da le ber çaw bigirîn le zemanî întîdabî brîtaniya ra ke qebûll kirawe be şeweyek le şewekan ke şewezarêk le şewezarekurdiyekan cêgay qebûll bê û bekar bihêndrê ew behsê lewê ziyatir xoy diy wetewe û le ber ewey ew qalbî keyanî kurdiy e drust nebuwe ew baseş le qalbî konê xoy da hermawe û nebirrawetewe. û wek le sereta da cenabit îşarret pê krd le sallî ٢٠٠٧ jmareyek, komellêk le nûser û rûnakbîran be pêy ew qalbey ke le nerîtî kon û le tirradîsiy onî şorrîşî ferranise da hebuwe ke lewêş zimanêk kirawete serdest, ew meseley e lewêş ta radeyek hate gorrê. wekû dîkeyek lelay enekanî dîkey ke renge hoy ewey ew meseley e bo komellî kurdewarî û tay betî le başûrî Kurdistan da hêndêk zû bê ewey e le ber nebûnî fezayekî siyasî kirawe, le rêjîmî pêşû da mebestme, ew corey ke pêwîste lêgerînêkî tay betî le ser ziman, lêgerrînî mey danî zor kem kirawe, nallêm be mutlleqî nekirawe, bellam zor kem kirawe ca le ber ewe zorêk le zaniyariyekan le barey zimanewe dîsan debestirêtewe bew şitaney ke le rabrdû da heye. Bo nimûne bo dabeşkrdirî şewezare kurdiyekan hêta zor car murrace'e dekrê be serçawey kon û bo nimûne degutirê şerrefxanî bitlîsî le şerrefname da şewezarekanî awa dabeş krduwe û îstînad bewe deken bo ewey netîcey ewroyî lê werbigîrê. ke diyare ewe be boçûnî min le cêgay xoy niy e. Beşêkîş ke



allozî heye lew barey ewe grêdrawî ewey e ke be mêtodî taze be pêy lêkollînewey mey danî hêndêk lew datayaney ke pêwîste bo ewey ke to bigey e merheley ewey ke planî bo dabinêy û qsey le ser bikey de rastîda ew corey ke debê cê be cê nekirawe.

Goderzî: bellam be giştî ew base dekewête derewey çwarçêwey zimaninasanewe betay betî karîgerî nasîy onalîzimî kurdî billêy in rwangey netewe – dewllet, yek alla, yek netewe, yek ziman her lew rwangey ewe. pêt way e karîgerî nasîy onalîzimî kurdî lew barey ewe çiy e? baseke dekewête derewey çwarçêweyekî zimaninasanewe debête siyasî le ciyatî ewey be giştî bibête zimaninasane û her weha le songe û rwangey billêy in rastiyeke Kurdistanewe ew base bikrêt. Qazî: eger carê lewerra dest pê bikey in be her şêweyek eto basî ziman bikey nakrê ciyay bikey ewe le wezî siyasî. Be hîç cor îmkânî ewey ke bitwanî ciyay bikey ewe niy e. Bo niy e çunike be siyaseta zimanê qedeşe kirawe. Bo nimûne qedeşe krînî zimanî kurdî le bakûrî Kurdistan ke be şêweyekî zor zeq dîtiraweya le rojaway Kurdistan, diyare ew qedeşey e mumkîne bo serdemayek le başûr û le rojhellatî Kurdistan û le cêgay dîkeş hebûbê, le ber ewey wekû ektêkî siyasî, wekû krêweyekî siyasî buwe qedeşe kiraneke, siyaseta eweyîcab krduwe le xizmeta siyaseta dîke da, ke wabû dawa krînî ew xwasteş, cê be cê krînî ewe, pêkhênanî eweş nakrê le bernameyekî siyasî ciya bikrêtewe. ewe zor zor grînge. yek nuxtey dîkeş demewîst bas bikem çunike bewe basekeman rûntir debêtewe. ewîş le pêwendî legell çemkî ' nasîy onalîsm ' day e. yanî çemkî nasîy onalîzimîş û hêtta fkrey nasîy onalîzimîş boxoy şitêkî zor alloze. Bestirawetewe bewey ke le kwê û le çî şêweyekî zemanî, mekanî da detwanê xoy nîşan bida. ta ew cêgay ey ke degerrêtewe ser meseley kurd gelo ême detwanîn tenê ewe billêy in ke bo nimûne le beşêkî Kurdistan da çemkêk heye be nawî nasîy onalîsmî kurd? ewe ze hîmete. çunike zorêk lew şitaney ke kurd le barî mêjuwî ewe, yanî mêjuwî muşiterek ya bîrewerî muşiterek berew yektiryan debatewe xayîbe, û çwarçêweyek niy e ke hemûyan ko katewe, boy e dekrê basî çûzanm huwîy etxwazîyekî let let kiraw bikey. Bew mefhûme, ca le ber ewe eger bêy û le beranber ewe da billiy nasîy onalîstekan wa dellên û xey re nasîy onalîstekan wa nallên ewe ta radeyek le pêwendî legell meseley kurdî da hêndêk renga cêgay monaqeşe bê, bellam be giştî ewey e le serubendêkî da ke ême têy da dejîn le her wullatey ke ew tefekure serdest bûbê bîrî ewey ke to her xot bibînî û nikûllî le ewey dîke bikey i, yanî fkrî nasîy onalîstî egerbe şêweyek le mefhûmî 'edalletî komellay etî, le mefhûmî azadî xallî bikrêtewe berrastî berew faşîzim derra ke nimûney ewe le ellman dîtirawe û nimûney zor zîndûtîrîşî le dewranî êsta da le hêndêk wullatan be aşkira debînîn. ewe detwanê le pan îranîzim da xoy nîşan bida, detwanê le nasîy onalîzimî xey rî tarîxî ke le turkiy e da debîndrê ta radeyek.

Goderzî: diyare le rastîda mebestî minîş le barî siyasiy ewe her ew kartêkeriy ey e ke nasiy onalîsmî kurdî le mawey sed sallî rabrdû da billêy in bew bîrokey e ke debêt dewlletêk hebê û ew dewllete zimanêk û allayekî hebêt, lew rwangewey e billêm ew rêaksiy onaney ke le Kurdistan drust bûn beşêkiyan dekewête ew çwarçêwewe. Bellam be her hâll êsta le beranberî rwangey tek zimanî da rwangey firezimanî heye ke eme le rastîda le krdewe da le ' rojawa' y Kurdistan cê be cê kirawe. le kantonekanî czîre, 'efrîn û kobanî le penay zimanî kurdî da zimanekanî 'errebî, asûrî, û hîeta basî eweş dekrê bo nimûne zimanî turkumanîş û be şêweyekî fermî ew zimanane lewê kariyan pê dekrêt, yanî êsta be krdewe tiy orî firezimanî, fire kultûrî kewtuwete bwarî pratîkiy ewe. êwe pêşweçûnekan le pêwendî legell firezimanî le rojaway Kurdistan çon debînin?

Qazî: wekû kutm ew pêşkewtinaney kurd, le başûrî Kurdistan buwe, le bakûrî Kurdistan buwe, le rojaway Kurdistan buwe û tenanet le dway rûxanî rêjîmî şay etî le êran buwe, pêşitir ewey ke twanîbat le ser zimanî kurdî qset krd ba, meqale nûsiraba û munaqeşe kiraba le êran ew îmkane nebû, bellam elan le êranîş be şêweyek le şêwekan ew îmkane pey da buwe. ca beleber çawgirtinî ew pêşkewtinaney ke beher hâll ta radeyek ruwîdawe le her kam lew beşaney Kurdistan ew meseley e îmkanî munaqeşe krîn û duwan û le ser qsekrdinî zor ziyatir buwe. meselen le serubendêk da ke îxtînaqî fikrî û siyasî ziyatir buwe ewey ke xellk le hewraman bo nimûne, ya xellk le badînan, wekû dû mîsal fkr lewe bikenewe ke le jiyânî îdarî û berrêweberî û siyasî û le her bwarêk da zimanî xoyan bekar bihênin, manîfêstî nebuwe, xoy nîşan nedawe, derinexirawe çunike zemîne nebuwe, îmkan nebuwe. Bellam êsta be leberçawgirtinî ewey ke rojname heye, mîdiya heye, torrî komellay etî heye debînî ke beşêweyekî germ wgurr ew munaqeşeyane hatûnete mey danê û carêkî dîkey firey êtî eger bikrê ew îstîlahe bekar bihênin, firey êtiy kultûrî le komellî kurdî da zor be aşkiratir xoy nîşan deda. lêre da şitêkî ke detwanê meselekey sax katewe û berewpêşî berê pêwendiy danî meseley zimane be mafî mirov. yanî eger ême meseley mafî mirovî ziman leberçaw bigirîn û ewe bikrê le naw komellanî gel da munaqeşeyekî berbillawtirî le ser bikrê detwanê zemîney ewe drust bika ke ew tolêrranis û qebûll krînî dûlay ene û çend lay ene ş ziyatir bika. yanî ew tesewrey ke bo nimûne, le tesewrêkî awa ra herreket dekrê ke hewramî ziman, kurmancî ziman, soranî ziman, kelurrî ziman ewaney ke le komellgeyekda begîştî wekû kurd denasirên eger her yek lewane be şêwezari menteqey xoyan qse biken, be şêwezari nawçey xoyan binûsin, bew şêwezarey frçkiyan pêy grtuwe pêy binûsin ewe debête hoy letibûn û dabirran, yanî ferrizeke ewey e, away dadenên, grîmaneke ewey e, de hâllêkda tewaw be pêçewanekey raste. pêçewanekeşî ewey e ke eger hemû be sîngî kirawewe bê leberçawgirtinî kem û zorî hejmarî cem'iy eteke, ziyad û kemekey çende bê, çunike bo

ewane hemû nimûney pozîtîv heye le astî cîhanî da. eger ewe bikrê ew demî hem zemîney tefahumî komellay etî ptewtir debê, tebayî komellay etî ziyatir debê, xellk be şêweyekî zor xoşitir detwanin legell yek te'amul biken, legell yektirî bijîn. ca ew nimûney ke bast krd lemerr komellgeyekî ke be nîsbet beşekanî dîkey Kurdistan, piçûktirî wekû rojaway Kurdistan le mawey ew sê çwar salley rabrdû da sererray ewey ke wez'êkî bê sbatî 'eskerî le gorrê dabuwe û meseleyawareyî heye, meseley daxiranî sinûran heye. legell eweşda bzûtinewe û tevgerrî komellay etî, siyasî le rojaway Kurdistan twaniy uy etî ew meseley e ta radeyekî zor berew pêş berê û debê roj berroj ewe ziyatir pere pêda. wek dezanî ewe be çend pêriy od da çuwe. yanî pêş ewey ew pey maninamey komellay etî le sallî ٢٠١٤, le mangî yekî sallî ٢٠١٤ billaw bikrêtewe pêş ewîş herreketî kurdî le rojaway Kurdistan, tenanet le zemanêk da ke hêşita hêkûmetî merkezî sûriy e lew menteqaney Kurdistanî sûriy e da serdest buwe, tenanet lew zemananeş da wek dezanî rêkxirawêk hebû be nawî 'saziyê zimanê kurdî' ke ew saziyê zimanê kurdî le merheley yekem da be şêwey tenanet billêy in nhênî le nêw binemallan da kûrsî zimanî kurdî û xwêndinî zimanî kurdî hebû û wurde wurde ke hêkûmet mecbûr bû hêzekanî bikşênêtewe, bellam beher hêl sîstmî pewrwerde lewê her mabuwewe, ca hawkat legell ewe, hawşanî ewe ew sazî zimanî kurdî twanî diyareyekem car le 'efrîn, hawullatiyekî kurd, têkoşerêkî kurd wetaş û xanuwî de îxtiyarinan ke lewê medresey kurdî bikenewe. her çonêk bê ew saziy e destî krd be krdinewey medresey kurdî û le merheley yekem da esasî karekeyan le ser ewe dana ke pêwîstî heye be perwerdey mamosta, çunikû dezanî ke zimanî kurdî egerçî hêmakani, detwanî billêy in hêndêk le hêmakani, mebestm le şêwezari kurdiy kurmançî y e, billêy in bedrxaniyekan le bakûr ra hatin û lewê pêşiy xist, yan rehmetî 'usman sebrî, bellam le dway teşkîlî dewletî sûriy e le ١٩٤٦ bem lay ewe heta ew dway iyane lewê zimanêke qedexê buwe. Bellam beleberçaw girtinî ew nerîtey ke hebuwe egerçî zimanî 'errebî her zimanî nûsîn û zimanî îdarî û zimanî rûnakbîranî kurd buwe ke zurbey zoriyan diyare lewê wez'êkî wa hebuwe ke xellk be zimanî xoy her qsey krduwe cge le hêndêk 'eşîret nebê ke mumkîne le nawçey i, le konewe ey ûbiyekan ke le dîmeşq bûn yan hêndêk xellkî dîkey le menteqey hêlleb û ewane, tenaney nimûneyawa heye ke zimanêke parêzirawe bellam clubergeke buwe be 'errebî û gorrawe. herçonêk bê zorbey xellkeke le qse krdinî rojane da be kurdî qseyan krduwe bellam zimanî serdest dîsan 'errebî buwe, bellam legell eweşda le ber bûnî ew nerîtî pêşuwî ke basm krd û tebî'eten lew helumerceş ke le bakûrî Kurdistan bewcud hatuwe. çunike dezanî ke le çend sallî rabrdû ra le bakûrî Kurdistanîş legell eweşda ke zimanî kurdî hêşita be şêweyekî tewaw azad niy e, yanî le perwerde da niy e, hêşita detwanî billêy in zimanêkî qedexey e, bellam legell eweşda le zemîney çonay etî pêwe çaran be zimanewe beşêweyekî zanistî zor kar kirawe. Betay betî jmareyek le têkoşeranî pêşxistinî ziman lew barey ewe kariyan krduwe, legell

zorêk le zanayan le astî cîhanî da pêwendiyên krduwe û tenanet le zor konfranis û sêminaran da beşdariyan krduwe û tenanet lew barey ewe çwarçêweyekîşiyên gellalle krduwe bo wêne bo ewey ke xwêndinî zimanî kurdî çonawçon berrêwe berin. Bo wêne le nawçeyek lewaney e mindallêk le binemalleyek dabê ke lerruwî zimaniy ewe betewawî asmîle bûbin, yan grûpêkî dîke ke ne zor çalakane be kurdî qşebiken. mebestm ewey e billêm ke bo grûpî ciyawazî mindallan çwarçêweykiyan danawe. ca ewe le 'rojawa'î Kurdistanîş kelkî lê wergîrawe. Bêcgele lewe le pêwendiy legell pesind kiranî ' pey maninamey komellay etî ' le sallî ٢٠١٤, çendîn akadêmî, pêk hatûn. akadêmî celadet bedrxanman heye, akadêmî şehîd ferizadî kemanger. le çwarçêwey ew akadêmiyaneş da kar le ser ewe dekrê ke ew sîstmî perwerdeyî ke le rabrdû da hebuwe, sîstme suninetiy ey ke hebuwe bigorrdre, bo wêne dewrî mamosta û şagrd bigorrdre, ya ewey ke mirov tenê le çwarçêweyekî mu'ey en da psporray etî hebê, ewe debê bigorrdre. wate gorrînî sîstmî perwerde be giştî û diyare eweş yarmetî deka be pêşbrdinî zimanî kurdî. Bibûre zor drêj buwewe; meseleyekî dîkeş heye wekû êweş îşareyektan pê krd lem ' pey maninamey komellay etî ' da, wa bzanm le xallî ٩ da basî ziman dekrê. le xallî ٩ da hatuwe: ' zimanî resmî kantonî czîrê brîtîn le zimanî kurdî, 'errebî û suriyânî her weha maffî hemû pêkhatekanî dîkey e ke be zimanî day kiy xoyan perwerde bîkrên.' katêk ke basî zimanî suriyânî deken, mebest le zimanî aramî nwê y e...

Goderzî: cextî pirsiyarekeş le ser ewe bû ew firezimaniy e çone? yan helumercêkî siyasî ewey xulqand ke firezimanî lewê cêgr bê.

Qazî: bellê, bêcgele eweş. le nawçey dîke momkîne zimanî ermenî hebê le kantonêkî dîke, yan çeçenî hebê û bo ewanîş deretanî pêşxistinî zimanekaniyan heye. Diyare le ber ewey min xom le wê nebûm û le nzîkewe ew allugorranem nediye we, bellam her ewey ke lewbarey ewe ew pêşbîniyane kirawn wate axêweranî zimanî cor be cor bitwanin be şêweyekî rêk û pêk û de azadî da zimanî xoyan bekar bihênin ewe le ruwî tiy oriy ewe zor deskewtîkî grîng û gewrey e û eweş ke le ppratîk da çon berrêwe deçê û çon berrêwe naçê ewe meseleyekî dîkey e ke debê ziyatir munaqeşey le ser bîkrê. şitêkî grîng ewey e ta ew cêy ey ke min xwêndûmetewe û lêyagadarm ħkûmetî merkezî le hêndêk nawçe be tay betî le kantonî czîrê hêndêk le medrese dewlletiyekanî danexistuwe, tenanet le doxî şerrîş da û ħkûmet maweyek danî mûçey mamostayanî ragrtibû, legell eweş da saziy zimanî kurdî twaniy uy e le çwarçêwey medrese dewlletiyekanîş da be şêweyek le şêwekan xwêndinî zimanî kurdî biguncênê.

Goderzî: kak Hesên dezanîn ke êsta helumercêkî siyasî le gorrê day e, yanî billêy in seretay ٢٠١١ wa dekat ke le ' rojaway Kurdistan ' dîsan be hoy hêzêkî siyasî ewe meseley firezimanî û be giştî billêy in le çwar çêwey ew projey ey ke pêy degutirêt xo berrêweberiy dêmokratîk meseley firezimanîş

cêge bigirê. Bellam em bîrokey e be heman şêwe le bakûrî Kurdistanîş way e, bellam, le bakûrî Kurdistan billêy in firezimanî le xudî herêmî bakûrî Kurdistan da niy e, bellkû renga bigutirêt fire zarawayî heye, kurmancî heye û zazakî yan billêy in krmanckî, bellam be giştî billêy in ew bîrokey e le tiy orî xo berrêweberiy dêmokrratîk yan konfêdrralîsmî dêmokrratîk yan ewey ke billêy in rêzdar wêcallan basî deka. yanî baseke lew rwangey ewey e. Bêcgele rwangeyekî zimaninasane bo ziman. êwe lew pêwendiy e da billêy in le beşekanî dîkey Kurdistan da corêkî dîke bîr dekrêtewe her dîsan le pêwendiy legell ziman da. hawkatîş êwe basî bakûrî Kurdistantan krd, bellam, be giştî billêy in lêre da çon helumercêkî civakî le rojawa dekrê tiy oriyekekî zimanî bixate bwarî prratîkiy ewe û hawkatîş le bakûrî Kurdistan dîsaneke. legell ewey ke helumercêkî ciyawazîş heye be tay betî le ruwî zimaniy ewe kar bew tiy uriy e dekrê yanî firezimanî, fire kultûrî, fire rengî le bakûrî Kurdistan pesind kirawe le rastîda.

Qazî: cenabit le seretay ew pirsiyare da wîstt ciyawaziyek dabinêy le nêwan ziman û şêwezar yan lehceyan herçiyekî nêwî binêy in. her çonêk bê emin pêw way e ew meseley ey ke êsta bast krd tenanet ewe le pêwendiy le gell munaqesey zimanî sebarete be başûr hebû. ke bellê ewaney ke dellên debê fire standardî hebê, ewane lêyan têk çuwe, têkellî deken, ewe nazanin ke ew kêşey e le wullatanî dîke le nêwan dû zimanan day e, le hâllêk da le Kurdistan ewe ciyawaziy zaraway iy e. yanî ew argumênte le rastiy da be larrê da brdinî meseleke, munherîf krdirî meselekey e. her çonêk bê nêwî binêy ziman, nêwî binêy lehce, nêwey binêy şêwezar ewane hemû êsta le ruwî zanistiy ewe cêgay munaqesey e. yanî te'rîfêkî mutlleq bo ziman niy e ke bînî çemkî zimanî pê binasênî. te'rîfêkî mutlleq le ser şêwezariş bew şêwey e niy e. ewe debestirêtewe be destellat. Dîsan ew babete dêtewe naw siyaset bitewê û netewê. ewey ke bast krd pêş ewey ke bême ser 'rojawa '. muqay eseyekî zor grîng heye lêre da, şebahetêkî zor grîng heye ke zor car renga serincî nedrabêtê. ewîş ewey e wullatî fenland yekêk lew wullataney e bê leberçaw girtinî sîstme siyasiyekey, degutirê ke dêmokrrattirîn siyasetî zimanî heye ; be kurtî lewe da ke ٩٤ le sedî xellkekey zimaniyan fenlandî y e û ٦ le sediy zimaniyan swêdî y e û eweş lew zemaniy ewe mawetewe ke fenland beşêk buwe le swêd û hêndêk le twêjêkî arîstokrrat lewê becê mawn. her çonêk bê le qanûnî binçineyî da ew ٦ le sede maf û hemu şitêkî dîkeyan legell ٩٤ lesedekey dîke wekû yek way e. lew barey ewe kes basî zoray etî û kemay etî naka. nimûneyekî awa le bakûrî Kurdistan debîndrê. le bakûrî Kurdistan zorbey xellk be kurmancî qse deken, beşêkî zor kemîş le barî cem'iy etiy ewe be kurdiy dmilkî yan kurdiy zazakî qse deken. Bellam ew tefekure, ew boçûne zimaniy e, ew boçûne 'adllaney e, ew boçûneyeksanîxwazaney e le çwarçêwey zimanî da le konewe damezirawe. mirov zor be nudret

detwanê bibînê ke rûnakbîrêk yan nûserêk îcaze be xoy bida billê nakrê be dmilkî binûsirê. yan dmilî axêwerêk mecbûr bikrê be kurmancî binûsê. ewe legell eweşda wek bas kira le qanûn da hêşita piyade nekirawe, bellam, le prratîk da le zêhniy etî rûnakbîran û ewaney da ke be meseley zimanewe deçarên tewaw cêy xoy krduwetewe, yanî le rojhellatî nawerrast da ewe detwanê nimûneyek bê wek çon fenland le astî cîhanî da nimûney e. paşan ew meseley e le rojaway Kurdistanîş wekû gutm ême debînîn ke fkrî xoserî dêmokrratîk, dêmokrratîsmî radîkall, ke xellk le xwarewe ra bê ewey ke dewllet bê û karekanî bo encam bida bo xoy xoy berrêweberê, boxoy xoy rêk bixa, frçk krđinî ew bîre le bakûrewe hatuwe û le rojawaş le mawey ew dû sê salley rabrdû da, sererray wez'î allozî komellay etî û helumercî 'eskerî û şerr wîstûy etî xoy piyade bika. ewey lêre da grînge rûñiy e û mênalîtî y e, zor car meseley prratîkîş dête gorrê ke detwanîn ziyatirî le ser birroy in ke mebestm lewe çiy e.

Goderzî: başe, her lêre da kake Hesên nimûneyekî dîke be pêçewaney emey e, leberamber eme da başûrî Kurdistane. Başûrî Kurdistan dezanîn be pêçewaney bakûrî Kurdistan, le bakûrî Kurdistan hêjêmoniyekî tewawî kurmancî heye lepenay da zazakî ke mafî tewawî xoy heye cenabit bast krd ke degerrêtewe bo rwangeyekî siyasî. Bellam le başûrî Kurdistan da herêmêkî fire zimane, hawkat fire zarawaşe, zor zarawî dîkeşî têday e, yanî bêcgele soranî, hewramî têday e, kelurî têday e le xaneqîn û dewr û ber, dway ewe wekû ziman turkumanî têday e, 'errebî têday e. Bellam, hêşita ew rwangey eyanî rwangeyekî firezimanî, yan rwangeyekî dêmokrrasiyane bo ziman le başûrî Kurdistan da cêgey negrtuwe. êwe ewe be çî debestinewe?

Qazî: emin pêm way e ew meseley ey ke le sallî ٢٠٠٨ hêndêk le rûnakbîran û nûseran hênayane gorrê, bexoşiy ewe beşêkiyan lew boçûney ew demî beşêweyek le şêwekan paşgez bûnetewe û ewe cêgay xoşiy e be boçûnî min.

Goderzî: kame boçûn? ewey le pêwendî legell elfabêt da bû ya be giştî le ser ziman ?

Qazî: na be giştî le ser ziman. ew demî zor be tundutîjî dijî boçûnekanî berrêz mamosta emîr Hesên pûr denûsira û qse dekira, car car lay enî şexisîşî pey da dekrd, bellam, her çonêk bê, lew dway iyane da emin legell çend kesêk lewane ke zor çalak bûn lewbarey ewe hêndêk diyalogî kurtm hebuwe, ewanîş bew akame gey şitûn ke ew meseley e le serewe ra û beşêweyamîrane ranaperrê û deretanî ewey ke hemû kes yek core cluberg deber ka, yek cor qse bika, yek cor bidwê, yek cor pê bikenê ewe bew şêwey e zemanî nemawe û debê zemîney ewe drust bibê ke şêwezarekan, zimanekan her nawêkî lê binêy in ba binêy in bitwanin be tenîşit yekewe berew pêş biçn. çunikû

eger dîqett krd bê lew mawey eş da ke ew tofane berpa bû de naw fîncanêk da, ewe wa nebû ke qet wa nebuwe meseley ziman muşkîleyekî esasî bo berrêweberiy lewê drust krd bê. êsta debînîn le badînan, le herêmî kurmancî axêf ke ew şêwezare delkênê be axêweranewe le bakûr, lewê tewaw cêy xoy krduwetewe berewpêş deçê. rojnamey rojane heye ke bexetî latînî denûsirê, ewe cêgay xoy krduwetewe û le hewramanîş her wetir. û le naw ewaneş da ke bezimanî fey lî ya kelurrîş qse deken berinamey radiy oyî heye, billaw kirawe heye. yanî emin pê m wa niy e ew fkrey e rîşeyekî ewende qûllî dakutabê le başûr ke rêgey gorran bigirê. lewêş hetmen gorran pêk dê.

Goderzî: bellam le astî siyasî da, billêy in ême basî rojawa û bakûrman krd ke potanisiy elêkî siyasî, herreketêkî siyasî û zor be kurtîş însan detwanê billê ke bîrokey xo berrêweberiy dêmokratîk, ke ew desellate, herêm ew destellatey heye ke boxoy birriyar le ser zimanî xoy bida. Bellam, le başûrî Kurdistan be pêçewane corêkî dîke le siyaset dekrê, yanî siyasetî resmî partiyekanî başûr rêga bew şite nada. pê way e lew barey ewe detwanê çi çet û rêgriyek hebê le ser rêy ew prrose?

Qazî: tesewrî min le merr partiy e siyasiyekan, be tay betî siyasî hîkûmetî herêmî Kurdistan le pêwendiy legell ziman da ew boçune niy e. yanî emin nemdiy we ke hîkûmetî herêmî Kurdistan biy ewê şêwezarek be ser şêwezarekî dîke da bsepênê çunike boxoşî dezanî le prratîk da îmkani ewey ke xellk ewe qebûll biken niy e. wekû le seretay qsekanîş da basm krd êsta mêdiya û amiraz û wesîle zor buwe bo ewey xellk leyektirî agadar bin, bellam, wek rege bîstibêtt lew mawey ey dwayî da fkrêkî awa hatuwete gorrê ke zimanî înglîsî bikrête zimanî resmî. nazanm bîstûteyan na? herçonêk bê fkrêkî awa hatuwete gorrê, zimanî înglîsî pêşniyaz kirawe, wa bzanm le parllmanîş qsey lêwe kirawe, çendêk le endamanî parllman înzayan bo ko krduwetewe ke karêkî ewto bikrê, diyare eweş rêga dekatewe bo hatine gorrî munaqeşeyekî dîke. ewîş boçûne le ser resmî bûn. emin pê m way e başitir way e ew nerîtey ke le zemanî şorrşî ferranisewe hatuwe û le hêndêk wullatan karî pê kirawe û le ferranise xoyîdî çbirr karî pê nakrê, bo nimûne ew zimananey ke ew demî serkut kirawn êsta carêkî dîke ser helldehêninewe û bekar dehêndrên û tirêndêkî cîhanî berrastî bo parastinî zimananî jêr metirsî heye. Bo wêne wullatêkî wekû emirîka, rege bîneranî ême, yan ewaney ke wek pîşe le ziman nakollinewe rege agadar nebin ke le emirîka zimanî resmî înglîsî niy e, yanî le resmiy et da, le qanûn da zimanî înglîsî zimanî resmî niy e, çunike jmareyekî zor le xellkî danîşituwî emirîka hen, nzîkey 17 mîliy on ke be zimanî êspaniyayî qse deken.

Goderzî: bellam le krdewe da zimanî înglîsî serdeste.

Qazî: bellê raste, bellam bzûtineweyek heye bo ewey resmîy et be înglîsî bidrê be nawî ' înglîş frst', bellam, hemû carê ke ewane pêşniyaz deken ewe red dekrêtewe. raste le hêndêk le eyaletan zimanî înglîsî resmî y e bellam le astî fêdêrall da zimanî resmî niy e. ca emin le ser ew bawerrem le nawçey êmeş çî le astî dewlletekan da û çî le astî xoman da zimanî resmî nebê başitire. yanî bo nimûne eger êsta rojaway Kurdistan le ber çaw bigirîn le pey maninamey komellay etî da basî ƴ ziman kirawe, lewêda basî zimanî çeçenî têda niy e, basî zimanî ermenî têda niy e.

Goderzî: turkumanîşî têda niy e.

Qazî: turkumanîşî têda niy e, ke wa bû yanî çî? yanî eger yekiyan resmî bê û ewîdiyan resmî nebê ewe debestirêtewe be ballanisî desellat, bo wêne eger le kobûneweyekî komonî da ermeniyekan jmareyan ziyatir bê detwanin ewe bihênine gorrê. ca boy e emin lew bawerre dam le resmîy et gerrêy in bêy ine ser meseley prratîk. eger mirov mênalîteyekî dêmokratî hebê ew demî le karubarî rojane da kurdêk lêy zehmet nay e turkumanêk çonî dewê zimanekey xoy bekar bihênê. prratîk şitêke, meseley ser kahez şitêkî dîkey e. Goderzî: diyare basî înglîsî krd le başûrî Kurdistan da. Bes wekû têbîniyek diyare min xom le konfranisêk da beşdar bûm le ser ziman. pêw way e ew bîrokey e bîrokey desellatêkî tecarî û bazirganî y e le başûrî Kurdistanda ewey ke zor car be ' dubey krdir' nawî dendrê ke ciyawaze le wîstî xellk, bellam, be her hâl pirsîyarî min ewey e ke lem mawey e da reşnûsî destûrî herêm kewtuwetewe rojev û be pêw ew basaney ke dekrêt basî xoberrêweberî bo herêmekan zor be tundiy pêşî degîrê, heta qerare birrgeyekîşî pê ziyad biken ke hîç herêmek nabê bo xoy xoberrêweber bê yanî ciyawaz le desellatî parêzga, nañiy e û qezakan. pêw way e ke cêgîr krdirî birrgeyekî awa le destûrî herêm da rêgr nabê lewey ke bo nimûne sbey inê eger herêmekî wek hewraman ke dey hewêt hewramî bikate zimanî xoy le herêmi xoy da yan le herêmi dîke bo nimûne şebek heyeyan şngar û badînan heye le şwênekanî dîke da. eger bigerrêy inewe ser kartêkerî siyaset le ser ziman. pêw way e ewe çî karîgeriyekî debêt le ser dahatuwî zarawayekan le başûrî Kurdistan da? Qazî: emin pêw way e ew qanûnî binçîneyî fêdêrallî ke êsta heye le 'êrraqê û lewêda zimanî kurdî hawşan û hawteraz û yeksane legell zimanî 'errebî ke sallî ƴ · · 0 pesind kirawe, lewêda zimanî kurdî awa qebûll kirawe û katêk awa qebûll kirawe basî eweş nekirawe ke ciyawazî bixirête nêwan şêwezarekan. ewe bew manay ey e ke le herêmi Kurdistaniş be pêw nawçe, be pêw herêm, herêmi badînan, herêmi hewraman detwanê zimanî xoy bekar bihênê û detwanê nawî ewe binê zimanî kurdî yanî amaje qanûniyeke awa dekrê tefsîr bikrêtewe. ca leber ewe emin pêw wa niy e eger hatû allugorrêkî ewto bikrê wate parêzga ziyad bikrê yan kanton dabmezirêndrê ewe xoy le xoy da kêşeyekî ewto saz naka çunikû eger têkî neden le qanûnî binçîneyî 'êrraq da binaşeyekî baş



dandrawe le pêwendiy legell zimanekan da û zimanî 'errebî û zimanî kurdî wekû zimanî dewlletiy û yeksan qebûll kirawn.

Goderzî: kak Hesên bêy ine ser rojhellatî Kurdistan û meseley zimanekan. Dezanîn ke rojhellatî Kurdistanîş be heman şêwe mûzay kêke, û mûzay kêkî zimanî û kultûrî heye û renga zor ziyatirîş bê le başûrî Kurdistan yan herêmekanî dîke. û be tay betî azerî û kurd zor têkell dejîn û sinûrêkî dûrudrêjîyan heye û le zor şwênîş lenaw yek da dejîn. û ew baseş êsta bo nimûne azadiy firezimanî û fire kultûrî be corêk nekewtuwete rojevî siyasatî kurdî rojhellat. yanî siyasatî partiy siyasî rojhellatî Kurdistan. êwe hem le rwangeyekî zimaniy ewe û hem le rwangey pêkewe jîyan û dahatû bo gelî azerî û kurd ew pirse çon şirove deken?

Qazî: Diyar e le rojhellatî Kurdistanîş, yanî le qse krîdin sebarete be ziman le rojhellatî Kurdistanîş hêndêk ew çwarçêwe û dîtinî nerîtî heye be manay ewey ke debê şêwezarek pêş bixirê û serdest bikrê, her çonêk bê her wek basman krd ew boçûne le beşekanî dîkey Kurdistan sst debê be manay ewe ke hellgran û axêweranî şêwezare cor be corekan le bwarî cor becor da dekrê şêwezarekeyan bekar bihênin. Bellam meseleyekî dîkeş heye ewîş suwî tefahumêk, xirap boçûnêk heye sebarete bew dû madey ey ke le qanûnî binçîneyî cmhûrî îslamî da heye ke ew dû madey eş be hîç corêk bew manay e niy e ke didan bewe da hatuwe ke zimanî kurdî yan zimanî turkiyazerbay canî yan belûçî dekrê bo pê xwêndin bekar bihêndrên. lewêda basî ewe kirawe ke hawşanî zimanî farsî ew zimananeş dekrê edebiyatî xoyan bekar bihênin. her le ber eweşe legell eweşda ke degutirê ew madane cê be cê nekirawn bellam le prratîk da kirawe, hem neşriy e heye be zimanî turkiyazerbay canî, be kurdîş heye. Demewê billêm ew tesewre nabê bête gorrê ke le çwarçêwey ew madane da dekrê meseley zimanî cê be cê bikrê.

Goderzî: Ey le rwangey kurdîyewe?

Qazî: Le rwangey kurdîy ewe eger temaşay bikey in debînîn le êran meseley ziman kirawete babetêkî eminiy etî. wek çon meseley kurd meseleyekî eminiy etî y e le rwangey hâkmanî êranewe, meseley zimanîşyan her awa lê krduwe. Bo nimûne pareke sallî ۲۰۱۴ ke axay rûhanî hate ser kar û de madey pêşniyar krd û basî cê be cê krîdin ew made mu'eweqaney naw qanûnî binçîneyîş hate gorrê, lew pêwendiy e da eger webîrt bê rêkxirawey parastinî ferheng û edebî farsî wate ferhengstanî êran zor be tundî kardanewey nîşan da nîsbet bew meseley e, eweş le ber ewe bû ke meseley ziman le rwangey ewanewe wek bwarêkî eminiy etî çaw lê dekrê. ca boy e ew destgay eş egerçî debê xerîkî geşe pêdanî ziman û edebiyat bê, hat ektêkî siyasî le xoy ewe nîşan da û basî ewey krd eger karêkî

awa bikrê ewe debête hoy let bûnî wullat. Bellam le beranber ewe da gelanî êran yan ew beşe le komell ke be zimanî xey rî farsî qse deken zemîneyekî hawbeşiyay heye û dekrê le ser ewe zor ziyatir beyekewe kar biken û betay betî êwe bastan krd le barî cuxrafiyay iy ewe turkî azerbay canî û kurd le nzîk yek dejîn û beyekewe dejîn grînge bitwanin le ser ew nuxte muşitereke ke ewîş dawxwazî zimaniy eyek bigirin û ege mirov le bwarêk da yekî grt renga ewe bibête hoyek bo ewey le ser şitî dîkeş tefahum drust bê. eger boçûnî ciyawaz le ser meseley xak hebê, eger le layekî dîke da muşiterekateket zeq krdewe lew barey eweş detwanî be tefahum bigey.

Goderzî: kak Hesen تنها xulekêkman mawe, bellam, eger be şeweyekî konikrêt bo nimûne le pêwendiy legell zimanî azerî da.

Qazî: Diyar e ew benaw krdine zor kes qebûlîyan niy e dellên turkî

Goderzî: Le pêwendiy legell zimanî turkiyazerbay canî da pêt wa heye partiy siyasî rojhellatî Kurdistan û be giştî mêdiyay derewey dewllet le êran da, mêdiyay kurdî bo nimûne têlêvîziy on û mêdiyakanî dîkey ke hen pêt wa niy e kemter xemî deken legell zimanî turkiyazerî da?

Qazî: Bellê emin pêm way e dey ken. û ewe karêkî zor grîng debê eger têlêvîziy one kurdiyekan hewl biden her nebê berinameyek ya çendîn beriname be zimanî turkiyazerbay canîş hebê çunike dezanîn le layekî dîkewe tebilîxatêkî zor regezperstane be dijî xebatî qaremananey gelî kurd û gelanî dîke dekrê lewane gelî turkî azerbay canîş.

Goderzî: zor spas bo to berrêz kak Hesenî Qazî, nûser û lêkolerewe zor spas.

Qazî: spas bo êwe gelêk memnûn.

## DÎFTONG

Dîftong (bi inglîzî *diphthong* ji yûnanî δίφθογγος /dîfthongos/ anku *dudeng* yan *cotdeng*) du vokal in ku di eynî kîteyê de peyda dibin. Bo nimûne, di peyva inglîzî *house* (xanî) de *ou* dîftongek e. Di axiftinê de herdu vokalên dîftongê dengêkî pêk tînin lê bo pêkanîna wî dengî lazim e ku ziman xwe bigihîne du cihan di devî de (cihên herdu vokalên dîftongê).

Di nivîsîna kurdî de di heman kîteyê de du vokal nakevin pey hev. Rast e ku di gotinên wek *saet*, *biavêje*, *dua*, *îdeal* de du vokal li pey hev hene lê ew ne dîftong in. Sebebê ne-dîftongbûna wan ew e ku ev herdu vokalên pey hev nakevin eynî kîteyê lê her yek ji wan aîdî kîteyeke cuda ye. Em dikarin wan peyvan wek *sa-et*, *du-a*, *bi-avê-je*, *î-de-al* bibêjin anku wan herdu vokalên li dûv hev bi kîteyan ji hev cuda bikin. Herwiha di peyvên *dua* û *saet* de di rastiyê de konsonanta *eyn* (ع, ع)<sup>36</sup> heye:

- du'a دوعا
- sa'et ساعهت

Lê dîsa jî kurdî ji dîftongan ne bêpar e. Dîftong ne tenê dikarin ji du vokalên xwerû (di kurdî de: a, e, ê, i, î, o, u, û) lê herwiha ji vokalekê û nîv-vokalekê (di kurdî de: Y, W) jî pêk bên. Ji dîftongên ku bi nîv-vokalekê (W yan Y) dest pê dikin re *dîftongên hilkev* yan *dîftongên hikêş* tê gotin (bi inglîzî *rising* yan *ascending diphthongs*). Lê eger dîftong bi vokaleke xwerû dest pê bikin, ew dîftongên dakev in (*falling* yan *descending diphthongs*). Di kurdî de herdu jî peyda dibin.

Lihevkirineke temam di navbera zimannasan de nîne li ser hindê ka kengî vokal li gel Y yan W dîftongan pêk tînin û kengî jî ew du dengên ji hev cuda ne û yek jê vokal e û yek jî konsonant e.

### Dîftongên ji U/W + vokalek

<sup>36</sup> Eyn (ع) di kurdî de: <http://www.kulturname.com/?p=9489>

Mirov dikare bibêje ku lihevkirineke giştî li ser wê yekê heye ku di komdengên XW+vokal de W li gel vokala pey xwe dibe dîftong. Bi gotineke din, di rastiyê de W li wê derê dengê U dide û tenê ji ber qeyda rastnivîsîna kurdî – ku du vokalan li pey hev di heman kîteyê de red dike – ew U bi W tê nivîsîn:

Rastnivîsîn	Rastgotin	Dîftong
xwar	xuar	ua
xweş	xueş	ue
xwê	xuê	uê
xwîn	xuîn	uî

Sebebê ku herfa W di rastî de li pey X ne dengê W lê dengê U dide ji wê diyar e ku gava em kîteyê li berî X hebe, dîsa jî X bi herfa W re dimîne:

- bi-xwin (ne \*bix-win)
- di-xwî-nim (ne \*dix-wî-nim)

Eger herfa W li pey X bi rastî konsonant bûya, diviyabû X xwe bidaya gel kîteya berî xwe û kîteya W bi cih bihiştta çunkî li gor qeyd û bendên giştî eger vokalek li berî du konsonantan hebe, ji wan konsonantan ya yekem xwe dide gel vokala berî xwe û konsonanta din bo kîteya din dihêle eger vokalek li pey wan herdu konsonantan hebe:

- dest (kîteyek – ST di eynî kîteyê de ne lê) → des-tê (S xwe dide gel vokala berî xwe anku E û T li gel Ê dibe kîteya duyem)
- çand (ND di heman kîteyê de ne lê) → çan-din (N ji D vediqete)
- stran → bis-trin!

Lê X di komdengên XW- de her bi herfa W re dimîne ji ber ku herfa W di vê rewşê de di rastiyê de ne konsonant e lê vokal e û nîşana dengê U ye.

Me li jor got ku dengên wek *ia* di peyva *bi-avê-je* yan jî *ea* di peyva *î-de-al* de ne dîftong in ji ber ku her yek ji wan dangan bi ser kîteyê cuda ve ye. Lê madem wisa ye, çima *we/ue* di peyva *xweş* de yan *ua* di peyva *xwar* de dîftong bin?

Sebebên dîftongiya W ya navbera X û vokalekê ev in:

- W di vê rewşê de ne konsonant e (wek ku me li jorê diyar kir)

- lê W di vê rewşê de ne vokaleke serbixwe ye jî ji ber ku ew bi xwe nikare kîteyekê pêk bîne: mirov nikare bibêje *xu-eş / xw-eş* wek ku ew peyveke dukîteyî be.

Wek ku ji tabloya li jor diyar e, li pey X, dengê U (herfa W) dikare van dîftongan pêk bîne:

Dîftong	Nimûne li gor gotinê	Nimûne li gor nivîsînê
ua	xuar	xwar
ue	xueş	xweş
uê	xuê	xwê
uî	xuîn	xwîn

Anku U dikare li gel çar vokalên din yê kurdî (a, e, ê, î) bibe dîftong. Du vokalên eynî bi hev re nabin dîftong loma U nikare li gel U dîftongan pêk bîne. Di kurdî de herwiha dîftonga *uo* (bi nivîsînê *wo*) yan *ûo* (*wû*) jî peyda nabin.

Di nivîsînê de komherfên *xwi-* hene (bo nimûne *xwişk* yan *bixwin*). Lê li gor gotinê W-ya van peyvan bi deng U ye û l-yan van peyvan "zêde" ye. Bi gotineke din, mirov peyvên *xwişk* û *bixwin* wek *xuşk* û *bixun* dibêje, ne wek *\*xuişk* û *\*bixuin*.

Di kurmanciya standard de dengê U (herfa W) tenê dikare piştî X û berî A, E, Ê yan Î dîftongan pêk bîne. Lê di hin devokên kurmancî de û herwiha di soranî de jî imkana çêkirina U + A/E/Ê/Î piştî hin herfên din jî heye. Li vê derê em ê çend nimûneyan ji kuranciya Behdînan û herwiha ji zaravaya soranî bidin. Awayên nivîsîna dîftongan di kevanokên goşedar de wek gotinê û li derveyê kevanokan jî wek nivîsînê hatine diyarkirin:

kurmanciya nivîskî <sup>37</sup>	kurmanciya Behdînan	soranîya nivîskî
nû	nwî [nuî]	nwê [nuê]
gûz	gwîz [guîz]	gwêz [guêz]
kû (kîjan cih/der)	kwî(ve) [kuî(ve)]	kwê [kuê]

<sup>37</sup> Kurmanciya nivîskî ya bi alfabeya latînî. Kurmanciya nivîskî ya bi alfabeya erebî jî adeten li cihê -wî- ya behdînan û dinivîse lê carinan jî Wî dinivîse.

Di kurmanciya Behdînan de di pratîkê de diftonga UÎ (bi nivîsînê WÎ) dikare li pey her konsontanê peyda bibe ji ber ku Û-ya kurmanciya giştî di behdînî de hema-hema herdem dibe UÎ (bi nivîsînê WÎ)<sup>38</sup>

kurmanciya nivîskî	behdînî bi gotinê	behdînî bi nivîsînê <sup>39</sup>
bûn	buîn <sup>40</sup>	bwîn
cûn, cûtin	cuîn	cwîn
biçûk <sup>41</sup>	biçuîk	biçwîk
dûr	duîr	dwîr
fûrîn	fuîrîn	fwîrîn
gû	guî	gwî
hûr	huîr	hwîr
jûjî	juîjî	jwîjî
kûr	kuîr	kuîr
lûrîn	luîrîn	lwîrîn
mû	muî	mwî
nû	nuî	nwî
pûng	puîng	pwîng
rû	ruî	rwî
şûşe	şuîşe	şwîşe
tûrik	tuîrik	twîrik
*vû <sup>-42</sup>	-	-
*wû <sup>-43</sup>	-	-
xwîn [xuîn] <sup>44</sup>	xuîn	xwîn

<sup>38</sup> Awarte û ististnayên ji qeyda guherîna Û ya kurmanciya giştî bi UÎ (WÎ) di behdînî de tenê ev in: "çûn" û "û" wek peyveke serbixwe (bi inglîzî "and") in. Herwiha "bûn" jî li kêma deverên Behdînan dibe "bwîn / buîn", li piraniya wan dibe "bîn" yan "bûn".

<sup>39</sup> Gava ku kurmancî bi devoka behdînî bi alfabeya kurdî-erebî tê nivîsîn, komgendê UÎ li nava peyvan wek -وى (-wî-) tê nivîsîn, ne wek -ئوى (-uî-). Bo nimûne, peyva kurmanciya giştî *bûk* bi behdînî wek بویک (bwîk) tê nivîsîn, ne wek بئویک (buîk).

<sup>40</sup> "Bûn" ya kurmanciya giştî li piraniya Behdînan "bîn" yan "bûn" e, tenê kêmanî wê bi awayê "buîn / bwîn" dibêje.

<sup>41</sup> Bi tesadîfî ti peyvên du di behdînî de bi dengê çuî- / çwî- dest pê bikin nehatine dîtin. Peyva kurmanciya giştî "çûn" jî di behdînî de her wek kurmanciya giştî "çûn" e û li gor qeyd û benda guherîna Û bi UÎ / WÎ neguheriye.

<sup>42</sup> Di dengên ku "vû-" tê de hebe di kurmanciya giştî de peyda nabin û di behdînî de jî bi şeweyê vwî- nînin.

<sup>43</sup> Di dengên ku "wû-" tê de hebe di kurmanciya giştî de peyda nabin û di behdînî de jî bi şeweyê wwî- nînin.

<sup>44</sup> Kurmanciya giştî jî wek behdînî diftonga xu- qebûl dike.

*yû <sup>-45</sup>	-	-
zû	zuî	zwî

Dîftonga *uî* di van devokan de heta li destpêka çend peyvan jî dikare peyda bibe:

- *ûite / ûitî* (bi kurmanciya giştî *ûtî* ji tirkî *ütü*)

Di heman devokan de herwiha heta O-ya kurmanciya giştî jî di hin peyvan de dibe *Uî*:

kurmanciya nivîskî	behdîni bi gotinê	behdîni bi nivîskî
kon	kuîn	kwîn
kovî	kuîvî	kwîvî
rovî	ruîvî	rwîvî

Lê hêjayî gotinê ye ku di van devokên kurmancî de jî ji bilî li pey X, li pey konsonantên din tenê dîftonga *U+Î* heye lê dîftongên din yê *U + vokal* (-ua-, -ue-, -uê-) peyda nabin. Di soranî de dîftonga -uê- li cihê monoftonga *û* ya kurmanciya giştî berbelav e lê ne bi qasî *Uî* ya devoka behdîni *û* hin devokên din yê kurmancî.

Di hin devokan de jî, bo nimûne di kurmanciya Dihokê de, U ji dîftonga *Uî* dikeve:

kurmanciya nivîskî →	(bo nimûne) Zaxo →	(bo nimûne) Dihok
dûr	duîr	dîr
nû	nuî	nî
bixwîne [bixuîne]	bixuîne	bixîne

Di gelek zimanan de W + vokal li destpêka kîteyan yan peyvan jî wek dîftong tên hesabandin. Wisa be, di kurdî de jî ev nimûneyên li jêr bi dîftong in lê di rêzimanên kurdî de adeten ev we dîftong nehatine hejmartin:

dîftong	nivîskî
wa	wan, war, walî

<sup>45</sup> Di dengên ku "yû-" tê de hebe di kurmanciya giştî de peyda nabin *û* di behdîni de jî bi şeweyê *ywî*- nînin.

we	welat, were, wekîl
wê	wêran, wê, wêrîn
wi	wilayet, wijdan, wisa, wilo
wî	wî, wîşî <sup>46</sup>

Komdengên \*wo, wu-, wû- di kurdî de peyda nabin tevî ku hin caran wisa bi xeletî tên nivîsîn jî. Wek ku li jor hatiye diyarkirin, dîftonga *ui* jî bi deng di kurdî de nîne tevî ku di hin peyvan de ew tê nivîsîn jî. Lê komdengê *wi-* heye, wek ku ji peyvên *wilayet, wilo, wisa, wiqas* jî diyar e lê tenê li gor hin devokan ji ber ku di hinên din de ev peyv bo nimûne wiha ne: *wîlayet, wesa, weqas/ewqas...*

### **-iwa- = -ua-?**

Di nivîsîna kurdî de di çendîn peyvan de komdengê *-iwa-* heye ku hevbîriyeke temam di nav dengnasên kurdî de li ser dengê *wî* yê rasteqîn nîne.

Li gor imlayê, bo nimûne *ciwan* peyveke dukîteyî ye: *ci-wan*. Lê mirov bi hêsanî dikare bibêje ku dukîteyîkirina *wê* hinekî zorlêkirin e. Di rastiyê de mirov *wê* wek peyveke yekkîteyî dibêje, heçku *i* tê de tine be û li cihê *W* jî *U* hebe: *cuan*.

Lê çawa ku ew ne bi awayê *ci-wan* peyveke dukîteyî ye, hê jî baştir aşkere ye ku ew bi awayê *cu-an* jî nabe dukîteyî. Loma jî bi ihtimaleke mezin *-iwa-* dengê *-ua-* yê dîftongî dide û hemû peyv tenê kîteyekê pê tîne.

### **Dîftongên ji vokalek + W/U**

Herfa *W* ne tenê berî vokalan lê piştî wan jî peyda dibe:

- daw
- dew
- dêw

<sup>46</sup> Bi hin devokên din *uşî* (koma libên tirî).



- dîw<sup>47</sup>

Çawa ku W di kurmançî de nakeve berî O, U, Ê, wisa nakeve dûv wan jî anku komdengên -ow-, -uw-, -ûw- di peyvên xwemalî de peyda nabin<sup>48</sup>.

Gelo W di van peyvan de li gel vokala berî xwe dîftongan pêk tîne yan na? Bi gotineke din, gelo awayê rastî yê gotina van peyvan bi U ye yan jî bi W?

Gelek zimannas li ser wê baweriyê ne ku di rastiye de em van peyvan wiha dibêjin: *dau, deu, dêu, dîu*.

Ev dê bi hin kesan xerîb be. Lê ev zimannas jî idia nakin ku U di van peyvan de dengê ji vokala berî xwe cuda û veqetandî ye. Ew idia nakin ku ev nimûneyên me peyvên dukîteyî bin. Bi gotineke din, çawa bawerkerên dengê *dew* texmîn dikin ku ev peyv yekkîteyî ye û tenê dikare bi carekê bi hev ve bê gotin û nabe dukîteyî wek *\*du-w*, wisa bawerkerên dengê *deu* jî nabêjin ku ew peyv wek *\*de-u* dukîteyî ye. Ew tenê dibêjin ku W bi wan dangan ve heliyaye û li gel wan dîftongek pêk aniye û loma mirov dibêje ew nîşana denê U ye.

Di dengnasiya zimanên din de jî gelek caran dengnas li hev nakin ka vokal + W dibe dîftong yan jî her wek vokal + konsonantek (W) ye.

Eger di kurdî de komdengê vokal + W dîftongan pê bîne jî, dîftongiya wan ne sabit e. Gava ku vokaleke din bikeve pey W, hingê W vokala berî xwe dihêle û dibe hevkişeya vokala pey xwe:

- kew → ke-wek
- daw → da-wa wê
- xew → xe-wê

Ev "pijîkîna" yan parçebûna dîftongê ji peyvên xwerû jî diyar e:

- ba-we-rî (ne \*baw-e-rî)
- de-war (ne \*dew-ar)
- cê-wî (ne \*cêw-î)
- dî-war (ne \*dîw-ar)

<sup>47</sup> Bi soranî ye û maneya *alî, rex, hêl, teref* dide û hevrehê peyva *dêm* (rû) ye.

<sup>48</sup> Di çend peyvên vê dawiyê wergirtî de dikarin hebin, bo nimûne *cowboy* ji inglîzî *cowboy* (gavan).

## Dîftongên ji vokalek + Y/Î

Herfa Y yek ji herdu nîv-vokalên kurdî ye (W, Y). Ew dişibe vokalan ji ber ku – berevajî konsonantan – di dema derxistina wê de hewayê dengî nayê rawestandî. Lê ew ne vokaleke temam e jî ji ber ku – berevajî vokalan – ew bi tenê nikare kîteyan pêk bîne. Li gel vokalan ew dikare dîftongan pêk bîne:

dîftong	nimûne
ay / aî	çay, hay, ay
ey / eî	heyv, keyf, hey, ey, mey, ney
? êy / êî	hêy
* iy / * îî	-
? îy / * îî	(bi soranî heye)
? oy / oî	oy, kowboy
? uy / ? uî	-
? ûy / ûî	(bi soranî heye)

### ay / aî

Di çend peyvan de peyda dibe. Lê di devokan de Y dikeve (çay → ça, hay → ha). Wisa dixuye ku tenê peyvika gazîkirinê ay di hemû devokan de peyda dibe. Di kurmanciya nivîskî de gava ku paşpirtika çemandinê ya nêrî li peyvên bi A bi dawî tên tê zêdekirin, ew wek –Yî tê nivîsîn. Lê di gotina hin devokan de di vê rewşê de tenê Y heye:

- kurmanciya nivîskî: wî birayî got
- hin devok: wî biray go(t)

Anku bi nivîskî A û Y dikevin kîteyên ji hev cuda lê bi devkî A û Y di heman kîteyê de ne û dîftongeke ay pê tînin. Di soranî de jî *biray min* (bira-yê min).

### ey / eî

Ji hemû dîftongên din yên bi Y/Î bi dawî tên mişetir peyda dibe. Lê gelek ji peyvên bi vê dîftongê bi eslê xwe biyanî ne (*heyf* û *keyf* ji erebî, *mey* û *ney* vê dawiyê ji farisî). Herwiha gelek caran jî – xaseten di kîteyî girtî de anku di kîteyên konsonantek li dawiyê de – EY dibe Ê (*keyf* → *kêf*). Peyva xwemalî *heyv* di gelek devokên kurmançî de bi awayê *hîv* e. Li aliyekî din, di gelek devokan de peyva kurmançiya giştî *deng* bi awayê *dey* tê gotin (xaseten *dey kirin* û formên wê yên çemandî).

Di soranî de gelek caran bi rêya girêdanê peyda dibe: *rojnamey Rûdaw* (rojname-ya Rûdaw). Herwiha di soranî de *key* (kengî, kingê).

### êy / êî

Ji bilî peyvika gazîkirinê *hêy* ji peydabûna vê dîftongê di peyvên din yên kurmançî de ne agadar im. Ev peyvik jî li gelek deveran bi awayê *hê* ye anku ne bi dîftong e.

Di soranî de bo nimûne *to kê'yt* (tu kî yî) – wek kîteyêke bi tenê *kêyt* tê gotin.

### iy / îî

Koma herfên -iy- di kurdî de di gelek peyvan de heye, bo nimûne: *çiya, giya, siyaset, qiyamet...* Lê dîftonga *iy / îî* pêk naînin (lê belkî dîftonga *ya-* pêk tînin – li jêrtir binêrin). Tek peyva ku mirov carinan di nivîsan de dibîne ku bi rastî dixuye ku dîftonga *iy/îî* pêk tîne, peyva *qiyamet* e. Lê ev awayê nivîsînê tenê ji ber tesîra tirkî ye. Di rastiyê de ew di kurdî de tekdengê (monoftonekî) *î* ye û awayê wê *yê* rast di kurdî de *qîmet* e.

### îy / îî

Ev dîftong di kurdî de peyda nabe. Heta eger mirov peyvên wek *çiya, giya, siyaset, qiyamet* wek *çîya, gîya, sîyaset, qîyamet* tercîh bike jî, dîsa di wan de dîftonga *îy* nîne ji ber ku li gor wê nivîsînê Î û Y dikevin ser du kîteyên ji hev cuda: *çî-ya, sî-ya-set...*

Di soranî de ev di rewşa girêdanê de peyda dibe: *kurdîy soranî* (*kurdi-ya soranî*). Lê gelek caran Î-ya dubare nayê nivîsîn û mirov forma *kurdî soranî* dibîne.

**oy / oî**

Dîftonga *oy / oî* bi giştî di kurmancî de tenê di peyvika gazîkirinê *oy* de tê dîtin. Helbet hin peyv hene ku herfên O û Y tê de li pey hev in (bo nimûne *Zaxoyî, boyax*) lê di wan de O û Y di kêteyên ji hev cuda de ne (*za-xo-yî, bo-yax*) loma ew dîftongan pêk naînin). Hin caran mirov di nivîsan de formên wek *Zaxoy* bi maneya *zaxoyî, xelkê Zaxoyê* dibêje lê wisa diyar e ku ew tenê ji kêmasiyên nivîsînê ne û ne ji awayê gotinê ne.

Di soranî de peyva *xoy* y abi dîftonga *oy* heye û ji *xo* (xwe) û *yî* (wî / wê) pêk hatiye û maneya *wî bi xwe* dide.

**uy / uî**

Wsa dixuye ku dîftonga *uy / uî* di ti peyvên xwerû de di kurmancî yan soranî de peyda nabe. Di hin devokan de mirov dikare gotina *duy piştî nîvro* bi maneya *saet du danê êvarê* bibihîze. Piraniya devokên din dibêjin *duyê/duyî...*

**ûy / ûî**

Ev dîftong di kurmancî de carinan di peyva *xûy* de tê dîtin lê heman peyv bi awayê *xû* jî heye. Di soranî de ev dîftong wek encaman girêdanê peyda dibe: *xanûy ewan* (xaniyê wan).

**Dîftongên ji Y + vokalek**

Wek ku me li jor li ser W jî gotiye, di nav zimannasan de hevbîriyeke temam li ser hindê jî nîne ka gelo Y + vokalek dibe dîftong yan jî na. Piraniya zimannasan wan wek dîftong qebûl dikin. Eger em jî wisa bikin, ev dîftongên bi Y dest pê dikin di kurdî de hene:

dîftong	nimûne
ya / îa	yar, beyar, yad, ya (wek "ya min")

ye / îe	yek, ye, yezdan
? yê / îê	yê, yên, bayê felekê
* yi / * îi	-
? yî / îî	(tu) yî, qamişloyî, ronayî
? yo / îo	birayo!
* yu / * îu	-
* yû / îû	-

Wek ku tê dîtîn, Y nikare li berî I, U, Ê dîftongan çêke. Li berî Ê ew tenê dikare wek paşpirtik yan herfa kelijandinê hebe. Di rastiyê de ew hingê jî dîftongan pêk naîne, tenê di nivîsînê de tê bikaranîn:

Nivîsîn	Gotin
tu yî	tuî
qamişloyî	qamişloî
ronayî	ronaî <sup>49</sup>

Bi nivîskî mirov komherfên YO dibêje. Lê di rastiyê de di gotinê de Y mit anku bêdeng e:

- nivîskî: *birayo*
- gotin: *birao* (yan: *biraw*)

Li berî Ê, herfa Y xaseten di çemandinê de û herwiha di cînavên *yê, yên*<sup>50</sup> de tê dîtîn:

- *yê* din, *yên* min, *birayê* te, *nameyên* wê

Lê di gelek devokan de Y di van rewşan de jî mit e:

- *ê* din, *ên* min, *bira-ê* te, *nameên/namên* wê

L berî E, herfa Y di çend peyvên de heye. Ew herwiha li gel kopulaya cînavê sêyem *yê* yekhejmar (ew) li kar e eger peyva berî wê bi vokalekê bi dawî were. Herwiha paşpirtika "-ek" dibe yek eger peyva ew digire bi vokalekê bi dawî were:

- Ew mamoste *ye* (bide ber *ew profesor e*)

<sup>49</sup> Forma serdesttir bi nivîskî û gotinê *ronahî*.

<sup>50</sup> Bi devokî herwiha *yêt, yêd*.

- name-yek (bide ber *kitêb-ek*)

Lê peyva *yezdan* di nav gel de nîne û bi aşkerayî vê dawiyê ji farisî ketiye kurdî. Heta peyva *yek* jî li hin deveran bi awayê *êk* e. Di gotinên wek *mamoste ye* de jî gelek caran *Y* nayê bihîstin. Ji xwe peyvên wek *nameyek* di axiftinê de bi piranî dibin *namek*. Anku eger em nebêjin ku dîftonga *ye* di kurmançî de nîne jî, divê em bibêjin ku di axiftina kurmançî de ew gelek kêr peyda dibe.

Wisa dixuye ku dîftonga *YA* zêdetir peyda dibe: *ya, yan, yar, yarî, beyar, eyar...*

Lê di rastiyê de ew jî ne zêde li kar e. Peyvên *ya, yan* bi awayên *a, an* zêdetir di nav gel de belav in. Peyvên *beyar, eyar* ji erebî ne. Peyva *yarî* (lîstik; henek) aîdî kurmançiya rojhilatî ye û di kurmançiya navendî û rojavayî de kêr tê bihîstin yan heta belkî qet peyda nabe. Peyva *yar* ne ji destê gel lê ji zimanê helbestî ye û qet ne dûr e ku wergirtineke ji farisî be.

#### **-iya = -îa**

Di kurdî de, hem di nav peyvên xwemalî de û hem jî nemaze di peyvên esil-erebî de gelek caran komdengê *-iya-*:

- çiya, giya, giyan, jîyan, niyan, şîyan...
- diyanet, riwayet, siyaset, xîyanet...

Heta hin kes van peyvên bi herfên *-îya-* (*çîya, jîyan...*) jî dinivîsin.

Li gor qeyd û bendên kîtekirinê, divê "î" ya van dangan di kîteyêke ji "-ya" cuda de bûya, wek "çi-ya, gi-ya..."

Lê di rastiyê de mirov adeten van peyvên wisa kîte nake. Mirov konsonanta yekem û "îya" hemû bi hev re bi carekê dibêje. Anku peyvên wek "çiya, giya, giyan, şîyan" ne dukîteyî lê yekîteyî ne. Sebeb jî ew e ku herfên "îya" nîşana dîftonga "îa" ye.

Ji ber ku di alfabeya kurdî-erebî de herfa "î" nîne, li hevberî "îya" ya kurdî-latînî *ya* (ya) tê nivîsîn, heçku mirov bi latînî binivîse: *gya, çya, syaset*. Di alfabeya kurdî-erebî de jî ji aliyê alfabeyê ve dê mimkin bûya ku mirov van peyvên wek *çîya, şîyan, sîyaset* binivîse lê ew awa qet di alfabeya kurdî-erebî de nayê nivîsîn û di kurdî-latînî de jî ne awayê standard e.

## HEVALÊN DEREWÎN DI KURMANCÎ Û SORANÎ DE

Di zimannasiyê de mebest ji *hevalên derewîn* yan jî *hevalên çewt* (bi inglîzî *false friends*) ew peyv in ku bi temamî yan pirr wek hev in lê di ziman yan zaravayên cuda de yan jî li deverên cuda wateya anku maneya wan ji hev cihê ye.

Mirov bawer dike ku ew peyvên nas in lê dibe ku mirov xelet wan fehm bike yan bi kar bîne. Navê peyvên wisa *hevalên derewîn* yan *hevalên çewt* e.

Bo nimûne, peyva *pirr* (pir) di kurmancî, soranî û zazakî de heye lê di kurmancî de wateya wê *gelek, zehf, mişe* ye lê di soranî û zazakî de maneya wê *tijî, tije, mişt, dagirtî* ye.

Dîsa peyva "mil" di kurmancî de maneya "beşa jorîn ya destan" dide lê di soranî û zazakî de wateya "stû" dide.

Di kurmancî de peyva "kin" li hin deveran heye û maneya "kurt, ne dirêj" dide. "Kin" di hin devokên soranî de jî heye lê maneya "(li) ba, (li) cem, (li) nik" dide.

Di kurmancî de peyva "kir" forma dema borî ji lêkera "kirin" e. Lê di zazakî de "kir" maneya "kîr" ya kurmancî dide.

Di kurmancî bi xwe de jî bo nimûne peyva "poz" li hin deveran maneya "difin, bêvil, kepî, organa bêhnkirinê" dide lê li hin deran jî maneya wê "qûn" e. Wateya peyva "pêsîr" li hin deran "bersîng, paxil, memik, çîçîk" e lê li hin deran jî ew maneya "navran, navbera herdu piyan" dide.

"Parzûn" li Behdînan çanteyê rîsî yê pişta bêrîvanan e. Lê li Mêrdînê heman "parzûn" tûrikê dawerivandina penîrî ye.

Di kurdî de "boş" maneya "pirr, mişe, zehf" dide. Lê "boş" a tirkî bi wateya "vala, xalî" ye.

Di soranî de "şit" maneya "tişt" dide. Lê di inglîzî de "shit" (bixwîne: şit) wateya "gû, pîsatî" dide.

Di inglîzî de "gift" maneya "diyarî, hediye" dide lê di almanî de maneya wê "jehr" e û di swêdî de jî "zewicî" ye.

Peyvên wiha di navbera ziman, zarava û deverên cuda de bi hezaran hene. Heta mirov dikare bibêje ku "hevalên derewîn" ji "hevalên rastîn" zêdetir in.

Dibêjin yekî hekarî li Helebê çûye xwaringeha yekî efrînî û pirsiyê:

- Çi heye?
- Gî heye. (bi efrînî: gî = gişt, hemû, her tişt)
- Çawa gî?! (bi hekarî: gî = gû, pîsatî)

Li vê derê em lîsteyêke (netemam) a hevalên derewîn di navbera kurmancî û soranî de didin.

Soranî	Kurmancî	Kurmancî	Soranî
al	til(iy)a navîn	al (alî)	la, dîw
aman	hewar, eman	aman (firaq)	qap-û-qaçan
areq	xuh, xwêdan	ereq (mey, bade)	şerab, mey
arê?	gelo? ma?	erê	beîê
aş	1) aş 2) xwarin	aş	aş
awa	ava	awa	şêwe
ayar	gulan	adar	adar
aza	fêris, çeleng	azad	azad
ba	1) ba 2) belê 3) bila	ba	ba
bawî	bahîv, behîv	bawî	romatîzmî
beq	nêrekew	beq	boq
berdewk	xweşheval, dost	berdevk	axawtinker
berok	bersîng	berok (berîk) gîrfan	
bijar	qirş, qirşik	bijare	bijarde
bilûr	belûr, krîstal	bilûr	şimşat
biske	girnij, bişir	bisk	egrîce
boq	beq	boq	biz
buwêj	biaxiftin, zêdebêj	biwêj	
			zarawe, aydiyom, îdyom
bum	erd, ax; avanî, avahî	bum (kund)	kundebebo
cerr	birxû,	cerr	goze, şerbe



cêga	şûn	cih, cî	şwên
çar	çare, hel	çar (4)	çiwar
çare	biçim, rû, serûçav	çare	çar, hel
çaşt	firavîn	taşt/têşt	nanî beyanî
çax	qelew; saxlem	çax	serdem; kat
çêşt	xwarin, xwirak	têşt (taşt)	berçayî, nanî beyanî
çirandin	bang kirin, gazî kirin	çirrandin	parçe parçe kirdin
daye	dayê, dê, dayik, da	daye	dawe
debê	divê, pêdivî ye	dibê (dibêje)	deîê
dem	dev	dem	kat
derewe	derve, der	derew e	diro ye
dew (pele)	lez, bizav, ecele	dew	do
dewar (reşmal)	kûn, kon, ~ çadir, xîvet	dewar	reşewîtax
direw	dirûn, birrîna giya	direw (derew)	diro
dîlan (gêl, şêtoke)	gêjelok, peledîn	dîlan (govend)	helperkê
dû	du (2)      dû (dûv /pey)		diwa
edî	1) helbet, tabî 2) ma ne?	êdî	îtir
em	ev	em	ême
emin	ez; min	emin	asayîş, emn
esto	patik, paştto sto	mil	şan
estêrk	1) embar 2) bendav	stêr(k)	estêre
firawan	fireh	firavîn	nanî nîwero
fire	pirr, gelek	fire, fireh	firawan, pan
gerrek	tax, mehel	gerrek	gerrek, pêwîst
hewar	war, havîn-, seyrangeh	hewar	hawar, gazî
hêlke	hêk	hêlik	gun
jîr	vehewayî, tebitî, tena	jîr	hoşyar
kat	kat	kat / kate [k-ya nerm]	???
keç	(serê) şorr / berjêr	keç	kiç (# kur)
kemer	navteng	kemer	şal
key	kengî, çi demê	key	padişa
kêr	kîr	kêr	çeço

kin	nik, cem, bal, dev, rex	kin (kurt)	kurt
kok	kux, kuxik	kok, qurm	kok, qurm
kon	kevn	kon, kûn	reşmal
lew	li wê/wî	lew(ma/re)	boye
lê xurrîn	ajotin	lê xurrîn	emir kirdin
lixaw	hefsar	lixav	demamk(î limoz)
mana	mane, wate	mana...	manewey...
mil	sto	mil	şan
mişt	mist (dest)	mişt (tijî)	pir
next	piçek, kêr	next (=qelen)	şîrbayî
pa	pê, pî	pa?	ey?
paxêl	erebe (li dû hespan)	paxil	baxet
pel	destûpî	pel (belg, çilû)	gefa
peya	peyda	peya	peyar
pêl (kat)	dem	pêl	şepol
pir	tijî, mişt	pirr	zor
pîrek (kon)	pîr û çilmisî	pîrek (jin)	jin, afret
pûr	met; xalet	pîr (dapîr)	dapîr
rakirdin	bezîn; bazdan, revîn	rakirin	hefsandin
razandin	raxistin	razandin	xewandin
sat	kêlik, bîsk	saet, seet	se'at, se'et, sa'et
sext	dijwar, zor	sexe	tezwîr
sil	şerm; tirs	sil (zîz, xeyidî)	tûre
sûk	sivik	sûk	bazarr
şan	mil	şan	şeref
şaş	ekran	şaş	hefe
şil	qerimî,	şil	terr
şîr	1) şûr 2) şîr	şîr	şîr (xurak)
şwên	cî	şûn	cêga
tena	tenê, bi tenê	tena (aram, rehet)	aram
terr	şil, ne zuha	terr	taze
terane	stran	tirrane	gafe, şoxî

tewir	bivir	tevir	kulepaç
wate	anku, yanî	wate	wata, mana
westan	rawestîn	westîn	şeket kewtin, mandû bûn
xas	baş, çê, qenc, rind	xas	taybet
xêzan	jin, kevanî, bermalî	xizan	hejar, feqîr
zarawa	têrm, peyv	zarava	lehce, zarawa
zor	pirr, gelek	zor	sext, zehmet

## NEW TESTAMENT TRANSLATION INTO KURDISH

**Marcin Rzepkin**



### ABSTRACT

In 2000 the Kurdish translation of the New Testament called Мъзгини. Пэймана Ну (Mizgîn. Peymana Nû) was published by the Institute for the Bible Translation. The Institute founded in 1973 from its very beginning have dealt with Bible translations into non-Slavic languages used in Russia. In 1983 the translation work among the Kurds living in the Caucasus started. It was inspired – to some extent – by Kurds and one of them Nadr Ozmanyanyan was involved in the project. He emphasises the cultural role of the Bible translation into Kurdish. In fact the final book consists not only the translated text of the New Testament but also contains many additional information, notes, maps and glossary introducing the reader to the biblical realities and culture.

### INTRODUCTION

In his article on semiotics and the Bible, Rober Hodgson states that “There are two Bibles, one visible, one invisible. We see the visible Bible rolled up in scrolls, sewn together in the pages of manuscripts; or, since the invention of moveable type and the printing press, bound up in the now familiar and canonical form of a printed book. We see the invisible Bible in over two millennia of media presentations — drawings, illustrations, music, dances, dramas, pageants, sculptures, icons, mosaics, paintings, tapestries, rugs, and architecture elements such as stained glass, portals, and altarpieces” (Hodgson 2007:182). Such a statement opens a discussion on the cultural function of the translated text indicating the role of its physical, material form and, at the same time, shows the

possibilities of the intersemiotic translation of its message. The visibility and invisibility of the Bible are equally important and determine particular projects of its translation. New translations intentionally interweave visual elements with textual contents. We also see that “In the last hundred years, editors have introduced concordances, maps, tables of measurement, topical lists, pictures, footnotes, glossaries or dictionaries, and introductions to individual books” (Ott 1990: 34). It can be used as the description of the Kurdish translation of the New Testament – Мъзгини. Пәймана Ну.

### **THE SEMIOTICS OF TRANSLATION**

Methods characteristic for the linguistic analysis of a text are fully recognized and used in the field of biblical studies (Chmiel 1972; Zaborski 1973, Bartnicki 1994). Jerzy Chmiel, a Polish Catholic priest and Biblical scholar, in his numerous valuable articles proposed semiotic tools for the study of the Bible and its translations (Chmiel 2001). Undoubtedly, semiotics may be seen as one of many approaches to textual and cultural analysis of translation (Nowotna 1999). The works based on such an approach intent to highlight semiotics as a frame organizing grammatical analysis, semantics and anthropological dimension of the text (Nowotna 1999:80). Chmiel is convinced that apart from semantic and stylistic adequacy, translation also needs involved translators in the process on semantic decoding of the whole text. Proper translation of various elements of the text is not enough, which is obvious, a certain translator must take the entire text with its semiotic configuration into account. This is a proper way for understanding the various cultural models (who speaks), language (how he/she speaks) and intercommunicative aspects (why he/she speaks) of the translated text (Chmiel 2001:183). In fact, while discussing the semiotics in reference to translation we consider not only the text but also the cultural context in which it was composed.

The text of translation may – compared to the original – comprise some additional information indicating the context in which it was produced. In reference to the Bible translation they are: introductions, commentaries to the main text, footnotes, references and glossaries at the end. Chmiel makes an attempt to distinguish between the textual semantics (with reference to the main text) and the para-textual semantics comprising commentaries, footnotes and also graphic elements (Chmiel 2001:185). The Kurdish translation fits perfectly to the assumption made by Chmiel. The reader is given not only a biblical message translated into Kurdish but rather a hypertext

equipped with a critical apparatus in the form of notes, drawings, maps and a glossary. As such, it constitutes a whole translation called *Мъзгини. Пэймана Ну*. It comprises the translated text of the New Testament and a meta-text in the form of the already mentioned commentaries and additional notes related to it. The language of commentary (to which introductory notes, a glossary, diagrams, maps are included) as the meta-language of the whole text uses the object language, in spite of John Lyons' opinion that the language of commentary needs no words or group of words belonging to the object language (Lyons 1984:15). In the translation analysed the meta-language of the commentary classifies and explains the lexical entities used in the main text translated.

Thus, translation raises a number of questions concerning the way in which foreign words and structures are incorporated into a text, how they are explained and what the role of the visual elements added to the text is. They constitute the full edition of the translated text which should not be analysed separately.

#### **THE HISTORY OF TRANSLATION**

The idea of the Bible translation into Kurdish for the Kurds living in the Soviet Union was introduced by the Institute for Bible Translation (in Kurdish *Вэлгэр'андьна К'ътеба Пироз*) in 1980s based in Stockholm. The Institute initiated its project in 1973 conducting ethno-linguistic research among the non-Slavic nations living in Soviet Union in order to estimate the conditions and possibilities of the Bible translation. At the beginning, the main task was to review the existing translation and later its re-edition. In the following years a collaboration with representatives of the minority ethno-linguistic groups was established in case of new translations. The Institute came into contact with other institutions working on the Bible translation like Wycliffe Bible Translators and United Bible Societies. Since 1990s it has been preparing some projects in cooperation with the Russian Academy of Sciences and the Russian Orthodox Church.

Although the initiative to translate the Bible for Kurds living in the Soviet Union was undertaken in 1983 the first translated book – The Gospel according to Matthew was published in 1993. The whole translation of the New Testament in a Cyrillic script – *Мъзгини. Пэймана Ну* was published in 2000. In 2011 it was re-edited in the Roman script. In 2009 part of the Old Testament – the books of Ruth, Esther and Jonah were prepared and in 2010 Pentateuch both in the Roman and Cyrillic scripts was issued (see: <https://ibtrussia.org/en/projects?id=KKD>). The 2000 edition was printed in 5,000 issues

and circulated in the territory of Russia Nizhniy Novgorod, Bataisk, Yaroslavl, Krasnodar and other cities as well as in Armenia, Georgia.

The origins of translation are connected with the personal story of Nadr Ozmanyanyan, a Kurd from Armenia who became a Christian in 1973 and later was involved in the translation work with Curt Gustafson. The materials published by the Institute emphasise the role of Kurds in the preparation of the book and their expectations to obtain the Bible in their own language – Kurdish, they, in fact, could read the Bible but only in Armenian or Russian. The personal story of the translator shows how the Bible is perceived among Kurds and what role it may play in the religious and cultural development of the society. Ozmanyanyan says:

“In April 1973 I found Christ and began to read the New Testament in Armenian. I felt that the Gospel was spiritual food which I could not eat alone but which I must share with others. I envied other ethnic groups who had the Gospel in their language, and I began to translate Matthew’s Gospel into my mother tongue of Kurmanji- Kurdish.” (Translators’ News 2004).

### **THE BIBLE AS A SIGN**

The Bible in Kurdish is a sign. For the people involved in the project it is a sign of collaboration between different institutions and churches. But the final form is the result of the work conducted by a scholar from the Russian Academy of Sciences. Apart from the text of translation, the edition comprises some information to make a reader familiar with the socio-theological context of the Bible. Each part of the New Testament is provided with an introduction. All this certainly makes it easier to understand the message of the Gospel. Excessive expansion of the commentary allows to insert words and structures characteristic for the original language in the text translated, which are explained in the meta-text of the glossaries and footnotes.

In the introduction Пешготъна Институте the history of the Bible translation into Kurdish is presented along with some information about the method (Щур’е [мет’ода] хэбата ве вэлгэр’андъне), and the edition which became the base for this translation – The Greek New Testament, Stuttgart 1993. Such information seems to be important in the light of history: the New Testament was translated into Kurdish via Persian, Arabic not from the original Greek. The authors of the translation ensure that they maintain the strict meaning of the original text, which may be

seen as a declaration of fidelity, and the original thoughts were presented in a beautiful, clear and modern language.

The process of translation, however, is explained in religious terms. "The issue of faith seems to be crucial for many Kurds, and their religious fervour recalls that of apostolic times. When members of the Kurdish community experience Christian conversion, it arouses a great spiritual struggle around them. Since the Bible translation process has started bearing fruit, many Kurdish families and whole clusters from different parts of Russia and the CIS have received Christ and become fervent members of either Evangelical or Orthodox Christian communities" (Newsletter on the Kurdish Kurmanji project 2011).

### **SOME SEMIOTIC AND SEMANTIC ASPECTS OF TRANSLATION**

The translation always represents the original text. Therefore, to be considered correct and understandable it must correspond with other texts in the language of the original text. On the other hand, as a representative of the original text it also may be characterized by the usage of a special language, defined just as the language of translation, not encountered in the texts produced directly in that language. Some scholars suggest that, because the translation is secondary and referential to the original text, we can hypothesize that it is highly possible that it indicates some elements of its foreign origin (Lewicki 2000:22). In the case of the New Testament, especially Gospel of Matthew, the Semitic elements are manifested both in the style and the lexemes used. Due to its well-seen Semitic background, the Gospel of Mathew seems to be the most translated part of the Bible into Arabic (Kościelniak 2001:282). Of course the message of the Bible is universal but transmitted in the particular linguistic form (Wierzbicka 2002). Some elements of the original language having been left in translation indicate its stylistic bias – the so called biblical style (Bieńkowska 2002). What is more, such elements influence the semiotic structure of the text emphasising the distance between the original and translated texts. In translation the semiotic feature is elementary and as something expected it defines the way of reading and interpreting the text (Lewicki 2000:24). Strangeness is manifested in non-equivalent terminology, proper names, terms describing realities (functions, ranks, etc.).

It is common for the authors of the New Testament to speak about two aspects of one action separately (Carmignac 1987). A good example being a fragment ἀποκριθεὶς δὲ αὐτῷ ὁ Πέτρος εἶπεν



Matthew 14:28 'And Peter answered him and said' (King James Bible), Пәтрүс лә вәгәр'анд у готә . The Greek form of an aorist participle passive ἀποκριθεὶς took the form of the past tense in translation: вәгәр'анд. In the Kurdish translation we have two actions: 'answered' and 'said'. Such forms are also used in other places: Mark 13:2; Luke 4:8: Иса ль (ви) вәгәр'анд у гот.

The construction 'got up and went' frequently appears in the text. Mark 10:1: καὶ ἐκεῖθεν ἀναστὰς ἔρχεται εἰς τὰ ὄρια τῆς Ἰουδαίᾳς 'he arose from thence, and cometh into the coasts of Judaea', Иса жь вьр р'абу чу синоре Щьһустане. The translation of the fragment καὶ ἀνοίξας τὸ στόμα αὐτοῦ ἐδίδασκεν αὐτοὺς λέγον 'he opened his mouth, and taught them, saying' in Kurdish әви дәст бь һинкьрьна хвә кьр у ванр'а гот in Matthew 5:2 seems to be very interesting. The translators used the idiom with the meaning to start, to begin, дәст ... кьрьн.

Among the numerous phrases of Semitic provenance nominal phrases (connections) constitute quite a large group. Often, it is a combination of a precise noun with the abstract one. The group includes phrases functioning as metaphors: the son of light, the son of perdition, the son of the kingdom.

Such structures need to be translated with some sort of equivalency, when they remain translated literary become a stylistic indicator. In the Kurdish translations they are translated as мәрвь 'man', or зар' (зар'о) 'child'.

The usage of the word 'son' Kurdish көр' 'son' is obligatory in Mark 3,17, where it explains the Hebrew name, the phrase in Greek καὶ ἐλέθηκεν αὐτοῖς ὄνομα[τα] Βοανηργές, ὃ ἐστὶν Υἱοὶ Βροντῆς 'and he surnamed them Boanerges, which is, The sons of thunder', is translated into Kurdish as: әви навә Боанерцәс ль ван кьр, кө те фә'мкьрьне: "Көр'ед Гөр'инийа ә'змен". Of course the word көр' 'son' appears many times in the phrases used to describe Jesus as the son of God or the son of Man – Көр'е Хвәде 'Son of God, or: Көр'е Инсан 'Son of Man'.

Sometimes words 'man' and 'child' are used interchangeably in translation. The Greek text υἱοὶ τῆς Βασιλείας 'sons of the Kingdom' from Matthew 8:12 and 13:38 is translated into Kurdish differently. The first one as: зар'ед П'адшатиye 'children of the kingdom, while the second one: мәрвьед п'ара П'адшатиye 'men of Kingdom'. Similarly, the Greek: υἱοὶ φωτός 'children of light' from Luke 16:8 and 1Thessalonians 5:5 in Kurdish is translated as: мәрвьед and зар'ед. The phrase 'sons of a space of time, an age' is preserved in translation. In Luke 16:8: υἱοὶ τοῦ αἰῶνος a space of time, an age, in Kurdish took the form: мәрвьед бь дьне. The exception in translating words 'son, sons' by 'мәрвь,

зап' can be found in Matthew 9:15; Mark 2:19, where the Greek phrase: υἱοὶ τοῦ νυμφῶνος 'children of the bridechamber' is translated as хвэндийед дэ'wate 'called, invited (to the wedding)'.

In the New Testament the phrases which are used to put an emphasis or to open a speech, especially in relation to Jesus' sayings are very common. Mark 3:28: Ἀμὴν λέγω ὑμῖν 'Amen, I say to you'. The word amen is translated into Kurdish as p'act 'right': эз p'act wəp'a дьбежъм, 'Verily I say unto you'. Hebrew amen in John 1:51 is dubbed: Ἀμὴν ἄμὴν λέγω ὑμῖν 'Verily, verily, I say unto you' (KJB). In the Kurdish translation two words with opposite meanings are used in order to avoid repetition. The emphatic structure like эз p'act бе хельф wəp'a дьбежъм; бь хельф 'without error, falsehood' deserves some attention. It is a very interesting proposition while there is no such equivalent in other translations. And thus, the Kurdish proposal seems to be very innovative.

The word amen opens a broader discussion on the lexical borrowing from Semitic languages in the New Testament (Carmignac 1987:518; Mussies 1984). In fact, their appearance in different translations depends primarily on individual choices and the methods adopted during the translation process (e.g. translations prepared in the frame of a dynamic equivalence approach seek to replace Aramaic and Hebrew words with the native ones). In the Kurdish translation analysed they occur in a large number indicating the „strangeness” of the text and may determine the biblical style of the translation. Their use in the original form is motivated largely by the glossary, which contains detailed explanations of the meaning. Foreign vocabulary allows the reader to associate with a different cultural reality, and thus to understand the cultural context of the original text. Among many borrowings we can count: abba 'Father' in Mark 14:36: Абба, Баво!; alleluja 'praise the Lord, in Revelation 19:1: халелуйа, with initial h like in Hebrew: halēlū jāh; effethah 'be opened' appearing as a synonymous quotation in Mark 7:34: “эффата!” кӧ те фэ'мкъръне: “Вэбэ!”; Eli, eli, lama sabachtani 'My God, my God, why hast thou forsaken me' in Matthew 27:46: “Ели, Ели, лама сабахтани?” кӧ те фэ'мкъръне: “Хвэдейе мьн, Хвэдейе мьн, тэ чьма эз ньштъм?”; hosanna 'save, rescue' appears in Matthew 21:9: хосанна Кӧр'е Давьдр'а!; manna 'bread' in John 6:31: мана; maranatha 'Our Lord, come', in 1 Corinthians 16:22: маранат'а, but in the footnote it is explained: Йа хӧдан wəpə; rabbi 'master, teacher' is used in John 1:38 with semantic equivalence: p'abbi, кӧ те фэ'мкъръне дэрсдар. In the Kurdish translation, however, Semitism like raka 'fool' in Matthew 5:22 does not appear. It is translated as: бе ақъл 'out of one's mind'. There is also no Semitic word satan in the main text of the translation even in the form borrowed from Arabic

(шәйт'ан is used just in the glossary). It is replaced with мирещън, a word composed of мир 'master, prince and щън 'Jinn, spirit'.

## VISUAL ELEMENTS AND GLOSSARY

The graphic element has a very important position in the analysed edition of the Kurdish New Testament. To some extent, visual and textual elements are complementary. Illustrations are of interpretative character (Chmiel 1998). The glossary contains 16 graphic illustrations, five of which are related to the 5 have to plants (бъхуре ә'реби ,incense'; зоха һусоне ,hyssop'; зьмьр ,myrrh'; хәрбал ,mustard seed'), which explain difficult and specialized vocabulary. A good example is the drawing of a Roman soldier and the description of each item of armour, which is associated with a fragment of Ephesians 6:11.

The graphic elements may be divided into three categories: 1) the ones which are merely illustrative or decorative; 2) those of explanatory character (e.g. a drawing with a note: дара һежире ,fig tree'); 3) those commenting a particular verse, which is also used as an explanation of the presented figure, for example legs in sandals with a note (Acts 13:25): әз нә һежа мә бәне чарьхед ньгед вәкъм' whose shoes of his feet I am not worthy to loose'.

The glossary contains more than 300 words. The definitions proposed by the authors can be divided into at least two classes: those that explain the meaning of the word, like Иса, Мәсих 'Jesus, Messiah' and those that explain the meaning of a term, for example Хач 'cross'. Kurdish words which must be clarified because of the dialectic differentiation constitute a large group, like р'ав ,root' or р'а ,root' and р'айе даре 'the root of the tree'. The word мәрвь, which we also find in the glossary may cause some surprise, but perhaps due to the lack of standardized written forms another form is given: мьров, along with the word of the Arabic origin инсан.

The notes and the glossary constitute an integral part of the Kurdish translation, making it more "interactive" and more interesting to the reader not familiar with the Bible. It is important to notice that the meta-language of the commentaries fully corresponds with the language of the main text, explaining its concepts and forms.

The edition of the translated Kurdish New Testament gives an impression of a small encyclopaedia introducing some cultural and religious aspects of the ancient world to the readers. The text of the

translation remains “foreign” by preserving some Arameisms and Hebraisms but by using a critical apparatus it gives an opportunity for a deeper understanding of the meaning of the original culture. And, at the same time, the linguistic choices made by the authors.

The authors of the Kurdish translation try to avoid explicit solutions. They decide to leave some elements of the original text, which, in fact, makes the reader aware of the strangeness of the text and the cultural context in which it was composed. Narrowing the possible ways of interpretation, they include notes and a glossary. Such translation seems to be a kind of ethnographic description of the situational context.

## REFERENCES

- Bartnicki, Roman. (1994), *Strukturalizm i semiotyka w badaniach nad Ewangeliami*, „Ruch Biblijny i Liturgiczny” 1, pp. 6-20.
- Bieńkowska, Danuta. (2002), *Polski styl biblijny*, Łódź: Wydawnictwo Uniwersytetu Łódzkiego.
- Carmignac, Jean. (1987), *Problem semityzmów w ewangeliach synoptycznych*, „Ruch Biblijny i Liturgiczny” 40, pp. 516-533.
- Chmiel, Jerzy. (1972), *Możliwość zastosowania analizy pola stylistycznego w egzegezie biblijnej*, „Analecta Cracoviensia” 4, pp. 181-190.
- Chmiel, Jerzy. (1998), *The Visual Interpretation of the Bible. An Outline*, “Folia Orientalia” 34, pp. 31-34.
- Chmiel, Jerzy. (2001), *Semiotyka przekładu Nowego Testamentu w Biblii Leopoldy*. In: *Nowy Testament w dziejach i kulturze Europy*, „Zielonogórskie Studia Łużyckie” 3, Zielona Góra, pp. 183-188.
- Hodgson, Robert. (2007), *Semiotics and Bible translation “Semiotica”* 163–1/4, pp. 163–185. Kościelniak, Krzysztof. (2001), *Tradycja muzułmańska na tle akulturacji chrześcijańsko – islamskiej od VII do X wieku*, Kraków: UNUM.
- Lewicki, Roman. (2000), *Obcość w odbiorze przekładu*, Lublin: Wydawnictwo Uniwersytetu Marii Curie-Skłodowskiej.
- Lyons, John. (1984), *Semantyka*, transl. A. Weinsberg, vol I, Warszawa: PWN. Mussies, Gerard. (1984), *Hebrew and Aramaic in the Greek New Testament*, “New Testament Studies” 30, pp. 416-432.
- Newsletter on the Kurdish Kurmanji project 2011, <https://ibtrussia.org/en/newsletter-1111>
- Nowotna, Magdalena. (1999), *Semiotyka w służbie przekładu*. In: *Krytyka przekładu w systemie wiedzy o literaturze*. Studia o przekładzie 9, ed. P. Fasta, Katowice: „Śląsk” Wydawnictwo Naukowe, pp. 81-96.

## KURDISH AND CATALAN: A SOCIO-LINGUISTIC COMPARISON

### Xarlatà

When talk of modern day independence movements comes up, Kurdistan and Catalonia always feature heavily. Catalans have recently been seeing a surge in support for independence from Spain, thanks in no small amount to the ever worsening economic situation in that country, but also because of the ever present threat to Catalan language and culture which the central Spanish government represents. Then there is the fact that the Spanish political system was set up by those who inherited power from General Franco's dictatorship without a clear split from the past and, at least in some people's minds, returning to it is only one crisis away. Whilst Kurdistan may be in the same boat in terms of being a nation without a state, the situation itself is quite different. Firstly the 30 million or so Kurds are spread out among four different states, none of which are Kurdish. In Turkey and Iran they are still being oppressed political, economically and culturally, in a way that the Catalans probably haven't experienced for one or even two generations. However, due to the great size and complexity of the entire Kurdish region, I am mostly going to talk about the Iraqi Kurdish autonomous region or South Kurdistan. This region was able to achieve de-facto autonomy after the first Gulf War in 1991 and has enjoyed legal autonomy since helping set up the new federal Iraqi state. What I wish to look at here is the difference between the socio-linguistic situations in Catalonia and South Kurdistan. This means I will be comparing the state of the languages and their outlooks as well as social and governmental attempts to protect them. Finally I will give my own recommendations for what should be done for the best interests of the two languages.

